Dr. CELİLÊ CELİL

# JIYANA REWŞENBİRİ
# Û
# SİYASI YA KURDAN

(Dı Dawiya Sedsala 19'a û
Destpêka Sedsala 20'a de)



JİNA NÛ

Dr. CELİLÊ CELİL

# JIYANA REWŞENBİRİ Û SİYASİ YA KURDAN

## (Dı Dawiya Sedsala 19'a û Destpêka Sedsala 20'a de)




JİNA NÛ

Jina Nû : 4
Tarix No : 2
Tarixa Çapê : Çırya Dawi 1985

Adres :
JİNA NU FÖRLAGET
Post Box: 240 12
750 24 UPPSALA

İSBN : 91970747-21

Dr. CELİLÊ CELİL

# JIYANA REWŞENBIRİ Û SİYASİ YA KURDAN

(Dı Dawiya Sedsala 19'a û Destpêka Sedsala 20'a de)

Werger: Elişêr

JİNA NÛ

## DAXUYANİYA ÇAPXANÊ

Ev kıtêba destê we, wergera lêkolina diroknasê hêja Dr. Celilê Celil a lı ser tevgera siyasi rêxıstıni û rewşenbiri ya Kurdan a dawiya sedsala 19'a û destpêka sedsala 20'a ye. Jı wergera Şaır Enwer Caf a Sorani (ku hê çap nebûye) me wergerand zaravayê Kurmanci. Dı wergerandınê de me alikariyek hêja jı Mamoste Dılzar dit. Jı bıli vi, me fırset dit, ku em hin metnên vê wergerê ku jı rojnamên Kurdi (her weki Roji Kurd) hatıne stendın bıdın ber orijinalan û wergerandınek hê tekûztır derxın holê. Vî karê hêja ji bal Mamoste Malmısanıj ve hat kırın. Dıvê em sıpasên xwe, lı vır jı wan re bıdın diyarkırın.

Dr.Celilê Celil, doktorê dirokê ye û pısporiya (ixtisas) wi lı ser diroka Kurdıstanê ye. Laweki hêja yê gelê Kurd jı Kurdên Yekitiya Sovyet e.Xebateke wi ya dûr û dırêj û pır bı rûmet a lı ser diroka tevgera rızgarixwaziya gelê Kurd a her du sedsalên dawi (sedsala 19'a u ya 20'a) heye. Gelek lêkolinên wi bı kıtêbi û wek makale çapbûne. Jı wan hınekên wan ha-

tıne wergerandın zımanê Erebi ji. Her çıqas Dr. Celilê Celil jı bal Kurdên Kurdıstana Tırkiyê tê naskırın ji, gelek mıxabın ku tu afırandınên wi heta nıha ne bı Kurmanci û ne ji bı Tırki nehatine çapkırın û xwendevanên vi perçeyi jı fêkiyên vê xebata hêja bêpar mane. Bı çapkırına kıtêba destê we, me seri lı rakarına vê kêmasiyê vekırıbe û afırandınên wiyên dın ji lı vi perçê welatê me ronahi bıbın emê gelek bextiyar bıbın.

Dr.Celilê Celil, bes bı xebata xwe ya dı warê dirokê de nayê nasin. Kareki gelek hêja dı warê berhevkırına folklora Kurdi de ji kırıye, û hin ji vê xebata xwe dıdomine. Dı vê xebata xwe de carnan bı serê xwe, carnan ji bı bırayê xwe Ordixanê Celil û xweha xwe Cemila Celil re afırandınên encama karubareki zanısti û dıjwar derxıstiye ronahiyê. Îro lı Akademiya Zanısti ya Ermenistana Sovyeti dı beşê Kurdi de hem lı ser diroka Kurdıstanê û hem ji dı warê folklorê de xebata xwe dıdomine.

Gava xwendevan vê kıtêba destê xwe bıxwûne bıqedine, em bawer dıkın wê ew ji bıgıhije wê qeneatê ku bı çapkırına wê, me çawa kareki dı cih de kırıye. Naveroka kıtêbê lı ser tevgera azadixwaziya netewi, rewşenbiri û rêxıstıni a dawiya sedsala 19'a ye ku qonaxek nû gırtıbû berxwe. Lêkolin bıderketına yekemin rojnama Kurdi "Kurdıstan"ê destpêdıke, xwe dıgıhine heta destpêka Şerê Cihanê yê Yekem. Lı ser tevger, karûbar, bûyer û serihıldanên vê demê (helbet ne lı ser hemû serihıldanan) bızanısti radıweste, lê hûr dıbe û gelek bûyerên heta nıha lêhaynebûyi derdıxe ronahiyê. Nıvıskar, jı bo amadekırına vê lekolinê seri lı gelek çevkaniya xıstiye. Jı rojnamên Kurdi yên wê demê bıgre heta dokumantên arşiva dema Rusya Kayseri yên lı ser mesela Kurd yek bı yek lı ser wan sekıniye û wan dıbın çev re derbaz kırıye. Dı

encama xebatek dûr û dırêj û bı sebır, lê gelek zanısti ve lêkolina han derketiye meydanê. Tu şık jê re tune ku ev kıtêb, dı ronikırına diroka tevgera rızgarixwazi û rewşenbiri ya gelê Kurd de ciyeki gırıng dıgre. Bı taybeti ji jı bo xwendevanên Kurdıstana Tırkiyê, wê bersiva ihtiyaciyek mezın bıde.

Bı çapkırına Kurmanciya vê afırandına hêja em berpırsiyariyek ser mılên xwe bı ci tinın, ger feyde bıgıhê xwendewanan jı bo me bextiyariyek mezıne.

JÎNA NÛ

## PÊŞGOTIN

Tevgera azadixwaz a netewa Kurd, dı van sedsalên dawi de roleki baş dı pêşvebırına xebata dıjê emperyalizmê ya netewên Rojhılata Nêzik û Nayîn de listi ye.

Dı wan deman de hışyarbûna Asya, ku dı warê cıvaki, abori û siyasi de rewşa netewên Rojhılat guhera û şoreşa demokrati-burjuvazi ya Rusya ya salên 1905-1907, dı vê guherandınê de tesireki mezın kır. Belê! Her dı wan deman de Kurdan ji, bı netewên dın re dı riya serxwebûniya netewi de dest avêtın xebat kırınê.

Ev kıtêba han,lı ser sala 1890 û heya destpêka Şerê Cihanê ya Yekem dısekıne.Behsa qonaxa destpêka jı dayik bûn û geşbûna bir û baweriya azadixwaziya netewi ya heymani ya Kurd dıke. Her dı vê demê de xebata rewşenbirên Kurd dest pê dıke û rêxıstınên siyasi û cıvaki yên Kurdi tên damezırandın û çap û rojnamenıvisiya Kurdi ne ku her tenê peyda dıbe, kareki mezın û gırıng dıke jı bo xemlandın û pêşvebırına tevgera azadixwaz a Kurd lı Kurdıstanê.

Ev pêşveçûn û gûherina jiyana cıvaki-siyasi ya Kurdan, roleki pır bı qimet û gırıng heye dı têgıhiştınek rêk û pêk a dest nişankırına çiniti dı zayina tevgera azadixwaz a netewa Kurd de.

Dı vê wari de nebûn û kêmkarê zanısti û serbıxwe, bûye zemineki xêr û bereket jı bo wan diroknıvisên burjuvazi, lı gora daxwaz û merama xwe dı derbarê Kurdan de dınıvisın, bezırgani lı ser xebata Kurdan dıkın û derewan dınıvisın û naxwazın rûye geş û rûken ê xebata netewa Kurd dı nav xebata netewên Rojhılata Nêzik û Navin de bıdın naskırın, ew bı xwe çawan jı xwe re dıxwazın bı wi awayi tevgera Kurd nişani xelqê dıdın.

Dı nıvisandına vê afırandınê de jı bo têgıhiştıneki baş û bı qimet, lı ser xasiyeta diroka jiyana cıvaki-siyasi ya Tırkan ji, mın geleki serekani jı nıvisarên ku Tırknasên Sovyet nıvisandıne gırtiye, ku dı qonaxên dawi de wek Tırknasên A. F.Miller(1), A.Petrosyan(2), A.D.Jeltyakov(3), K.Sarkisyan

---

(1) A.F.Miller, Pênceh Saliya Şoreşa Tırkên Cıwan, Moskova, 1958; Kurtê Diroka Tırkan, Moskova, 1948.
А.Ф.Миллер, Пятидесятилетие младотурецкой революции, М., 1958; Его же, Краткая история Турции, М., 1948.

(2) Y.A.Petrosyan, Tevgera Tırkên Cıwan, Moskova, 1971.
Ю.А.Петросян, Младотурецкое движение, М., 1971.

(3) A.D.Jeltyakov, Y.A.Petrosyan, Diroka Rewşenbiri Lı Tırkiyê (Türk Eğitim Tarihi), Moskova, 1965
А.Д.Желтяков, Ю.А.Петросян, История просвещения в Турции, М., 1965; А.Д.Желтяков, Печать в общественно-политической и культурной жизни

(4) ..h.w.d.Mın feydeki baş jı afırandınên Kurdnasê Sovyet M.S.Lazeriyev (5), ku bı malzemên dewlemend ve lı ser diroka jiyana siyasi ya Kurdan nıvisiye, ditiye. Lazeriyev jı bo ku yekemin ê bı awayek zanısti,bı dırêji derbarê diroka Kurdi, lı ser sedsala 19 û heta dawiya sedsala 20 an nıvisiye û xıstiye ber dest, dı nıvisandınên xwe de bı berfıreh û xweş lı ser mesela xebata siyasi-cıvaki ya netewa Kurd û peydabûn û hêzbûna tevgera Kurd lı Tırkiyê û dı ciyên dın de sekıniye.

Lı ser vê meselê dı edebiyat û weşanên derveyi Sovyet de, bı taybeti dı çapên Kurdên Iraq de hatiye nıvisandın û nav û bı nav hınek kurti lı ser vê meselê hatiye axaftın. Jı bo misal,dı wan gotaran de,ku lı rojnama El-Teaxi(6),lı ser yekemin rojnama Kurdi Kurdıstan (1898-1902) hatiye nıvisandın û lı xeleka zıncira hejmarên biraninan ku a Ebu Ala

---

Турции, М., I972.

(4) Siyaseta Dagırkeri ya İmparatoriya Osmani Lı Rojavayê Ermenistan (Lı Pışt Qafqas), Êrivan, 1962.
Е.К.Саркисян, Экспансионистская политика Османской империи в Закавказье, Ереван, I962; Его же, Политика Османского пра-вительства в Западной Армении, Ереван, I972.

(5) M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd, Moskova, 1964 Bınêre : Mesela Kurd, Moskova, 1972.
М.С.Лазарев, Курдистан и курдская проблема, М., I964; Его же, Курдский вопрос, М., I972.

(6) Rojnama El-Teaxi, 1976, Hejmar, 9-10 Tebax.

carek dın lı ser sekıniye, ev kareki baş bûye jı bo rûn kırına vê meselê.Dr.Kemal Mezher ji (7), dı kovara Netewên Asya û Afrika de gotareki lı ser rojnama Kurdıstan belav kıriye. Dr.Kemal lı ser bıngeheki pêşkevtixwaz, rola diroka "Kurdıstan" rûni dıke û damezırandına rojname û nıvisandınên Kurdi û pêşveçûna wan bı vi awayi derdıxe holê. Her weha dı biranina 75 saliya derketına rojnama Kurdıstan de,zanayê bı nav û deng ê Kurd Dr.İzzeddin Mıstefa Resul (8)kareki zanısti yê mezın û pır bı qimet derbarê rojnamenıvisa Kurdi pêşkêş kır, ev kar jı teva baştır e.

Dı hınek nıvisarên dın de dı rojname û çapiya Kurdên Iraqê de hınek mılên jiyana cıvaki-siyasi ya Kurd hatiye roni kırın, lê belê hemûyan bı awayek kûr û fırehi zayin û pêşveçûna bir û baweriya Kurdayeti nexıstıne ber çav.

Şair Lahuti dı sala 1920 i de, dı sereknıvisa kovara Rojhılata Nû de nıvisareki dı derbarê xasiyeta tevgera azadixwaza Kurd, belav kıriye. Dı vê nıvisarê de Lahuti(9),zêdetır qimet dıde salên destpêka hatına ser hıkum ya Tırkên Cıwan. Her bı xwe ji vê qonaxa tevgera azadixwaz a Kurd qonaxa Kurdên Cıwan dıde navdan û dıbê; armanca Kurdan; azadkırına Kurdıstan, jı bın zılm û zora Tırkan bûye. Lahuti, navê Kurdên Cıwan bı nav û zmanê Tırkên Cıwan dışıbine.

---

(7) M.A.Kemal Mezher, Lı Ser Diroka Yekemin Rojnama Kurdi, kovara Netewên Asya û Afrika, 1968. hejmar 4, rûpel, 161-164.
М.А.Камаль, К истории издания первой курдской газеты,"Народы Азии и Африки", 1968, № 4, стр.161-164.
(8) Dr.Izzeddin Mıstefa Resul, El-Teaxi, hejmar 1282-1286.
(9) Lahuti, Kurdıstan û Kurd, Rojhılata Nû, Moskova 1923, hejmar 4, rûp. 58-71. Akademiya Gerdelêvski yekem car

O.L.Vilçivski (10) dı nıvisarekê de ku dı derbarê sêsaliya destpêka sedsala 20 an de lı ser rojnamenıvisên Kurdan nıvisiye, her weha Cebbar Cebbari (11) dı kıtêba Diro-

---

dı serekaniya dirokê de zaravayê "Kurdên Cıwan" bı kar aniye. (V.L.Gerdelêvski,Jı Diroka Kurd, Afırandınên Helbıjarti, çapa Moskova 1962, rûp. 119-bı Rusi.) Her wıha Vilçivski, jı dayik bûn û peyda bûna tevgera azadixwaz a Kurd, bı yekemin qonaxa peyda bûna komita İttihad û Teraqqi ve gırêdıde. Vılçivski wıha dıbêje : "Dı sala 1908 an de, wextê Tırkên Cıwan hatın ser kırdayetiyê, siyaseta wan a nıjadperesti riyek wısa dani ber wan ku Kurd jı wan dûr bıkevın. Dı wê dûrketınê de, wezifeke dın ket ser mılên tevgera Kurd; dı Kurdıstanê de wezifa xebat kırın dıji desthılata Tırk û jı bo peyda kırına azadi û serxwebûni, jı İmparatoriya Osmani qetandın." O.L. Vilçivski, Bibliyografya Weşanên Kurdi Lı Derve Dı Sedsala 20 an de, Zmanê İraniyan cılda yekem, Moskova, Leningrad. O.L.Vilçivski, tevgera azadixwaz a Kurd dı salên 1920-1930 an de pışti Şerê Yekemin ê Cihanê ji her bı tevgera "Kurdên Cıwan" bı nav dıke û dı mılek dın de ji tevgera wê wextê bı giyanek kevneperest û nedemokrati dıde nişan. Wek tê xûya kırın, Vilçivski, hınek qonaxên dın ên tevgera Kurd, dıxe çarçuva tevgera "Kurdên Cıwan", ku dı rastiyê de eva han wıha nine. Kurdan tevgera xwe tu cari bı navê "Kurdên Cıwan bı nav nekırıne.

Лахути, Курдистан и курды. Пер. с перс., "Новый Восток",М., 1923, № 4, стр.58-71.

(10) O.L.Vilçivski, Bibliyografya Gotarek, Moskova-Leningrad 1945.

(11)Abdulcebbar M.Cebbari, Diroka Rojnamêgeri Kurdi, Bexdat, 1970.

ka Rojnamegeri Kurdi (Mêjûy Rojnamegeri Kurdi) de, xwestıne destpêka vê meselê bıkolın.

Dı van behsan de ku lı Iraq derbarê diroka Kurdan hatiye nıvisandın, zêdetır gırıngi dane destpêka peydabûna çapi ya Kurdi, dı çapiya van salên dawiyê de ji çend nıvisar derbarê xebata Huseyin Huzni Mukriyani (12) hatiye nıvisin û belav kırın. Bı gıştî van nıvisandınên han bı awayeki objektifi û kûr rewşa cıvaki û rewşenbiri ya Kurdan dı hemû waran de roni nekıriye. Lêbelê, deverên van behsan malzemeyeki dewlemend û yarmetiyeki baş, jı bo lêkolin û tehqiqa peydabûna destpêkırına çap û çapemeni dı Kurdıstan de, dane. Bo meyilbûna ber bı vê meselê, zêdetır serekaniyên Kurdan û ên Ermeniyan bı kar anine. Kurdnasan heta nıha ji bı awayek fıreh materyalên çapi ya Kurdan bı xwe kar nanine, ev darıng û materyalên han ku dı çapi de, lı ser pêşveçûn û guherina rewşa jiyana cıvaki-siyasi ya Kurdan hatıne belav kırınê. Peydabûna rojnamevanên Kurdan dı salên destpêkê de ne tenê eynıka rengdana diyar kırına siyaseta komelên Kurdi bû ye, belko tesireki pır mezın kıriye lı ser wan diyar kırınên xemlandınên bir û baweriya netewi dı nav Kurdan de. Jı ber vê, nıvisarên van behsan lı pêş hemû serekaniyên dın, pıştа xwe bı çapa Kurdan qaim kıriye û feydeki mezın jê gırtiye.

Nıviskar, dı nıvisandına wê beşa ku behsa çapa Kurdi dıke, hejmarên Kurdıstan û sê hejmarên destpêkê yên kovara 'Roji Kurd' bı kar aniye. Eşkeraye ku heta demên nêzik ji tıştеki kêm derbarê Kurdıstan, ciyên derketın û lı ser nıviskarên wê nedıhatın zanin û dı edebiyatê de nehatıbûn roni kırın, neketıbûn ber çav.

Yekemin hejmara rojnama Kurdıstan lı nav wan kovar û rojnamên ku lı Zanistgeha Rojhılatnasa Leningradê a ser bı Akademiya Zanısti Sovyet de bû, hate ditın. Pişti ditına

(12) Huseyn Huzni Mukriyani, Pêşketın, Hewlêr 1972.

vê hejmarê Dr.Maruf Xeznedar(13) û Dr.Kemal Mezher(14) ew xeletayi û kêmasiyên ku hebûn,rast kırın ku darbarê ciyê sernıviskar û kesên dın ên ku vê rojnamê nıvisi bûn.Dr.Kemal Fuat(15) ji hejmarên dın ên rojnamê lı Almanya Rojava ditiye.

Wek tê zanin zanayê bı nav û deng ê Kurd Alaaddin Seccadi dı sala 1952 an de dı kıtêba Diroka Edebi Kurdi de behs kıriye ku hejmarên Kurdıstan dı kıtêbxana Prusya de hatıne parastın.(16) Ev kıtêbxane, dı dawiya Şerê Dûyem ê Cihanê de hatıbû rakırın,jı bo vê yekê ji heta wextekê rojname ne dıhat zanin. Dr.Kemal Fuat, pişti xebatek gıran dı sala 1965 an de hejmarên rojnamê ditiye û lı Iraq (17) bı pêşgotıneki pıçûk carek dın çap kıriye. Hejmarên Kurdıstan , gelek bı roni ideolojiya tevgera Kurd û rola wê tevgerê dı xebata dıjê zılm û zora dewleta Osmani de diyar dıkın.

Dûyemin qonaxa xemlandına jiyana cıvaki-siyasi ya Kurdan, bı derxıstına kovara Roji Kurd (18) dest pê dıke.

Materyalên ku dı Roji Kurd de hatıne belav kırın, itibareki wan i pır gırıng heye, jı bo têgıhiştına xasiyeta geşbûn û xemlandına jiyana cıvaki-siyasi ya Kurdan . Bı xêra van metaryalan em dıkarın dı rewşa siyasi ya têkoşerên Kurdan dı dawiya şoreşa 1908 an ya Tırkiya bı gehın.

---

(13) Dr.Maruf Xeznedar, El-Teaxi, Bexdat, 22 Nisan 1968.

(14) Dr. Kemal Mezher, (Afırandına navê wê derbazbûyi)

(15) Kurdıstan, 1898-1902, hejmar 1-31. Dı nav van de hejmarên 10, 12, 17, 18, 19 heta nıha nehatıne ditın.

(16) Elaeddin Seccadi, Diroka Edeba Kurdi, Bexdat 1952, rûp. 552.

(17) Kurdıstan, yekemin rojnama Kurd, pêşgotına berevokê Dr.Kemal Fuat, Bexdat 1972.

(18) Roji Kurd, hejmar 1-4, 1913.

Melzeme û dokumentên pır zêde me jı çapi û rojnamên Ermeniyan derxıstiye, wek rojnamên Nurdar, Bozandiyan, Jamanak, Horizon, Azatamart, Vıtak, Mişak ûhwd . Bı pırani ev rojnamên han lı İstenbul derdıketın û bı awayek baş ji deng û behsên rast yên jiyana cıvaki û rewşenbiri ya Kurdan dıxıstıne pêş çav û eşkera dıkırın. Ger mırov van materyalên ku dı çapa Ermeniyan de dıhat belav kırın mıqayese bıke lı ser serekaniyên dın, bı dılxweşi baweriyeki temam jı mırov re dıbexşine. Deng û behsên hevkariya siyasi û ideoloji dı navbera Kurd û Ermeniyan de lı derve, dı kovarên Ermeniyên derveyi welat; weki dı kovara Pro Armenia , Ararat û geleki dın de hatıne belav kırın. Kovarên Ermeniyan van nıvisar û bangan çap dıkırın, ku serokên têkoşer ên Kurd dı organên Tırkên Cıwan de dıdan belav kırın.

Wan dokument û belgeyên ku diplomat û peyamnêrên (muhabir) şeri yên Rusya lı İstenbul anine, tevê wan dı arşiva siyaseta derveyi Rusya (A.V.P.R.) de hatıne parastın. Her bı wi awayi, nıvisên İdara Qafqasyayê ji mırov dıkare itibar pê bı ke. Vanên han jı bo zanina wê tevgera, ku Abdurrezaq Bedırxan serokatiya wê dıkır û dıxwest ku Rusya pıştgıriya wi bı ke, bı başi xebat û lebata wi têkoşeri û rêberên serihıldana Kurdên Bitlis bı me dıdın ron kırın. Ev belgeyên han vê serihıldana dı destpêka rabûna Şerê Cihanê yê Yekem de ku hat vêxıstın bı gelek aliyan lı dıji Tırkan dıdın nişandan.

Van serekaniyên han,her weha yarmetiya nıviskar kırıne ku hınek aliyên bıngehin û sereki yên jiyana cıvaki-siyasi a Kurdan dı dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de, bıde ronikırın, eger ev bı awaki têr û tıji, fıreh nebe ji, bı kurti hemû aliyên meselê daye ronikırın.(19)

---

(19) Bê goman, jı bo dest xıstına program û nizama daxıli ya Hevkari û Pêşketın û her wıha hejmarên Roji Kurd, ku lı kutupxana Universita İstenbul tên parastın, qimeteki

wan a pır mezın hebü ku rê ü armanca wan komelan baş bê zanin û zêdetır ji, jı bo xurt kırına vê nıvisandınê. Lêbelê, sed mıxabın, ez pır xebıtim jı bo dest xıstına wan, lê, bê feyde ma.(Wergerê bı zaravayê sorani.)

## KURDÊN İMPARATORİYA OSMANİ DI RİYA PEYDA KIRINA HİŞYARİ Û NETEWİ DE

Paşvemayina jiyana abori, têkılheviya rewşa cıvaki û dıjıtiya nav xwe, xebata netewên İmparatoriya Osmani, ya dı warê netewi de xurt kırıbû. Sermayedarên Awrupayi dı mêtına warê abori de, İmparatoriya Osmani kırıbûn niv mêtıngeheki xwe. Sultan Abdulhemid ê dûyem ê xwinrêj bı komek nûneren pistırin û kevneperestırin a çina derebegên mezın ên kevneperestên Tırkiya, der û dore xwe gırtıbû û dıxwest bı xwinrıjin û bı terorê rê lı ketına İmparatoriyê bıgre, ango; Abdulhemid dıxwest bı kuştın û bırin nehêle İmparatoriya wi bıkeve. Ewên jı rûyê menfeeta çiniti de lı der û dora Sultan bûn, derebegên mezın, serekleşker, memurên mezın, mırovên dini yên mezın, komelên ku destên wan tê de û hınek peywendiyên dın bûn. Qonaxa hıkûm ajotına Sultan Abdulhemid, dı dirokê de, bı zılm, zor, kuştın û bırinê ve bı nav û deng e.

Zılma netewi û cıvaki, xebata netewên bındest ên Imparatoriya Osmani, awayek nediti bı hêz kırıbû.

Sansora tund û tûj a Sultan, bı çı awayi dıbe bıra bıbe ku nıvisandınekê dı wareki de roniti bıdaya xuyakırın, an ji pıçek bêhna demokratiyê jê bıhata, dıgırt. Her ku hınek kesên çav qaim bûn û ewan bıkarıbûna dıji rejıma Sultan bıaxıfın, van kesên han zêdetır dıhatın cezakırın.

Her weki dı kovara Sovremenik de ji hatiye xûya kırın "jiyana cıvaki,bı mefhumê Avrupa dı Tırkiyê de tûne bû."(1) Nıqte bı nıqte, lı gora fermana Sultan hejmar dı hat diyar kırın û dıhat çapkırın û her tenê dı sinorê İstanbula paytext de belav dıbû. Dı sala 1885 an de, dı van bajar û der û dorên wek Trabzon, Sêwas, Diyarbekır, Erzırum, Bıtlis, Wan û hınekên dın de, belavok, ferman û bangên resmi 100-150 lıb dıhatın belav kırın. Pırtırin ew ji jı fermanên Sultan, bıryarên resmi yên dadgehan, fermanên şer û deng û bahsên idarê wan navçan pêk dıhatın.(2)

Her çend Sultan û dar û destên wi bı hemû awayi dıxwestın bir û baweriyên demokrati yên burjuvaziya Avrupayê negıhije welat, lê belê, bê rawestan vê bir û baweriyê her rêya xwe gırtıbû, ber bı çav û guhên gel de dıçû û tesir lı ser wan dıkır.. Jı ber vê, dı welat de qet mecal ne hıştıbûn û dı xwestın, vê bir û baweriya burjuvaziya Tırkiyê ya nûzayi, bıxne wareki teng û rê lê bıgrın, jı ber vê rewşa nebaş, lı derveyi welat, xebatek siyasi ideoloji dıji zılm û zor û bê

---

(1) P.P.Sıminota, Tırkiya İro, Rasti û Mizac, S.P.B., rûp.14.
П.П.Семенюта, Турция сегодня, факты и настроения, СПб., I908, стр.I4.

(2) K.Yust, Weşanên Anadol, Tıflis 1972, rûp. 6.
К.Юст, Анатолийская печать, Тифлис, I922, стр.6.

qanûniya lı hûndırê welat, hatıbû holê.

Dı dawiya sedsala 19 an de, lı bajarê weki Cenevre, Londra,. Paris û Qahirê rewşenbirên Tırk komel, grup û rêxıstınên siyasi damezırandıbûn, dı wan bajaran de rojname derdıketın û bira cıvaki-siyasi û bir û baweriya burjuvazi ya nûzayi belav dıkırın. Bı bir û raya hemû rêxıstın û kesên siyasi yên Tırkiyê û organên wan, dıvê tenê qet nebe rêyek bıhata ditın jı bo rızgarkırına İmparatoriya Osmani jı vê rewşa wê ya xırab û jı bo carek ditır mêtıngehkarên rojava neyên ser kar rejıma qıraltiya meşruti ku dı welat de be.(3)

Hılgırên vê bir û baweriyê û ên hela vê dıxwestın, dı dirokê de, bı navê Tırkên Cıwan tên navkırın. Ew bı bir û baweriya xwe neteweperestên burjuvaziya Tırk bûn, ku lı dıji bıngehiya avayiya derebegi bı tuji derdıketın. Minbera tevgera ideolojiya Tırkên Cıwan lı derveyê welat ev rojname bûn; Meşweret a lı Paris, Osmanlı ya lı Cenevre, Mizan a lı Qahire. İttihat û Terakki ku rêxıstıneki dızi ya Tırkên Cıwan bû, roleki mezın dı serokati û pêşengiya xebata dıjê Sultan de dılist.

Tırkên Cıwan ku armanca wan parastına İmparatoriya Osmani bû, dı kar û barê siyasi de, qimeteki mezın bı mesela netewayeti dıdan û jı bo rê çareser kırına wê dıgeriyan. Bıngehê ideolojiya wan gir û gırıfta Osmani bû.Vê bir û baweriyê ji jı Tırkên Cıwan re, jı Mithet Paşa yê destûrxwazê

---

(3)A.A.Alimov, Şoreşa 1908 an Lı Tırkiyê, Serihıldan û Hişyarbûn, 1905 û Lı Rojhılat Şoreş, Moskova 1935, rûp. 13.
А.А.Алимов, Революция 1908 г. в Турции, сб. "Пробуждение Азии. 1905 год и революции на Востоке", М., 1935, стр.13.

(Meşrutiyetxwaz) mabû. Armanca wan ji İmparatoriyek Osmani yekgırti û ne perçe perçe bû û ku dı çarçûva hemû netewe, dı warê netewayi.oli (dini) û azadi de mafên wan neyê wenda kırın, wek lawên neteweyên İmparatori, wek hevaltiyeki temam, hemû maf û heqê wan hebe. İtibarek siyasi ya mezın vê armanca Tırkên Cıwan hebû, ku dı vır de, hemû hêzên dıji Sultan kırıbû yek.

Dı dawiya sedsala 19 an de tevgera netewi ya wan netewên bındestê İmparatoriya Osmani, hêzeki baş peyda kırıbû. Her ev bılıêzbûn, bûye sebebek jı wan re, lı Avrupa, Ermeni, Yewnani, Bulgar Ereb, Arnavut û.h.w.d, rêxıstınên lı ser mêhla burjuvazi damezrinın.

Akama (netica) rızina peywendiyên derebegi, û bi sebebê peyda bûna cûre cûre peywendiyên abori, cıvaki û siyasi yên nû, armanc û menfeeta sermiyandariya bezırgani ya nû peydabûyi derxıstıbû. Dı tevgera Kurdi ya dı İmparatoriya Osmani de, gelek guherandınên mezın peyda bûn.Bı vi sebebê rewşa nû, rewşenbir û entelektûel dı komelên Kurdan de peyda bûn. Peyda bûna sebebên taybeti jı ideolojiya Kurdayeti re, gelek fırsetên nû afırand bo çareserkırına mesela Kurdi.

Em dıkarın bı sedan misal lı ser xebata netewa Kurd dı sedsala 19 an de, ku lı dıji bandêriya Tırk bûne bınıvisın. Serihıldana netewa Kurd, jı ber peydabûna zılm û zora Sultanên Tırk û peydabûna wê rewşa nebaş bû, ku hemû mafên neteweyi û cıvaki yên Kurdan kırıbû bın piyên xwe.

Belav bûn û tund û tûj bûna zılm û zordariya Sultan, hemû netewên bın zılm û zora İmparatoriya Osmani kırıbû yek û xebata hemûyan dıjiya rûbara xebata dıji Sultan. Baştırin minakiyên van, ne qaili, nerazi û lı hember sekınina, şoreşa sala 1854-1885 i Kurdan bû, ev şoreş bı navê serokatiya xwe; Yezdanşêr hatiye nas kırın. Vi serokê Kurd ne ku her tenê Kurdan kıriye yek, her weha Asuri, Ereb, Yunan û lawên netewên dın ji pıştgiriya wi dıkırın û pê

re xebat dıkırın. (4)

Pışti vê şoreşê, tesirek pır mezın a şoreşa Şêx Ubeydullah a sala 1880 yi çêbû. Bıhêzbûna vê tevgera han, ne ku tenê İmparatoriya Osmani, heta hınek diplomaten Avrupa ji tırsandıbû. Dı vê qonaxê de bı awayek eşkera roni,bir baweriya siyasi ya tevgera Kurd derdıkeve.

Tevgera Şêx Ubeydullah şıkleki dini gırtıbû xwe. Şêx dıxwest komek pır jı sofiyên Neqşibendi lı der û dora xwe kom bıke û Şahê İranê û Sultanê Osmani bı gel bıde naskırın, ku ew jı dinê İslamê derketıne, dıji Xwedê ne û bêdin ın. Dı cıvinek berpırsiyar û serokên Kurdan de Şêx got : "Şah û Sultan xwinmêjê Kurdan ın, astenga rêya peşveçûna jiyana me ne, jı ber vê bav û bapirên me dawa lı hemû kesên ku lı ser riya Quran dıçın dıkın, ku canê xwe dı riya din û rızgariya welat de bıkın qurban." (5)

Programa Şêx Ubeydullah yekemin programe ku dı diroka tevgera azadixwaz a Kurd de, kariye siyaset û din bı awayek baş yek bıxe, ku dıjiti nekeve navbera wan û xebatê, jı bo xebatek adılane ya netewi dıji rejım û zordestiya Sultan nişan bıde.(6) Vi programi, rewşeki baş jı bo pêşve-

---

(4) Celilê Celil, Dı Nivê Yekemin ê Sedsala 19 an de Kurdên İmparatoriya Osmani
Джалиле Джалил, Курды Османской империи в первой половине XIX в.,М., 1973.

(5) P.Y.Avriyanov, Dı Şerê Rusya de, Kurd Lı Dıji Tırkiyê û İran, rûp. 229.
П.И.Аверьянов, Курды в войнах России с Персией и Турцией в течение XIX столетия, Тифлис, 1900, стр.229.

(6) O.L.Vilçivski, Dı Sedsala 19 an de, Peywendiya Kurdan

bırın û hêzkırına tevgerê dırûst kır.(7) Programeki Şêx Ubeydullah ê taybeti jı bo rızgarkırına Kurdıstan damezrandına dewleteki Kurd hebû. Dıxwest ev program, qonax bı qonax netice bıde. Berê Kurdıstana İranê û dawiyê ji Kurdıstana Tırkiyê azad bıke. Şêx dıgot : "Fırset dı dest de hebe mırov bıke ev zanayi ye, nıha Farıs dıji Tırkan şer dıkın hemû hêz û quwetên xwe jı bo vi şeri amade kırıne. Jı ber vê menfaeta me,dı wê da ye ku dema nıha em lı İranê dest pê bıkın. Nıha İran bêhêz e û ku em karıbın vi perçê Kurdıstanê û bırayên xwe azad bıkın û welateki weha bı xêr û bereket bıkeve destê me, wê wextê, ku serekaniyeki bê ser û bın û xurt,serweteki jı bo pêşvexıstına şer de çêbe û dimahiyê jı bo dıjmınên me ên dın de, dı dıji Osmaniyan de dê mıl bıde ber me."

Herçi xebat û hêza dewleta Osmani hebû, jı bo Kurdan bıke dıji ciranên wi yên nemısılman bı kar ani, lê ev bı tevayi vala çû û nekari tıştek bı dest bêxe. Şêx Ubeydullah, pır bı başi bı vê siyaseta Tırkan tê gehiştıbû,a ku dıxwestın netewên bındestên xwe lı gora siyaseta "perçe bıke idare bıke" bıkın dıji hev, da ku her dı bın pençê wan de bıminın. Jı bo vê, dı cıvinek serokên Kurdan de Şêx bı eşkera û bı roni got : "Babê Eli, guya nıha, pışgıri bı Kurdan dıke, lê belê, daxwaza wê hemû ewe, ku xebatekê bıke û bıkare me dıji yên nemısılman (mesihi) rake lı Anadolê, ku Ermeni ji neman û jı holê çûn wê wextê lı ber çavê dewleta Tırkan wê

---

a Abori, 1936.

).Л.Вильчевский, Экономика курдской кочевой сельскохозяйст зенной общины Закавказья и прилегающих районов во второй юловине XIX в., "Советская этнография", I936, № 4-5.

(7) P.Y.Avriyanov, A.n.d., rûp. 230.

tırs û heybeta netewa Kurd nemine.(8)

Serihıldana 1880 an a Kurdan bı ser neket û dewleta İran û Tırkiya pêkve , pır bı tund û tûji û hoviti lı wan xıstın. Dawiyê ketın wêrankırına gundan, talan kırın û bırinê; bı hezaran jı Kurdıstanê derêxıstın dı hındur û kurayiya Anadolê de derbeder kırın. Êdi Kurd dema bışkê dıjmın dê çı pê bıke? Dê bıkeve canê wi. Her çende ev şıkestınên han kêm nebûn, her çende zılm û zori ji heta dıhat zortır dıbû, lê belê zılm û zordari nedıkari rehê şoreşgeri azadixwaziya netewa Kurd bêdeng bıke,vemırine.Bir û baweriya azadiya Kurdıstan dı afırandınên şaır û edibên Kurdan de,dı tevgera van rewşenbirên kêmhejmar ên Kurdên wi wexti de, tirêj davêt û deng dıda.

Têkoşina zehmet a çekdarên Kurd, dı sedsala 19 an de lı dıji Sultanê Osmani, dı qonaxa serbıxweyi ya siyasi de, xurt, hêz û belav bûbû,ku Sultan rû bı rû û eşkera dı heqê wan de nedıhat û jı bo wê ket fır û fêlan û siyasetek dın gırte ber; siyaseta perçe kırın û dıjmınayeti xıste nav tevgera azadi ya Kurdan bı xwe.

Her dı wê demê de, dı bakûra rojhılata İmparatoriya Osmani de tevgera azadixwaz a Ermen bı hêz bû û belav bıbû. Rewşa siyasi-abori ya Rusya ji quwet dabû wê.Jı ber vê Sultan dıxwest, dı siyaseta salên heştê yên sedsala 19 an yek bı yek gûhertınan pêk bine.

Jı bo şerxwazi, temakari û rıki, hınek serekeşiretên Kurdan ji, alikariyê dan Sultan Abdulhemid ku planê xwe ê fêlbazi û sextekari bêxe kar. Dı sala 1891 an de, fermana damezırandına "Sıwarên Hemıdi" jı bo eşiretan derket.(9) Kesên ku a vê eskeriyê de dıhatın nıvisandın, hınek bexşiş bı dest dıxıstın û bac û xerac û talankırın jı wan eşiran re bû

(8) A.n.d., rûp. 228.

(9) Hesen Arfa, The Kurds, and historical and political study, London 1966, rûp. 24.

ku dı Ermenistana rojava de pere, rutbe û madalyên pır zêde dane serek eşiret û axayên Kurdan.(10) Ew axayên Kurdan ku carnan rê lı wan dıbırin û çetan dıbırın nav wan.(11)Nıha rutbe û madalyan bı ser wan ve belav dıkırın, wek albay Karsov, endamê Mekteba Generalê Rusya baş roni kıriye,ku ev bûye sebebê nerızayiyeki mezın dı sefên serekên resmi ên leşker de.(12)

Dewletê bı xêra van eskerên nizami, karıbû mexferên qaim lı ser sinor lı dıji Rusya deyne û xwe dı rojavayê Ermeniyan de xurt bıke. Bı her awayek êriş û serihıldanek ji dema jı aliyê Ermeniyan de bıhata Suwarên Hemidiyan lı hember dıdan sekınandın. Damezırandına Suwarên Hemidi dı rasti de, alikariyeki pır mezın dıda Sultan, jı bo bê hêzkırın, temırandın û bêdeng kırına tevgera Kurdan.

Jı ber damezırandına Suwarên Hemidi , hınek dıbıstanan jı bo zarokên Kurdan vekırın. Zarokên axan û yên serek eşiretan dı van dıbıstanan de, dersên dini û şer dıxwendın. Ev dıbıstanên han bı vi awayi hatıbûn danin; dı van dıbıstanan de nesleki nû jı kurên axan û serekeşiretên Kurdan bê gihandın, jı bo rojên pêş ku bıbıne palpışt û alikarvanên re-

---

(10) Bınêre;Karsov, Lı Ser Kurdan Hınek Gotar, Tıflis 1896, rûp. 32.
Карцов, Заметки о курдах, Тифлис, 1896, стр.32.

(11) A.R.Kasım Lo, Kurdıstan and the Kurds, Prag 1956, rûp. 41.

(12) Karsov, Lı Ser Kurdan Hınek Gotar, rûp. 34. Her wıha dı xebata Lazeriyev,Kurdıstan û Mesela Kurd de û geleki karên zanısti yên dın de,rola kevneperesti ya Suwarên Hemidi dı diroka Kurdan de û ew zori û xwinrêjiya Suwarên Hemidi lı dıji Ermeniyan kırıne baş roni kırıne.

jıma derebegi û kevneperest ê Sultan,kar û barên eskeri û yên idari yên eşiran bıdın ser wan, bı destên wan bê meşandın. Jı bo damezırandına van dıbıstanan jı xezina dewletê 8 mılyon lira ji hatıbû texsis kırın.(13)

Dı sala 1895 an de, lı Patnos, Somaz, Toprakkale( perçeki jı bajarê Wanê ya kevn e-n.m.),Wan, Modak û bajarên dın ev dıbıstanên han hatıbûn avakırın. P.Y.Avriyanov weha dı bêje : "Mızgeftan hazır kırıbûn; tê de ji dıbıstanên pişeyi ava kırın, evên han dı peywendiyên siyasi de gırıngiyeki wan i mezın heye."(14)

"Sebebê xwendına zarokên Kurdan wek komên mezın bı hev re û bı destên wan melayên Tırkan, ku pır bı kıtêb û bı berfırehi û kuri lı ser din ku ew ji ne jı bo dostaniya Kurdan bû, her bı vi awayi zarokên Kurdan hini Tırki dıkırın û mejiyên wan ber bı tırkkırınê ve dıbırın. Kurdayetiyê bı wan dıdan birkırın, armanca vekırına van dıbıstanan her ev planên

---

(13) Bınêre; F.F.Gıryazinov, Kurd û Suwarên Kurd, Hevalên Dıbıstana Eskeri yên Lı Nav Navçên Qafqas, hej.20, 1907, rûp. 21.

Ф.Ф.Грязнов, Курды и курдская конница "Известия штаба Кавказского военного округа", №20, 1907, стр.21.

(14) P.Y.Avriyanov, A.n.d. rûp. 263. F.F.Gıryazinov, A.n.. Gıryazinov cigırê konsolosê Rusya lı Wanê, dı gotara Kurd û Suwarên Kurd de, baha û gırıngiya wan dıbıstanan derdıxe holê : "Xebat û bızava Sultan guya jı bo vê ye, wan Kurdên kovi têxe nav şarıstaniyetê, eger armanca Sultan lı ser şarıstaniyeta Kurdan bûna û bıxwesta ber wê ve pêşve here, wan dıbıstanan lı ser sınorê Tırkiyê û Iranê venedıkır, dê dı nav Kurdıstanê bı xwe de bıda vekırın."

han bûn"(15)

Dı sala 1892 an de, "Eşiret Mektebi"yekê lı İstenbul vekırın. Dı wê dıbıstanê de zarokên xanedanên Kurdan (16), xanedanên Ereb û Arnavutan ên naskıri ji dıdan xwendın. (17) Dı vê dıbıstanê de wextekê, zarok, jı bo hinkırına kar û barê şer û xwendına Quranê hatıbûn amade kırın.(18) Ev xwendevanên han dema vê dıbıstanê dıqedandın, hewce bû ku bıçne universita leşkeriyê. Lı wır ji xwendına bılınd a leşkeri xelas bıkın. Peyamnêreki (muxabır) wê wextê weha dıbêje:"Dı rastiyê de, Sultan,bı vekırına Eşiret Mektebi fırset kete destê wi ku zarokên serekeşiretên Kurdan wek rehin lı cem xwe bıgre" (19) Sultan bı xwe ji vê rastiyê gelek caran dıgot. (20)

Lêbele, dı eksê daxwaz û meramên Sultan de, dı nav çar diwarên Eşiret Mektebiyan de rewşên nerızayi, dıjiti û serihıldanê peyda bûn. Dı sala 1903 an de, rojnama Kixa ya Ermeniyan, ku lı Londra derdıket, nıvisibû ku; "wan zarokên Kurdan, dı ber vê re, ku dı dıbıstanên dı nav Tırkan de dıxwinın, lêbele, her peywendiyên wan bı gel re heye û bı azadixwazên lı İstenbul re dıjin,bı wan re peywendi danine.Lı wır vê ramana ku Sultan bı tund û tûji lı hember radıwesta,zabû,bir û baweriya azadi û serbıxweyi ya netewi ya wan cıwanan, bı başi dı wê siyaseta xelet û hışk a Sultan

---

(15) P.Y.Avriyanov, A.n.d. rûp. 263.

(16) A.n.d.

(17) A.D.Jeltyakov, Y.A.Petrosyan, Diroka Rewşenbiri Lı Tırkiyê, Moskova 1965, rûp.94.

(18) Mıhemmet Cewad Bin Şêx Nafi, Diroka Wezareta Gışti ya Rewşenbiri û Rêxıstın û Karên Wê, rûp. 340.

(19) Bınêre; Kulekel (Zengıl), 1903, hej. 7-8, rûp. 47( Bı Ermeni)

(20) Bınêre ; M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd.

gıhiştıbûn, peywendiyeki şıd û berdewami bı tevgerên şoreşgerên İstenbul re, danibûn. Belê, ev ramanên han dı destpekê de û heta wextekê wek xewn û birek bêbıni dıhat ditın, lê, bı xêra wê birê, ramana damezırandına 'Kurdıstaneki azad û serbıxwe' bûye programa wê koma cıwanên Kurdan"(21). Jı bo wê yekê Sultan dı sala 1906 an de, Eşiret Mektebi da gırtın.(22)

İstenbul hêdi hêdi ne ku tenê bûbû ciyê merkeza azadi û meyla bı ber liberalizma Tırkan, her wıha, bûbû merkeza rewşenbirên azadixwazên Kurdan ji. Rojnameyek Ermeniyan dı wê wextê de dınıvisi ku; "Dı nav wan Kurdên ku lı İstenbul dıjiyan de, komeki jı kurên axa, begzade û leşkeran hebûn ku, xızmeta ıktıdara İmparatoriya Osmani dıkırın. Jı bo ku Sultan wan dı bın çavên xwe de bıgre, jın û zarokên wan anibû paytext. Ew gundiyên jı bo karkırınê hatıbûn paytext, dı rewşên nerazibûnan de mıl bı mılên cıwanên şoreşgerên Kurdan re dıxebıtin." (23)

Bınemala Mirê Botan, Bedırxan Beg û Mirên Baban, ew bınemale bûn ku Sultan bı hemû awayi dıxwest dı nav wan de dost û mırovên jı bo xwe peyda bıke, wan jı bo hukmê burokrati-eskeri bı kar bine. Jı ber vê yekê jı wan geleki kesan danibû ber xwendınê. Jı kesên wan bınemalan kêm mırovan xızmeta Sultan kıriye. Ewên ku geleki jı wan, bı taybeti ewên ku rewşenbir, xwenda, riya xebata azadixwaz gırtıbûne ber xwe. Dı sala 1878 an de, kurê Bedırxan Osman Beg û Huseyn Beg ku dı eskeriya Osmani de bûn, bı hemû awayi pêşengiya xebata netewi ya Kurdan dıkırın,

---

(21) Bınêre ; Kulekel, 1903, hej. 7-8, rûp.47.

(22) Bınere; M.S.Lazeriyev, A.n.d. rup. 117.
Bınêre; A.Ezgin, Diroka Rewşenbiri ya Tırkiyê(Türkiye Maarif Tarihi) İstenbul, 1941, Cild.3, rûp. 979.

(23) Biyuzandiyum, 1913, 17 Kanuna Duyem, hej. 46-49.

netewa Kurd han dıdan ku doza serxwebûna Kurdıstan bıke.(24)

Dı İlona 1898 an de, Sultan fermanek bı gışti ya bınemala Bedırxaniyan derêxıst.Sebebê vê fermanê, şandına kaxızeki jı Tırabzonê re bû, ku yek û yek navê kesên bınemala Bedırxaniyan tê de hatıbû nıvisandın û tê de : Jı gelê Kurd hatıbû xwestın ku, rabın dest bavêjın şoreşê. Ew name ketıbû destê dewletê.(25)

Dı dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de, bı awayek pır fıreh dı nav serekên cıwanan de û lı nav xwendewarên Kurdan lı İstenbul, ramana "Kurdıstana serbıxwe" baş belav bûbû û ew mesele hatıbi holê. Netica vê bir û baweriyê, dı nav gelê Kurd de û lı Kurdıstanê bı xwe, belav bûbû ku hewcê alikariya maddi bê sıtandın û ew pıştgıriya tevgerê bıkın. Dı vi wari de peyamnêrê Xınçak dınıvisand ku; "Jı bo vê xebata rexê Gewriya İstenbulê bıçe çiyan(şaxan), jı bo ew rehet û berfırehtır giyana azadixwaz dı nav netewe de belav bıke dıvê vegerın welat. Dı gel vê de, dewlet şûn piyê wan kesan dıgre û dıxwaze ew armanc neyê ci, lêbelê, ew kes dıxwazın saniyeki zûtır bıgehın nav cergên welat. Bira 'Kurdıstana serbıxwe' lı ser axa bab û bapiran, dı nav gel de belav bûye û dılxwaz û aligırên zêde jı xwe re peyda kıriye." (26)

Bir û baweriya dıji Sultan, dı nav xwendayê dıbıstanên eskeri de lı bajarên dın ji belav bûbû; bo minaki, dı sala 1903 an de lı dıbıstana eskeri ya Bexda, Ereb û Kurdan, du grubên dıji Sultan damezırandıbûn. Generalê muteserrıfê

---

(24) Dr.Bılec Şêrko, Mesela Kurd, Qahire 1930, rûp.47.

(25) A.V.P.R.F. (Arşiva Siyaseta Rusya ya Derve), Kansilirya, M.Y.D. (Wezareta Derve), 1898 D.27, rûp. 251-252.

(26) Kulekel, 1903, hej. 7-8, rûp. 47.

Bexda, dıxwest dıjiti bıxe nav xwendayê Ereb û Kurdan. Jı ber vi sebebi, wê dıbıstanê da gırtın û ewan ji tevda gırtın, guya; "fıtne û xırabiyan bı kar dıanin."(27)

Karbıdest û memurên Sultan, tenê bı vi awayi rêyan gırtıbûne ber xwe, tevger û bızaveki bêhna azadixwaziyê jê bıhata, lı ku dıbûya bıla bıbûya, lı İstenbul an Bexda bûya, pır bı tundi dıxwestın bıtemırinın.Dr.A.D.Jeltyakov û Y.A. Petrosyan weha nıvisine: "Dıbıstan û mamosteyên wê dı bın çav û sansorek tund û tuj a Wezareta Rewşenbir û Meclisa Rewşenbiran a wilayetan de bûn." (28) Abdulhemid, dı welat de, xwendewari û rewşenbiri, meşala ramana serxwarnekırına azadi dızani, jı ber ku wi hıs dıkır û dızani, netewe dı bın çı rewşeki paşkevti de, dı bın sitem, zılm û zordariyek de dınale. Çı kıtêbek, çı çapek, eger raste rast xızmeta rejım nekırıya û bang jı bo hêzkırına wi nedabûya, ne dıbû ew derkeve. Lê belê, lı gel wê hemû zor û terorê ji, dı Tırkiyê de rewşenbirên hêja peyda bûbûn, ku yekser bı dızi xızmeta geş kırın û pêşve bırına çanda Kurd bıkın.

Dı sala 1892 an de kıtêba El Hediyye El Hemidiyye Fi El Luxe Kurdiye ya Yusuf Ziyaeddin Paşa Xalıdi derket. (29) Qimeteki mezın a vê kıtêbê dı diroka edebi de heye. Dı wi wexti de derveyi vê, kıtêbên Kurdi tune bûn. Her çıqas ev kıtêb, jı bê naçari hatiye pêşkêş kırın jı bo Sultan Abdulhemid, lê belê, wek mamoste Mele Necmeddin dıbêje : "Eger jı bo wi nehatiya pêşkêş kırın nedıhat çapkırın û der-

(27) A.V.P.R., Konsolosxana İstenbul, 1900, D.1224, rûp. 146-147.

(28) A.D.Jeltyakov, Y.A.Petrosyan, Diroka Rewşenbiri Lı Tırkiyê, rûp. 64.

(29) O.L.Vilçivski, bı xelet tê gotın ku ev kıtêba han dı sala 1897 an de derketiye. Bınêre; O.L.Vilçivski, Bibliyografya Gotaran,164. Ev kıtêba Ziyaeddin Paşa dı sala 1310 an de hatiye çap kırın. Ger lı gora takvima hıcri bê hesıbandın, ev, wek ku nıviskar (Celilê Celil) ji dıbêje, teqabulê sala miladi ya 1892 an dıke. Lê, dı wi wexti de, Osmaniyan ku takvima rumi bıkar tanin û ger lı gora vi bê hesap kırın, sala rumi ya 1310 an, teqabulê sala miladi ya 1894 an dıke. Yani, kıtêb dı sala 1894'an de hatiye weşandın. (N.M.)

nedıket."(30)Ev kıtêba han 300 rûpel e û bı zmanê Erebi behsa rêzmana Kurdi dıke. Her wıha helbestên helbestvanê mezın ê Kurd, Ehmedê Xani û perçeki helbest û ferhengokek Nûbar a Xani tê de belav kıriye. Derveyi vê, helbestên Mehmud Hûsni Xalıdê Neqşebendi ji tê de belav kıriye. Ew materyalên ku tê de belav kıriye, bı qimet û gıringiya xwe dı pêşxıstın u jiyana zman û edeba Kurdi de ci gırtıne. Wan rêzên helbestvan Xani dı pêşgotına Nûbarê de nıvisiye evana ne:

"Ne jı bo sahıb rewacan
Belko bo pıçûkêd Kurmancan"

Naveroka rast û dırûst bı dıjitiya pêşgotına kıtêba Yusuf Ziyaeddin Paşa rê dıkeve, pêşgotına nıvisar dıji naveroka kıtêbê ye. Dı pêşgotınê de her çend behsa gırıngi û rûmeta zmanê Kurdi dıke, belê, pıraniya wê metıh û mezınkırına Sultan e.

O.L.Vilçevski, Yusuf Ziyaeddin Paşa, siyasiyeki mezın û bı navûdeng ê Kurd, pıştgırê edebiyata nû yê Erebizan dıde naskırın.(31) Nıvisarê vê kıtêbê dı hêla bir û baweriya bingehên netewi de dıjitiya wê heye. Dr.İzzeddin Mıstefa Resul û Abdullah Heddad dı nıvisandınên xwe de, ku ew dı rojnama El-Teaxi de(32) hatıne belav kırın, dıbêjın, bir û raya bıngehiya Erebiyeti ya Yusuf Ziyaeddin Paşa dı nav de heye. Hınekên dın ji nıvisandıne ku Mewlana Xalıdê Neqşebendi Kurd e. (Mewlana Xalıd dı sala 1826 an de lı Şamê mıriye) (33). Bê guman, ew bir û rayên cûda ku derbarê bın-

(30) Mele Necmeddin, Roji Kurd, 1970, hej. 12, rûp. 21.

(31) Bınêre; O.L.Vilçivski, A.n.d. rûp. 164.

(32) El-Teaxi, Bexdat, 1972, hej. 1207.

(33) A.n.d. Lı gora tê gotın û melumatên ku lı ba me hene, Yusuf Ziyaeddin Paşayê Xalıdi, lı Qudsê jı dayika xwe

gehan de heye, em bı vê awayi dıgırın dest ku Yusuf Ziyaeddin Paşa xızmetek mezın a çanda Kurdi kıriye, şarezayiyek wi ya baş dı jiyan û rewşa cıvaka Kurdan de heye. Nıvıskarên gelê Kurd vê kıtebê pır bı qimet dızanın û heta dı çapên Avrupa de ji, derbarê vê kıtêbê de nıvisandın hatıne belav kırın.(34)

Jı ber belavbûn' û pırbûna pêşkevtınxwazê Tırkiyê dı Avrupê de, rewşenbirên Kurdan ji serê xwe hıldan. Dı rasti de, dı destpêkê de lı derve, wan lıb bı lıb rewşenbir û zaroyên xanedanan armanca netewa Kurd dıxıstın ber çav. Tevgera Kurd riyeki eşkerayi netewi gırtıbû, lê xebata azadixwazan hêj bı başi nemeyibû, qalıbê xwe yê tevayi negırtıbû. Kurdên muhacır peywendiyeki tund û qaim, lı gel rêxıstınên radikal ên Tırk û Ermenên azadixwaz danibûn, dı çapi û belav kırına xwe de dı peywendiyên wan bı wan hêzan re hebûn. Wan peywendiyên han ji tesirek baş kırıbûn lı ser xebata tevgera Kurd.

Bir û baweriya ew qevdek rewşenbirên Kurd, ku belavi derve bûbû, ketıbû bın tesira bir û baweriya burjuvaziya liberal ya rojava, ewan ji doza damezırandına rejımeki burjuvazi dı welat de dıkırın. Lêbelê, her dı wi wexti de, yani dı dawiya sedsala 19 û destpêka sedsala 20 an de, cıvaka Kurdan cıvakeki derebegi-eşireti bû, rewşa abori ew qasa pêşve neçûbû, ku bıngeheki jı bo bir û baweriya burjuvazi, rewşenbiri xweş bıke. Jı ber vê rewşa han, bir û baweriya wan rewşenbiran nedıkari ciyê piyê xwe baş qaim bıke û kareki temam bıke ser cıvakê.

---

bûye. Dı dıbıstana Zmanê Rojhılat a yekem de xwendına xwe tımam kıriye û zmanê Kurdi baş zaniye. Qanun zan bûye û her dı wê wari de lı Bıtlisê wexteki dırêj karbıdesti kıriye. Lı wır bı xwe, sala 1906 an de mıriye-Nıviskar.

(Bıra kıtêbê ya ferheng a Yusuf Ziyaeddin Paşa yê Xalıdi, M.Mokri bı pêşgotınek ıngılizi û fransızi ve, ku sala 1975 an weşandiye, dı wır de dınıvisine ku; Yusuf Ziyaeddin Paşa, jı malbatek Fılıstini yê musulman û dindar e. ) (Bınêre : Diä'ud-Din Bäshä al-Khalıdi, Al-Hadiyatu'l-Hamidiyah, Beyrouth, 1975, rûp: 28) (N.M.)

(34) Journal Asiatique, IX serie, t.2, 1893; rûp. 545-549.

## DERKETINA YEKEMÎN ROJNAMA KURDÎ "KURDISTAN" 1898-1902 XEBATA CÎYÊ VÊ ROJNAMA PÎROZ.

22 yê Nisanê sala 1898 an lı Qahirê, hejmara Kurdıstan a yekemin derket. Bı vi awayi rojnamenıvisi dı diroka netewa Kurd de za.(1) Derketına vê rojnamê diyarkırınekiı pır gırıng û pır bı qimet bû jı bo jiyana cıvaki, siyasi û rewşenbiri ya Kurdan.

---

(1) Dı serekaniyên cûre cûre de, behsa derketın û diroka hejmara yekemin Rojnama Kurdıstan hatiye kırın. Jı bo minaki; Admons û yên rêça wi de çûne, wek Gavan, wıha dıbêjın : Dı sala 1892 an de derketiye. Bınêre; J.Admons, Kurds, Turks and Arabs, London 1957, p.58, S..S. Gavan Kurdıstan, dirıded natıon of the Mıddle East, London 1958, p.15. Lêbelê, Elphınston wıha dıbêje : 1887 an de derketiye. Bınêre; Elphınston, The Kurds Question, Journal of the Biritich Just of Intern Affairs, 1946, Cıld: I-II, rûp. 94.
Her wıha mamoste Emin Zeki Beg û Elaeddin Seccadi ji

Mıqdat Mithed Bedırxan, sereknıvisar û xwediyê rojnamê bû. Jı Tırkiyê baz dabû û wek mıhacıreki lı Qahirê dıjiya. Rojname organa tu komele û rêxıstınên siyasi nebû. Mıqdat Mithed, têkoşer û welatparêzeki Kurd û zana bû. Dı karê rojname û çapi, dı geşkırın û pêşve bırına çanda netewi de gıhişti bû. Jı ber vê zaneti û bir û baweriyê bû, ku ev rojname derdıket.Hewceyê biraninê ye, pışti derketına "Kurdıstan", ew rewşenbirên Kurdan ên derve, belavok û bangan dıji Sultan derdıxıstın, dı wan de doza yekitiya rêza netewa Kurd dıkırın û bang lı Kurdan dıkırın ku lı dıji zılm û zora Sultan bı hev re xebatê bıkın. Dı wan bangan de bı mıxabıni behsa pêwısti û wextê hatına holê û peydabûna rojnamenıvisên Kurdan dıkırın, jı bo hemû têkoşerên Kurd lı der û dora vê kovarê kom bıbın.Ronitır û baştır tê gehıştı bûn, ku rolek rojnamê ya baş dê dı kom kırına Kurdan de hebe.

Mıqdat Mithed Bedırxan tenê pênc hejmarên Kurdıstanê derxıst. Sê hejmarên pêşin dı çapxana El Hilal û du hejmarên dınê ji dı çapxana Kurdıstan bı xwe de. Rûpelên rojnamê ne zêde mezın bûn. Du hezar lıb dıhat çapkırın. Lı ser rûpelê rojnamê yê yekemin hatiye nıvisandın, ku mehê du car derdıkeve, lêbelê, jı ber zori û rewşa xırab bı awayek bı ser û beri derneketiye. Rojname bı kurmanciya jor û bı devoka Cızira Botan hatiye nıvisandın. Eşkeraye ku ev devok dı wê wextê de dı nav Kurdan de pır belav bûye û xwediyê rojnamê bı xwe ji bı wi devoki axaftiye.

Rojnama Kurdıstan bı riya Suriyê, dı navçên bakûra welat de belav dıbû. Beşeki ji lı Awrupa dı nav Kurdên mu-

---

wıha dıbêjın : Hejmara yekem, dı sala 1897 an de lı İstenbul derketiye. Bınêre; Mehmed Emin Zeki, Diroka Kurd û Kurdıstan, Qahire 1939, rûp. 37. Elaeddin Seccadi, Diroka Edeba Kurdi, Bexdat 1973, rûp. 551.



ذوبیر — سالا عوّلي — عدد ۱

# كردستان

۱۳۱۵


حجي كاغذك في ريكه
دني ريكێ مصرى سنز
ناقف خوني في جريدهيى
لاو بدرخان پاشا
مقداد مدحت بكى
هرجار دوهزار جريدهيا
بى پره آزيسى دبكم
كردستانى دهبدن خلكى
بازده روژا جاركي تيت
نيساندن

شرطي
مغرقوالاكردستانه غزتهسي
صاحب ومحرري بدرخان
پاشا زاده
مقداد مدحت
هر طلبده ... نسخه كردستان
ولات [illegible]
[illegible]
كردستان خارجده هر بر
ابونه سنهلك اجرتي
۸۰ غروشدر
كردستان غزتهسي
انتهالره مجانا كوندريلور

كردلري ايقاظ وتحصيل صنايعه تشويق اچون نشر اولنور

اون بش گونده بر نشر اولنور كردجه غزتهدر

روژا پنجشنيده ۳۰ ذوالقعده سنه ۱۳۱۵ پنجشنبه في ۹ نيسان سنه ۱۳۱۴


## بسم الله الرحمن الرحيم

صد هزار شكر وحمد ژخدى تعالىره آم مسلمان خلق بكرن. وطانيا علم ومعرفتبره هش وزكا دامه. دوحقا علماذيا علم ومعرفتبره گلك آيتين جليله واحاديث شريفه هنن دنيايده چقاس مسلمان هين گوند وبازيرين حيادهمكتب ومدرسه وجريده هنن دنيايده چه دبه چه نابه جريده دنفيسن. حيفامن تيت ژكردژه كرد ژگلك قوما زيدهتر خوني هش وزكاه جاميرن نبين خودهراست وقويه خوژتن ودنيا وكه قوميت دي نه خونده ه ه[illegible] ژدنيايده چه دبه جيران وان موسقوف چ وبه وى چه كه [illegible] [illegible] رباخدبده من ف جريده [illegible] نبي [illegible] ش نهو هر [illegible] روژه [illegible] نى جريدهكي [illegible] في من كره كرد [illegible] في جريدهيده [illegible] فحر [illegible] ومعرفة بكم.

لكوردي مروف دعليه لكوردى مدرسه ومكتبن قنج هنه ازي نيشا كردا بكم لكوردي چه شر دبه دولتين معظم چه دكن چاوه شر دكن تجارت چاوه دبه ازي حيا حكات بكم حتى نهو كسي جريدهكي وه‌لي نتيسيبه ئف جريدهيا مناها ياعوّلي به لوما وي گلك كيماي هيتن. ازهيڤي دكم كيابا جريدهيي ژمنره بنفيسن حمي بتشتوكي نو چه دبن بكين بلي هكي دچه دكوه ريده اوه ايدي ازي دست مقصدى بكم. (ومن الله التوفيق)

---

حضرت پيغمبر عليه الصلوة والسلام گوتيبه «العلماء ورثة الانبياء» اكو عنا وارثين انبياءنه ژطرف خديده مأمورن وعظ ونصيحتي بدن خلكي ربا قنج نيشا وان بكن [illegible] كي [illegible] كردا چاوه اون وعظ ونصيحتا [illegible] ددن ون [illegible] ون مير وآغا وكرمانجين داستن ون [illegible] [illegible] ومعرفتى بكن ربا قنج نيشا وان بكن هكي اون وي [illegible] سطوتهوبه

hacır û dı nav Awrupayiyan de dıhat belavkırın , ku lı wan deran meraqek lı ser edebiyat û zmanê Kurdi hebû. Lı gora wan namên bo rojnamê çûne tê xuyakırın, ku pır kes xwendayê rojnamê bûn e, ewan ji daxwaz kırıne hejmareki gelek zêde bê şandın jı bo Kurdıstan.

Dı qonaxa Qahirê de, rojname zêdetır qimet daye jı bo bebelav kırın dı nav xwendewarê zane de. Dı rûpelê hejmarekê de ku bı fransızi hatiye nıvisandın, Miqdad Mithed dıbê : "Dı pêvajoya vê de ezê netewa xwe dem tehrik bıkım jı bo xwendewari û fêrbûna zanıstiyê, jı bo vi ji mın lı Qahirê vê rojnamê derxıst. Bı wi ku netewa mın bıbe şerezayê şarsaniyet û zanısta hemdemê,şerezayê edebiyata xwe bıbe.Ez hêvidarım ku bıbinim Kurd, jı bo vê pêş bıkeve û hêvidarım bıbinım sewiya rewşenbiri ya netewa mın bılınd bıbe." (2)

Dı hejmara yekem de behsa wezife û armanca rojnamê hatiye kırın. Nıvisinên derbarê ‹deng û behsên nav dewletan, derbarê tıştên nû hati icatkırın, dı meydana pişesazi û zanısti de, ya dıdûyan; derbarê çûna dıbıstanan û xwendın dı welatên dın de... Bı ayet û hedisan, sernıvisan hatıne xemlandın ku ewên bı gırıngi behsa zanıstiyê dıkırın. Kurdıstan wek organên 'Tırkên Cıwan jı bo her mesele û bûyerekê ayeteki Quranê yan hediseki dıani, dı ser vê re ji, nêrina Miqdat Mithed û Tırkên Cıwan lı ser mesela bir û baweriya rewşenbiri ya Rojava cûda bû. Miqdat Mithed, zanıst û pêşkevtınê, dı muaweneta Awrupayan a lı dıji dest dırijayiya dınya mesihi çekeki dızani. Lı cem wi weha bû; Kurd qet nıkare bı azadi bıbe xweyi mafê xwe, eger zanıstiyê hımbêz neke, dı meydana rewşenbiri û pişesazi de pêş

---

(2) Kurdıstan, 1898, hej. 1-2.

nakeve.(3)

Miqdat Mithed, dı hemû bangên xwe de doza bırayeti û hevkariya navbera Kurd û Ermenan dıke. Wek tê xuya kırın xwediyê rojnamê, jı mılek ve parastına cihana vê demê dıke û jı mılek dın ve doza bırayetiya Kurd û Ermen dıke. Eva belga wê ye, ku baş dı rewş û zırufê de gıhiştiye. Dı bın vê nêrinê de dı hejmara sısiyan de doza yekiti û bıratiya her dû netewa kıriye, ev ji bûye qezenc û menfeeta her dû mılan û wan her dûyan bı hev ve gırêdaye. (4)

Rojnama Kurdıstan lı Suriyê û bı taybeti ji lı Şam bı awayek fıreh hatiye belav kırın. Eşkereye ku dı ser Suriyê re ji hatiye rêkırın bo Kurdıstanê. Hejmareki pır mezın Kurd, jı navçên Kurdıstanê ên dın jı bo xebatê rıjabûne bajarê Şamê. Dı hejmara sısiyan de nameyek hatiye belav kırın. Yê ku namê şandiye dıbê : "Rojnama Emir gıhişte destê mın, mın tev Kurdên der û doran berhevkır û rojnamê nişani wan da. Bı xweşi ewan maçi kırın û danine seri xwe. Pışt re mın jı wan re xwend,pır pê xweş bûn.Dı naveroka wê baş gıheştın û dı dılê wan de rûnıştbıryar dan dest jı hemaliyê berdın û hini pişeyek bın, bıryar dan zarokên xwe bıdıne ber xwendınê jı bo ku hini pişe û hunerên dın bıbın."(5)Xwendewar pır bı germi dıçûn ber bı derketına rojnamê ve.Dı rastiyê de rojname,daxwaz, ihtiyac û asteng û kelemên cıvaki yê Kurdewari kolaye û darberê wan de nıvisiye, pır kesan gotıne û xwestıne jı berê de xema wê dıxûn,ku jı bo çı Kurd ji dı nav netawan de bı zmanê xwe rojname dernaxın. Yek jı wan, bı vi awayi rûyê wê demê daye naskırın.

'Pır caran mın hewar jı bo Kurdan bıriye, mın serê xwe

(3) A.n.d. hej. 3

(4) A.n.d. hej. 3

(5) A.n.d. hej. 3

pê êşandiye û pırsiye, bo çı Kurd bı vê zireki û başbûna xwe jı pişeti û xwendewariyê dûr dıbın? Bo çı her weha nexwendewar dıminın? Hemû wextek mereqa mın ev karê han bû û bı vi ve mıjûl bûm. Lê nıha sıpas jı bo xwediyê rojnamê ku wi vê rojnamê jı bo Kurdan derxıst". (6)

Kurdıstan , her dı hejmara yekem de, bala xwendewaran bı aliyê xwe de kêşa û xwendewaran dozê lı rojnamê dıkırın, ku derbarê jiyana siyasi, cıvaki, abori wan meselên gırıng ên wê demê bınıvisine û jı bo jiyana nexweş, zehmet û xırab, bıbe rênişandar û rêxıstın.Wê nama jı Edenê, Seid Tahır Botani, lı ser navê çend hezar Kurdan jı rojnamê re şandiye, ku qimetekê wê ya mezın heye. Dı wê namê de, karkerên Kurdan, nerızayiyên xwe derbarê zehmeti, xırabi û nexweşiya jiyana xwe de gotıne, wan daxwaz kıriye ku rojname pır û pır lı ser jiyana wan bınvise, bı vi awayi pêşniyar kırıne, ku her carê pênci lıb jı bo Edene bê şandın. (7) Miqdat Mithed, dozeki baş kıriye, lê rojname bı awayeki veşarti jı wan re hatiye şandın.

Miqdet Mithed, nêrin û raya xwe, dı derbarê Sultan û siyaseta wi û meselên gırıng û esasi de, bı awayek ne raste-rast dıda xuyakırın. Ew namên ku jı bo rojnamê hatıne dıdın kıfşkırınê ku rojname dı bın çav de bûye. Bı gotına Hartman , çı kesê rojname bıstanda bı cezayek mezın dıhat ceza kırın.(8) Miqdat Mithed, ev işkence û cezayên mezın, karê karbıdest û memuran dıda xuya kırın û dınıvisi, dawa lı Kurdan dıkır, ku bıçın jı Sultan bı xwe re bêjın. Bı xwe ji, dı

(6) A.n.d. hej. 5.
(7) A.n.d. hej. 5.
(8) Bınêre ; Y.Hartman, Zur Kurdıschen Literatur, Wiener Zeitschrift far die Kurds des morgenlandes, B-XII, Wien 1898, rûp. 112.

nıvisandınek taybeti de dawa lı Sultan dıke, bê merhemetê û çareki jı bo asteng û zehmetiya Kurdan bıke.(9)

Nıvisandına pênc hejmarên pêşin, bı bê nav hatıne belavkırın.. Lı gora uslûb û stila wek hev, dı nıvisandınan de, mırov dıkare bêje,ku jı bıli naman, sereknıvîskar bı xwe tenê, bı hemû awayi nıvisandınan nıvisiye. Ev ji dıde xuyakırın, ku kesek tûne bûye bı nıvisin alikariya rojnamê bıke. Jı ber vê sereknıvîskar,lı Qahire peywendi û dosti lı gel wan xwendewanên Kurdan daniye, ku jı Sılêmaniyê, Kerkûk û bajarên Kurdıstanê ên dın hatı bûn xwendınê bo Universita Ezher. Hejmarên Kurdıstan dıdın xuya kırın ku nişaneki karê wê ya bı rêk û pêki nebû ye.

Bı ci guhertına Kurdıstan jı Qahirê bo Cenevrê, rû û riyeki nû dı diroka rojnamê de dest pê kır. Abdurrehmanê bırê Miqdat, kar û barê derêxıstına rojnamê gırtı bû ser mılên xwe.

Abdurrehman Bedırxan, beri ku bê Avrupa, lı İstenbul cigırê Serokê İdara Wezareta Rewşenbiri bû. Ku ewi ji, welatê xwe dı ci de hışt ew ji hate rêza dıji Sultan. Sultan, bı bê rawestandın dıxwest, bı destê mırovên xwe, wan rakêşe ber bı welat de. Dı sala 1900 an de dadgeha Tırki, bê ku ew lı wır e, fermana hepıskırına wi ya muebet û dest bı ser da gırtına mal û mılkê wi derxıst. Rojnamên Tırkiyê bı yekdeng pıştgıriya vê fermanê dıkırın û belge û bahanên wan ew bûn, ku Sultan çendin car dawa lı Abdurrehman kıriye,da dev jı awareti û serêşiyê berde û bızıvıre İstenbul a ku ci û meqamê wi lê kıfşe. Lê belê, wi Kurdi, jiyana serbılındi ya ger û xebata Avrupayê jı vegerandına İstenbulê baştır dıdit.(10)

---

(9) Kurdıstan, 1898, hej. 1.

(10) Nurdar (Sedsala Nû) 1900, 13 Kanuna Yekem, hej. 226 (Bı Ermeni)

Lı Avrupa, Abdurrehman Bedırxan meyla wi bı Tırkên Cıwan ve bû, ku doza damezırandına rejımeki meşruti dı Tırkiyê de dıkırın. Dı hejmara şeşan de, rojname ku êdi Abdurrehman serokatiya wê dıkır, rewş û rûwangê (perspektif) xwe kıfş kır. Dı sala 1900 an de rojnama Nurdar a Ermeniyan dınıvisi ku: "Her bı Tırki û bı Kurdi rojname derdıket, doza xıstına rejıma Sultan û damezırandına rejımeki federasyoni dıkır, rejımeki weha, ku lı ser axa Arnavut, Romanya, Asuri, Ereb, Ermen û Kurd bê bıcikırın."(11)

Abdurrehman, têkoşin û xebata xwe, lı gel Ermen, Tırkên Cıwan, rêxıstınên dın û çapên dıji Sultan bıkardıani, bo bang û doza Kurd. Wek minaki, peywendi lı gel rojnama Dıruşak (12) û Osmanli datani, bı veşarti, dı riya dızi ya Ermeniyan re, bang û belavokên xwe dışand Kurdıstanê, tê de dozê lı netewa Kurd dıkır, ku xwe jı wê xewa gıran şiyarkın û serihıldın. Bı gışti, belavokên wi dı rojnama Dıruşak de dıhatın belavkırın.

Komelên rojhılatnasên Avrupiyan, Abdurrehman bı başi nas kırıbûn, ewan lı ser alikariya wi ya mezın jı rojhılatnasên weki M.Hartman û H.Makas hwd. re jı bo derêxıstına gelek afırandınên Kurdi, axıftıne. Jı bo minak, Hugo Makas dı kıtêba xwe de nıvisiye, dıbêje; "sıpaseki mezın lı berêz Abdurrehman dıkım, ewi vi karê pır baş dızani, her tışteki ku mın nedızani ewi jı bo mın roni dıkır û mın têdıgıhand. Jı ber alikariya wi ya dı vi qunci de ye ku ez alikariya edeba Kurdi iro dıdım." (13)

Rewşa dıji Sultan û bir û baweriya burjuvazi ya demokrati

(11) A.n.d.

(12) Dıruşak (Al) 1901, hej. 4, rûp. 67 (Bı Ermeni)

(13) H.Makas, Kurdısche Studien, Heidlberg 1980, rûp. 67

a Avrupa, bı awayek raste rast kariye tesirê bıke lı ser bir û baweri û rewşa siyasi û cıvaki ya Abdurrehman.

Dı destpêkê de Kurdıstan lı Cenevre, wek hecm û tirajê Qahirê û mehê du car derdıket. Lê belê, pıştı demek çû, bı awayek rêk û pêki derneket. 200 lıb jê dıhat çapkırın. Dı sala dawiyê de redaksiyona rojnamê her dı karê ci guhertınê de bû: Londra, Folkstan, cara dıduyan Cenevre û Qahire, Teşqele û zordestiya mırovên Sultan, bê pereyi, qezenca kêm a xwediyê rojnamê, roleki mezın dı vê meselê de dılist.(14)

Dı lêkolina qonaxa dıduyan a diroka rojnama Kurdıstan de, hebûna hınek peywendiyên wê, hewceye ku em bıxın ber çava. Jı ber sebebê bir û baweri û siyaseta wê, dı navbera Kurdıstan û rojnama Osmanli de peywendiyek hebû. Ev rojname, meha Tirmehê dı sala 1900 an de lı Londra û 15 yê İlonê lı Folkstan derketiye. Berpırsiyarê wê Sebahettin bû. Hêjayê gotınê ye ku, Kurdıstan ji her dı wan deman de lı wan her du bajaran der ketiye.Armanca rojnama Osmanlı bı awayek esasi propagande bû,jı bo İmparatoriyeki Osmani ya bı meşrutiyet. Sebahattin dı destpêkê de pır xebıti jı bo yekitiyekê bı kar bine, dı navbera rêxıstınên Tırkan û ên ne-musulman ên ku dıji Sultan bûn. (15) Ew rêberê rojnama Osmanlı ji bû. Ewi wusa lı Abdurrehman kıri ye ku peywendiyeki bı tund û qaim lı gel organa Tırkên Cıwan dabımezrine. Pro Armenia daye xuya kırın, ku Abdurrehman yekek bû ye ku bı dılxwazi û bı bızavi alikariya rojnama Osmanlı kıri ye. (16) Hewceyi gotı-

(14) W.Elphinston, The Kurdısh Question, p. 97.

(15) A.D.Jeltyakov, Weşan dı Jiyana Cıvaki-Siyasi û Rewşenbiri a Tırkiyê de, Moskova 1972.

(16) Pro Armenia 1900, N.4, p.31.

nê ye ku, berpırsiyarên hemû netewên musulmanên İmparatoriya Osmani,endamên koma nıviskarên wê bûn. Lı ser rûpelên wê rojnamê, behsa tevger û propaganda rêxıstınên netewa Makedonya, Arnavutluk û yên Kurdıstanê dıhat kırın. (17)

Heta hejmara 31 ê ya rojnama Kurdıstan dı kutupxana Marburgê de hatiye parastın. Dı hejmara dawiyê de behsa kongra Tırkên Cıwan a yekemin, bı awayeki dûr û dırêj kıri ye. Wek tê xuya kırın dı dawiya wê kongrê de dubendi ketiye navbera tevgera Tırkên Cıwan.A.D.Jilyakov dıbêje: "Pıraniya wan kesên ku dı kongrê de beşdar bûbûn ne nûnerên Tırkan bûn, ew kes zarokên netewên İmparatoriyên bûn, ku lı gel mesela mafên belavkırına kırdayetiya mehelli, bûn. Ehmet Rıza û hin kesên dın, mırovên kıfşe bûn dı nav rêxıstına Tırkên Cıwan de, ew nûnerên menfeeta burjuvaziyên Tırkên netewi bûn. Ewan dıxwest ciyê rejıma derebegi û burokrati bıgrın û hevsarên İmparatoriya Osmani bıkın destên xwe. Dıxwestın İmparatori her wek berê bımine, lê, hevsar dı destên wan de be, jı bo wê bir û baweriyê, dıjiti kete nav Tırkên Cıwan û guherandınek eşkere peyda bû û ewê ji xwe lı ser weşanan dıda xuya kırın."(18).

Abdurrehman gotara ku lı ser kongrê nıvisi bû, dı wır de rewşa xwe bı meşrutiyetxwazan re dabû kıvş kırın.

Derebegên dı nav Tırkên Cıwan de, dest danina wan lı ser rojnama Osmanli , tesireki mezın kır lı ser liberalan û roleki gırıng leyist. Ewê lı ser qedera rojnama Kurdıstan ji rol leyist û ew dıjitiya nevbera her dû aliyan tesir kır lı ser nederketına rojnamê û rojname êdi derneket.

Rojnama Kurdıstan dı wan wextan de,lı çapxana Tırkên Cı

---

(17) A.D.Jeltyakov, A.n.d. rûp. 266.

(18) A.n.d., rûp. 267.

wan dıhat çap kırın.Kovara Anahit(19) ya Ermeniyan behs kıriye ku, Tırkên Cıwan bı pırani nıvisandınên xwe bı Tırki belav nekırıne. Her Abdurrehman bı xwe ji armanca wi ew bû ye ku, naverok û deng û behs ne tenê jı bo xwendewarên Kurdan bıbe, hewceye ku ew ji lı ser dıjitiya navbera Tırkan agahdar bıbın û bızanın çı dı holê de heye.Sernıviskarê rojnamê namên xwe yên jı bo Sultan dınıvisi bı Tırki dınıvisand û belav dıkır. Xuya ye ku Abdurrehman pıştı hejmara şeşan serokatiya rojnamê kıriye û her dı wê hejmarê de nameki jı bo Sultan nıvsisiye û tê de bir û baweri û rewşa xwe ya rewşenbiri xıstiye ber çav.Ne tenê dı wê rojnamê de, bı cûre cûre materyal û weşanên dın ên hatıne belav kırın ji,behsa cûre cûre raman rewşa siyasi ya Abdurrehman kırıne. Lı ser Sultan û darû dezga burokratên lı der û dorên wi ji nıvisiye. "Ez jı welatê xwe derketıme û mın bı neçari ciyê xwe berdaye, idara rojnama mın ji dı bın çav û kontrola wi da ye (qesta wi Sultanê Osmani ye.Werger), mın ciyê xwe guhertiye ku ez xızmeteki baş jı bo Kurdan bıkım."(20) Bı vi awayi lı ser pêwısti û qimeta zanısti û xwendewari dı nav Kurdan de ji nıvisi ye : "Mırov bı eqıl, hış û fêm kırınê jı heywanan tê cûda kırın, wê hış, eqıl û zanyariyê mırov dıkare bı piçek xwendınê ve peyda bıke. Bê xwendın mırov her dı taritiyê de dımine, jı ber sebebê hebûna eqıl û hış e ku, kontrol û idara lı ser jindarên dın mırov dıkare bıke. Her jı ber sebebê zanıstiyê ye, keşti dı behran de, trên dı zeviyan de riyên dûr dıçın. Zanısti, bı xweza û tıştên dın ku diyarın dıkare mırovan tê bıgehine."(21)

(19) Anahit 1900, hej. 4-5, rûp. 138 (Bı Ermeni)
(20) Kurdıstan 1898, hej. 6.
(21) Kurdıstan 1898, hej. 6.

Rojnama Kurdıstan dı hejmarên xwe yên dawiyê de, qimeteki pır mezın bı mesela xwendewari û zanıstiyê, daye. Dı sala 1900 an de kovara Anahit nıvisiye ku : "Bı pırani sernıvisên Kurdıstan, lı ser gırıngi û qimeta xwendewari û zanısti ne Bı awayeki pır germin, hawar lı Kurdan dıkın û dıxebıtın ku,ewan bı hışi û jindariyekê bıxe kar û jı bo wi kari hewl dıdan.Hewceyê gotınê ye,ev mesele ne her bı tenê ewe ku, qimet bê dan jı bo xwendewariyê, hewceye ew jı bo armanceki be. Belê, xwendewari wek riyekê ye jı bo hişyar kırına siyasi ya netewe û ku ew ji jı bo xebata siyasi bê amade kırın."(22)

Abdurrehman sebebê paşvemayina Kurdan dıda xuya kırın û dewleta Tırk dı wê meselê de gunehkar dıkır. Lı ser vê meselê weha nıvisiye : "Pere jı Kurdan dıstine û lı Tırkan xerc dıke". Her weha kovara Anahit dınıvise û dıbêje : "Kurdıstan bı delil û belge ispat dıke ku, sebebên feqiriya Kurdan dewleta Tırkiyê ye, dıxwaze Kurd dı wê rewşê de bıminın, jı berê de dıxweze çareseriya wê mesela siyasi têkıl bıke. (Dengê Kurdan bı hile û pêlan dı Kurdıstanê de bıde bırin- Werger) Dozê lı Kurdan dıke ku, daxwaza xwe ya adılane bıgihinın Sultan, jı bo rejım mesela xwendın û zanıstiyê jı wan re bıkarbine."(23) Rojnama Kurdıstan , wê rewşa Kurdan a xırab, kırdayetiya dewletê ya rızi û xwarına mafên siyasi yê Kurdan dı zani. Rojname, her çend Kurdan han dıda heta dest avêtına çek lı dıji rejım, lê belê, para vê riya han ji dıhêla jı bo çareserikırına meselê, riyek aşiti bê pêşiyê hewceye pıştgiriya wê ji bêkırın. Rojnamê nıvisiye : "Eger kırdayetiyên heremê nehêlın dıbıstan bêne vekırın, şikayeta wan jı Sultan re bıkın. Eger ew ji dı hewara we de

(22) Anahit, rûp. 139.
(23) A.n.d., rûp. 139.

neyê, ewan tıştan jı bo mın bınıvisın, ez ê bıxwe dozê jı Sultan bıkım... Eger lı ser van ji xwe ker kır, dest bavêjne şurê ku, ew jı serê şûrê bıtırse û sıtoyê xwe lı ber wê dozê xwar bıke, eger doz kırın feyde neda, êrişan bı şûr bıbın herın ser. Jı bo gehiştına vê armancê ji yekgırtın pêwıste, hûn yek negrın ew wan tıştan hiç bı hiç nakın."(24)

Dengdan û rengên armanc û bir û baweriya Miqdet Bedırxan, her dı wextê bırayê wi Abdurrehman de ji mırov dıkare lı ser rûpelên rojnamê bıbine. Dı aliki de Kurdan hewl dıda ku êriş bıbın ser Sultan û memuran ceza bıkın, dı aliki dın de ji bı awayek eşkere doza serihıldan û şoreşê dıkırın. (25) Hêdi hêdi liberaliya Abdurrehman bı ber radikaliyeki sıvık de dıçû.

Abdurrehman rexnên tund û tuj zêdetır lı şexsê Sultan dıkır. Dı rojnamê de behsa nebaşi, pisi û gunehkariya Sultan dıkır ku, çawan cariyan kırıne wek kolan.(26) Rojname lı ser

---

(24) Kurdıstan 1898, hej. 7

(25) Kurdıstan 1898, hej. 7.

(26) Ю.А.Петросян, Документальное свидетельство нелегальной антиправительственной прпаганды среди моряков турецкого флота в конце XIX века, в сб. "Письменные памятники и проблемы истории, культуры народов Востока", УIII годичная научная сессия Ленинградского отд. Института востоковедения АН СССР, стр.106.

Sultan weha dınıvise : " Bı hezaran keçên Çerkezan hene ku serê wan sıpi dıbe û pir dıbın û dımrın, tu cari jı serayê dernakevın û ewqas qizık bê mêr û bê zarok ın."(27) Lı ser dar û dezgên rejımê ji weha dınıvise : " Hewceye ev halên han iro bên eşkere kırın jı cihanê re, Tırk wan halan baş dızanın û iro disa pır rojname hene ku evan halan jı mırovên nezan re dıdın zanin. Lı der û dorên İstenbulê gelek Kurd hene ku, ez mecburım bı vê rojnamê evan halên Kurdan bıdım zanin ku, ev jı hemû musulmanan re bê eşkere kırın û dermaneki vi derdi bê peyda kırın." (28)

Jı ber vê, Abdurrehman bı awayek eşkere dıjmınati lı hember Sultan dıkır, lê belê, sloganê xıstına Sultaniyê hılnegırtıbû, zêdetır rexne û gotın û nıvisandınên ne bı raste rast lı şexsê Sultan dıkır û daxwaza wi ji ew bû Sultaneki adilane bê ser kar ku, exlaqê wi wek yên xelifeyên İslamê be. Dı wan wextan de Abdurrehman pıştgiriya rewşa Osmaniyeti dıkır û dıxwest hukmê mutlaq bê xıstın û dı ciyê wi de hukmeki destûri bê damezırandın. Ewi weha dızani ku, bê pêşkevtına rewşa siyasi-abori û rewşenbiri dı hemû İmparatoriya Osmani de, pêşkevtına gel ne mumkun e û pêşkevtın û şarıstaniyet nayê pêş. (29)

Rojname, gırıngiyek mezın dıda zehmeti, tengasi û dıjwari yên dı nav dewletê de. Rexnên tund û tuj lı sistema hu-

---

(27) Kurdıstan 1900, hej. 2-16.

(28) A.n.d.

(29) Y.A.Petrosyan, Tevgera Tırkên Cıwan, Moskova 1971, rûp. 257 (Bı Rusi)

kumdari, dızi û rızibûna dar û dezga dewletê dıkır. Dı maqala İstenbul de(30),lı ser jiyana zehmeti ya cıvaki û tırsa sixûrên Abdulhemid hatiye sekınandın. Nıvisarê maqalê behsa beredayeti û bêqanuniyê dıke û dıbêje;jı ber xezeb û kina gel, tırs û saw ketiye ser Sultan. Dı wan rojan de Kurdıstan ji weha dıbê : "Eva pêleke (qaseke) halê İstenbulê gelek dıjwar bûye, zılm her roj zêdetır dıbe û êdi tehemûla gel nemaye. Tu roj tune ku çend mırov hepıs nekın an ji neyên nefikırın, tu mal û malbat nemaye lı derveyi vi tadê. Wezareta Hındûr jı mezluma tıji bûye. Emniyeta can nemaye, jı ber vê, hewceye ku Sultan bı edalet hereket bıke, lê ew jı ber tırsa yekcar zılma xwe zêde dıke û hema jı ki pıçek şuphe bıke bê mehkeme ewi mehkum dıke."(31)

Rojnama Kurdıstan, bı zmaneki sade û vekırı, hemû pisi, geniti û zılm û zordariya rejıma burokrati ya Sultan, jı bo xwendewaran derdıxıst û dınıvisi : "Dıvê hûn ittifaq bıkın û wan memurên zalımên ser xwe bavêjın. Eger hûn ıttıfaq nekın, hûn ê dı bın zılmê de, welat, din û namusa xwe wenda bıkın. Ez ê nıha jı we re bıdım xuya kırın ku wan memurên Sultan çawan tên tayin kırın jı bo Kurdıstanê : Xunkar (Sultan) sê hezar zêreki jı wezirek dıstine û ewi dıke sedrezem, paşi ew sedrezem, bı çend hezar zêreki weziran dıke nazır. Paşi paşayek hezar zêreki ruşwet dıde sedrezem, mesela em bêjın dıbe waliyê Diyarbekrê, ew wali ji jı bo heyfa perê ku daye sedrezem derine, dıvê ruşweta bıxwe, ki ruşweteki bıde wi, ew ji dıbe muteserrıf, muteserrıf ji, jı bo ku heyfa perê daye wali derine, heçi yê geleki pere bıde wi, dı ke qeymeqam. Qeymeqam ji, heyfa perê da-

---

(30) Kurdıstan 1900, hej. 21.

(31) A.n.d. rûp. 1.

ye muteserrıf derine, vi pereyi jı Kurdên reben dıstine."(32)

Bı awayeki cûre cûre gelş û problemên Kurdan ên cıvaki lı ser rûpelên Kurdıstanê dıhatın xweya kırın. Nıviskar dı gotarek xwe de, behsa gundiyeki Kurd ku navê wi Mehmud e dıke; ka bı çı awayi çina xwedi kırdayeti jê bertil wergırtiye û serpêhatiyên wi bıraderi dıxe ber çav. Behsa wi bıraderi dıke ka bı çı awayi hatiye talan kırın û hebûna wi jê hatiye sıtendın û gundiyên Kurdıstanê ka bı çı awayi tên mıjandın, şelandın û rût kırın.(33)Nıviskarê gotarê vi gundiyi wek misalek tine û jı derebegê Kurdan re dıbêje"çarenıvisa evên han çavrêya we dıkın".Nıviskar, vê mesela çiniti wek meseleyek netewi dıde ber çav. Daxûyakırına bı vi awayi, jı bo menfeeta Kurdên xwedi mılk û ax pêkhatiye, û derdıkeve ku wê çina ku çı derkerê rojnamê û çı ji peyamnêrê (muxabır) wê bûn jı yek bıngehê bûn. Jı ber wê ji,Kurdan wek neteweki gıştî û bê ferqa çiniti xulamên bın destê Sultan daye nişandan.Nıviskar,jı hemû Kurdan re, xwestiye bıde xuya kırın û fam kırın ku; eger hûn hemû nebın yek û yek negrın, dı rojên pêş de tırsa mın ewe ku hemû zevi û zarê Kurdıstan dê jı destê me bıçe û mırovên Sultan wê zêdetır êrişan binın ser me û ava tehıl dı qırıka me de bıkın xwarê.(34)

Rojnamê, qimetek mezın daye belav kırına ruhê nıştımanperweri. Gotara (Maqala) Welat û Nıştıman , yek jı wan gotaran e ku bı başi û xweşi lı ser wê meselê sekıniye.Nıviskar, welatê Kurdan, Kurdıstan dışubhine laşeki bırindar(35). Dı gotarên dın de wek ;Kurdayeti, Kurd û Kurdıstan.... bı roni û xweşi behsa riya ramana bir û baweriya

(32) A.n.d. , 1899, hej. 11, rûp. 1.

(33) A.n.d.

(34) A.n.d.

(35) Kurdıstan 1898, hej. 9.

Kurdayeti tê kırın.

Dı bangên Kurdıstan de, şop û tesira bir û baweriya Tırkên Cıwan bı awayek eşkere tê ditın. Kurdıstan ji, doza welateki perçenekıri û yek perçeyi dıkır. Tenê dı wi wexti de, bangi netewa Kurd dıkır jı bo serihıldan û şoreşekê, lê,dı wır de, bı awayek rıni û raste rast behsa damezırandına dewleteki Kurdan nedıkır.

Bı nısbet rojnama Kurdıstan tıştek nediti û ecêbe ku dı mesela Girit de dozê dı kır ku ew jı dewleta Osmani bıqete. Heta demeki dırêj rojname û çapên Tırkan ên derve, Sultan gunehkar dıkırın lı ser vê meselê.(36) Her jı bo çareserikırına vê meselê Kurdıstan weha nıvisiye : " Halê musulmanan lı Gıritê gelek xırab e. Dewlet eskerê xwe naşine wır, jı ber vê mırovên musulman geleki jar û reben bûne. Mêrên wan geleki hatıne kuştın, jın û zarokên wan bırindar bûne..."(37) Her dı wan rojan de rojname behsa xeteriya dagırkırına Kurdıstan û qetliameki dı Imparatoriya Osmani de dıke.

Baweriya rojnama Kurdıstan ew bû, ku dı vê meselê de peywendiya siyaseta Avrupa û a Tırkan hebû û wekhev ji dınêrin. Dı wan rojan de rojname behsa wê mêtın û zordestiya abori kıriye ku, çawan netewên dı İmparatoriya Osmani de wê tam dıkırın. Dı gotarek xwe de behsa rola wan

---

(36) Y.A.Petrosyan, Dı Dawiya Sedsala 19 an de, Dokument û Belgên Propagandên Dızi, yên Dıji Sultan lı Nav Behrên Tırkan de. Weşanên, Biraninên Mesela Diroka Çandi a Netewên Rojhılat, Weşanên salane yên seminerên zanısti a Zanıstigeha Rojhılatnasi -beşê Leningrad- Akademiya Zanısti a Sovyet, rûp. 106.

(37) Kurdıstan 1898, hej. 7, rûp. 4.

misyonerên Avrupayi kıriye, ku ew tım û tım xebıtine jı bo peyda kırına dıjiti û aloziyê dı navbera netewên İmparatoriyê de (38)

Kurdıstan , danina meşrutiyetê, tenê riya çareser kırına hemû gir û guruftên siyasi,abori û cıvaki yên İmparatoriya Osmani dızani. Dı vi wari de weha dıgot : "Hasıl, çara van halan tev, qanuna esasi ye dı welatê me de. Dema qanun bê danin, êdi bı wi awayi hemû gel jı huquqê xwe emin dıbe, êrişa Sultan a bı qaim û ên memurên wi namine û êdi misyoner ji, inada jı gel re tu cara nabinın, heta dewletên xerib ji mudaxele û têkıli xwe bı me nakın."(39)

Rojname jı bo ispat kırına bir û raya xwe, Japoniya misal daye, ku jı ber danina meşrutiyetê jı mêtıngehkari û jêrdestiyê rızgar bûye. Jı ber vê giyanê, rojnamê, geleki parlamentoya sala 1876 an parastiye. Dı çend hejmaran de, çend rûpel veqetandiye jı bo jiyana têkoşina Mithat Paşa yê bavê Meşrutiyeta Tırki, wan gotaran bı nav û nişana Mithat Paşa belav kıriye. Jı derveyi jiyana vi têkoşeri, Kurdıstanê behsa evi ji kıriye, ku bı çı fêl û dafıkan, Sultan, Mithat Paşa kuştiye. Kurdıstan weha nıvisiye :"Xwedê rehmetê lı wi paşayi bıke, Xwedê cezayê Sultan bıde, Xwedê wi jı ser vi mılk û netewi hıline, ku musılman hemû jı wi xelas bın". (40)

Rojnamê pır caran behsa mesela Ermeniyan û peywendiyên wan bı mesela Kurdan re dıkır. Kurdıstan dawa lı Kurdan dıkır,ders jı rojên derbasbûyi yên nêzik wergırın, dı wan deman de, ku Sultan tehrik dıkır û dıxwest wan bıke dı-

---

(38) Kurdıstan 1902, hej. 30.

(39) A.n.d., rûp. 2

(40) Kurdıstan 1900, hej. 25, rûp. 2.

ji Ermeniyan. Rojnamê, qimeteki mezın dıda mesela peywendiya van her dû netewan. Jı ber ci bı ci kırına û pêşve bırına vê meselê, tesira peywendiya siyasi û ideoloji ya navbera derkerên rojnama Kurdıstan û multeciyên siyasi yên Ermeniyan lı derve dewreki wan aktif lıebû.

Rojnama Kurdıstan, behsa zept kırına mafên Ermen û Kurd dıkır û jı bo vê dı gotarekê de weha dınıvisand : ''Eva çendin sale ku Kurd û Ermen geleki zılmê jı destê memurên dewletê dıbinın. Ew, hemû tıştan dıkın, jı bo, xwe jı zılma memuran xelas kın. Ew memurên ku tên, çıqas jı wan tê, ew qas zêde xırabi lı Ermeniyan dıkın. Dıvê Kurd ji Ermeniyan nekûjın, Xwedê ji vi hali ne raziye, Ermeni mezlûm ın''. (41)

Dı gotareke dın de, lome lı wan Kurdên ku eziyet lı Ermeniyên dı nav wan de rûdının dıke û dıbêje : ''Cahılên Kurdan nezan ın, Ermeniyan dıkûjın, ev hal jı Kurdan re geleki xırab e. Dıvê ulema jı Kurdan re bêjın, ev hal qatıli ye, dıvê Kurd xwe jı gunehan bıparêzın. Dıvê Kurd ji bı Ermeniyan re ittifaq bıkın, wan memurên ku Sultanê xwinmêj û zalım rêdıke ser wan; ewan jı ser xwe bavêjın. Dı şûna hûn bıçın hewara Ermeniyên mezlum de, hûn dıçın wan dıkûjın!''(42)

Rojname, dı hejmarên xwe yên destpêkê de, tenê eriş bo der û dora Sultan bıriye, dı dawi de, Sultan bı xwe alozixwaz û dıjmınê hemû netewên İmparatoriya Osmani daye naskırın : ''Abdulhemid dıbêje ku Ermeni neyarê we ne, we bı vê xeberê dıxapine, ma hûn nızanın ku Ermeni nıkarın neyariya we bıkın? Neyarê we ew Sultan e...''(43)

Kurdıstan, propaganda xebata Ermeniyan dıkır û dı-

---

(41) Kurdıstan 1898, hej. 7, rûp. 2-3.
(42) Kurdıstan 1899, hej. 11, rûp. 3.
(43) Kurdıstan 1901, hej.27, rûp. 1.

xwest Kurd û Ermen dı xebateke hevkari de nêzikatiyê bı hev re pêkbinın û peywendiyek şıdıyayi bê çêkırın.Mıl daye ber yekitiya her du netewan û pêşve bırına armanca her dû aliyan zaniye û nıvisiye : "Heke ev halê han wıha dom bıke, Kurd ji, jı vê zılmê re tehemmul nakın, wê bıbın hevalê Ermeniyan û bı hev re dıviyahiyên edaletê bıxwazın." (44)

Xwendewanên rojnamê, pıştgıriya vê rewşê kırıne ewan ji naman şandıne û peşniyar kırıne ku rojname banga bıratiya Kurd û Ermen lı dıji zılm û zora Sultan belav bıke. Mele Salıhê Cıziri dı nameke xwe de, behsa siyaseta ne rewa (ne heq) a Sultan kıriye û daye xweya kırın ku, Sultan ka bı çı awayi dıvê Kurd dı nezani û belengaziyê de bıminın.

Weha nıvisiye : "Em sehdıkın ku lı hemû deran dıbıstan hatıne çêkırın, wextê wê hatiye. Dı welatê me de tu afırandıneki pêşkevti tune, ev rewşa han ji dıde xuyakırın ku Sultan navê Kurd bıpêşkevın û dıvê ku em jı hemûyan kêm bıminın. Her Kurdan jı bo kuştına Ermeniyan tehrik dıke. Em icar zanın ku Ermeni mezlum ın, me armanca wi zani, ew dıxwaze em her dı halê hovitiyê de bıminin." (45)

Rojname, jı bo deşifre û rezil kırına siyaseta Sultan û ya dar û dezgehên wi, çı jı dest dıhat paş de nedıhışt, her wıha sebebên perçe bûn dıjitiya navbera Ermen û Kurdan dıda xûyakırın. Kurdıstan , dı gotarên xwe de, zêdetır dıqqetê dıkışande ser siyaseta wan dewletên Avrupayê ku dıxwestın netewên pıçûk bıkın qurbana daxwaza menfeeta xwe.(46) Dı gotara Roja Îro û Rojên Bên Kurdıstan de, rojnamê xwestiye, bı hemû mılan de bı awayeki kûr peywendiyên

---

(44) Kurdıstan 1899, hej.13, rûp.2.

(45) Kurdıstan 1899, hej. 14, rûp. 2.

(46) Kurdıstan 1901, hej. 29.

her du mılan; ên Kurdan û Ermeniyan û sebebên wan bıxe ber çav ku, dı wê qonaxê de rola wê kıfş bû. Her dı wê gotarê de, rojname, wan Kurdên ku aliyên Sultan dıgırın û Ermeniyan dıjmınên xwe dızanın, gunehkar dıke, dı aliyek dın de ji, wan Ermeniyan gunehkar dıke ku hemû Kurdên musulman pışgırê Tırkan dızanın. Dı dawi de, behsa rewşa Rusya û İngiltere ji kıriye ku, feyde jı dıjmınatiya Kurd û Ermen werdıgrın û evê sebebeki xıstına rejıma Sultan dızanın. (47)

Lı derveyê van meselan, Kurdıstan bı dırêjayi behsa Suwarê Hemidi û derbarê pisiyên wan leşkeran kıriye û wê gotarê ji, jı ber gırıngiya wê, bı tırki û kurdi belav kıriye. Rojname, gotınên Sultan derew derêxıstiye; guya, vi leşkeri jı bo parastına welat ava kıriye. Van gotınên Sultan û daxwaz û armancên wi xıstiye ber çav nıvisiye: " Armanca danina wan suwaran ev e ku, wextê Ermeni jı zılma hukumetê gelek bêzar bın û Kurd ji jı ber zılma hukumetê xwe bıdın mılên Ermeniyan û her du bı ıttıfaq dest hıldın, dıbe tehlikek gırıng, jı ber vê, Zeki Paşa vê pêşniyarê pêşkêşi Sultan kır û jı bo danina van alayan izın xwest..."(48-49)

Rojnama Kurdıstan, her wıha roleki baş ji dı pêşvebırına edebiyata Kurdi de listiye.Lı ser rûpelên Kurdıstan afırandınên edibên Kurdan hatıne belav kırın û dı hejmarên dawiyê ên rojnamê de hınek rıstên jı destana Mem û Zin a şaırê mezın ê Kurd ; Ehmedê Xani hatiye belav kırınê. Belavbûna vê destanê ne tenê dıqqeta Kurdan, lê belê, ya Avrupayiyan ji kêşaye. Jı bo misal; rojhılatnasê bı nav û deng Martin Hartman wıha nıvisiye : "Rojnama Kurdıstan, yekem ta-

---

(47) Kurdıstan 1902, hej. 30.

(48) Kurdıstan 1901, hej. 28.

(49) Kurdıstan 1898, hej. 1.

qikırdınewey pır gırıng û bı qimet bû, mın wê gavê bı xwe dit, dı hejmara duduyan de dest bı belavkırına Mem û Zin ê buye û wê geleki dılê mın xweş kıriye".(50) Rojnamê, helbestên şaırê rewşenbir ê netewa Kurd, Haci Qadırê Koyi ji belav kıriye. Xwediyê rojnama Kurdıstan dıxwest bı dıl û can, ber du zaravan; kurmanciya jor û jêrê, edeb belav bıke. Miqdat Bedırxan dı hejmara duyem de bı serbılındi behsa rûmet û hêjatiya afırandınên du şaırê klasiki yên Kurd Xani û Haci Qadırê Koyi dıke û dı eyni hejmarê de ji helbestek Haci belav kıriye. Dı wê helbestê de Haci pır bı berêz û bı gırami behsa qimeta afırandınên Xani dıke. (51)

Dı çend hejmaran de, hınek afırandınên diroki û çend rûpel ji lı ser Şerefname ya Şerefxanê Bıtlisi û her weha derbarê Bedırxaniyan ên bapirên xwediyê rojnamê hınek tışt hatıne belav kırın. Wan namên jı bo rojnamê hatıne, rûmet û ciyên rojnamê dı nav gel de dıde ber çav. Jı bajarê Musıl, Cızirê, Sılêmaniyê, Şam, Edene û bajarên dın, name jı bo rojnamê hatıne. Dı van naman de behsa zor û zehmetiya jiyana cıvaki dı İmparatoriya Osmani de, aloziya kar û baran hatiye kırın.

Dı sala 1902 an de, meşa (rêveçûna) ideoloji û şıklı(teşeyi), hûnera rojnamê baş kıriye û bı awayek roni derketiye. Jı aliyê rojnamê ve çareserkırına van meselan, belgeki şarezati û têgehıştına siyasi ya Abdurrehman Bedırxan e. Ciyeki Kurdıstan bı taybeti û kıfşkıri dı nav multeciyên Tırk û Ermeni de hebû.Ew babet tıştên ku dı rojnamê de hatıne belav kırın ispat dıke ku, Kurdan ji dı warê rêxıstıni û çapi de jı gelê Tırk kêmtırin xebat lı dıji Sultan û dar û destên wi ne kırıne. Xebata ideoloji ya tevgera azadixwaza Kurd tê-

(50) M.Hartman, Zur Kurdıschen Literatur, s.112.

(51) Kurdıstan 1901, hej.29.

kili xebata pêşkevtixwazên hemû netewên dın ên İmparatoriyê bû bû.

Jı ber wê rewşa siyasi -cıvaki, dı hındûre İmparatoriyê de rewş baş nebû. Çapên Kurdi lı derve, lı Qahirê û bajarên Avrupa çavên xwe vekır û xebata bızavi a xwediyê rojnama Kurdıstane bû yekemin çıra (meşale) hılgırê rewşenbiri. Ewi xebata xwe bı tundi bı xebata multeciyên Tırk, Ermen û Ereb ve gırêdabû. Programa siyasi ya rojnama Kurdıstan ji, wek hemû rêxıstınên dıji Sultan, xıstına rejıma Abdulhemid û dı welat de tetbiq kırına meşrutiyeta 1876 bû. Kurdıstan minberek tevgera azadixwaz a Kurdan bû, dı dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de, xebat dıkır dıji zılm û zordariya cıvaki û netewi.

Kurdıstan dı destpêkê de, wek rojnameke liberal derket û dı dawi de ji şıkleki radikali wergırt. Ev ji mumkune bı tesira pêşveçûna tevgera burjuvazi liberal a Tırk bû,ku dı wi wextê lı derve,bı temami lı ser riyeki liberal xurt dıbû.

Derveyi rojnama Kurdıstan , siyasiyên Kurdan ên lı derve gelek bang û belavok derêxıstıne. Hınek jı wan bı wasıta weşanên Ermeniyan mane, lê pıraniyan wan ji wında bûne. (52)

Wan belavokan bı xurti tundi êriş dıbırın ser dewletê; jı

---

(52) Heya nıha 31 hejmarên Kurdıstanê ketıne berdest. Ne hêsane ku em bıkarın qonax bı qonax behsa wê bıkın. B.Nikitin wıha dıbêje: "Tê gotın ku pıştî şoreşa Tırkên Cıwan bı serokatiya Sureyya Bedırxan bırayê Ebdurrehman Bedırxan, carek dın Kurdıstan hatiye derêxıstın. Dı destpêkê de lı İstenbul û pıştî Şerê Cihanê ê Yekem lı Qahire derketiye." B.Nikitin, Kurd, Moskova 1946. Her wıha nıvisandına lı ser qonaxên Kurdıstanê mumkun nîne, jı ber ku heya nıha hejmarek jı wan nehatiye ditın.

bo misal; ewên ku dı sala 1898 an de hatıne nıvisandın, bı vi awayi bangi netewa dıkın: "Geli Kurdan! Dem dema zaninê ye, wextê camêriyê çû, iro xelqê alemê hemû dıxwinın, bı xwendınê zanin çêdıbe, qet nebe, disa jı ber sebebê xwendıne hemû mafên xwe dıstinın û azad dıbın. Netewek ku nexwine dıbe xulamê alemê. İro hûn xulamê hukumetê ne; hukumet perê xwe dıstıne,hûn jı sıbê heta êvarê dışıxûlın dıstinın şeş pere, ewi ji dıdın hukumetê. Wan perên hûn dıdın hukumetê, hukumet dıde zeptiyan, memur lı ser perên we dıjin. Ew zepti û memurên ku her roj zılmê lı ser mala we, lı ser jına we, lı ser xwişka we û qiza we dest dırêjiyê dıkın, hûn nıkarın deng bıkın. Çıma jı mervê hukumetê re dengê xwe na kın? Loma, carekê aqılê xwe berhev bıkın, bızanın ku ew koşka xulamê we ye, jı bo wi pere jı maaşê xwe hûn dıdın...

"Geli kurmancan! Mêran berhev bıkın, herne qonaxa hukumetê, çı jı perê we dıbe bıpırsın, hukumet mecbur e guh bıde axaftına we, eger guh nede, çekên wê jê bıstinın isyan bıkın û zalıman bıkûjın..."(53) Dı wê belavokê de ne her tenê jı bo hinbûna xwendewari û qimeta zanısti yê,bangi Kurdan dıke, raste rast doza serihıldanê ji lı wan dıke.

Her dı vê belavokê de ji, qimetek bı temam dıde wê,ku pêwıste netewên bındestên dewleta Osmani hev bıgrın û behsa yekiti û xebata hevkariyê dıke, Ermeniyan bo misal tine û dıbêje:"Jı Ermeniyan bıpırsın ku hun çıma radıbın?Ew dê jı we re bêjın, rabûna me,jı ber zılma lı Ermeniyan tê kırın,jı ber vê zılmê ye em radıbın,xwina xwe dırıjinın. Hûn çıma dısekınin, hûn ji bı mıl û mılê Ermeniyan rabın, hukumet nıkare tışteki jı we bıke, ez jı we re rastiyê dıbêjım, ez

(53) Dıruşak 1898, Heziran, hej.6, rûp.51.

jı rastiye hes dıkım,jı we re dıbêjım ku hukumet dıjmınê mal û canê me ye. Hemû bı hevre rabın, hûn çıma dısekının? Silah û cebırxanan bıgrın, iro ne behsa din e, iro behsa insaniyetê ye.

"Çara xelasiyê ew e, ku em dest bıdıne silahê insaniyetê". (54)

Ev belavokên han, bı rojnama Kurdıstan re, wek rojname û weşanên Tırkên Cıwan û rêxıstınên Ermeniyan ên dıji Sultan, bı awayek dızi dıgihıştın Kurdıstan. Her wek me beri nıha ji behskır, Abdurrehman Bedırxan berpırsiyarê rojnamê bû û bı dılxwazi û bızavi alikariya rojnama Osmanli, organa Tırkên Cıwan Lıqê Cenevrê dıkır.(55) Hêjayi gotınê ye ku,dı nav sefên serokên partiya İttihad û Terakki de Kurdên wek İshaq Sukûti Efendi (56) û Abdullah Cewdet hebûn. Dı sala 1900 an de, dı hejmarek rojnama Nurdar a Ermeniyan de, behsa Abdurrehman wek "serokeki bızavi û xebatkar ên Tırkên Cıwan lı derve" tê kırın.(57)Her wıha peywendiya Abdurrehman lı gel rêxıstınên

(54) A.n.d., rûp.51-52.

(55) Pro Armenia 1900, N.4, rûp.37.

(56) İshaq Sukûti (1862-1902), xelkê Diyarbekrê ye, gelek salên xwe lı Cenevre derbaz kıriye, pır bı bızavi alikariya derketına rojnama Osmanli kıriye,lı San Remo dı rewşek feqiri û belegazi de mıriye.Dı Ansiklopediya Tırkiyê de, bı xelet hatiye nıvisandın ku sala 1903 an mıriye. Bınêre; Türkiye Ansiklopedisi, Ankara 1956, C.I, rûp. 186. Pıştî şoreşa Tırkên Cıwan, dı sala 1909 an de, cenazê wi anine İstenbul û bı qedır û gıramiyeki pırmezın hatiye veşartın.

(57) Nurdar 1900, hej. 226, 13 yê Kanuna Yekem.

Ermeniyan ji hebû.

Dı dawiya sedsala 19 an de, dı meydana tevgera azadixwaz a Ermeniyan de, çendin rêxıstınên siyasi û partiyên dızi ku xwediyê bı dehan organan rojname û kovar- hebûn û xebat dıkırın.Dı nav wan de partiya Taşnaksutyun, berpırsiyarê burjuwaziya netewi ya Ermeniyan bû. Dı nav Ermeniyan de rolek wê bı tesir û ciyeki wê ya bı bıha taybeti hebû. Peywendiyên wê partiyê, lı gel têkoşerên Makedonya, Tırkên Cıwan, Ereb û Kurdên dıji Sultan hebû. Rûpelên organa Dıruşak , her wext gotar û axaftınên serokên siyasetan belav dıkır û roleki wê aktif hebû jı bo hêzên dıji Sultan bıke yek, wê rejıma kevneperest a Sultan jı ser kar û xebatê bıde aliki.

Dı salên 1899-1900 an de, dı rojnama Dıruşak de, dı quncıkê Guherinên Siyaseta Nû Lı Tırkiyê de, çendin car gotar û axaftınên serokên rêxıstınên dıji Sultan hatıne belav kırın.Dı hejmarekê de,bı imza Kurdek*(58)gotareki pır baha belav bûye û dı wê gotarê de behsa xırabiya dewra Sultan hatiye kırınê ku ewi dûbendi xıstiye navbera Ermen û Kurdan. Gotarê doza yekiti û bıratiya Ermeni û Kurdan kıri ye. (59)

Abdurrehman bı rojnama Kurdıstan re, bı postên Ermeniyan wan belavokên ku bı xwe dınıvisand, dışand Kurdıstanê.Yek jı wan belavokan dı rojnama Dıruşak hejmara çaran ya sala 1900 an de daye belav kırın.(60)Hınek nıvis-

(58) M.Varandiyan, dı biraninên xwe de nıvisiye; Abdurrehman gelek car dıhat ciyê karbıdestê rojnama Dıruşak. Bınêre; Naverok û stilên gotaran. Bı a mın, dıbe ku Abdurrehman van gotaran bı xwe nıvisibe- Nıviskar.

* Kurdek (Bir Kurd), ev nav ê Abdullah Cewdet e. Dı dewra rojnama Osmanli de wi gelek caran bı vê imzê, makale jı rojnamen dın re dınıvisand. Pışti Mutareka 1918 ji lı İstenbul bı vi navi makalên wi dı kovara "Jin"ê de derketıne. (N.M.)

karê rojnamê pêşgotın jı bo vê belavokê nıvisandıne û tê de weha gotıne : "Nêziki 500 lıb jı wan belavokan bı Tırki û Kurdi, çar meh beri nıha hatiye şandın jı bo redaksiyona Dıruşak . Vê banga han ajardaneki (geşbûn) nû ye dı lêkolina Kurd de. Ev belavok pışti dı hemû rojnamên Ermeniyan de û dı nav Kurdan de belav bûye em wê çap dıkın." (61)

Dı wê belavokê de behsa pêwıstiya belav bûna xwendewari, hişyarbûna cıvaki-netewi û problemên cıvaki, tehdayi û inkar kırına mafên netewi û riya rızgarbûn û xelasiya jı wan zılm û zordariyan hatiye kırın. Belavokê, bı giyana bırayeti û xebata bı hev rê ya ciranên Kurdan, bı taybeti bıratiya lı gel Ermeniyan dıji zılm û zordestiya Tırkan nıvisi ye.

Abdurrehman, lı ser warê bızavi, jı bo hemû endamên komelê nesihet dıkır û weha dıgot : "Hemû mırovên vê demê, lı pey vi tışti ne ku hebûna xwe bıdın ispat kırın, kes nıkare bı tenê bıji, herkes hewceyê peywendiya gelên dın e û hewceye ji peywendi peyda bıke. Ew ji bı vi awayi pêviste; hemû hêzên xwe dı riya komelên xwe de bıxın kar, şeref û navên xwe bıparêzın. Hewceye dahatûya xêzanên(zar û zêç) xwe temin bıkın, ax û welatê xwe jı dıjmınan bıparêzın." (62)

Mesela xwe bı xwe xebat kırın dı nav Tırkên Cıwan de pır belav bûbû, bı taybeti ji, serokê eniya meşrutiyetxwazan Sabahattin vê bir û baweriyê, bı tesira sosyalistên pêşeng ên Fransi, wek; Frédéric Le Play û Edmond Demolins

---

(59) Dıruşak, 1900, hej: 1. Kanuna Duyem, rûp. 3.

(60) Dı sala 1900 an de, dı kovara Pro Armenia de, kurtiyek wê gotarê bı fransızi hatiye belav kırın. Bınêre; Pro Armenia 1900, N.12, p.92.

(61) Dıruşak 1901, hej. 4, Heziran, rûp. 67.

(62) A.n.d., rûp. 67.

lı ser wan hebû û lı gora wê xebatê belav dıkır. Bir û baweri ji dı wê de bı xwe derdıket ku, pêwıste xêzan paşda bên anin, lı ser bıngeha mılên cıvaki, gel jı bo giyana kar kırın û bı xwe bı xwe xebata baş û lı ser camêriyê bên terbiye kırın."(63) Abdurrehman, lı dıji nezanin, xebatnekırın û tıraliyê weha nıvisiye : "Derveyi xızmeta Abdulhemid û memurên wi yên zorker ku jı şarıstaniyet, zanin û serbestiyê we dûr dıxın, bı gunehkariyek neheq navê we xeradıkın, jı bılê vê hûn çı dıkın? Jı bo çı têkoşin nakın?! Hemû daxwaza Sultan ew e ku we dı nezanin û paşvemayinê de bıgre, ew rutbe û madalyayên dıde, her weha ne belaş ın, ew dıxwaze çanda netewi û rojên bên bıke qurbana van tıştan."(64)

Dı derbarê peywendiya Kurd û Ermeniyan dı dawiya sedsala 19 an de, Abdurrehman xwestiye perda ser rûye siyaseta fêlbazi û pilanên Sultan yên dar û destên wi rake. Gelek mıxabın, behsa rewşa hınek wan eşiretên Kurdan bı şermezari kıriye ku, ew bı pilanên Sultan hatıne xapandın. Şêx û kesên bı nav û deng ên Kurdan ji gunehkar kıriye. Kesên karker gundiyên bê xwenda bê guneh nıvisiye. Serokên wan xırabiyan bı pırani serokên eşiretan zaniye û daxwaza xelaskırına aloziya lı gel Ermeniyan kıriye. Abdurrehman, yekitiya hemû kesên bın destên Tırkan, alikariya pêşveçûna hemû azadixwazên wan netewan, alikariya netewa Kurd dızani. Ev bir û baweri û bangên Abdurrehman lı ser rûpelên rojnamê belav dıkır, bı taybeti rewşa welatparezên Kurdan bû. Hewceye neyê wê manê ku raya hemû welatparezên Kurd wek hev bû. Wek minaki; peyamnêrê rojnama Ma-

(63) Y.A.Petrosyan, Şoreşa Tırkên Cıwan, Moskova 1972, rûp. 252.

(64) Dıruşak 1901, hej.4, Heziran, rûp. 67-68.

tin lı Londrayê hevpeyvinek bı bırayê Abdurrehman, Osman Paşa re çêkıriye. Osman Paşa bı awayek dın behsa mesela Kurd kıriye. (65) Rojnama Nurdar , behsa wê hevpeyvinê kıriye û dı wi wari de weha gotiye : "Demek beri nıha General Osman Paşa, kurê cigırê emırê Kurdıstanê, jı Selanik hat İngiltere."(66) Hevpeyvina Osman Paşa bı tevayi dı kovara Pro Armania ku lı Fransa derdıket hatiye belavkırın. Wê pêşgotına jı bo hevpeyvinê hatiye nıvisandın weha dıbê : "Osman Paşa jı Tırkiyê reviyaye, jı ber ku, fermana Sultan ci bı ci nekırıye û ne şexseki wısa ye ku lı rexeki ji bısekıne.Osman Paşa weha dıbêje:Çendin sale jı bo yekitiya xebata Kurd û Ermeniyan dıji zılm û zordariya Sultan bê rawestan xebat çêbûye. Axaftına xwe bı vi awayi dıdomine; Kurd û Ermeni bı dızi çekdar ın, tenê çaveriya vegerandına mın dıkın, em ê êrişeki bı tırs û bı tesir bıbın ser Tırkiyê ku dı diroka İmparatoriya Osmani de nehatıbe sehkırın. Hêviya mın ew e Kurdıstan jı bın vê rewşa abori ya xırab ku, sebebê wê zılm û zora dewleta Tırk e, bê xelas kırın. Wê dewleta ku dıxwaze dı Tırkiyê de bı hukmeki mutlaqi Kurdan bê maf bıhêle û tenê wan jı bo menfeeta xwe bı kar bine."(67) Bê guman, van bir û rayên Osman Paşa zêdetır meseleki şexsi û bir û raya wi bı xwe bû û ew ji ne zêde gıring bû.

Dı wextê xwe de, redaksiyona Pro Armenia û Abdurrehman Bedırxan ji dıqqet kışandıne ser vê rastiyê.Lêbelê, gırıngiyek dın dı wê hevpeyvinê de ci gırti ye, ew ji wê hışyariya siyasi ye ku, mesela hevxebata Ermeni û Kurdan, têkoşerên Kurd dı ser hemû meselan re gırtın e.

(65) Pro Armenia 1900, hej. 3, rûp. 20.

(66) Nurdar 1900, hej. 228, 16 yê Kanuna Yekem.

(67) A.n.d.

Cirantiya Kurd û Ermeniyan û hevsınoriya wan dı rojhılata İmparatoriya Osmani de, peywendiya jiyana abori-siyasi wısa lê kıriye ku, xebat û tevgerên xwe bıkın yek. Hukumeta Sultan, car carnan jı ber sebebên dini ve karibuye çend serok eşir an qebilên Kurd bıke dıji Ermeniyan. Ew ji zêdetır zerara wê ne tenê jı bo tevgera azadixwaza Ermeniyan bû, jı ber ku Kurdan ji zırarên mezın jê ditıne. Ew bûye astengek dı riya her du netewan lı dıji Sultan de, ku hev bıgırın. Sultan lı ser vê tenê nesekıniye, dıjiti xıstiye navbera eşiretên Kurdan, jı ber ku, ewi dızani eger yekbın mezıntırin zehmeti û zoriya jı bo İmparatoriya Osmani çêdıkın, dûr nine bıkarın xwe jı zılm u zorê azad bıkın.

Rêxıstınên burjuvazi yên Ermeniyan ku lı derve dengeki baş dabûn ew dengdan destpêkek pır bıqimet bû jı bo yekiti ya Kurd û Ermeniyan. Nemaze jıbo xemlandına bir baweriya azadixwaza netewa Kurd ku ew tevger ketıbû warê geşbûn û pêşveçûnê. Her du netewe ji bındestê zılm û zora Tırkan bûn, jı bo wê ji, çı Kurd û çı Ermeni, çı lı hındûrê welat û çı lı derve xebata bızava xwe kırıbûne yek.(68)

Dı destpêka sedsala 20 an de, weşan û rojnamenıvisên Ermeniyan, rûmetek gırıng dıdan van xebatan. Rojnama Dıruşak , behsa rewşa . diroka bıratiya her du netewan bı vi rengi dıkır : "Mesela bıratiya Kurd û Ermen û xebata wan bı hev re ne perçek jiyana nû ya naha ye. Bir û baweri û nêrina Nêrsisa Varjapıtina Mıkırdiç Xırmiyan û kesên dın baştırin gav û belga heqiqeti ye û agahdariya pır kesan ji jı vê rastiyê heye."(69)

---

(68) Behsa peywendiya Ermeni û Kurdan, meseleki serbıxwe û fıre ye û meseleki mezın û bıngehin e û ew kar ji ne karê mın e - Nıviskar.

Zana, serok û mırovên bı nav û deng ên Ermeniyan an ji ên Kurdan, bahayeki gırıng dane xwendınê. ''Mıkırdıç Xırmiyan, dı biraninên xwe de dıbêje ku,pêşniyar kıriye jı bo dewletê û dozê jı wan kıriye ku, xwendewari dı nav Kurdan de belav bıbe û lı gundên Kurdıstanê dıbıstan bên vekırın.Koşka Sultan bersiva wê pêşniyariyê nedaye û jı ber vê, rewşenbireki Ermeniyan M.Petrogaliyan, wê dı rasteqiniya jiyani de bı ci aniye û çend zarokên Kurdan bı zarokên Ermeniyan re qebul kıriye dıbıstana xwe.(70)

Dı sala 1904 an de, dı kombûnek gıştî ya partiya Daşangışık de behsa yekitiya her du netewên bın destên hukmê Tırkiyê hatiye kırın. Doz lı komita herêmi hatiye kırın ku programeki xebati dı vi wari de amadebıkın. (71) Partiya Xınçak , jı nunerê xwe yê Qahirê Agop Gazariyan re gotiye ku dostiya têkoşerên Kurdan bıke û peywendi bı wan re dabımezrine.(72)

Agop Şehbaziyan û Karapêt Nataniyan hewl û xebatek mezın dan jı bo ku dı Wanê de rêxıstınên herêmi yên Er-

---

(69)Dı sala 80 i sedsala 19 an de,bı alikariya Mıkırdıç Xırmiyan, bı sedan Kurd jı bırçiti û mırınê hatın xelas kırın. Bınêre; Dıruşak 1901, hej. 4, Heziran, rûp. 65.

(70) Şahbaziyan, Diroka Kurd û Ermeniyan, İstenbul 1911, rûp. 166.

(71) Dıruşak 1906, hej. 9, 15 yê Kanuna Dûyem.

(72)A.Gazariyan,pışti damezırandına kırdayeti ya Sovyetê lı pışt Qafqas, armanceki piroz û gıranbıha; armanca xwendewari û hişyar kırına zarokên Kurdan gırt ser mılên xwe. Bı alikari û pêşengiya wi camêri lı Tiflisê kutupxanek jı bo zarokên Kurdan hatiye vekırın û lı Ermenistanê ji buroşurek bı navê Roj û çendin kıtêbên dın hatıne çap kırın - Nıviskar.

meniyan, Kurdan û Tırkan bıkın yek. (73) Ew dıxebıtın ku xebata Kurdan û yên Ermeniyan lı dıji Sultan bıkın yek. Têkoşerên Kurd, dı bang, hawar û belavokên xwe de, siyaseta dijmınatiya navbera Kurd û Ermeniyan beşeki xırabiyê dızanin û lı dıji wê dısekının. Abdurrehman Bedırxan, dı wê meselê de hınek serok eşiretan gunahkar dıkır ku ew bı fêl û keminên Sultan hatıne xapandın. Daxwaza yekitiyê jı her du netewan dıkır û dıgot; tenê riya serkevtın azadbûna jı perçıqandın û zordariya cıvaki ew yekiti ye.(74)

Her wıha rojnama Dıruşak dı nêrina xwe ya dı wi wari de, weha dıda xuya kırın : "Jı bo menfeeta her du gelan e û jı bo vê têkoşin tê meşandın. Ev hewl û xebat wusa dıke ku Ermen û Kurd dı rewşên baştır de pêşve bıçın û bıbın yek perçe."(75)

Kuştına Ermeniyan dı dawiya sedsala 19 an de lı Sason, kareki pır mezın xıstıbû ser mılên têkoşerên Ermeni û Kurdan. Ewan bı hev re hewl û xebat dıkırın ku ew bûyer ducar nebe. Jı ber vê yekê ji gavên gelek baş avêtın. Lı ser gotına Linc (76) hewl û xebata Gençakyan lı bajarê Bitlisê , Ermeni û Kurdan lı dıji perçıqandın, tehdayi, zılm û zora dewletê kırıbû yek û ewan nerızayiyên xwe dan xûya kırın û baca miri nedan. Her wıha propagande û pır bang ji lı nav danıştıwanên Kurd û Ermeni yên Sasonê dıhat belav kırın. Heta hınek eşiretên Kurdan, memurên Tırkan bı vi tış-

---

(73) A.Şahbaziyan,Diroka Kurd û Ermeniyan,rûp.166-167.

(74) Dıruşak 1901, Heziran, hej. 4, rûp.65.

(75) Dıruşak 1901, Kanuna Dûyem, hej. 1, rûp. 5

(76) X.F.Linç, Ermenistan, C.II. Tiflis 1910, rûp. 202-203. Bınêre; G.Aronsi, Serihıldana Sasonê, Cenevre 1903, rûp. 14.

ti gehandıne ku, eger netewên ciran jı bo mafên xwe seri hıldın, dê ew yarmetiya çekan jı wan re bıkın. Jı bılı vê; gelek jı wan Kurdan bı qimeta yekitiya Ermeni û Kurdan tê gehiştibûn û dı nav rêxıstınên Ermeniyan de dıxebıtin. Dı nav Kurdan de komite û hucrên wan rêxıstınan avakırıbûn.(77) Gelek jı wan eşirên Kurdan lı ber fermana Sultanê Tırkan seri hıldan û mıl dane ber Ermeniyan. Dewletê lı hınek herêman raste rast bı xwe şer saz nekırıbû, wê bı wasıta Arximandırita Vardına û Kurdeki bı nav û deng şer rakırı bû.(78)

Konsolosê İngiltere yê Erzurum, dı nama xwe ya 16 yê Çırya Paşin 1903 an de lı ser nizikatiya Ermen û Kurdan bı vi awayi nıvisi bû : "Bı awayeki gıştı ev çend mehên dawiyê daxuyaniyek nû dıqqeta mın dıkişine. Ew ji bı taybeti mesela yekitiya Kurd û Ermen e. Ev bûye sebebeki gıring ku vê havina han dewlet êrişê nebe ser Sason ê, sebebê wê ji rewşa Kurdan e. Jı ber ku, amade nebûn beşdari êrişa nav bırayên xwe bıkın. Komek nûnerên Fransayê ji bı awayek dın mın agahdar kırın e.Ew weha dıbêjın:Netica axaftın û muzakerên Kurdan û Ermeniyan, ew gıhiştıne vê bıryarê ku, dema dewlet êrişê bine ser Ermeniyan, Kurd dê bê teref bısekının, eger hewce bıke dê alikariya çekan ji jı wan re bıkın."(79)

Rûmeta bırati û hevxebata Kurd û Ermeniyan lı dıji fend û fêlên siyaseta Sultan, dı nav Kurdan de zêdetır belav dıbû. Rojnama Pro Armenia dı vi wari de nıvısibû ku: Serokên

(77) Rubin, Biranina Şoreşgereki Ermeni, Los Angeles 1951 C.III. rûp. 259.

(78) A.n.d. , rûp.261.

(79) Correspondence respeeting the Asiatıc Provinces of Turkey 1904, N.35, rûp. 9.

Kurdan ên der û dora Xarputê poşman bûne ku beşdari kuştına Ermeniyan bûne. Bı vê gıhiştıne ku menfeeta xwe bızanın û xebat bı bırayên xwe Ermeni yên bındest re bıkın. Lı dıji dıjmınê her du mılan, lı dıji Sultanê xwinrêj û Koşka Yıldız bısekının.(80)

Nûnerên diplomasiyên Avrupa, pır caran dı rapor û cıvinên xwe de lı ser xebata peywendiya Kurd û Ermeniyan axaftıne û sekınine.Raporên diplomatên İngilizan ên dı dawiya sala 1903 an de baş dıdın xuyakırın ku çawa Kurdên Sêrtê yarmetiyê jı bo wan fedayiyên Ermeniyan dane. Wextê eskerê Tırkan lı Sasonê der û doran gırt, çawa dı malên Kurdan de çakmaksazên (Çek çêker) Ermeniyan, tıfıng, çek û kar û barên şer ên dın saz dıkırın.(81) Qeymeqamê Bıtlisê dı 14 yê Nisanê 1903 an de telgrafek şandıbû İstenbul û weha gotıbû : "Komek jı Kurdan hatıne gırtın ku gumanê wan dı yarmetiya çekdana Ermeniyan de heye."(82) Konsolosê gıştı yê İngilizan A.Vıratislav dı nama xwe ya 28 ê Kanuna Yekem 1903 an de weha dıbê : Bı wasıta çend serok eşiretên Kurdên lı ser sınorê Tırkiyê û İranê, çek gıhiştiye destên Ermeniyên Tırkiyê".(83) Konsolosê İngiliz yê Wanê ji dı 11 Nisan 1904 an de weha nıvisıbû : "Tê gotın, ew şoreşgerên ku cılên Kurdi lı xwe dıkın berdewamın têne Wanê. Kurd ji amadene bı hemû awayan ku yarmetiya wan bıdın.Rê dıdın wan jı bo ku dı sınor de bıçın û bên û dıxwazın xebata xwe bıkın yek."(84)

---

(80) Un appel aux Kurdes, Pro Armenia 1900, N.12.

(81) Correspondence Respeeting .... rûp.9.

(82) Haydinik (Welat) 1904, hej. 285, 24 ê Kanuna Yekem (Bı Ermeni)

(83) Bınêre; Correspondence Respeeting...., rûp. 11.

(84) A.n.d. , rûp. 25.

Dewleta Tırkiyê bı hemû hêzên xwe ve lı dıji vê hevxebata Kurd û Ermeniyan dısekıni.Lı fırseteki dıgerya ku wan kesên bı tundi û tuji, bir û baweriya vê meselê gırtıbûne ser mılên xwe bıgre û ceza bıke. Jı bo minaki, Robinşişaniyan ceza kırın, jı bo ku dı nav Kurdên Dêrsımê de bı bızavi(aktifi) xebat kırıbû. Eskerên Tırkiyê êrişek bırıbûn ser gundên eşiretek Kurdan; Qasım Beg . Sebebê vê êrişê ew bû ku peywendiyek wani tund û xurt bı rêxıstın û şoreşgerên Ermeniyan re hebû. Eskerên Tırkiyê wàn gundan xıstın bın muhaserê û gelek jı wan gule baran kırın.(85)

Her wıha ev serekaniya han behsa vê meselê dıke û dıbê : "Hukumetê hewlê gırtına serok eşireteki Dûmılı (Zaza) Zeynel Beg kırıbû.Jı ber ku ew kesek bû ku bı bızavi bang jı bo bıratiya Ermen û Kurdan dıkır. Xebata yekitiyê dıkır. Çendin sal ev serok eşirê Kurd bı dızi lı Dêrsımê dıjiya, lê dawiyê bû qurbana pilan û fêlbaziya İttihadiyan".(86)

Çelengi û bızaviya hılgırên bira bıratiya Kurd û Ermeniyan berfırehtır dıbû û eşiretên nû lı der û dorên xwe kom dıkır. Lı bajarê Bıtlisê wê hevkariya bıratiyê bı eşkera xwe dıxıst ber çav. Konsolosê Rusya yê Tebrizê Şirkov nameki jı konsolosê Rusya yê İstenbul Zinoviev re şandiye û tê de weha dıbêje : "Mana bê dengiya vê havinê ewe ku Kurd dê bırati û hevkariyê bı şoreşgerên Ermeniyan re bıkın. Kurd, dı gelek herêm, bajar û gundan de mêvandariya şoreşgerên Ermeniyan dıkın , riyan nişani wan dıdın û xwarınê dıdın wan."(87) Dı wan rojan de bı taybeti jınên

---

(85) M.Varandiyan, Diroka Daşnaka Ermeniyan. C.I. rûp. 256. (Bı Ermeni)

(86) A.n.d., rûp. 257.

(87) Arşiva derve a Rusya, konsolosxana İstenbul 1905, D.1400, rûp. 42.

Kurdan rolên mezın dılistın. Şirkov weha dıbê : "Lı bajarê Bıtlisê polis jınekê bı dûwanzde batman barut ve gırti ye. Wê vê barutê jı yeki musulman ku navê wi Haci Mıhemed bûye kıriye. Dı navbera wan de ıttıfaqa barut durustkırınê hebû ye." Şirkov bı vi awayi dıdomine : "Ewan wısa kıriye ku, çı dewlet û çı Ermeniyên herêmê, têbıgehın ku Kurd yarmetiya çek û zexiran dıdın şoreşgerên Ermeniyan".(88)

Çavdêran dı biraninên xwe de nıvisandıne, ku çawa ideolojistên Ermeniyan dı gundên Kurdıstanê de bir û baweriya bırati ya Kurd û Ermeniyan belav dıkırın.Lı Muşê, Diyadin û dı nav deştê de propagande dı nav çiyayên Kurdan de ji dıkırın.(89)

Bırati û bı aşiti jiyana Kurd û Ermeniyan bı hev re, yekser tesir kıriye lı ser kırın û rewşa Suwarê Hemidiyê . Konsolosê İngilizan Tirvel , lı ser banga dewletê êrişa ku hatiye kırın ser Ermeniyan lı Basên, weha nıvisi ye : "Mın bıhisti ye ku hınek serokên Suwarê Hemidiyê sar bûne. Bangên êriş bırına ser Ermeniyan pıştgûh kırıne û gûh nedane bangên dewletê. Dı ber vê re ji çend talanên baş ji kırıne."(90)

Dı destpêkê de, peymana lı navbera Kurd û Ermeniyan bı tevayi baweri pê nehatiye kırın û hılgır û dılxwazên wê bir û baweriyê ji jar bûne.Aburrehman, dı wi wari de weha gotiye : "Ev dara han ku nû hêşin dıbe, hêvidarım ku ber bıgre, em pê bawerın û tu şıka me tê de nine, dı welat de emê bıkarın hêzeki mezın dıji Sultan bı kar binın".(91)

---

(88) A.n.d. , rûp. 43.

(89) K.Sasoni, Diroka Taron, Beyrut 1957, rûp. 266.

(90) Correspondence Respeeting.

(91) Dıruşak 1900, hej. 1, Kanuna Dûyem, rûp. 5.

## KOMELA HEVKARİ Û PÊŞKETIN A KURD
## (KÜRT TEAVUN VE TERAKKİ CEMİYETİ)

Dı sala 1905-1907 an de, çêbûna şoreşa demokrati-burjuvazi ya Rusya,netewên Asya hişyar kır.Jı bo rızgarbûn û xelasiya jı bın kırdayetiya derebegi-eskeri ya paşvemayi ya heymana sedsala navin,serihıldanên gelêri yên mezın dı nav wan de peyda bûn.Wan serihıldanan Tırkiyê,İran,Çin û welatên dın ên Asya ji gırte nav xwe.V.İ.Lenin,qonaxa bızaviya şoreşgeriya Asya "hişyarbûna Asya"bı nav kıri ye:"Şoreşa sala 1905 ya demokrati-burjuvazi a Rusya, bı yek cari Asya hişyar kır.Bı sedan milyon xelqên mezlum jı bın destên heymana sedsala navin a paşvemayi xelas bûn û berê xwe dan jiyanek nû. Dı riya mafên jıbirkıri yên mırovi de, dı riya demokrasiyê de dest avêtın xebat kırınê."(1)

Bızaviya tevgera şoreşger lı Tırkiyê, hemû netewên Imparatoriya Osmani han da (gıjkır), jı bo xebatek xurt lı dıji rejıma rıziyayi ya Sultan Abdulhemid. Ew rejım ku nav û nişana zordari û otokratiya Asya bû. Lı bajarên Bıtlis, Wan, Erzurum... wek minaki, dı warê siyasi de lı dıji Sultan gelek tıştên mezın çêdıbûn(2). Serihıldana sala 1905 ya

(1) V.İ.Lenin, Afırandınên Gıştî, C.23, rûp. 146.

(2) Y.A.Petrosyan, Dawiya Sedsala 19 an û Destpêka Sedsala 20 an de Tevgera Tırkên Cıwan, 1970, rûp. 46.

Kurdan lı Dersımê jı bal Ermeniyan pıştgıriyek baş gırt.Lı ser xebata çekdari ya her du mılan,Kurd û Ermen eskerê dewletê jı hındûrê Dêrsımê derxıstın.(3)

Kurd, lı dıji dewleta Tırkan hini cûre xebata xwenişandanên gelêri bû bûn. Dı sala 1906 an de, jı bo bersıva terora ku dewlet lı dıji Kurdên İstenbulê dıkır, Kurdan gelek xwenişandan û meşên gelêri saz kırın. Her dı wê salê de wan lı dû hev lı bajarê Bıtlisê êrişek mezın a gelêri Kurdi kırın jı bo ku memur û karbıdestên bertilxwar û destıkên Sultan jı ser kar bên rakırın. Ew xebat gihışte wê derecê ku xwenişandaran doza rakırına wali dıkırın. Dı wê êrişa çekdari de, gel dest dani ser telgraf û hınek dezgayên dewletê.(4)

Lı ser xurt bûn û pır bûna bızava gelêri ya nav gel dı hındur de,têkoşin û xebata dıji Sultan, a rêxıstınên derveyi welat ji tund, tuj û fırehtır dıkır. Hemû daxwaz û armanca wan ew bû ku bıkarın hêzên xwe bıkın yek û lı dıji rejıma Sultan wê hêzê bıkarbinın. Riya dıji Sultan, dı wan hal û rewşan de dı nav welat de şıkleki eşkere gırtıbû xwe. Eşkere belga vê nerızayiyê ji ev nama han e ku 28 serok eskerên Tırkiyê û nûnerên rewşenbiran şandıbûn jı bo xêzanê serokên serihıldana behra Siwastopol ,jı Şmêt re. Yên namê ımza kırıbûn du kes jı wan Kurd bûn. (5) Salên 1907-1908 qonaxa nû bû dı xebata parti û hêzên berxwedanên hındûrê welat û yên derve de. Dı sala 1907 an de, Komela İttihad û Teraqqi ya Osmani û Komela Azadi ya Osmani bûne yek.

---

(3) Bınêre; M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd,rûp.111

(4) Bınêre; Yakor (Keştiwan) 1907, 12 ê Tebax, hej. 4 (Bı Ermeni) Her wıha bınêre; E.K.Sarkisyan, Siyaseta Dewleta Osmani Dı Rojavayê Ermenistanê de, Êrivan 1972, rûp. 221.

(5) Bınêre; X.M.Tisevikiyan, Tesira Şoreşa 1905 a Rusya lı Tırkiyê, Rojhılatnasên Sovyetê, C.III, 1945, rûp. 21.

Turknasê Sovyeti Y.A.Petrosiyan lı ser wê weha dıbê :"Dı vê qonaxê de rêxıstınên netewên dın ên ne-Tırk, dı İmparatoriyê de, nêziki Tırkên Cıwan bûn û vê nêzikatiyê, bıngeheki rasteqini û esasi durust kır. Jı bo vê ji Tırkên Cıwan, parti û rêxıstınên netewên dın konferansek gıŞti çêkırın jı bo ku dı hemû mılan de pıştgiriya hev bıkın."(6)

Dı 27 û heya 29 ê Kanuna Yekem a sala 1907 de, lı Parisê Kongra Dûyem a Tırkên Cıwan çêbû. Dı vê Kongrê de nunerên hemû mılan yên parti û rêxıstınan beşdar bûn. Wê koma Kurdan ku lı der û dora rojnama Kurdıstan cıviyabûn, dı bın serokatiya Abdurehman de beşdari kırın. Her weha Kurd û Tırkên lı Amerika dıjiyan beşdari kongrê bûn. Hêjayi gotınêye ku ew multeciyên lı Amerika dıjiyan, organeki wan a siyasi hebû û navê wê ji La Yara bû. (7)

Kongra Tırkên Cıwan a duyem jı bo xebata şoreşgêr hatıbû amadekırın. Vê nêrina han dı belavokê de ji hatıbû eşkerekırın ku, bı xebata çekdari doza xıstına Sultan û damezırandına meşrutiyet û parlamentoyê dê bê kırın. Jı bo zêdetır xurtkırına xebata şoreşgeri, belavokê doza van tıştan ji kıriye; bı zmanê hemû wan netewên bın destên dewleta Osmani, belavok û broşurên siyasi bên belavkırın.(8)

Dawiya kongrê, tevgera şoreşgeri lı Tırkiyê bı awayeki yekgırti, hemû hêzên berxwedanê gırte nav xwe. Dı meha Tirmeha 1908 an de, netica serihıldana çekdari ya hêzên eskeri dı Makedonya de, rewşa welat aloz bû û textê Sultan hejiya. Abdulhemid naçar ma ku makeqanuna sala 1876 an bıxe kar û rejıma Sultaniya-Meşruti ilan bıke. Rêxıstına Yekitiya Tırkên Cıwan serokatiya wê serihıldanê dıkır û dı banga xwe de hevkariyê jı hemû rêxıstınên netewan ên dıji Sultan dıxwest. Serkevtına şoreşê beri hemû tıştan nû

---

(6) Y.A.Petrosyan, Tevgera Tırkên Cıwan, rüp. 50.

(7) Bınêre; Şepul (Pêl) 1908, 11 i İlon, hej. 7.

(8) A.n.d., hej. 5-9, Kanuna Dûyem.

bû. Kombûn lı dora wan sloganên Tırkên Cıwan bû; slogana "azadi, wekhevi, bırati". Hemû hêzên şoreşgêr ên netewên İmparatoriyê, programa Tırkên Cıwan, tenê rasteqini ya xıstına rejıma derebegi-otokrati ya Sultan dızanin.(9)

Pır bı zû, dı dawiya serihıldanê de dıjitiyek tund û tuj kete navbera Tırkên Cıwan û gel. Razibûna danina meşrutiyetê dı aliyê Sultan de, lı cem Tırkên Cıwan armanca sereki bû. Lêbelê, gel, vê destpêka guherandına bıngehin jı bo sistemek nû ya bı rêvebırına welat nedızani. Nazım Beg, mıroveki bı nav û dengê serokê Tırkên Cıwan bû û dı dawiya serihıldanê de weha dıgot: "Dı 14 yê Tirmeha 1908 an de, komita partiyê bı hemû awayi rêxıstınek şoreşger bû. Lê belê, wexta ku şoreş hıl bû, meşrutiyet hat ilan kırın, komite wısa tê gehiştıbû ku rola şoreşgeriyê temam bû. Gotın ku; dema xebata aram û aşitiyê ye".(10) Tırkên Cıwan, siyasetek şoreşgeri dı mesela burokratiya cihaza dewletê û dı rêxıstına eskeri ya rejıma Sultan de nedan pêş çav. Destek û komelên aligırên Sultan dı ciyên xwe de mabûn û dı xebat û bızavên xwe de bûn. Her lı fırsetekê dıgeriyan jı bo ku meşrutiyetê bıxın.

Dı ber vê re, lı welat dı mehên yekemin de, her çend Tırkên Cıwan dıxwestın rejım lı ciyê xwe rûne û asayiş berkemal be ji, disa hez lı cûre azadiyan dıkırın û bı eşkera hemû rêxıstınên netewi-pêşkevtixwaz karên xwe bı bızavi (aktifi) dımeşandın. Rojnamên wan bı riyên cûre cûre derdıketın. Jı bo pıştgiriya meşrutiyetê û ya vê rewşa nû, dı hemû bajaran de xwenişandanên fıreh, mezın ên gelêri dıhatın çêkırın.

Rêxıstınên netewi yên Ermen, Ereb, Arnawud û netewên dın lı gor bıryarên kongra Tırkên Cıwan a lı Paris "qebul kırıbûn", pıştgıriya rejıma Tırkên Cıwan dıkırın. Lı ba wan

(9) Y.A.Petrosyan, A.n.d. , rûp. 314.

(10) A.A.Alimov, Şoreşa 1908 an Lı Tırkiyê, rûp.44.

wıha bû, ku Tırkên Cıwan dıkarın mesela netewi çareser bıkın û jı ber vê ji bang jı bo demokrati, pêşkevtın û bıratiya netewan dıkırın.

Lı İstenbul rewşenbirên Kurd , bı taybeti ewên ku multeci, yan ji dı riya Sultan da hatıbûn rawestandın, roleki baş dılistın û bı aktifi dıxebıtin. Dı nav wan de, Seyid Abdulqadırê kurê Seyid Ubeydullahê serokê serihıldana 1880 yi Seyid Abdulqadır dı sala 1881 i de jı aliyê Sultan ve lı İstenbul hatıbû rawestandın- rolek wi ya mezın û eşkera hebû. Pışti serihıldana Tirmehê vegeriyaye İstenbul û dı welat de parastîgerekî meşrutiyetê hatiye zanîn. Bı gotına beşdaran; dı roja cejna remezanê de meha Çırya Yekem 1908 an lı İstenbul,lı ber derê mala Seyid Abdulqadır xwenîşandanekî mezın hatiye çêkırın. Xwenişandaran, lı hemû bajêr geriyane û sloganên pıştevanî jı bo meşrutiyetê û jı bo qanuna nû avêtıne, lı ber derê meqera nûnerê Sultan jî cıvînek mezın pêk anîn e. (11)

Sloganên bı gıştî û esasî yên rewşenbirên Kurdan slogana pêşketın û yekiti bû ye. Dı welat de, wi wexti, rêxıstıneki Kurdan ya netewi bı wi awayi tune bûye ku rêberiya xebata Kurd bıke. Eva han ji astengek mezın bû ye dı riya geşbûna bira netewi û tevgera Kurdayeti de. Ew Kurdên rewşenbir ku lı derve muhacır bûn, vegeriyabûn welat, tenê hêvi û daxwaza wan ew bû ku rêxıstınek bı wi awayi damezırinin.

Dı payiza sala 1908 an de, Seyid Abdulqadır û Emin Bedırxan lı İstenbul Komela Hevkari û pêşketın a Kurd (Kürt Teavun ve Terakki Cemiyeti) damezırandın, jı bo serokati û rêberiya xebata siyasi û rewşenbiri ya hemû çin û tebeqan bıke.(12) Ew komela han, bı kêmasi nûnerê sê bınemalên Kurdan ên mezın -Bedırxani, Şemzinani, Baba-

(11) Jamanak (Wext) 1908, hej. 2, 16(29) ê Çırya Yekem.

(12) A.Safrastiyan, Kurds and Kurdıstan, Londra 1948, P.70.

ni- bû. Ew rewş ji jı bo serokatiyê dıjiti peyda dıkır, yekitiyek pêk nedıhat. Lê, cardın bı pırani rewşenbir û siyasiyên Kurdan çûne wê komelê. Endamên wê pır hebûn, berpırsiyarê hemû rê û bir û baweriyên cûda cûda lı der û dorên xwe kom kırıbû.

Endamên komelê pıştgiriya sloganên Tırkên Cıwan dıkırın. Parastına mesela yekitiya netewên bındestên Osmaniyan û meşrutiyeta sala 1876 an dıkırın. Komel, wek ku dı programê xwe de ji nıvisi ye, xebat jı bo cibıcikırına van armancan kıri ye : Dı mıntıqên Kurdıstanê de vekırına dıbıstanan; tayin kırına memur û karbıdestên Kurd lı dam dezgên kırdayetiyê dı welat de; itiraf kırına resmi jı bo zmanê Kurdi; çêkırına universitekê dı Kurdıstan de; rêdana derêxıstına kovar û rojname bı zmanê Kurdi; kıfşkırına nûnerên herdemi yên Kurd jı bo meclısê; bızav û hewldan jı bo geşkırına rewşa abori dı Kurdıstan de.(13) Seyid Abdulqadır, Emin Eli Bedırxan, Zihni Paşayê Baban, Damat Ehmet Zulkuf Paşa, Xelil Xeyali(Motkan), Ehmet Cemil Begê Diyarbekri, Ehmet Ramız Beg (Lıce) û hınek kesên dın serokatiya wê komelê dıkırın û roleki wan a mezın û bızavi dı komelê de hebû. (14)

Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd , qimetek bı temam û mezın dı nav Kurdan de peyda kıriye. Rêxıstınên netewi-burjuvazi yên Ereb, Ermen û yên netewên dın itiraf û itibarên mezın pê dıkırın. Bı taybeti peywendiyeki wê ya xurt bı rêxıstınên Ermeniyan re hebû. Dı payitext de lı ser hewıldana her du mılan xwenişandanên mezın dıhatın

(13) Programa Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd, İstenbul 1324, Roji Kurd, hej. 6, 1960.

(14) El-Teaxi, hej. 10, Tirmeh 1967, Pır mıxabın, dı wan belge û materyalên lı ber destan de, jiyana damezırênera û endamên wan komelan dı wan de ninın·Nıviskar.

çêkırın. (15) Çina lı ser kar û dewlemendên Kurd û Ermeniyan, koşk, xani û çayxanan jı bo vê armancê texsis dıkırın. Rojnamên Ermeniyan, deng û behsên bırati û hevxebatiya Kurd û Ermenan dı paytext de belav dıkırın. Rojnama Gortis dı 12 yê Çırya Duyem sala 1908 an de, lı ser peywendi û dostaniya Kurd û Ermenan weha dınıvisi : "Hêdi hêdi ev bırati xurt dıbe û dıbe sebebê xweşiyê". Komela Hevkari û Pêşketın, peywendiyek xurt bı Taşnak (16) re daniye. Her wext nûnerên komelê jı bo cıvinên xwe, bang Ermeniyan kırıne û rêxıstınên Ermeniyan ji ewan daweti cıvinên xwe kırıne. Kesên beşdari cıvinan bûne, bı hev re marşa Kurd û Ermeniyan a nıştımani pêşkêş kırın e.(17)

Rojnama Jamanak , lı ser danina programa rêxıstınên netewi dı cıvinek de gotiye : "Her dû mılan ji heya ku jı wan hat bıryar dan ku dı riya armanceki de bıxebıtın"(18) Komelên Ereb, Ermen û yên dın, vê komela Kurdan, bı tenê nûnerê derbarê armanca Kurd zani ne. Heta komel dıqeta diplomatên İngilizan ji kêşa bû.

Eziz Yamulki, dı biraninên xwe de weha dınıvise : "Komelê jı Hukumdarê İngiltere re telgrafeki şandıbû. Vi Hukumdari jı bo vi agahdariya Kurdan, bı pirozbahi û sıpasiyên xwe ve bersiv dabû..." Yamulki bı vi awayi dıdomine: "Komela Hevkari û Pêşketın, jı Hukumeta İngilizan ya wi wexti hêviya alikariyek kırıbû."(19

(15) Jamanak 1908, Çırya Yekem, hej. 7.
(16) Gortis (Kar) 1908, Çırya Dûyem, hej. 53.
(17) Jamanak 1908, 18 i Çırya Dûyem, hej.19.
(18) A.n.d. , 4 ê Çırya Yekem, hej. 4.
(19) Eziz Yamulki, Kurdıstan û Serihıldanên Kurd (Kurdıstan ve Kürt İhtilalleri) 1946, rûp. 55.

Bı vi awayi em dıkarın bêjın, dı wan wextan de, lı nav têkoşerên Kurd lı İstenbul, hınek kes hebûn ku mêla wan bı ser Ingilizan ve bû, ew mêla han lı dawiya xelasiya qonaxa Şerê Cihanê ê Yekem ji peyde bûbû.

Armanca bıngehin ya bızava komelê, derxıstına organek bû. Rojnama Jamanak , dı meha Tirmeha 1908 an de, weha nıvisiye :"Van rojan Kurd dê rojnameki navê wê Kurd , bı zmanê Kurdi û Tırki derêxın".(20) Hejmara rojnamê ya yekem dı 29 ê Çirya 1908 an de lı İstenbul derketiye.(21) Yê ku wê rojnamê derêxıstiye navê wi Tewfiq bûye û xelkê Sılêmaniyê bûye.Dı rûpela rojnamê ya yekem de wıha hatiye nıvisandın: "Rojname organa Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd e û armanca wê ya bıngehin ji belav kırına bir û baweriya komelê ye." Heftê carek heşt rûpel derdıket û her rûpelek ji çar sutûn bû.(22)Wê rojnama han tenê neh meh derke-

---

(20) Jamanak 1908, 16-22 yê Çırya Yekem, hej. 2.

(21) Bınêre; Revue du Monde Musulman, 1909, T.7, N.1-2, P.170-171.

(22) Dı Bibliyografya Edebiyat de, lı ser rojnama Kurd rayên cûre û cûre û kêm hene. Bibliyografya dewlemend û ê xurt a O.L.Vilçivski, behsa wê kıriye,lêbelê,dı weşanên Kurdan ên dın de,qet lı ser tıştek nehatiye nıvisandın.(O.L.Vilçivski,Bibliyografya Weşanên Kurdan Lı Derve,rûp.157-158)Her wıha nıviskar û diroknıvisan navê rojnamê ji bırasti nenıvisandıne, jı bo minaki; E.K. Sarkisyan û Lazeriyev, Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd bı nav dıkın. Bınêre ; E.K.Sarkisyan, Siyaseta Dagırkeri ya İmparatoriya Osmani (Dı Rojavayê Ermenistan) Lı Pışt Qafqasya, Êrivan 1962, rûp. 82.
Her wıha bınêre; M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd, Moskova 1964, rûp. 139. Tenê yek serekani lı ser

in M. Gezai[illegible]

# کرد

# تعاون و ترقی غزته سی

۳۲۴

جمعیتک واسطهٔ نشر افکاریدر

تاریخ تأسیسی ۱۳۲۶ — ۱۳۲۴

شمدیلک هفته‌ده بر دفعه نشر اولنه‌جق دینی، علمی، سیاسی، ادبی، اجتماعی غزته‌در

مندرجات

[illegible] . . . . . . سلیمانیه‌لی [illegible] توفیق
[illegible] بیاننامه‌سی
[illegible] . . . . . . [illegible]
[illegible] کردستان . . . . بابان زاده اسماعیل حقی
[illegible] ارتقاسی و سعادت
[illegible] . . . دیاربکرلی محمد حلمی
[illegible] . . . . سلیمانیه‌لی [illegible]
[illegible] . . . . . [illegible] سید عبد القادر
[illegible] انوار [illegible] . . . [illegible]

کردجه مقاله . . . . . . بدیع الزمان ملا سعید کردی
کردجه مقاله‌لر . . . . . . سیاح شوقی
کردجه شعرلر . . . . . . سلیمانیه‌لی توفیق
[illegible] رسم عالیسی
[illegible] = تحریر
[illegible] ذکر [illegible] وجه تسمیه
[illegible]

tiye.(23)Pê re nehatiye gihiştın ku dı hemû mıntıqên Kurdıstanê de bê belavkırmê û bıkare bıbe rojnamek berbelav û bı nav û deng.(24) Rojnamê behsa meselên gelek cûre cûre kıriye û lı ser pır tıştan nıvisin belav kıriye. Beri hemû tıştan lı ser guherandına rewşa cıvaki û xurtkırına rêzên netewa kar kıriye.Rojnama Kurd*,rojên kevnar ên netewa Kurd pır bı iftixar û bı sıfet û camêriya netewa Kurd nişan daye.

Dı hejmara düyem de, dı gotarekê de, ew gotara ku bı navê Kurd û Kurdıstan hatiye nıvisandın weha hatiye gotın : "Kurd dı İmparatoriya Osmani de jı hemû jiyana xweş, jı hemû mafan bê parın. Her çend camêri û fedakariya wan lı cıyên welat dı aliyên hemû kesan de diyare û ciyek wani bı taybeti jı methê re heye." Ew kesên ku rojnamê derêxıstıne, rexnên ku lı dewletê gırtıne, ne vala û bê armanc bûne.(25)

---

wê rojnamê nıvisiye; Revue du Monde Musulman, dı sala 1959, hej. 1-2. Ewê nıvisiye ku rojname, rojnameki hefteyi, dini, siyasi û cıvaki bûye. Hejmarên rojnamê nehatıne parastın, lêbelê, komek jı naveroka wê dı kıtêba A.Şahbaziyan; Diroka Kurd û Ermeniyan de hatiye nıvisandın. Hêjayê gotınêye, ew kıtêb dı vi wari de yekem serekaniya me ye. Kovara Revue du Monde Musulman, behsa rojnama Rojhılat û Kurdıstan(Şark ve Kurdıstan) kıriye. Ehmed Şerifê Herseki, Bedriyê Meletyê, İsmailê Herseki wê derêxıstıne û zêdetır propaganda dinê İslamê kıriye û bı tu awayê peywendiya wê bı tevgera azadixwaz a Kurd re tunebûye. Derveyê van du malumatan, tu serekaniyên dın yên dı vi wari de ber destên nıviskar nebûye.

* Bınêre : Têbıniya 22. (Navê esasi yê kovarê "Kurd Teavun ve Teraki Gazetesi ye (Rojnama Hevkari û Pêşketına Kurd)" e. Em dı vê kıtebê de klişa rûpelê wê yê pêşiyê pêşkêşi xwendewanan dıkın. N.M.)

(23) Şahbaziyan, Diroka Kurd û Ermeniyan, rûp. 177.

(24) A.Safrastiyan, Kurds and Kurdıstan, P.70-71.

(25) Bınêre; E.K.Sarkisyan, A.n.d. , rûp. 82.

Bı wi awayi rojname zêdetır gotarên cıvaki-siyasi belav dıkır. Dı wan gotaran de gelek ideologên Kurdan bir û rayên xwe dıxıstın ber çav û riya rastiyê jı bo pêşveçûna netewa xwe nişan dıkırın.Rojname,gelek gotarên rewşenbiri û çandi ji belav dıkır. Nıvisarên wan gotaran Kurdên jêhati û xwedi bira netewi, weki Seidê Kurdi, İsmail Hakki Babanzade û geleki dın bûn.

Dı hejmara duyem de gotara Çı jı bo Kurdan pêwıst e? hatiye belavkırın û tê de weha hatiye nıvisandın : "Nêziki panzde salane ez tım û tım dıfıkırım û vê meselê dıpivım û datinım, dı netica vê sersekınınê de, tıştên pır gırıng dı serê mın re derbaz bûne. Tenê du tışt eninıvisa Kurdıstan dıkare bıgûherine; yekitiya netewi lı gel hişyariya dini û wê hişyariya ku dı şarıstaniyet, zanısti û huner de bê bışavtın." Seidê Kurdi ji weha dıbê : "Jı bo azadbûna Kurdıstan, pewısti bı damezırandına eskereki Kurdi yê mezın heye."(26)

Wi nıviskari dı hejmara şeşan a rojnamê de gotarek dın nıvisiye; ku dıbê hewceye bir û baweriya pêşketın û azadiyê lı gel din bê pejırandın û bı wi awayi derkeve. Baweriyek bı wi awayi dıji islamiyetê nine. Nıvisar dı wi wexti de dıji Panislamizmê dısekıne da ku perda lı ser rûyê wê zılım û zora ku lı ser navê islamiyetê dı dewleta Osmani de lı netewên musulman te kırın rake.ıı. Ev bir û baweri rê û nêrinên han, bı pırani yên kesên ku rojnamê derdıxıstıne bûye.

Dı hejmara sêyem de İsmail Hakki Babanzadeyê nıviskar û xebatker, gotarek lı ser qimet û gırıngiya xwendewari nıvisiye. Dı wê gotarê de roni kıriye ku xwendewari rolek çawa dı xurtkırın û yekitiya netewi de dılize. Ewi gotarê bı vi awayi domandiye; pêwıste zarokên Kurdan bı zmanê bab û bapirên xwe bıxwinın.(27)

---

(26) Şahbaziyan, A.n.d. , rûp. 177-179.

(27) A.n.d. , rûp. 179.

Ew gotarên ku dı rojnamê de hatıne belavkırın ne tenê jı bo propaganda siyasi hatıbûn amade kırın. Dı eyni wexti de lı ser bıngehek xurt jı bo belav bûn û geşkırına zmanê edebi yê Kurdan ji hatiye sekının. İsmail Hakki Babanzade, dozê jı gel kıriye ku tıştên veşarti yên bı dev û çirokên Kurdan, bên komkırın û bı zmanê Kurdi diroka Kurdi bê nıvisandın. Dı vi wari de weha dıbêje: "Parastın û durustkırına zmanê edebi riya pêşketınê jı bo me vedıke. Tenê xwendın û zanısti karê netewi dıparêze. Kılita zaninê, zman e. Her ew kılit tenê dıkare deriyê şarıstaniyetê veke." Lı ser pêwısti û bahayê vê meselê xwediyê gotarê bı vi awayi gotara xwe dıdomine: "Jı bo cianina van wezifan, ez berê xwe dıdım wan kesên zana û şareza û dozê lı wan dıkım; zûtırin dest û zendên xwe bıdın jor û mıl bıdne karkırınê".(28)

Sernıvisarên rojnama Kurd , bang lı gel dıkırın, jı bo yekiti û bıratiyê û sazkırına peywendiyên xurt dı navbera netewên welat de.(29)

Ev rojname ji wek gelek rojnamên dın ku lı İstenbul bı Tırki û Ermeni derdıketın û dıhatın nıvisandın, meşandın û serokatiya wan dı bın destê burjuvaziya liberal de bû.(30)

Rojnama Kurd , dı mesela cıvaki û abori de lı gora menfeeta çina xwediyê wê bû. Bı pırani ji dı bın tesira Şêx Abdulqadır de bû. Gelek kesên beşdar ewi derker û xwediyê rojnamê dızanin.

Komela siyasi û cıvaki Hevkari û Pêşketına a Kurd dı 25 ê İlona 1908 an de lı İstenbul kulubeki vekır.

Dema vekırına wê kulubê dı salona Wezneciler de, 500

---

(28) A.n.d. , rûp. 178-179.

(29) Gortis, 1909, 1 ê Kanuna Dûyem, hej. 11(Bı Ermeni)

(30) Bınêre; A.D.Jeltyakov, Y.A.Petrosyan, Diroka Rewşenbiri Lı Tırkiyê.

kes jı endam û mêvanan hazır bûn. Dı vekırına wê kulubê de bı vi awayi axaftın hat kırın: Em hemû Jı bo bırati û hevxebata netewên İmparatoriyetê pıştgıriya qanun û meşru tiyetê dıkın. Muftuzade, ku serokek Kurdan û xelqê Muşê bû, bı taybeti lı ser van tıştan sekıni; jı ber vê rewşa nû Kurd daxwaza wekheviyê dıkın, bı netewa Tırk ve dı riya pêşketın, zanısti û başkırına rewşa abori, azadi û siyasi de dıçın û ku ewê wezifeke lı ser mılên xwe dızanın, ew çax hewceye em bı dıl û can parastına meşrutiyetê bıkın û ewê dı jiyana xwe de tetbiq bıkın.(31)

Dı wê cıvinê de axaftına jı bo vekırına wê kuluba Kurdi hatiye kırın ew ji her jı bo peyda kırına bırati û peywendiya navbera Ermeni û Kurdan bû. Muftuzade dı gotarekê de, bı germi doza zêdetır xurtkırına bıratiya navbera her du netewan dıkır. Peyamnêrê rojnama Gortis weha nıvisiye :"Xetib, wezifa bıngehin ya wê kulubê xurtkırına bırati û dostiya her du netewan ditiye".(32)

Dı rojname û weşanan de, çavên mırov pır caran lı wan kesan dıkeve ku lı ser kombûn û cıvinên kulubên bıra yên

---

(31) Elaeddin Seccadi, Diroka Edeba Kurdi, Bexdat 1952, rûp. 552. Rojnamên Kurd û Kurdıstan, her wek me lı jor ji behsa derketına wan kır, dı wê wextê de ber û bahayê du neslên Kurdan bûn. Geleki ji ku eşkera nebe, dı şerên tevgera azadixwaz a Kurd de mıl û bı mıl bûne. B. Nikitin, dı vi wari de wıha nıvisiye : "Dı rasteqini de, dı wi wexti de herdu mılan; Bedırxaniyan û aligırên Seyêdê Nêhri (meqsed Seyid Ebdulqadır e), dıjitiya hev dıkırın û pilanên cûre û cûre lı dıji hev dıgerandın. Bınêre; B.Nikitin, Kurd, rûp. 290.

(32) Gortis 1908, 26 ê İlon, hej. 13.

Ermeniyan an ji yên Kurdan dınıvisandın. Pır caran dı hamû aliyên paytext de, an ji van gundên nêzikê hev ku Kurd û Ermeni tê de dıjiyan, bıhev re dıketın wan cıvinan. Peyamnêrê Gortis lı ser wan cıvinan weha nıvisiye :"Dı nav me Ermeniyan de ev eşkera ye û ciyê zanin û dılxweşiyê ye, jı ber ku ev nişana han ya bırati û alikariya her dû mılan dıke..."(33)

Kulubên Kurdan, roleki baş jı bo lı hev kırın û nehıştına sariti û rakırına dıjwariya navbera Kurd û Ermeniyan listine. Rojnama Gortis cara duyem nıvisarekê lı ser wê bûyerê nıvisiye: "Do, lı Xas Koyê(34)Kurd û Ermeni cıvinek çêkırıne, sebebê cıvinê ev bû ye;hınek komelên Kurdan nenzayiyên xwe lı ser Ermeniyan diyar kırıbûn. Ew Kurdê ku gotarê xwend, bı tevayi dıji wan bûyeran axıft û lı ser xurtkırına bırati û hevkariya bı Ermeniyan re sekıni. Dawiya vê cıvinê peywendiya wan baş bûye û navbera wan de qet tıştek nemaye."(35)Bı vê riya hevxebata Kurd û Ermeniyan çı lı Kurdıstan û çı dı nav Ermeniyan de pıştgıriyeki wek ku dı İstenbul de hebû hate ava kırın.

Bızava siyasi ya Komela Hevkari û Pêşketına a Kurd , her dı İstenbulê de nerawesta.Rêxıstınên wê dı rojhılata İmparatoriyê de; Diyarbekır, Bıtlis, Musul, Muş û Erzurum de belav bûbûn.Dı destpêkê de,dı wan herêman de, komitên herêmi yên komelê pêk dıhat,pıştı paşwexteki ew komitên han bı awaki serbıxwe xwe kıfş dıkırın. Her weku tu peywendi dı navbera wan de nebe. Lêbelê, dı eslê xwe de, serokatiya siyaseta wan komitan, serokatiya komelê ya lı İstenbul dıkır û serkırdayeti û meşandına wan lı wır dıhat

(33) A.n.d. , 1908, 19 yê Çırya Dûyem, hej. 53.
(34) Lı qeraxê İstenbul.
(35) Gortis, 1908, 12 yê Çırya Dûyem, hej. 53.

kırın. Pır dı ser de neçû, wan kuluban kareki pır gırıng lı ser rewşa siyasi-cıvaki kırın, û gıraniya xwe lı ser siyaseta wan herêman xıstın ber çav. Bı pırani dı bajar û mıntıqên pıçûk ên Kurdıstanê de ew kulub û hucre hatıbûn danin.

Kuluba Bitlısê mezıntırin û xurtırinê wan kuluban bû . Dı Çıriya Dûyem a sala 1908 an de, lı vi bajari kuluba Ermeniyan 50, ya İttihadiyan 90 û ya Kurdan ji 680 endamê wê hebûn. Cigırê konsolosê Rusya Akimoviç dı rapora xwe ya 30 ê Çırya Paşin de waha nıvisiye :"Hejmara endamên kuluba Kurdan gıhiştiye çend hezaran."(36) Dı meha Sıbat û Adara 1909 an de, hejmara endamên kulubê bû ye 80 hezar.(37)

Bı eksê kuluba paytext, serokên ku kar û barên kulubê meşandıne, rol û gıraniyeki wan kesên çep tê de tunebû ye. Dı wê rewşa siyasi-abori ya nû de, çina navin roleki gırıng liyistiye. Ew çina ku Akimoviç dı rapora xwe de "dewlemendên Kurdan" bı nav kıriye. Endamên kulubê (meqset kuluba Bıtlisê ye-Nıviskar), "dı nav xwe de deh hezar lire komkırıne, ku bıkın sermaye jı bo vekırına kargehek dı Bıtlisê de." (38)

Derebeg û nûnerên eşiran ji dıbûne endamên wan kuluban. Armanca wan ew bû ye ku dı wê rejıma nû de, bı saya wê rêxıstınê menfeeta xwe bıparêzın. Bızava siyasi û kombûna Kurdan dı Bıtlisê de lı der û dor wê kulubê, jı bo kulubên dın yên dı bajêr de bû ye ciyê tırsê. Ermeniyên Bıtlisê bı xebat û bızaviya wan kuluban şa bûne, xurt bûna wan wek menfeeta xwe nıvisandın e. Akimoviç lı ser vê pırsê

(36) A.V.P.R.F., jı konsolosxana İstenbul, 1908, rûp. 58.
(37) Bınêre; M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd, rûp. 141.
(38) A.S.D.R. , bıngeh,konsolosxana İstenbul, rûp. 58.

weha dıbêje:"Vê yekgırtına Kurdan diqetê dıkışıne.Pêkanina bı vi rengi hêzeki mezın,dıbe sebebê netırsandınê jı bo Ermeniyan. Jı ber ku, ev hêz û yekgırtın, dı paşerojan de bı bızavi (aktifi) wê rola xwe kıfş bıke."(39)

Zêdetır netırsiya Ermeniyan jı bo vê yekê bû : Wê kulubê, komiteki şerê ku jı deh kesan pêk dıhat damezırandıbû û ewan ji kesên dın hini kar û barê şer dıkırın. Kulubê xebateki baş dıkır jı bo rewşa arami ya bajêr. Bı rasti ji, alozi kêm bûbûn û çeng û berê asayiş û aramê, dı ser herême de hatıbû vekırın. İttihadiyan sebebê lawazi û jarbûna xwe, wan kulubên Kurdan dızanin. Jı bo vê yekê, ketın bızav û xebatê û xwe amade kırın jı bo wan kulubanjı nav hıldın. Sala 1909 an dı meha Gulanê de wê kulubê gırtın.(40)Gelek endamên wê naçar man bıbın endamê İttihadiyan.Dı vê meselê de Akimoviç roleki baş listiye û dı rapora xwe ya ku jı bo Zinoviev konsolosê Rusya yê İstenbulê nıvisiye weha dıbê: "Nabe ku em vê jı bir bıkın, Kurd heta nıha dıjmınên dewletê yên eşkere bûn, nıha bûne pıştgırê qanuna gırtına kuluba Kurdan. Heta demek beri nıha Ermeni dı rehetiyê de bûn, lê vê dawiyê, jı bo ku navbera wan û Kurdan hate xırakırın ketıne nerehetiyê û bê aramiyê".(41)

Mesela ku Kurd dıbûne endamê kuluba İttihadiyan, bahayeki wê ya abori ji hebû. Jı ber ku, her Kurd yekemin serokaniya butça kuluban bûn. Konsolosê Rusya yê Bıtlisê lı ser vê weha gotiye : "Kuluba İttihad û Terakki zêdetır xebıtiye ku Kurdên dewlemend û yên bı nav û deng lı der û dorên xwe bıcıvine."(42) Ew nayê wê mane ku İttihadiyan,

(39) A.n.d.

(40) M.S.Lazeriyev, A.n.d., rûp. 141.

(41) A.S.D.R. , bıngeh, konsolosxana İstenbul, 1909, D.141 rûp. 8, bı gışti.

(42) A.n.d. , rûp. 150, gışti.

armanca wan ne ewbû ku dı hêla siyasi ve tesir nekın lı ser Kurdan. Gırtına kuluba Kurdan dı Bıtlisê de, nerazibûneki mezın xıstı bû nav gelê Kurd.

Ew kulubên Kurdan hewce bû ku bı awaki helbıjarti û lı gora meşandına karê hındûr bên danin, lê, gelek caran dı ciyê vê de bı awaki eşireti dıhat danin. Carên dın ji hebûn, rewşa cıvaki, dı mesela danina kuluban de rol dılist. Lı bajarê Xınısê eşira Çarikan, jı kuluba lı wır dûr ketıbûn, jı ber ku ew kesên ku serokatiya wê kulubê dıkırın, heta demek berê zori û zordestiyê lı ser wan kırıbûn. Jı bo vê ji ewan dı wê kulubê de ci negırtıne û dest avêtıne jı xwe re kulubek dın vekırıne. Dı wan rojan de rojnama Gortis ya Ermeniyan weha nıvisiye : "Eşira Çarikan wê eziyet û tadaya beri bı kûri tinın bira xwe û jı ber vê ji dıxwazın nizikati bı Ermeniyan re deynın. Jı ber ku Ermeniyan ji van ceza û tadayiyan tam kırıne. Em jı pır salan bı destê zor û zordestiyê weki wan ketıbûne bın perçıqandına zılm û zora cıvakiyê".(43)

Havina sala 1909 an , dema Tırkên Cıwan dest avêtın siyaseta Osmanizmê, hêdi hêdi kulubên Kurdan hatın gırtın. İttihad û Terakki jı bo fıreh kırın û xurt kırına iktidara xwe, pêwıst dit ku Kurd bıbın endamê kulubên wan. Lê belê, Kurdan bı dıl,kar dı nav partiya Tırkan ya İtilaf de dıkırın.

Dı saya wan bang û propagandên zêde ku kulubên Kurdan jı bo bira netewi kırıbûn, hejmareki pır zêde Kurd lı der û dorên xwe kom kırıbûn. "Heta ew Kurdên ku xwe Tırk dızanin pıraniya wan ji xıstıbûne nav rêzên xwe".(44)

Lı gora wan deng û behsên jı Muşê gıhiştıne redaksiyona rojnama Horizon a Ermeniyan, pışti gırtına wan ku-

(43) Gortis, 1909, hej. 48, 6 ê Adar,

(44) A.Şahbaziyan, Diroka Kurd û Ermeniyan, rûp. 177.

luban,. Kurd lı der û dorên hıcrên dini dıciviyan û dest bı xebateki bı pır dızi kırıbûn. Lı navça Bılanıx , Melazgırd û ciyên dın cıvin dıkırın û lı ser mesela programa xebatê û babetên dın kar û barê dıaxıftın. Awayê tên gotın Kurdan van xebatên xwe bı awaki pır dızi û veşarti domandıne. Belgên bı nıvisandi lı ser minakiyên wan xebatên hıcran heta nıha bıdest neketiye ku mırov bıkare bı fırehayi lı ser bısekıne.(45)

Dı dawiya sala 1909 an de, jı ber sebebê gırtına wan kulubên siyasi bızavi û keft û lefteki Komela Hevkari ü Pêşketın a Kurd û ya rojnama Kurd nema. Her çıqas ew rojname û komele dı demek kurt jiyana xwe karıbûn bıdomının, lê, roleki wan a baş dı hişyarkırına gel de çêbû.

Komela Hevkari u Pêşketın a Kurd , jı bo belav kırına xwendewariyê dı nav Kurdan de xebatek mezın kıriye. Endamên wê, vê wezifa han wezifeki bıngehin a lı ser mılên xwe zanine. Jı bo vê armancê Komita Kurdan a Weşani û Rewşenbiri hatiye damezrandın. Wezifa wê komitê xebatkırın jı bo vekırına dıbıstanan û bı zmanê Kurdi çap kırına kıtêban bûye. Endamên wê komitê, bı wezirê Tırkiyê yê Rewşenbiri re ittifak kırıne û jı bo vê armancê gelek bızaviyên hêja meşandıne. Xelil Xeyaliyê xelqê Motkan, rolek mezın dı vê xebatê de listiye.(46)

Butçe û alikariya maddi ya vê komitê, jı Kurdên dewlemend û Kurdên ku dı kar û barên dewletê de xebıtine û hınek ji jı dewletê hatiye gırtın. Wextê lı İstenbul dıbıstan tê vekırın Abdurrehman Bedırxan 30 lireyê Tırk yarmetiyê dıke û vi qewli ji dıde ku her meh bı awayeki berdewam ali-

---

(45) Horizon 1910, 10 ê Sıbat, hej. 3.

(46) El-Teaxi, 10 ê Tirmeh 1967.

## کرد نشر معارف جمعیتی
## نظامنامه‌سی

مطبعهٔ آمدی

دیوان عمومیه جوارنده سلطان مکتبی

زوقاقنده نومرو ۲۳

۱۳۲۶

### کرد نشر معارف جمعیتی نظامنامه‌سی

ماده ۱ کرد نشر معارف جمعیتی نامیله منحصراً علمی وادبی و[illegible] استانبولده مستقل بر جمعیت مرکزیه تشکیل ایتمشدر .

### جمعیتك مقصدی

ماده ۲ جمعیتك مقصدی و آمال مقدسه‌سی اولاد وطن ایچنده اك زیاده نعمت معارفدن محروم اولان کردلر آره‌سنده معارف و [illegible]ی نشر و تعمیم ایتمکدر .

ماده ۳ جمعیت شمدیلك استانبولده کرد چوجقلرینه مخصوص مکتب ابتدائی تأسیس واحیاسیله مشغول اوله‌جق واحوال مالیه‌سی ارباب حمیت وغیرتك معاونت انسانیتکارانه‌سیله مساعد بر حاله کلدکجه اکثریت سکنه‌سی کرد اولان قصبه وقریه‌لره و بالترجیح مفهوم بر حقده فلان عشائر وقبائل آره‌سنده مکتبلر تأسیس و تکثیریله اراءه جهتلرینه چالیشیله‌جقدر .

### جمعیت مؤسسلری

ماده ٤ جمعیته مؤسس اوله‌بیلمك ایچون بدایة لا اقل

kariya wê dıbıstanê bıke. (47)

Ew dıbıstan lı taxa Diwan Yolu û lı kuça Hace Paşa hatıbû vekırın. Roleke wê ya mezın dı jiyana çandi ya Kurdên İstenbul de hebû. Rojnamên lı paytext derketıne, bı taybeti wek rojnamên weki Horizon , Azade Mıllet , Jamanak û geleki dın ji lı ser vebûna vê dıbıstanê bı fırehayi nıvisine. Programa wê dıbıstanê her wek dıbıstanên dın bû ye. Rojnama Horizon , lı ser wezife û programa mamostên wê dıbıstanê weha nıvisiye: "Navê dıbıstanê dani bûn Dıbıstana Meşrutiyetê . Her çend mırov nıkare bêje ku lı wır tenê meşrutiyet dıhat xwendın, lê belê, xwendına bı dıl û germin meşrutiyet bû".(48) Serokê dıbıstanê Abdurrehman Bedırxan bû, dı destpêkê de tenê 30 zarokên Kurdan hebûn, dawiyê hejmara wan geleki zêde kırın e.

Wê komitê, doza vekırına dıbıstanan dı Kurdıstanê de ji kırı ye. Dı rastiyê de ji ew mesele ne wesa hêsan bû. Jı ber ku, ew kadro û mamosteyên ku dı İstenbul de bı dest dıketın dı nav gundên Kurdıstanê de tunebûn. Rojnama Azata Mart ya Ermeniyan, lı ser vê, pirozbahiyê lı rewşenbirên Kurdan kırıye û weha gotiye : "Her bı çı awayi be, ev zori, zehmeti û nerehetiya han dê bê pêşiya rewşenbirên Kurdan, nabe ku dev jı vê meselê berdın û bıdın aliki. Jı ber ku, rojên bên û çarenıvisa netewan gırêdayi ye bı hişyari û xebata zehmet, dıjwar dı dıji hemû rewşeki xırab û nelıhevhati de".(50)

"Xebatkerên Ermeniyan ên pêşkevtixwaz baş dı wê rastiyê gıhiştı bûn. Jı ber ku, belav kırına xwendewari û zanıs-

---

(47) Bınêre; Revue Du Monde Musulman, 1910, T.10, N.4, P.578.

(48) Horizon 1900, 9 ê Sıbat, hej. 30.

(50) Azata Mart (Erdê Xas) 1910, 22 ê Sıbat, hej. 190,

ti dı Kurdıstanê de, wezifeki pır pêwısti û gırınge, jı ber ku, ewan dızani; Kurdıstan ciyê bext, can û dılê tevgera Kurdan e, ne paytext". (51)

Wê geşbûn pêşveçûn û jiyana ku dı paytext de dı nav tevgera Kurd dıgiya , bı vi avayi germ û gur nedıgihişt Kurdıstan û sar dıbû. Jı ber ku, dı vi wexti de yek dıbıstan çiye dı Kurdıstanê de tune bû.Heta ew ji hemû lı navçên dı destê Tırkan de bûn.. Tu cari lı wan xweş nedıhat ku tevgera azadixwazê Kurd xurt bıbe û pêşve bıçe. Dı sala 1910 an de, Tırkên Cıwan, destên xwe yên gemar kırne nav û ewan xıstın bın muhaserê û ew jı mafê xwe bêpar kırın. Ew netewên ku heta do bı wan re lı dıji Sultan xebatê dıkırın.(52)

Lı ser gırtına kulubên Kurdan, Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd û derketına organ û weşanan, xebata qonaxa pêvajoya pêşveçûna jiyana cıvaki-siyasi ya Kurdan nesekıni. Tırkên Cıwan, bı vê siyaseta xwe ya êrişker, dıj xebata berxwedana netewên pıçûk sekıni û ewi domand. Dı ber vê re ji sala 1910 an , tevgera Kurdi gıhişte qonaxek geşbûnê ya dın. Xebata bızavi ya Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd û bir û baweriya serokên wê, serekaniya ilhama tevgera Kurd bu. Eziz Yamulki bı awayek pır bı rûmet û baha behsa dewra wê komelê dıke û weha dıbêje : "Ew yekemin car bû vê komelê, mesela azadiya Kurdan bı kar ani. Ew ji ne ew bû ku lı daxwaz û xwestına serokên wê bû; ew netica guherandın û perewpêşveçûna hedda rewşa siyasi û cıvaki bû". (53)

---

(51) A.n.d.

(52) El-Teaxi, 10 ê Tirmeh 1967.

(53) Eziz Yamulki, Kurdıstan û Serihıldanên Kurd,.rûp. 55. (Kürdistan ve Kürt İhtilalleri)

## KOMELA HİVA-HÊVÎ Û KOVARA ROJÎ KURD , DAMEZIRANDINA YEKEMÎN ÇAPXANA KURDÎ

Dı jiyana siyasi-cıvaki ya Kurdan de, xwendewaran roleki mezın listiye. Nemaze xwendewarên ku lı İstenbul dı universite û enstutiyan de dıxwendın. Dı paytext de, dı belavok û cıvinên Kurdên siyasi de, dengên xwendewaran xurt, zelal û bılınd bû. Ew têkoşerên Kurdan -ku dı rojên bori û dı diroka xebatê de pır xwedan tecrube bûn- hemû nesihetên wan xwendewaran dıkevte beranberi hişyariya siyasicıvaki û ewan wê hişyariyê geş û bılınd dıkırın.

Dı destpêka sala 1912 an de lı İstenbul, komeleki nû ya xwendewaran bı navê Hiwa-Hêvi hat damezırandın.(1)

---

(1) V.F.Mınorsky, Koşa Hêwayê, Şekiti tercume kıriye. Bınêre; V.F.Mınorsky, Têbini u İntibaat,Petersborg 1915, rûp. 18. Emin Zeki û Bıleç Şêrko, sala 1910 an , sala damezırandına komelê zanin e. Bınêre; Bıleç Şêrko, Mesela Kurd, rûp. 52. Dı wan salan de, İttihadiyan hemû dezge û rêxıstınên Kurdan qedexe kırıne. Jı ber vê yekê, rê jê re nayê vekırın ku dı bın wan rewşan de, komeleki

Peywendiya danina vê komelê jı aliyekê de bı rewşa welat a nû û serkevtına siyaseta nav Tırkên Cıwan ve hebû.

Peywendiyeke baş a endam û serokên wê komelê bı têkoşerên Kurdan ên dı İstenbul de dıjiyan re hebû. Komele dı fakulta Ziraat de hat damezırandın. Jı ber ku hejmarên xwendewarên Kurdan dı wê fakultê de pır bûn.(2) Her bı wi awayi,dı fakultên dın de ji,wek dı fakulta Bıjişki,Melekiyeta Şahinşahi de endamên wê hebûn. Omer Cemil Paşa serokê komelê, Qedri Cemil Paşa ji sekreterê wê bû. Fuat Temo, Cerahzade Memduh Selim, Necmeddin Huseyn, Ebduleziz Baban, Omer Efendi û Zeki Beg.... endamên bızavi yên komelê bûn.(3) Berpırsiyarê maliyê, Xelil Xeyali bû. Endaman lı gora programa nav xwe mehaniyên komelê dıdan.

Peywendiyên komelê, bı xebatker û kesên bı nav û deng û bı kesên siyasi yên Ereban re ji hebû. Bo minaki, peywendiyeki xurt lı navbera Necmeddin Huseyn, Qedri Cemil Paşa û nıviskar û têkoşerê bı nav û deng ê Ereb; Sedullah El Cabır û Reşid Riyad de hebû.(4) Ew kes damezıranên parti-

---

wıha bê danin.Dı nivê yekemin ê sala 1912 an de, jı ber şıkestına şerê Balqan, rewşa riya İttihadiyan raste rast bıber jariyê ve dıçû û dawiya wê rewşa xırab de ji, Partiya Hurriyet û İtilaf a Tırkên Cıwan hat danin. Pışti van bûyeran, Kurdan karin komeleki nû dabımezrinın.
В.Ф.Минорский, Курды, заметки и впечатления, Петроград,1915, стр. 18

(2) El-Teaxi, 10 ê Tirmeh 1967.

(3) Dr.Bıleç Şêrko El Qediyye El Kurdiye (Mesela Kurd), rûp. 52.

(4) Dı damezırandına wê komelê de, nıviskar û edibê Kurdi ê bı nav û deng, Refiq Hılmi, rolek mezın û gırıng listiye. Bınêre; Roja Nû, 1960, Sılêmani, Tirmeh, hej. 1, rûp. 61.

ya netewi ya Ereb Hızbil Merkeziyye El İdariy Osmaniyye bûn û ewê partiyê dı dawiya sala 1912 an de lı Qahirê damezırandıbûn.(5)

Bızav û xebata komela Hiwa ya dı nav gel de, jı ya Komela Hevkari û Pêşketın pırtır bı nav û deng bû. Beşa Erzurum ê ku dı dıbıstaneki navin de hatıbû damezırandın,bızav, xebat û rewşeki wê ya pır eşkera û gırıng hebû. Serokê wê beşê Teyib Eli bû.(6) Beşeki komelê ji lı derve -lı Lozan- hebû. Jı ber sebebên êrişen terori û hoviti ku dı destpêka Şerê Cihanê ê Yekem de dıhatın ser komelê,ewê dı wê navê re bızava xwe hınek da sekınandın.Arşivên ku dı destên komelê de hebûn ji,ewan dabûne Ebduleziz Baban ku bıparêze.(7) Komelê bı navê Roji Kurd kovarek mehani derdıxıst. Jı hejmara çaran pê ve navê kovarê kırın Hetavi Kurd .(9) Endamên komelê xebat û bızaviyên xwe bı xurti bırıbûn nav serbazan.(8)

---

(5) Le mérite sur la question Syrienne -Publ- par le commandemend de la IV-me Armée, İstenbul 1916, P.58

(6) Dı sala 1925 an de, Kemalistan Teyib Ali, têkoşerê mezınê Kurdanı idam kırın. Ewi beşdariya şoreşa Şêx Seid kırıbû.

(7) Pışti Şerê Cihanê ê Yekem, komel bı serekatiya Asıf Bedırxan destbıxebatê kıriye. Ekrem Cemil Paşa serokê fexri bûye. Dı wê qonaxa xebatê de, komele hınek kıtêban ji çap kıriye. Jı bo minaki; afırandınên Ehmedê Xani kıtêba hinbûna zmanê Kurdi ku Ekrem Cemil Paşa nıvisiye. Dı sala 1922 an de, jı ber sebebên siyaseta Kemal Ataturk, komel hatiye qedexe kırın.

(8) Mehmed Emin Zeki, Diroka Kurd û Kurdıstan, 1939 Qahire, rûp. 35. Dr.Bıleç Şêrko, Mesela Kurd, rûp. 52.

(9) V.F.Mınorsky û Bazil Nikitin, Roji Kurd, bı Hetava

فیاتی ۱ غروش


صاحب امتیاز : و مدیر مسئول عبدالکریم

تاریخ تأسیسی : ۱۳۳۱


# روژ کرد


عدد : ۱

ژمار : ۱

۱۴ رجب سنه ۱۳۳۱ — شیمدیلک آیده بر نشر اولنور — ۶ حزیران سنه ۱۳۲۹




سلطان صلاح الدین ایوبی

[ حقوق مطبعه‌سی ] باب عالی جوارنده ابوالسعود جاده‌سنده نومرو ۱۹

Hejmara yekem a kovarê 6 ê Heziranê, ya duyem 6 ê Tirmehê, sêyem 1 ë Tebaxë (10) û hejmara çaran ku navê wê hat guherandın û bû Hetavi Kurd 23 yê Çırya Yekem sala 1913 an derket.(11) Her sê hejmarên yekemin sih û du rûpel derketıne,hejmara çaran nivê wan bû.Sernıviskarê sê hejmarên yekem, yekek navê wi Suleymani Ebdulkerim bû. Ya hejmara çaran Ebduleziz Baban bû. Kovar bı Tırki û Kurdi derdıket. Her çend kovar a xwendewaran bû lê belê, gelek kesên siyasi û yên bı nav û deng ên Kurdan,weki Necmeddin Kerkukli, Salıh Bedırxan û hınek ditır alikariya derketına wê dıkırın. Hêjayê gotınêye ku nıvisarên wek nıviskar Abdullah Cewdet, pır caran lı ser rûpelên kovarê hatıne belav kırın. Ew kes yek jı wan e ku bı İsmail Heqqi Babanzade re damezıranên Tırkên Cıwan * û dı

Kurd tercume kırıne. Bınêre; V.F.Mınorsky, Kurd, rûp. 18. B.Nikitin, Kurd, rûp. 290. Dı zmanê Kurdi de gotına Roj û Hetav bı eyni menë de nın. Dı kovara Almani de, dı gotareki de, bı zmanê Almani, bı rasti navê wê rojnamê hatiye tercume kırın. Bınêre; Die Welt des İslam, Berlin 1913, Band I. Hett 314, s. 221.

Pışti sansorê ewê qedexe kır, navê rojnamê kırın Hetava Kurd.

(10) Roji Kurd 1913, hej. 1-2-3.

(11) O.L.Vilçivski û M.S.Lazeriyev, bı xeletayi derketına Hetavi Kurd, sala 1914 an nıvisandın e. Bınêre; O.L. Vilçivski, Bibliyografya Weşanên Kurd ên lı Derve, dı Sedsala 20 an de. Zmanê İraniyan, I, Moskova-Leningrad 1945, rûp. 158, M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd, rûp. 139.

* Yê yekemKomela Tırkên Cıwan damezırand bı Abdullah Cewdet re, ne İsmail Haqqi Babanzade, İshaq Sukûti bû.(N.M.)

hukumeta Tırkên Cıwan de ji wezirê rewşenbiri bû. Dı wi wexti de, wan her du kesan dev jı Tırkên Cıwan berdan û hatın ketın nav tevgera Kurd. Tırkên Cıwan , bıryara jı bo mesela çareser kırına netewi bı ci nanin û wan mafên netewan pışt guh kırın. Ew bıryarê ku dı sala 1907 an, Partiya İttihad û Terakki dı kongra xwe ya duyem de lı ser wê meselê gırtıbû,ewê ci bı ci nekırın ku mafên wan nete wan bûn heta do bı wan re dıji rejıma Sultan têkoşin dıkırın.(12)

Hejmarên Roji Kurd jı İstenbul dıgihıştın Kurdıstanê. Lı ser vê baştırin belge, ew name û pirozbahiyên xwendewarên Kurdan ın ku jı bo rojnamê şandın e. Heqqi Medeni bı pirozbahiya xwe re perçek helbesta şairê mezın ê Kurd Haci Qadırê Koyi şandiye û kovarê ji wê belav kıriye.

V.Mınorsky, behsa belavkırına Roji Kurd dı Kurdısta-

---

(12) Dı weşan û edebiyata Kurdan de, rola gırıng a Abdullah Cewdet dı peydabûna ideolojiya tevgera Kurd de, behsa xebata wi nehatiye kırın. Lêbelê, şahıd û belge ên wi têkoşerê Kurd ew gotarın ku lı ser rûpelên Roji Kurd, xebat û wezifên ser mılên kesên Kurd, ka çı ne, belav dıkır. Derveyi van, dı weşanên Tırkan de ji lı ser diroka edebiyat û çanda Kurd, nıvisaran belav kıriye. Dı dawiya Şerê Cihanê yê Yekem de,roleki wi ya bı bızavi dı damezırandına komelên siyasi yên Kurdan de hebûye. Her wiha,pışti Şerê Cihanê yê Yekem,dı sala 1925 an de, ew nıvisandın û gotarên dı rojnamên Tırkan de lı hember serihıldanên Kurdan derketıne û ku ewan bı doza damezırandına dewleteki Kurd gunehkar kırıne, Abdullah Cewdet, dı dıji van nıvisandın û gotınan nerızaya xwe eşkera kıriye. Bınêre; Rojnama Akşam (Êvar) Kanuna Dûyem 1925 - Nıviskar.

nê de dıke û weha dıbê : "Lı ciyên wek Sılêmaniyê yên dûr dıhat belavkırın û dı kovarê de, serokên rewşenbir ên Kurdan, daxwaza belav kırın û jiyana mesela netewi dıkırın." (13) Lı gora kovarê, behsa hemû zor û zehmetiyên gelê Kurd û armanca wê, dı hemû qunc û derên Imparatoriya Osmani de tê kırın. Jı ber vi çendi, riyek weha danibû pêşiya xwe : Behsa yekitiya netewan, jiyana wan, guherinên cıvaki hwd. û behsa jiyana xelqê dıkır.

Roji Kurd , behsa xwendarê Kurd tenê nekıriye û bala wan tenê nekışandiye ser xwe. Behsa rojnamên Ermeniyan ji kıriye û bı awaki metıh lı ser derketına rojnama Horizon û gotarên ku tê de hatıne belav kırın sekıniye. Lı ba wê her weha bûye; ev kovarên han bira pêşkevtixwaz dı nav Kurdan de belav dıkın.(14)

Kovarê behsa siyaseta nıjadperesti ya Tırkên Cıwan a dı warê mesela netewi de kıriye û jı bo wê ji tenê çar hejmarên kovarê derketiye. Jı ber sebebên wan nıvisandınan, ewê gırtın û ketın dûv gırtına nıviskar û belavkırên kovarê. Dı dawiya Çırya Yekem sala 1913 an de, jı ber nıvisinên dıji siyaseta dewletê, peyamnêrê kovarê Salıh Bedırxan hat gırtın û hepıskırın. Rojnama Jamanak a Ermeniyan û rojnama Tercuman ya Tırkiyê, vê xeberê belav kırın e û weha gotıne : "Salıh Bedırxan dı kovara Roji Kurd de gotarek dıji kırdayetiyê nıvisi ye, jı bo wê ji karbıdestên eskeri lê geriyane û gırtıne xıstıne hepsê."(15)

Bı wi awayi dı sala 1909 an de lı ser rûpelên rojnama Tırkan hınek gotar hatın nıvisandın ku rexne lı siyaseta Tırkên Cıwan dıgırtın. Ew rexnên wan wek minaki lı ser tıştên we-

---

(13) V.F.Mınorsky, Kurd, rûp. 18.

(14) Horizon,.25 ê İlon 1913, hej. 214.

(15)Jamanak, 23 yê Çırya Yekem 1913, hej. 1600.

ha bûn; qanuna dı warê weşan derêxıstın û çapi de weha dıgot: Eger kırdayetiya mehelli an wali, dı rojnamekê an kovarekê de gotareki dıji dewletê bıbinın, ew dıkarın hem sernıvîskar, hem xwediyê wê gotarê û hem ji çapxanê bıgrın, ciyên ew weşan hatıne çap kırın lı wır derêxın dadgehê.(16)

Lı derveyi van zor û zehmetiyên dewletê, hınek asteng û gırıngiyên dın ji lı ber kovarê hebûn. Ew kesên berpırsiyar û derkerên kovarê,pıspori û şarazayiyeki wan a bı temami lı ser rojnamenıvis û derêxıstına warên kovari de tune bû. Dı ser van gışkkan re, zor û zehmeti ya rêzman û imlayên erebi û hınek tıştên wek wan ji lı ber derketına kovarê astengên gırıng bûn.

Lı gora wan gotar û materyalên dı kovara Roji Kurd de hatıne belav kırın, dıdın xûyakırın ku bı pırani lı ser jiyana Kurdan hatiye sekınandın. Dı hejmara yekem de gotarên Necmeddin Kerkukli;Komela Xwendewarê Kurd û Xızmeta Kurdan ya jı bo Makam-i Xilafet, yê Fexri; Dı Nav Kurdan de Qabiliyeta Hevdemi, yê Xarputli; Derd û Dewa, yê Mithet; Hêzên Hukumetê Yên Gıştı(Kuva-yi Umumiye-i Hukumet) û geleki ditır hatıne belav kırın.

Dı hejmara duyem de gotarên Lı Pêşberê Netewa We Wezifa We(dı bın vê gotarê de imza Daganê Bulgaristani heye, ne yê Abdullah Cewdet N.M.) û Riya Yekitiyê yên Abdullah Cewdet, Mısılmani û Kurditi yê İsmail Haqqi Babanzade, Her Ez Bım Keseki Dın Nebe, Bextreşi û Mehrumiya Kurdan, İbreta Ebdulkerimê Sılêmaniyê û Zıman û Nezaniya Kurdan yên X.Mudani û geleki dın têde hatıne belav kırın.

Dı hejmara sêyem de, ew kesên dı hejmarên pêşi de nı-

(16) K.Yost, Weşanên Anadol, rûp. 14.

visandınên wan hebû dı vê hejmarê de ji nıvisarên wan hatıbû belav kırın. İsmail Haqqi Babanzade; Pêşketına Kurdan, Ebdulkerimê Sılêmani; Yarmeti, X.Mudani;Bextreşi û Mehrumiya Kurdan û hınek gotar û babet nıvisandınên dın têde hatıne belav kırın.

Dı hejmara sêyem de, ew kesên dı hejmara pêşi de nıvisandınên wan hebûn,dı wê hejmarê de ji nıvisarên wan hatıbûn belav kırın. İsmail Haqqi Babanzade Pêşketına Kurdan , Ebdulkerimê Sılêmani Yarmeti , X.Mudani Belengazi û Jêrdestiya Kurdan û hınek gotar û babet nıvisandınên dın tê de hatıne belav kırın.

O.L.Vılçiviski, pır bı başi behsa kovara Roji Kurd dıke û weha dıbê: 'Ew nıvisandınên tê de hatıne belav kırın, pır bı eşkera bir û bawireya netewi ya wan kesan dıdın diyarkırın. Gotarê wê lı dıji perçıqandın, zılm û zora Tırkan ın û dozê lı Kurdan dıkın jı bo yekitiya hevxebata pêvajoya serxwebûnê û azadiya Kurdıstan.''(17) Dı hemû halan de em pır bı gotına ''netewi'' nerazi ne. Jı ber ku, lı ser yekemin rûpelên hejmara Roji Kurd , dı mesela siyaseta dıji Sultan de, armanceki kovarê ya bıngehin dı riya pêvajoya serxwebûniyê de tunebû ye. Wezifa kovarê ya bıngehin, propaganda rewşenbiri û handana Kurdan jı bo şarıstaniyetê bûye. Kovarê, pır bı dızi behsa çûna dıji dewletê kıriye û xwe niziki babetên weha nekıriye. Kovarê nekariye bı eşkera banga azadi û serxwebûni ya Kurdıstani hıkde. Ev bû-

(17) O.L.Vilçivski, A.n.d., C.I, Moskova-Leningrad 1945, rûp. 151.
О.Л.Вильчевский, Библиографический обзор зарубежных курдских печатных изданий в XX столетии. "Иранские языки", т.I, М.-Л., 1945, стр.I5I

yer zêdetır jı ber rewşa objektif û subjektif a wê demê bûye. Hewceye eva han ji jı bir neçe, kesên berpırsiyarên kovarê meyla bir û baweriya wan bı ber bir û baweriya Tırkên Cıwan ve bû û baweriya wan bı Tırkên Cıwan hebû ku wê qerarên xwe bı ci binın.

Bir û raya Mınorsky ya dı vi wari de rasteqinitır e : "Kovara Roji Kurd rewşeki wê ya netewi hebû".(18)

Dı vi wari de hewceye ku em vê ji bêjın; bı pırani çap û weşanên netewi lı ser mılên Roji Kurd bû û bı wasıta wê dıhat amade kırın.

Ew zor û zehmeti û paşkevtın, bı pırani jı ber sebebên paşvemayina rewşa rewşenbiri ya Kurdan bû. Kovar bı xwe, dı gotara Armanc,Rê de behsa vê meselê dıke û weha dıbêje : "Dıvê Kurd itiraf bıke, ku ew çawa jı şarıstaniyetê dûr ın, her wısa jı zanısti û rewşenbiri ji dûr ın".(19) Destek nıvisarên kovarê, çavkaniya vê paşketına rewşa Kurdan, vê zılm û zora bı berdewami lı ser gelê Kurd tê meşandın dızanın. Jı ber vê ji weha dınıvisın : "Kurdan beri hemû tıştan zanin ku xwendewari dı nav wan de pır kêm e û bı wi tışti hesiyan. Jı ber vê dizanın pêwıstiya wan bı zanısti û xwendınê ye. Pêgava yekem a riya şoreşgerên Kurdan xwendewariye." Kovarê bı vi awayi dıdomand : "Nıha şefeqa Hêviyê avêtiye, em dıkarın bı dıl û giyan bêjın, zordari hêdi hêdi namine. Dı nav Kurdan de me du meşale hılkıriye, an ji me du riyên hişyarkırınê çêkıriye; Hêvi û Roji Kurd" (20)

Lê belê, dı xebata rewşenbiri ya têkoşerên Kurdan de, dıvê eva han jı bira me neçe ku, ewan van xebatan ji xeba-

---

(18) V.F.Mınorsky, Kurd, rûp. 18.

(19) Roji Kurd 1913, hej. 1, rûp. 2.

(20) A.n.d.

ta xwe ya siyasi cûda nedıkır, wan her du rengên xebatê dı kovarê de dan xûyakırın. Dı vê gotarê de weha nıvisandine : "Dı pêvajoya azadi û serxwebûni ya siyasi de, em ê riya zanıstiyê nişan bıdın, bı tenê riyek ber bı wê armancê ve dıçe"(21) Roji Kurd, lı ser zehmeti û nerehetiya wê riyê nıvisiye : "İro cıwanan jı bo netewa xwe û hemû cihanê evê wezifê gırtıne ser mılên xwe û dızanın, dê dı vê riyê de gelek zehmeti û nerıheti ji derkevın, lê belê, ev zehmeti dê dı pêvajoya pêşketın û şarıstaniyetê de ciyê xwe bıgre."(22)

Roji Kurd, bı vi awayi zor û zehmetiyên dı aliyên komelên Kurdan de tehlil kıriye, roni kıriye. Roleki wê hemlê ya baş hebû dı afırandına ideolojiya Kurdewari de.

Ber bı vê re ji, kovarê behsa wezifa ser mılê xwe, riya rızgarbûn û pêşveçûna netewan dıkır. Lê belê, lı gora me, van rewşenbiran, bı başi nezanine riya xebata xwe destnişan bıkın. Ew "bira netewi" ji zêdetır jı bo menfeeta nıvisarên kovarê bûye.

Abdullah Cewdet, dı gotara Bir Hitab (Xitabek) de, lı ser wezifa komelên Kurdewari û handana wan jı bo hinbûn û zanıstiyê weha nıvisiye : "Em dı qonaxa avabûna netewi de dijin." Lı gora Abdullah Cewdet ji; "Netewek, ku ne xwedan şexsiyeta xwe be, derveyi bırek heywanên be hışi û nav nexwendi pê ve nabe tıştek" û bı vi awayi lı ser dısekıne û dıde xwûyakırın: "Netewe dirokeki meyandi (monoton) û sekıni nine. Jı nebatek dı bexçên me de, çiyan de, dareki ku belgên xwe yên hêşin dı aliyê hejina bayê de xwar dıke, jı derveyi vê tıştek nine."(23) Bı vi awayi

---

(21) A.n.d.

(22) A.n.d.

(23) A.n.d. ,rûp. 4.

dozê jı gelê Kurd dıke : "Sedsala em tê de dıjin ne henek e, sedsala 20'an e. Netewek ku xwediyê mêjû û rojên bên yên diroka xwe nebe, xwediyê xwe nine. Netewe û kesên ne xwediyê xwe bı xwe bın dıbın kole, dıbın malên ên dın."(24)

Abdullah Cewdet, vê mesela nazık, bı gırıngi xıstiye ber çavên wan rewşenbirên cıwanên Kurdan. Ewi dıgot hewceye em bızanın ka em çı dıxwazın, me dıvê serbıxwe azad bın, an dı bın siya Imparatoriyê de bıjin. Eger me navê em dı çarçova Imparatoriyê de bımının, bı çı awayi be ji, jı bo bıcianina vê armancê ji hewceye "xwendewari û şarıstaniyet" dı nav netewe de bête belav kırın.

Abdullah Cewdet, pışti du-sê mehan dı Roji Kurd kovara komela Hêvi de, lı ser wezifa ser mılên xwendewarên Kurd, gotarek nıvisiye. Ewê gotarê bala nıviskarên rojnama Ermeniyan a Jamanak kişandiye û gotara Abdullah Cewdet bı tevayi lı ser rûpelên rojnama xwe belav kırıne.

Abdullah Cewdet, bı awayek objektifi lı ser rewşa siyasicıvaki û abori ya netewa Kurd û lı ser paşvemayina wê nıvisiye. Pır bı tund û tuji rexne lı wan têkoşeran û welatparêzan gırtiye ku duri Kurdıstan dı İstenbul de, lı ser navê netewe dıaxıfın, her bı devki xebat dıkın û xwe lı wan deran dıveşêrın ku jı bo xebatê bıçne ciyên der û dorê jı Kurdıstanê dûr. "Wır deşte, pır warên gul û çiçekan ku bûne gorıstan û dı wan zeviyên bı xêr û bereket de ku bırçiti û feqiriya xwediyê wan tê de heye. Nıvisar dıbê; tenê bı hêvi û ramana baş serbesti bı destên Kurdan nakeve, riya rasti û çareser kırın, tenê vegerina nav netewe, nav Kurdıstan e. Bı wi awayi dıdomine : " Axaftın, munaqeşe û dest gırêdana lı vır, lı İstenbul, bê maneye, qet feydeki nagıhıjine

(24) A.n.d.

wan gundan jı bo nanê paxaç, şir vexwarın,gundi hişyar kırın û handana ber bı şarıstaniyetê, belê, evaye wezifa lı ser mılên cıwanên Kurd".(25)

Abdullah Cewdet,rızgarbûn û pêşveçûna cıvakê bı zanısti û xebatê ve gırêdaye. Abdulkerimê sernıviskarê kovarê dı gotara Her Ez Bım Tu Keseki Dın Nebe de, lı ser xebat û karê negıhişti, sewiya hışyari û bira netewi ya Kurdan nıvisiye û astenga hevnegırtına wan nıvisiye.Ebdulkerim,behsa rewşa hemû sebebên cıvaki û abori, paşvemayina cıvaka derebegi-otokrati kıriye û lı ser vi diwarê berxwedana dıji pêşveçûnê û guherandına wê nıvisiye û doz lı netewe kıriye ku bı xwendewari, zanısti ewê bıkarın vê astengê jı holê rakın. Weha gotiye: "Feqet dermanê cehalet gelek hêsane: Maarif. Maarif çıqas lı pêş be, netewe ew qas kamıl dıbe. Maarif çıqas taammum bıke netewe ji lı gor wê gav bı gav tewessu dıke."(26) Bı vi awayi Abdullah Cewdet ji, pêşveçûna rewşenbiri dı guherandına rewşa cıvaki-abori ya netewe de dı bine û dıbê : " Dı laşeki nexweş de hış û giyana rast vegır dernakeve." Nıviskar, geleki rastiyên tal û zehmeti û lı ser belavbûna nexweşi û bırçitiya dı rojhılata Imparatoriyê de sekıniye û dıbê; gundeki Kurdan lı nêziki Edenê yê ku 744 kes lı wır dıjin,jı bo eskeriyê bang lı wan kırıne, tenê dı nav wan de 12 kes bê êş, saxlem bûne.

Abdullah Cewdet, dozê lı cıwanan dıkır, bı kûri û firehi hemû sebebên rewşa cıvaki-abori ya jiyana netewa Kurd eşkera bıkın û bıkolın. Mesela hejmartına nufusa Kurdan û ciyên lı wır rudınên, cûre cûre kar û memuriyeta wan, rewşa wan a abori, hejmara jın û mêran, mırın û jı dayik bûn, hej-

(25) Jamanak, 31 yê Çırya Yekem, 1913, hej. 1608.
(26) Roji Kurd, 1913, hej. 2, rûp.21

mara xwendewar û nexwendewaran, peywendiya wan a abori bı netewên ciranên wan re, pişesazi û rewşa belavbûna ax û zeviyan û gelek tıştên dın gırtiye dest, lêkolin kıriye û lı ser axaftiye. Nıviskar bı vi awayi nıvisandiye : "Wek van meselên han ku dı nav netewe de dest dıkevın, ew wext em ê wan wezifan bı ci binın û bıkarın bıbın têkoşereki rasteqini dı riya pêşkevtınê de. Wê demê rutba mamostayeki dıbıstanê, dê jı ya qaymeqameki bılıntır bıbe".(27)

Necmeddin ku têkoşereki jı xelqê Kerkukê bû, peywendiyeki wi ya raste rast bı komela Hêvi re hebû. Dı gotarek xwe ya bı navê Komela Xewdewarê Kurd û Xızmeta Kurdan ya Jı Bo Meqam-i Xilafet de,pirozbahi lı kovara Roji Kurd kırıbû û dozê jı Kurdên cıwan dıkır ku xwe zêdetır nêziki netewe bıkın,tıştên rasteqini û bıngehin jı yê vala ciyê bıkın.Necmeddin bı vi awayi gotara xwe dıdomand:"Bı hişyarbûna rewşenbirên cıwan emê jı destê zılm û zoriyê rızgar bıbın."Lı gor Necmeddin,wezifa lı ser mılên her endameki Hevi-Hiwa,çûna nav netewe û bıhevre xebat kırın bû.Nıviskar her çend bı pırani nıvisandın û axaftınên xwe bı veşarti û tukılên (qalıkên) armanca xwe bı eşkera diyar nekırıbû ji, gotara xwe gelek bı gotınên hêja û ramanên bılınd xemlandi bû.

Bızava rewşenbir ya rewşenbirên Kurdan a dı warê danina rênıvisa Kurdi, vekırına dıbıstanan, xwendına dirok û çanda Kurdi, xemlandına hişyariya netewi û dı dawiyê de ji jı bo başkırına jiyana abori ya Kurdan xebat kırın de geş bûbû.

Wê guherandına cıvaki û siyasi ya ku şoreşa Tırkên Cıwan lı nava welat kırıbûn,kareki bıngehin kır jı bo belavbûna mesela rewşenbiri dı nav Kurdan de.Tırknasên Sovyeti Jeltya-

(27) Jamanak, 31 yê Çırya Yekem 1913, hej. 1608.

kov û Y.A.Petrosyan weha dıbên; salên dawiyê yên şoreşa Tırkên Cıwan, salên jiyan û geşbûna jiyana cıvaki, siyasi û çandi ya welat bûn.

Dı wan salan de bir û baweriya netewi ya Tırk, bı yek cari dı nav rewşenbirên Tırk de bı hêztır û xurtır bû.(28) Evê ji dı nav netewên dın de riya dıji Tırkan vekır.

Peydabûna bı Kurdi nıvisandın gaveki mezın bû. Ewê, carnan xwe dıkır astengek mezın lı ber pêşveçûna çanda Kurdi. Têkoşerên Kurd, lı ser rûpelên Roji Kurd , bı hemu awayi vê meselê nıvisandın û raberızin lı ser dıkırın. Ew guherandınên dawiyê ya şoreşa Tırkên Cıwan ku dı nıvisandınên Tırki de dıhatın pêşkêş kırın, tesireki wan a pır mezın lı ser nıvisandınên Kurdi kır û ewan ber bı pêş ve bır. Dı vê navê re Kurdan, lı İstenbul Komela Başkırın, Belav Kırın û Hin Kırına Alfabê damezırandın. Kar û barên vê komelê, çêkırına alfabeki nû ya Kurdi bû. Têkoşerê Kurd Abdurrehman Bedırxan, dı vi wari de weha nıvisiye : "Jı ber ku alfabeya Kurdi bıngeha wê Erebi ye, sistema fonetika zmanê Erebi jı bo Kurdiyê bı kêr nayê û jı ber vê ji danina pêwıstiya vê alfabê hatiye holê".(29) Dı yekemin hejmara Roji Kurd de Mesud Sılêmani dı gotara bı navê Herfên Me û Hêsankırına Xwendına Wan de bı vi awayi lı ser vê meselê nıvisandiye:"Pêwıste carek dın lı ser alfabeya Kurdi bê sekınandın."Lı gor nıviskar: sebebê aloziya dı warê nıvisandınê de ewe ku, gelê Kurd bı zanısti negıhıştiye şarıstaniyet

(28) A.D.Jeltyakov, Y.A.Petrosiyan, Diroka Rewşenbiri Lı Tırkiyê.

(29) Kurte Xeberek Netewên Ciranên Hev, Roji Kurd, hej. 4,,1913, rûp. 11.
Сводка сведений о сопредельных странах", № 4 , I913, стр.II.

û pêşkevtına Avrupayê, Hêjayê gotınêye ku nıviskar jı bo başkırına alfabeya Kurdi qet tu pêşniyarek ji neaniye.

Dı vi wari de M.S.Eziz (Salıh Bedırxan), programeki jı bo guherandın û temam kırına alfabeya Kurdi pêşniyar kıriye û ew peşniyar ji bı ci hatiye. Jı bo xwendın û nıvisandıneki rasteqini, afırandına alfaba Kurdi, geleki dıqqeta xelqê kışaye.(30)

Ew alfaba ku Salıh Bedırxan lı ser bıngeha alfaba Erebi danibû û pêşniyar kırıbû, dıxwest; têde heşt herfên dın ên dengên zman bên danin û ew ji bıkevın ser herfên bê deng yên alfabê. Dı rasti de, ew pêşniyar dı warê xebatê de ew qas ne rehet bû. Nıviskar û xwediyê pêşniyarê bı xwe dı wê meselê de baş gıhiştı bû û bı vi awayi dıgot : "Ez dozê lı bırayên Kurd dıkım, ew lı ser mesela alfabê bısekının û jı bo wê ji dan û sıtandına bir û rayê bıra bê kırın." Her weha, dozê jı kovara *Roji Kurd* dı kır ku qunceki taybeti jı bo çareserkırına vê meselê bê amade kırın.

Kovarê buhayeki pır mezın daye vekırına dıbıstanên nû. Her wek ku tê zanin, dıbıstanên Kurdıstanê yên kevnare, her ew hıcrên medresên dini bûn. Jı ber vê, armanca *Roji Kurd* ew bû ku qimet bı zanıstiya dınyayê bête dan. Dı wi wari de Abdulkerimê sernıviskarê kovarê dı gotara wxe ya Mındal Bo Çı Zû Fêrê Xwendın Nabi de, rexne lı riya ders gotın û hinkırına hıcrên medresan dıgre û weha dıbêje : " Dı ser vê re, dı hıcran de demeki dırêj tê xwendın, lê, dı destpêkê de hini xwendınê nabın" û weha dıdomine; " jı bo xwendına ılım melayên wan mızgeftan destpêkê de emır dıkın ku bı çend cari Cami bıxwinın, demên dırêj nıvisandınên Usameddin, Ebdulxefur, Ebdulhekim û Mıherrem Efendi dıxwinın û bı wan mıjûl dıbın. Ew hinê vê dıbın

(30) Roji Kurd 1913, hej. 2 , rûp. 12.

ku "dal" (herfa D) a Zeyd bo çı bore, wê "R" ya Emr bo çı mansub e."(31)Dı dawiya gotara xwe de weha dıbêje:Ev metoda han yarmetiya xwendewaran nade ku bı zû dı meselên siyasi û bûyerên welat de bıgıhên.Dı dıbıstanan de hewce ye behsa demokratiyet,parlamento,otokratiyet,qanûn û meşrûtiyet ûhwd.. bên xwendın.Ebdulkerim gotarê bı vi awayi dıdomine : "Çıqas baş e ku eger zarok zanıstiya abori û ya kışt û kal (Ziraat) û kimya bıxwinın". Nêrina nıviskar weha bûye, ku bı vi awayi xwendın dıkare kadroyên taybeti bıgehine. Pêwıste ku em dı hemberi wi de dest gırêdayi neminın.

Jı bo vê gûherandın û xwendınê, pêwıste zarok dı yekemin salên xwendınê de jı bo kar û barên cıvaki bên terbiye kırın. Dawiyê nıviskar dıbê ; kesi nediye ku, Avrupiyan zaninê xwe bê hile û derew jı bo kesên me bıkar binın.

Pêwıste em vê ji bêjın; gelek têkoşerên Kurdan, mesela xwendın û zanistiyê, jı bo zor û zehmetiya cıvaki xebat kırın, jı bo guherin û berewpêşvebırınan temam nedıkırın. Bı temami dı bıngeha çanda rojava negıhıştı bûn, jı bo vê dıxestın ku tovê çanda rojava dı Kurdıstanê de bıçinın. Bıngeha çiniti lı gora menfeeta wan bû. Jı xwe ewê nexıstın ber çav û eşkera, banga xebata dıji paşvemayi ya peywendiyên derebegi dı Kurdıstanê de hılnanibûn. Belê! Dı wê qonaxê de, programeki ya cıvaki, abori û siyasi ya rewşenbirên Kurdan bı eşkera, roni û bı qimet dı meydana xebatê de tûnebû. Tenê qimet dıdan mesela zanısti, belav kırına xwendewari û rewşenbiri. Ew ji her armanceki piroz û bı rûmet bû, derveyi wê tıştek nebû!

Hewceye em vê ji bêjın ku, dı Roji Kurd de, carnan gotarên lı ser guherandına rewşa abori û cıvaki dıhatın

(31) Roji Kurd 1913, hej. 1, rûp. 21.

belav kırın. Jı bo minaki; sernıviskarê kovarê, gotarek nav û nişana wê Tal û Şırini û Necdetê Diyarbekıri ji gotarek bı navê Cotkari belav kırıbû. Dı wan gotaran de, ne tenê lı ser bir û baweriya netewi nıvisandıbûn, her wê menfeeta çiniti ji dı wan afırandınan de xıstıbûn ber çav û eşkera kırıbûn.

Ebdulkerim dı gotara Tal û Şirini de, banga parastına bezırganiya burjuwazi ya nû jı dayik bûyi kırıbû. Nıviskar, dozê jı xweyi sermayedarên Kurdan dıkır ku hini hunera bazırgani, sermaye kom kırın û xıstına kar bıbın. Hemû cûre riyên bezırganiyê nişanê wan daye. Lı gor nêrina wi weha bû;ev karê lı ser vi wari bê kırın,dê bıngeha jiyana abori ya Kurdıstanê deyne. Dı wır de her weha dıgot; bızavek heye jı bo ku rewşa abori-cıvaki pêş ve bıbe, riya berewpêşveçûna şarıstaniyet nişani xelqê da ye û dozê jı dewlemendan kıriye ku dıbıstan û merkezên zanıstiyê vekın. Nêrina xwe ya dı wi wari de bı vi awayi domandiye ; rewşenbiri lı Avrupa çawa xelqê rêxısti ye, bezırgani, fabriqe û kargehan damezırandiye, bı wi awayi dı Kurdıstan de ji dı kare bıke. Lê belê, dı gotara xwe de nıviskar, yekcari dıji derebegi nesekıniye û derd û kulên wê sistema cıvaki nekıriye ku ew astengeki pır mezın lı pêşiya pêşketınê ye. Jı ber ku, eşkeraye ku dı wan cûre cıvakan de, bezırgani û sermayedari bı hezar benıkan ve bı sistema derebegi ve gırêdayiye.

Necdet, dı gotara xwe ya Cotkar de lı ser warên dın sekıniye. Wi gotara xwe lı ser gundên Kurdıstanê nıvisandiye. Nıviskar dı wê de weha dıbê : "Jı bo çı ax û zeviyên Kurdıstanê rıji ne û berên wan ne wek ên Avrupiya ne? Jı ber ku em alet û melzemên kevn, ew ji yên nû bıkar tinın" Her bı vi awayi dıji vê ji nıvisandiye ku, wek bıkaranina makinan bê dini û guneh e. Nıviskar weha gotiye : "Bıkaranina makinan tıştek baş e, ew kesê ku jı mın re bêje bıkaranina

wan guneh e, ew an derewan dıke an ji tışteki nızane". Necdet bı vi awayi dawiya gotara xwe tine : "Hewceye ku hûn ji jı wan hêdi hêdi peyda bıkın. Dê hûn dawiyê hêviya xwe bıbinın û qezenç bıkın. Bıla erdê me baş bê kolan, bıla bênderên me mezın bıbın û bıla çewalên me tıji bıbın".(32) Gotara Roji Kurd bı vi awayi dıdomine; zarokên xwe hini pişe û teknik bıkın. Ev bir û baweri, bir û baweriya netewi ya burjuwaziya nû jı dayik zabû,ya wê bû. Dıxwest rê lı sermaya biyani bıgre û nehêle serweta netewi bırıje Avrupayê.

Derveyi vê, kovarê, pır bı zireki dozê jı gelê Kurd kıriye ku peywendiyên xwe bı mesihiyan û netewên dın re baş bıkın. Siyaseta Sultan a "perçe bıke û idare bıke" ji lı ser rûpelên xwe ruswa kıriye. Lı ser vê meselê, dı gotara xwe ya Demê Kalê Me de sekıni ye. Dı wê gotara xwe de evê ji xıstiye ber çav û gotiye ku, ne gelek dûre ku hınek dest û tıliyên mısılmanên kevneperest ji dı vê meselê de hebe.

Hewceye ku eva han qet jı bira me neçe ku rewşenbirên Kurdan, roleki wan a baş dı belav kırına bira netewi û hişyariya siyasi de heye. Wek minaki, dı van gotaran de; Hişyarbın! , Zerarên Nezanina Kurdan , İbret û geleki gotarên dın de wan meselan kolan e.

Ebdulkerim, bersıva wan gotın û şayiên dı Avrupa de belav dıbın û ku dıbên; "edeb û zmanê Kurdan tune" dıde û bı xurti dıji wan dısekıne. Dı gotara xwe ya İbret de navên çendin şair, nıviskar û mırovên zana û jêhati yên siyasi ên Kurdan dıjmêre û dıbê ku, ciyê iftixar û serbılındiyê ye ku dı nav Kurdan de mırovên wek Şêx Maruf, Notşi,Qızılci,, Çuri, Şêx Qadırê Pencwini, Kak Ehmed , Mewlana Xalıd, Nali, Salım, Mustefa Begê Kurdi, Haci Qadırê Koyi, Şêx

(32) Roji Kurd 1913, hej. 1, rûp. 27.

Rızayê Telebani û çendin ên dın ên bıjare derketıne.(33)

Kovarê bıryar daye ku afırandınan çap bıke. Dı vi wari de weha dıbêje : "Ciyê heyf û mıxabıniye ye ku, xwendewaran afırandınên wan xebatkaran bı çapkıri neditı ne". Dı kovarê de hınek helbestên Haci Qadırê Koyi hatıne belav kırın ku ewan helbestan bı awaki gırami dı kovarê de weşandıne.

Dı her du hejmarên yekem de, bı qelema Fuat Temo çirokek cıwan û bı zmaneki rewan hatiye belav kırın. Ewê çirokê geleki bal kışandiye û dı babetê xwe de yekemin minaki nıvisandına nesır bû ye ku dı kovarê de hatiye belav kırın. Ew çirok behsa jiyana nebaşi û neraziya feqir û jaran dıke. "Şıvaneki pehlewan i bê pışt, feqir û jar, parastıngeha wi cıvakê û derdên wi çarenıvisa netewe ye". Jı ber vê nıvisarê kovar tê gırtın û çirok ji hemû nayê belav kırın. Dı vır de ne mumkune mırov bıkare dı hemû rûyan de lı ser wê afırandınê bınvise. Tenê beşa hati çapkırın, serekaniya wê dıde xûyakırın ku, nıviskar dıxwaze aşiti bıxe navbera axa û gundiyên Kurdıstanê. Nıviskar bı vi rengi dınvise ; Kurd çı axa çı gundi her Kurd e, bê ferqiti destê Tırkan de tê perçıqandın û mafê wan tên xwarın. Dı rastiyê de ji ewan dı nav Kurdan de behsa wan ferqên çiniti nekırıne, ev ji riya eşkera û ya xwûya a kovara Roji Kurd bû.

Her ku me berê behs kır, armanca kovarê handana netewe jı bo hımbêzkırına zanısti, şarıstaniyet, yekgırtına rêza gelê Kurd û bılınd kırına jiyana abori-cıvaki bû. Derveyi vê, yên rojnamê derdıxıstın nûnerên çinekê bûn, ku nedıkarin hınek mesele bı kûri û esasi çareser bıkın. Sansor ji astengek mezın bû lı ser riya behs kırına hınek meselan. Salıh Bedırxan, dı gotara xwe ya Hişyarbın! de, bı awaki şewat û hesret weha nıvisi ye : "İro tu netewe tune ku nexwediyê

(33) Roji Kurd 1913, hej. 1, rûp. 27.

panzde kovaran be. Bı van kovaran rewşa xwe dıxın ber çav, derdên xwe dıkolın û belav dıkın, daxwazek wan hebe dıxwazın. Kovar jı hemû netewan re dı ciyê xwarınê de ye, heçi netewa bê kovar e ew wek mıroveki lal e, ne dıkare derdên xwe bêje û ne ji dıkare seh bıke, ka hal û rewşa wê çi ye".(34)

Bı van nêrinên pıçûk re, me behsa rewş û nêrinên kesên ku kovarê derdıxıstın kır ku ew bı wan zor û zehmeti, tengi û dıjwariyên mezın dest pêsir bû bûn. Kovar organa Kurdên cıwan ên pêşketixwazên wi wexti bû. Dı ber vê re demeki kurt derket, lê belê, dı wi wexti de kari bıbe eyna armanc û bira netewi ya Kurdan û kari bıbe neynıka bir û baweriya Kurdayeti. Bı awayek temami ji, tesira şarıstaniyeta Avrupa û hınek nêrin û rêvebırınên Tırkên Cıwan, lıb lıb dı wê kovarê de reng daye. Kovar, belavkırê ideolojiya burjuwazi demokrati ya Kurd bû. Ciyek wê eşkera dı warê rojnamenıvis û çanda Kurd de heye.(35)

Dı sala 1915 an de çapxaneki Kurdi hat damezırandın. Ev bûyereki gırıng û bı qimet bû dı jiyana cıvaki, rewşenbiri

---

(34) Roji Kurd 1913, hej. 2, rûp. 23.

(35) Celilê Celil, Kovara Roji Kurd, wek serekaniyeki bira cıvaki a Kurdan, dı destpêka sedsala 20 an de. Belav kırox; Welat û Netewên Rojhılata Nêzik û a Navin, Kurdnasên Êrivan 1975 Êrivan, rûp. 89.

Джалиле Джалил, Журнал "Рожа курд" как источник изучения курдской общественно-политической мысли начала XX в., сб. "Страны и народы Ближнего и Среднего Востока", т.7, "Кур-доведение", Ереван, 1975, стр.89.

ya Kurdan de. Her wek mesela zanısti, rewşenbiri, mesela çap û weşan ji,kareki mezın kırıbû lı ser netewên İmparatoriya Osmani. Lı Bexda, Şam, Heleb û bajarên dın ku bûbûne merkezên rewşenbiri û zanısti jı bo Ereb û Kurdan û netewên dın, jı ber vê yekê ji dı van bajaran de jı bo pêşvebırına rewşa çapxane û çapi bızaveki mezın hebû. Dı Kurdıstana bakûr de, hem jı ber sebebê çanda Kurdi ya kevnare û rehên wê yên dı kurayê de çûyi û hem ji jı ber çanda Erebi û Farısi ku dı mıleki dın de tesirê lê kır, rewşa çandi, zanısti û giyana Kurdayeti geş bû û pêşve çû û xwendewar, rewşenbir û zaneyên baş dı nav wan de derketın.

Dı destpêka sedsala 20 an de Iraq dı warê siyasi, abori û rewşenbiri de, dı bın kırdayetiya xırab û paşvemayi ya İstenbul de bû. Vê kırdayetiyê wesa kırıbû ku, Ereb û Kurdên Iraqê, heta dereceki bûbûne warên ajardanên nû. Bı taybeti bajarê Bexdayê dı wê meselê de rolek kıfş û mezın dılist.

Dı şerê Yekemin yê Cihanê de, İngiltere pır hewıl da û hêzeki mezın xıste kar jı bo wan navçê Ereb û Kurd ên Iraqê jı İmparatoriya Osmani bıqetine û bıxe bın destên xwe. İngiltere dı eyni wexti de hez nedıkır yarmetiyê bı doza hêzên dıji Sultan bıke û bı xweşi destên yarmetiyê neda rewşenbirên Ereb û Kurdan. Tıştên ku dıkır ji jı bo qaimkırına şûnpe û cıyên xwe, pıştgıriya tevgera têkoşerên rewşenbir a wan netewan dıkır. Dı dawiya şer de, İngilizan çend kıtêb û kovarên bı zmanê Kurdi derêxıstın.

Dı nav Kurdên Mukriyan de diroknıvis û edibê hêja Huseyn Huzni yekemin çapxana Kurdi damezırand. Roleki Huzni ya bê hempa û gırıng dı warê çap û weşani de heye. Huzni, baş dı rola belav bûna çap û weşanê de gehişti bû. Jı ber vê yekê dıxwest rewşa rewşenbirên Kurd bıxe qonaxeki dın. Jı bo vê ji bı sermaya xwe ya kêm ve, biryara damezırandına çapxaneki Kurdi da. Jı bo vê armancê çû Al-

manyayê û çapxwanekê pıçûk a bı herfên Erebi kıri. Dı destpêka sala 1915 an de bıre Helebê, lı wır jı bo fonetika Kurdi, lı ser bıngeha zmanê farısi hınek işaretên nû durust kır. Careki dın jı bo wi kari çû Almanya û dawiyê vegeriya Helebê û dest avêt kıtêb çapkırınê.(36) Bı tevayi dı xebat û karên çapkırına kıtêban de bı xwe dıxebıti. Jı bıli kıtêb çapkırınê, dı çapxana Huzni de kovara Kurdıstan, Çiyayê Kurmanc, Botan, Diyarbekır(37)... hatıne çapkırın. Çapxana Huzni heya sala 1925 an lı Helebê bû. Wextê serihıldana Şêx Seid dest pê kır, Huzni bı Kurdi-Fransızi kovara Diyarbekır derdıxıst û lı ser rûpelên wê pıştgıriya vê serihıldanê dıkır. Jı vê kovarê çend hejmar derketıne.

Dı sala 1925 an de çapxane jı Helebê bır Bexdayê û jı wır ji bır Rewandızê. Lı wır navê çapxanê dani Zmanê Kurmanci (38).

Pıştı mırına Huzni dı 20 ê İlona 1947 an de, bırayê wi Mamoste Giw çapxane bır Hewlêr. Huzni, dı warê nıvisandınên diroka Kurdan de gelek afırandın xıstıne berdest. Wek : Awreyeki Paşewe, Paşayên Kurdên Zend, Mirên Soran, Navdarên Kurdan, Kurd û Nadır Şah... hwd. nıvisiye. Her weha bırayê wi Giw ji heya mırına xwe xızmeta edeb, dirok û çanda Kurdan kıriye û xebat, ked û afırandınên xwe jı bo netewa xwe amade kıriye.

Misyonerên Avrupayê bı taybeti yên Almanan destên wan

(36) Mukriyani, Pêşgotına kıtêba Pêşketın, rûp. 10. Hêjayê gotınêye Huzni nıviskarê vê kıtêbê ye.

(37) El-Teaxi 1973, hej. 1257.

(38) Tê xûya kırın ku, Huzni bı vi navi kovarê derdıxıst. Heta 1926-1932 jina xwe domandiye, 40 hejmar jê derketiye.

dı handan û peydabûna weşanan dı Kurdıstanê de hebû. Dı destpêka Şerê Cihanê yê yekem de, Almanan dıxwestın bı hemû avayan tesirê lı Tırkiya bıkın. Alman jı bo ku bı karın Kurdan bı aliyê xwe de bıkêşın, meselên bıngehin ên xwendınê anibûn holê. Wezifên lı ser mılên wan misyoneran ji ew bûn ku bı zmanê wan netewên rojhılat, propaganda Almanan belav bıkın.

Almanan, dı meha Nisana sala 1914 an de, lı Seblax(Mahabat) kovarek pıçûk bı navê Kurdıstan (39) derxıstın. Dı wê kovarê de babetên cıvaki û edebi hatıne nıvisandın. Lı ser wan nıvisandınên ku dı kovarê de hatıne belav kırın weha hatiye gotın : "Almanan dı beşa cıvaki de û jı bo propaganda xwe, bı Kurdiyeki xırab gotaran belav kırıne. Mesela Ariti , nizikiya Alman û Kurdan dıxıstın ber çavan. Dıxwestın hêz û imkanên mesihiyan lı hember İslamiyetê derêxın. Dı beşa edebiyatê de ji hınek caran helbestan bı ramaneki xırab jı bo wan armancên xwe û car carnan ji hınek ew afırandın, nıvisin û hwd. ku kom kırıbûn belav dıkırın".(40) Kovar, dı İranê de hatiye belav kırın û armanca wan ew bûye ku Kurd xwe bıdın ser mılên Alman û Tırkan. Demeki kın derketiye û dı salên Şerê Cihanê yê Yekem de sekıniye.

---

(39) Mınorsky, Kurd, rûp. 19. Lı gora Seccadi wıhaye ; ew kovar sala 1921 an hatiye derêxıstın, Bınêre; Elaeddin Seccadi, A.n.d. Bexdat 1952, rûp. 522.

(40) O.L.Vilçivski, A.n.d. , rûp. 159.

## XEBATA RÊXISTINÎ-SÎYASÎ YA EBDURREZAQ BEDIRXAN

Dı dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de, em dıbinın ku dı nav hınek xebatker û komelên Kurdan de, dılxaziyek jı bo peywendi danin bı Rusya re peyda dıbe. Her çend ew bı roni dı destpêka sedsala 20 an de derketiye, lê belê, wexteki dırêji kevn de reh û rişên xwe dı nav Kurdan de avêtı bû. Ew dılxwazi dı wextê şerê Kırımê de derket. Wi. wexti Kurdan dest avêtıne serihıldaneki wesa, ku Asuri, Yunan û nûnerên netewên dın ji bı wan re çûn û yarmetiya eskerê Rusya kırın. Şoreşgerên Kurdan, nameyek şandıbûn û dıxwestın alikari û êrişên xwe bı yên eskerên Rusya re bıkın yek. (1)

---

(1) Tomar (Tescil) a Komita Arşiva Qafqas, T.OP, rûp. 957, P.Y. Avriyanov, Kurd, dı Şerê Navbera Rusya, İran û Tırkiyê de. Tiflis 1900. Lı ser serihıldana Kurdên Êzıdiyan dı bın serokatiya Şêx Mirza. Bınêre; Celilê Celil, Kılamên Kurdên Êzıdiyan. Lı ser derêxıstına van lı Rusya, dı 30 yê sedsala 19 an de, berhevkırınên Zmanê İraniyan, Leningrad, rûp. 130-144.

Pışti vê bûyerê, eskerên Rusya êrişek bır ser bajarê Bazidê (Doğubeyazit n.m.), wi wextê serokê serihıldana Kurdan Izzeddin(2) doz jı serokeskerê Rusya kır ku hêz û gıraniya eskerên xwe ber bı bakur ve bine.

Dı wi wexti de Şêx Ubeydullah ji ku dıxwest lı dıji Tırkiyê û İranê serihıkde, xebat dıkır ku alikariya Rusya bıgre. Jı bo vê, proja han pêşkêş kırı bû; Şêx dıxwest istifade jı rewşa nav dewletan bıke. Şêx Ubeydullah, bı peyamnêrê xwe çendehan car diplomatên Rusya yên Tırkiyê û yên İranê agahdar dıkır û evê rastiya han jı wan re dıgot : "Jı ber ku Rusya ciranê Tırkiyê ye ıhtırama wan bı sedan car jı a Ingılizan pırtır e lı cem me. Rusya, baştıre bıbe hevalê şêr ne yê rovi."(3) Şêx Ubeydullah, hez jı siyaseta Ingılizan a durû nedıkır, dıxwest peywendi bı Rusya re dayne. Eva han ji her dıda ber çav; rojên bên Rusya bı Tırkiyê re bıkeve şer, Kurdıstan dıkare bıbe palpışteki mezın jı wê re.(4) Vê armanca xwe ji jı gelê Kurd re roni dıkır û dıxwest ewan ji bı vê riyê agahdar bıke û wan ji bine ser vê riyê.

Derveyi wê, serokên Kurdan dı nivê dawi yê sedsala 19 an de, bı rasti dıxewstın serxwebûna Kurdıstan bı yarmetiya Rusya bıparêzın. Lê belê, ew mesele, bı wi rengi jı aliyê Rusya ve qimet pê nehat dan û Rusya jı bo wê amade nebû. Gelek sebebên wê mesele hene; yek jı wan, nebûna rêxıstı-

---

(2) Bınêre; M.Dixotin, Rusya Dı Asya Tırkiyê de, salên 1854 û 1855, Peterborg 1863, rûp. 257.
М.Лихутин, Русские в Азиатской Турции в 1854 и 1855 годах;СПб.,1863, стр.257.

(3) P.Y.Avriyanov, Kurd, Dı Şerê Navbera Rusya, İran û Tırkiyê de.... rûp. 227, Celilê Celil, Serihıldana 1880 a Kurdan, Moskova, 1966, rûp. 54-55.
Джалиле Джалил, Восстание курдов в 1880 г., М., 1966, стр.54-55.

neki cıvaki-siyasi ku bı wi awayi bıkare dı nav Kurdan de pêşengiya serihıldana netewe bıke. Sebebên dın, paşvemayina rewşa cıvaki ya Kurdıstan, nebûna ideolojiyeki ronak û eşkera ya netewi û hınek sebebên dın...

Armanca netewa Kurd ya dı wê qonaxê de, dı Rojhılata Navin de bı menfeeta mêtıngehkarên Rusya re lı hev nedıhat. Jı ber ku, dı wan wextan de jı bo wan xelqên mesihi yên dı nav Imparatoriya Osmani de bûn, dıxebıti û pıştgıriya wan dıkır ku ewan bı ber xwe ve bine û bı xwe ve gırêde. N.A.Xalfin weha dıbê: 'Heta sala 90 ya sedsala 19 an, dı Kurdıstanê de bızaveki Rusya nayê ditın. Xebata wan her zanin û hişyar kırına pışt Qafqasya bû. Eva han ji Kurdan jı bira wan derêxıstı bû.''(5)

Dı qonaxa emperyalizmê de, netica tund û tûj bûna dıjiti û xebata navbera Avrupiyan, jı bo dest danina ser hebûnên abori-siyasi yên navçên rojhılat û belaş bırına serwet, xêr û bêrên bıninehati yên wan navçan, belê; dı netica wê de, guherandınek bı ser siyaseta Rusya ya Rojhılata Navin de hat. Dı sedsala 19 an de hemû navçên rojavayê İranê ketıbûn bın destên Rusya yê. Wek minaki; dı destpêka sedsala 20 an de, Mehabat bûbû bazareki mezın jı bo dan û standına kel û pêlên (malên tıcaretê-werger) tıştên Rusya. Malkır û fıroşên Kurdan ji hez dıkırın peywendiyên bezırganiya wan bı Rusan re berdewam be.(6) Her weha, bazırganiyeke kêm ya Rusya dı nav navçên Tırkiyê de ji hebû. Dı wan wextan de êdi navê Kurdan ji, dı şerê menfeeta siyasi de derbaz dı bû

---

(4) A.V.P.R. (Arşiva Siyaseta Derve a Rusya), bıngeh, konsolosxana İstenbul, 1879, A.1565.

(5) H.A.Xalfin, Şer Lı Ser Kurdan, Moskova 1963, rûp. 153
Н.А.Халфин, Борьба за Курдистан, М., 1963, стр.153.

(6) M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd, rûp. 41.

û hesabê wan dıhate kırın. Meselek dın ji hebû ku Rusya guh dabûyê, ew ji eva bû; Sultan Abdulhemid siyasetek nû gırtıbû ber xwe û Suwarên Hemidiyan jı eşiretên Kurdan pêk anibû û wek hêzeki şerker lı ser sınorê Rusya danîbû. Dı sala 1896 an de lı Tıflisê, Generalê Dıbıstana Rusi Kartsov, broşureki pıçûk lı ser Kurdan derêxıst.(7) Dı wê bruşorê de bı kurti behsa peywendiya Rusya û Kurdan a dı şerê Rusya-Tırkiyê de hatiye kırın. Lı ser fermana serokê dıbıstana Qafqas, General F.N.Bilyaviskov û P.Y.Avriyanov, lı gora wan malumatên wan û arşiva dewlemend a dıbıstana Qafqas, dı sala 1900 an de kıtêbek lı ser Kurdan derêxıstın. Wê kıtêbê rewşa gelê Kurd a şerên dı navbera Rusya-İran û Tırkiyê de dı sedsala 19 an de çêbûne daye xûyakırın.(8) Nıvisandına wê kıtêbê beşeki jı siyaseta Rusya ya nû bû lı ser Kurdan. Lı gora wê siyasetê, Rusya dıxwest ku netewa Kurd dı eniya şer de bı aliyê xwe de bine, an ji nebe,bê deng an ji bê terefiya wan temin bıke. Dan û sıtandın û peywendiya konsolos û cigırên konsolên Rusya yên İran û Tırkiyê lı gora wê siyasetê lı Kurdıstanê dınêrin û ew ajoyên (yê kar dımeşine n.m.) wê siyasetê bûn.

Dı destpêka şerê cihanê yê yekem de, tevgera azadixwaz a netewa Kurd qalık û teşeki (formeki) nû gırte xwe û programa xebata siyasi-cıvaki ya cûre cûre tê de peyda bû.

Dı sala 1913 an de, dı gotarên çavdêrên siyasi yên rojnama Bakûya Zayim (Dengê Bakû) (9) a Ermeniyan de, tesira riya Rusya lı ser tevgera azadixwaz a Kurd, wek rehberiyeki bıngehin û esasi hatiye nıvisandın. Lı gor wi çavdêrê navê wi derbaz dıbe, ev mesele weha bû ye; rehberiya wê riyê Ebdurrezaq Bedırxanê têkoşer û siyasiyê bı nav û dengê Kurdan kıri ye.

---

(7) Kartsov, Hınek Gotar Lı Ser Kurdan, rûp. 2.

(8) P.Y.Avriyanov, A.n.d.

(9) Bakuya Zayim (Dengê Baku) 1913, İlon, rûp. 124.

Ebdurrezaq, kurê mezın ê Bedırxan Begê lawê Necib Paşa ye. Sala 1846 an lı İstenbul jı dayika xwe bû. Dı zarotiya xwe de -lı gora wan rojan- xwendıneki baş kır. Hini zmanê Avrupa rojhılat bû. Fransızi zanina wi pır yarmeti dayê û feydeki jê gırt ku dı şoreşa Fransa û bir û baweriya demokrati-burjuvazi ya Fransayê bıgehe. Wextê Ebdurrezaq xwest bıçe Fransa jı bo xwendınê, Sultan Ebdulhemid astengek mezın jê re derêxıst û nehışt ew karê han bıserbıkeve. Ebdurrezaq dı biraninên xwe de weha dıbê : "Ez baş tê gehıştım ku Sultan jı bo çı nehışt ez bıçım xwendınê. Jı ber ku, naxwaze yek kes jı malbata me şarıstaniyeta Avrupa bıbin e û şareza bıbe."(10) Mamostayê bı nav deng ê Kurd Haci Qadırê Koyi mamosteyê zarokên Bedırxan bû.Tesireki wi ya mezın lı ser cıwaniya Ebdurrezaq hebû(11)Dı dawiyê de dostiyek mezın û bı giyani dı navbera her duyan de pêk hati ye.

Ebdurrezaq, çend salek dı wezareta Derve ya Tırkiyê de xebıti. Dawiyê bû sekreterê sêyem yê konsolosê Tırkiyê yê Leningradê. Lı wır hini Rusi bû û şarezatiya xwe ya lı ser jiyana cıvaki-siyasi û çandi ya İmparatoriya Rusya pêş ve bır. Jı ber wê dosti û peywendiya xurt a Rusya madalya dereca duyem a Stanislavi wergırt.(12) Pışti saleki dın bû sekreterê duyem ê konsolosê Tırkiyê yê Tehranê. Ebdurrezaq dı wi wari de weha dıbê : "Wextê xwestın ez herım ser karê xwe, ewan mın bı guneheki siyasi gunehkar kırı bûn û bı fermana hovi a Sultan Ebdulhemid, mın jı Sasonê anin û lı İstenbul mın dane rûnıştandın."(13) Bı wasıta konsolosê Rusya yê İstenbul, Ebdurrezaq dıxwest xwe jı destê Sultan

(10) Arşiva Dewleta Gurcistan.

(11) Mehemedê Mela Kerim, Haci Qadırê Koyi, şaırê qonaxeki nû ye... rûp. 80. Kerim Şareza, Koy û Şaırên wê, Bexdat 1961, rûp. 210.

(12) A.n.d.

(13) A.n.d. , rûp. 7.

rızgar bıke. Dı İlona sala 1894 an de jı Tırkiyê bazda çû Sivastopol û jı wır ji jı bo ku bıçe Êrivanê derbazi Tıflisê bû. Armanca wi ew bû ku xwe niziki Kurdıstanê bıke.

Bazdana wi, koşka Sultan xeyidand.(14) Jı ber ku, ketın tırsê ku dı navçên sınor de alozi peyda bıbın. Ebdurrezaq dı navçên Qafqas de dest avête xebatê. Lı gora serokeskerê Tırk yê bajarê Erzurumê; ewi fermaneki jı bo serokeskerê Rusya yê Tırkiyê ani ku maaş bıdın serokeskerên Kurdan û ev ji bıbe sebeb ku qet nerızayiyek dı navbera wan de peyda nebe.(15) Sultan dozeki mezın jı Rusya kır ku Ebdurrezaq jı Rusya derêxın. Ebdurrezaq dı riya dostên xwe yên Petersborgê re gelek hewıl da ku ew ferman ci bı ci nebe, lê, ew bızav û hewıldana wi bê feyde ma.

Ebdurrezaq, jı Rusya derbazi İngiltere bû û lı wır peywendiyeki xurt bı rêxıstınên gelên muhacır ên netewên bındestên İmparatoriya Osmani re peyde kır.Ewi lı Londra peywen diyeki xurt bı rêxıstınên Ermeniyan re dani. Pişti çend salan Sultan, bı wasıta kalê wi Necip Paşa kari Ebdurrezaq bine İstenbul. Wextê Ebdurrezaq hat İstenbul Sultan wi kır serekê teşrifata koşka Sultan. Her çend wi ciyi jê re amade kırın, lê, disa sixor û peyayên Sultan bı dûv de bûn û çavdêriyê lı ser dıkırın.Heta dı bın çavdêriya wan de çend car ewi bı kuştınê tehdit ji kırın.

Dı sala 1906 an de, jı ber sebebê kuştına wali Rıdwan Paşa û serokeskerê Sultan, rojnamên derve û yên hundır disa lı ser navê wi sekının.(16) Ebdurrezaq Bedırxan, Eli Cemil Paşa û 25 Kurdên dın jı ber vê kuştınê hatın gırtın. Ewan bı komek heresan ve bı tırs û lerz şandın Trablusa Afrikayê. Dı bın serokatiya Necmeddinê ku dı kevneperestiya xwe de bı

(14) Mişak 1904, 22 yê İlonê, hej. 189-190 (Bı Ermeni)

(15) A.n.d.

(16) Bınêre ; M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesal Kurd, rûp. 116.

nav û deng bû, qomiteki taybeti damezırandın û şandın Trablusê. Wê qomitê cezayê mırınê jı wan kesan re dıxwest. Ew deng û behs jı Trablus dıgihiştın paytext. Peyamnêrê rojnama Tıfliski Listok weha dıbêje: "Ew xeberên dılnexweşi ku jı Trablusê tên weha dıbêjın :.Hukumeta Tırkan bê rehım, işkence û cezayên cûre cûre dıde wan Kurdan. Eger dest jı wan gunehan neyên kêşan dê têkılhevi dı nav Kurdan de belav bıbe."(17) Lı gor xeberên ku dıgıhiştın İstenbul gırtiyan dıjitiya xwe ya lı hember Sultan venedışartın. Ebdurezaq namek jı Sultan re nıvisandıbû û tê de gotıbû ku qet agahdariya wi dı kuştına Rıdwan Paşa de nine. Eli Cemil Paşa ji, dı nameyek dın de bı xurti lı ser çavsori, destdırêjayi û işkencên Necmeddin sekıni û daxwaz dıkır ku ew bê ceza nemine; cezayek gıran jı wi kesi re bê dan.(18)

Derveyi van xeberan, lı İstenbul gelek deng û behsên dın ji belav dıbûn. Der û dorên Sultan Ebdulhemid her dı gotın ku; bı tevayi belge dı destên me de hene ku ewan pilana kuştına Sultan dane ber xwe. Lı ser wê meselê weha dıhat gotın; guya, gırtiyan jı bo guherandına Yusuf Izzeddin pilaneki dızi çêkırıne û xwestıne ewi dı İstenbul û Kurdıstanê de ci bı ci bıkın. Dı ber vê re ji gelek mırovên der û dorên koşka Sultan bıkujın.(19) Tifliski Lıstok bı vi awayi nıvisi bû: "Sultan, tırseki mezın lı ser Kurdan peyda kıri ye. Lı ser tuhmeta wê pilanê, Ebdurrezaq û hınek Kurdên dın derêxıstıne ber dadgehê, cezayê heta hetayi(muebbed) dane wan û ewan avêtıne gırtigehê."(20)

---

(17) Tifliski Listok (Rûpelên Tiflis) 1906, 5 ê Gulan, hej. 94, rûp. 3.

(18) Mişak 1906, 3 yê Nisan, hej. 119 (Bı Ermeni).

(19) Tifliski Listok 1906, hej. 44, rûp. 3.

(20) Lı ser wi Kurdê bı nav û deng, dı nav Kurdên İstenbulê de pır nerızayek mezın peyda bûbû. Polis, jı bo paras-

Lutfi, dirok nıvisek bû ku dı wi wexti de jiyaye. Dı kıtêba xwe de lı ser Bedırxan sekıniye û xwestiye mesela kuştına Rıdwan Paşa wek meselek şexsi bı de ber çav. Ew nıviskar weha dıbêje: "Dıbêjın Ebdurrezaq kuştiye û Eli Cemil Beg ji beşdari kıriye. Ew çax gunehê Mithed, Hesen û Ebdurrehman Beg çiye? Gelek ciyê şermê û nenzayiyê ye ku yeki wek Salıh û yeki wek Huseyn Begê sed sali şandıne Rodosê. Zarokên dıbıstanan ku salên wan nagihijın 12 an û van jınên bêpışt û jêrdest dı malan de esir kırıne, gunehên wan çi ye?" Ev diroknıvis bı eşkera weha dıbê : "Zıravê Sultan jı bınemala Ebdurrezaq qetiya ye."(21-22)

Ebdurrezaq dı biranên xwe de weha dıbê: "Hemû kesên xêzanên mın ku dı İstenbul de dıjiyan, xızm, mırov, der û dorên mın û lı gel 3 hezar kesên dın, bı ber lehiya gırtınê û ceza ketın, an ji hatın surgun kırın. Ez serokê teşrifatê bûm ku, ewan bı yek cari mın şandın gırtigeha mezın. Pişti çend seetan mın xıstın keştiyeki dewletê ku ew dıçû Mekkê, lê, dawiyê ewan mın şandın Trablusê û lı wır ji, mın avêtın zındanê. Bı fermana Sultan dı zındanê de mın qeyd û zıncir kırın, pıştre ji ewan mın avêtın zındaneki yekcar xırab.

"Pışti mehek, komiteki jı karbıdestên mezın a Wezareta Adliyê bı keştiyek taybeti gehişt Trablusê û bı fermana Yıldız ewê tuhmetê gelek zû bı ci anin ku qerarê bı xwe re ani bûn. Ew dokumentên wê komitê amade kırıbû, bı hemû awayek zılm û zora xwe tê de dabû xuyakırın, lı gora daxwaza hatıbû hazır kırın. Wan dokumentên bı xwe re anibûn ni-

---

tıniyê qanuneki nû dani bû, lı gora wê; nedıbû ku Kurd lı ser cadeyan bı kom bısekının û kom bıbın. Her wıha, qedexe bû lı ser pıra Kirika re bıçûna Galatayê . Bınêre; Mişak 1906, 27 ê Nisan, hej. 89.

(21) Lutfi, Emir Bedırxan, rûp. 50.

(22) A.n.d. , rûp. 51.

şani karbıdestên mehelli dan. Lı gora wan bıryarên bı dızi hatıbû dayin, dıxwestın; çar kesan lı sêdarê bıdın, yên dın hınek jı wan heta hetayi û hınek dın ji wextê cezayên wan hatıbû kıfş kırın."(23)

Ebdurazaq çar sal dı gırtigehê de ma. Pıştî şoreşa 1908 an ku, qanuna berdana gırtiyên siyasi hat derêxıstın û ew bı ber wê qanunê ket, dı nava sala 1910 an de,rê danê ku carek dın vegere İstenbul.

Ebdurezaq, dı paytext de peywendiyek xurt bı konsolosê Rusya Çarikov re dani û bir û baweriya xwe pê ani û doza iltica siyasi jê kır. Konsolos, bı namek resmi doz jı Wezirê Derve Sazanov kır ku wi mafi bıdın Ebdurezaq û ew jı xwe re lı Êrivan bıji. Hêjta bersıva Wezirê Derve nehati, konsolos, wizeki wexti da Ebdurezaq ku jı Tırkiyê derkeve.(24) Dı 21 ê Çirya Duyem sala 1910 an de, konsolos telgrafeki dızi jı İstenbul şand jı serokê İdara Qafqas a Rusya re û dozê jê kır ku qedır û ihtirama Abdurezaq bıgrın. Rê bıdın wi lı ser kar û barên mesela Kurd û serokên eskeri yê Qafqas pê bıdın naskırın.(25) Dı Çirya Duyem a sala 1910 an de, Çarikov lı ser hev telgraf û nameke dın jı Koxonovisk re nıvisi û bı dırêjahi behsa jiyana Ebdurezaq û pêşniyara wi ya 10 ê Tebaxa sala 1910 an kır. Ebdurezaq, dı wê pêşniyara xwe de dıgot: "Ev rejıma nû (rejıma İttihat û Teraki n.m.) mın, bınemala mın û Kurdan dı bın çav de dıgıre, jı ber vê ez nıkarım lı Tırkiye bıminım."(26) Dı vê namê de Çarikov dozê jı

(23) Arşiva Dewleta Gurcıstan, L.8-8.

(24) A.V.P.R. (Arşiva Derve a Rusya) 1907-1913, D.3572, rûp. 271. Wezirê Derve yê Rusya, dı 3 yê Adara sala 1911 an de, bo wê meselê razi bû.

(25) Arşiva Ermenistana Sovyetê.

(26) A.V.P.R., konsolosxana İstenbul, 1907 heya 1913,

Koxonovisk kırı bû ku, hay lı Ebdurezaq bın, yarmetiya wi bıkın, bı çaveki dosti peywendiyek baş pê re bê danin, jı ber rewşa wi ya baş lı hember Rusya.

Ebdurezaq, 28 ê Kanuna Yekem jı Sivastopolê, dı ser Yalta re çû Tiflisê.(27) Lı gora belge û materyalên jı arşivan derdikevın, armanca wi ew bû ku bıçe Ermenistanê, jı bo nêziki hıdut be û peywendi bı Kurdan re deyne. Lêbelê, vê hewıldana wi bı ser neket. Beri Ebdurezaq bıgihije Rusya, İdara Qafqas jı waliyê Êrivanê xwest ku nêrina xwe lı ser mana Ebdurezaq diyar bıke. Wali, 15 ê Tebaxê, dı nameke xwe ya dızi de weha nıvisi bû : "Bı tu awayi nabe ku musaade bê dan ew lı wır bıji."(28) Ebdurezaq, zani ku rê nadınê ku bıçe Êrivanê, çendeki lı Tıflisê ma. Koxonoviski qedır û qimeteki pır mezın dayê û bı hemû awayi amadebûna xwe jê re da xûyakırın ku alikariya wi bıke. Ewi, bı taybeti, jı wır dıxwest bıçe İranê. Lı nav navçê İranê; Şapur (Selmas) an ji Urmiyê niziki sınorê Tırkiyê -ew wext ew navçe dı bın destên Rusya de bûn- rûne. Vê proja du mıli bı başi serkevt. Koxonoviski, Adara sala 1911 an, dı telgrafek xwe ya dızi ku jı konsolosê Rusya yê İstenbul re şandi, dabû xûyakırın ku Ebdurezaq dê here İranê. Jı ber vê yekê, bı awaki rêk û pêk de têkeve xebatê, axaftın û raya Kurdan dı wan waran de tecrube bıke û baş bızane ka Kurdıstan bı ber kijan mıli de dıçe. Konsolos dı nama xwe de weha dıbêje : "Ebdurezaq, me tê gıhandiye ku, dıxwaze lı ser Kurdên Tırkiyê û yên İranê xebat bıke. Ew dıxwazın dıji Tırkiyê rawestın û talanên wır bıbın derbazi İranê bıkın."(29)

D.3572, rûp. 3.

(27) Arşiva Dewleta Gurcıstan, D.3100, rûp. 2.

(28) A.n.d., rûp. 10.

(29) A.V.P.R. , bıngeh, konsolosxana İstenbul, 1907,D. 3572, rûp. 124.

Lı ciyên danıştıwanên mesihi tê de bûn, daxwaza kırdayetiya Rusya ew bû ku jı bo armanca xwe, bı taybeti, dı wan alozi û têkılheviyên dı navbera sınorê Tırkiyê û İranê de, istifade jı Ebdurezaq û Kurdan bıke. Ebdurezaq beri bıçe İranê, bê ku Koxonoviski bêje, weha gotiye : "Ez ê wek aligıreki Rusya bı dıl û can dı nav Kurdan de propaganda Rusya bıkım û ez ê bıxebıtım ku meyla wan ber bı Rusya ve bıkêşım."(30)

Dı destpêka Adara sala 1911 an de, Ebdurezaq jı Tiflisê derket. Lı Şahtaxi, Mako û Kotor geriya. Serok û kesên bı nav û deng êr Kurdan dit. Bı wan kesên ku dıxwestın bıbın aligırê Rusya re peywendi dani û bı taybeti, bı serokê Kurdan ê bı nav û deng Sımkoyê İsmail Axa re bı awaki berfırehi axıft. Dı wextê xwe de, bavê Sımko lı İstenbul dıjiya û pır nêzıki Ebdurezaq bû. Lı ser mesela kuştına Rıdwan Paşa, wi bı Ebdurezaq re bırıbûn Trablusê, lı wır ji ber eziyet û işkenca nediti mıri bü.(31) Sımko, bı hemû awayi dı dıji Tırkan de bı Ebdurezaq re hemfıkır bû. Gera wi ya lı ser sınor, bû sebeb ku ew gelek serokên Kurdan bıbine. Peywendiyeke wi ya berdewami bı serokê Asuriyan Petroselov re hebû.(32) Konsolosê gışti yê Tırkan, lı Tebrizê, dıxwest mesela pilan û armanca wi bıxe ber çavê Rusan. Wexta ku Miyolar ditıbû jê re gotıbû : "Ebdurezaq, dı sınorê Tırkiyê û İranê de wezife û tewsiyên dewleta Tırkiye bı ci tine".(33)

26 ê Adarê Ebdurezaq dı sınorê Tırkiyê re derbas bû çû bajarê Wanê, lı wır, bı awaki nediti û germin hatına wi kêfxweşi çêkır. Vê ji tırs û lerzê xıste nav dezga dewleta Tır-

---

(30) A.n.d., bıngeh, Arşiva Farısan, 1911.
(31) A.V.P.R., rûp. 166, tevayi.
(32) A.n.d.
(33) A.n.d. , Arşiva Farısan, 1911, D.547, rûp. 56-57.

kiyê û sixorên dızi bı pê xıstın. Ebdurezaq, lı Wanê behsdıkır ku dıxwaze xwe jı bo parlamentoya Tırkiye bıde bıjartın. 20 roj lı wır ma. Kari pır kesên bı nav û deng ên Kurdıstana Tırkiyê bıbine û bı wan bıde zanin ku dıxwaze dıji hukumeta Tırkiyê û jı bo serxwebûnê şer bıke. Her weha, lı wır cigırê konsolosê Rusya ji dit û jı wi re behsa programa karê xwe yê siyasi kır.

Ebdurezaq, wexta vegeriya İranê, jı bo şıkê jı ser xwe bavêje, çû Urmiyê mala Seid Begê konsolosê Tırkiyê ma. Pışti bıhist ku jı İstenbul fermana gırtına wi dane konsolos, 11 ê Gulanê lı Urmiyê xwe lı mala konsolosê Rusya veşart. Konsolos herçi hewıl û bızav kır ku wi bıgre, lê, ev yek bı gışti dı valayiyê de çû.(34)

Dı nav kırdayetiya Rusan de, du rayên cihe lı ser Ebdurezaq hebûn. Berpırsiyarê Rusya yê Tehranê Poklevisky Kezyol, doz kır ku, yarmetiya Ebdurezaq neyê dan. Jı ber ku, şık jê bırı bû, weha nıvisi bû; Tırkan jı bo fıtne û aloziyên ser sınor vê rolê dane wi. Raya dın, a berpırsiyarê Wezareta Derve ya Rusya İranov bû. Ewi lı ser wan malumatên bê belge yên Kezyol nıvisi bû, jı Kezyol re gotıbû ku ; wek hınek serekani behs dıkın,sebebê şıkbırına jı Ebdurrezaq,dılsoziya wi ya bı me re û rıkiya wi ya jı Tırkan e, û ev dıbe ciyê sebebên wan şayian. Cigırê konsolosê Rusya yê Urmiyê, lı ser vê meselê xwestiye Kezyol roni bıke.(35)

Rewşa dın a karbıdestên Rusya, rewşa yên Qafqas bû ku, pıştgıriyê lı Ebdurezaq dıkırın. Dı bersıva Wezareta Derve ya Rusya de, pışti wan pênç rojên ku Ebdurezaq xwe dı konsolosxana Rusya de veşartiye, Koxonoviski weha nıvisiye:''Ez dıbêjım rewşeki wi -yani ya Ebdurrezaq-ya vekıri

---

(34) A.n.d. , D.572, rûp. 51-52.

(35) A.n.d. , D.1258, rûp. 78. M.S.Lazeriyev, rûp. 158.

lı hember hukumeta nû heye. Jı endamê İttihad Teraki re dıbê; heramzade û mınafıq. Dıbê; jı bo armanc û daxwazên xwe ew dıkarın hemû tıştan bıkın, çı dı welat de kuştın û çı ji belav kırına terorê be. Jı bo menfeeta xwe û jı bo kursiya wan neheje, bı her cûreyi destdırêjiyan lı ser gel dıkarın paş de nehêlın."(36)

Xebata Ebdurezaq û doza wi ya yarmetiyê jı konosolê Rusya, lı ser karbıdestên Rusan tesireki pır mezın kırı bû. Gelobinovê ku heta wê gavê şıkê jı dılsoziya Ebdurezaq dıkır, pışti demekê, xeletiya xwe jı beşa yekem re -jı Wezareta Derve ya Rusya- weha nıvisiye : " Dı 11 ê Gulanê de jı bo parastına ala me Ebdurezaq bı lez hat konsolosxana me, jı bo mın qet guman û şık nema eşkera bû ku dudıli û şıka mın a berê dı ciyê xwe de nebû. Ebdurezaq, nedıxwest nıha lı dıj Tırkan şerê çekdari bıke, jı ber ku heta pilanên xwe temam bıke. Bêguman bı yarmeti û itimada me ya manewi dı hemû waran de bê tırsa kuştınê, bı camêri kar kıriye. Dosti û dılsoziya wi bı me re jı ber kerb û dıjitiya Tırkan bû." (37)

Dewleta Tırkiyê bıryar da ku bı xwe wê meselê bı Ebdurezaq re bıaxıve. Sultan nameki taybeti jê re şand û dozê lê kır ku bı zûtırin wext vegere İstenbulê. Wextê nama Sultan gıhişte destê konsolos, bı wasıta konsolosê Tehran doz jı cigırê konsolosê Rusya kır da Ebdurezaq bıbine. Gelobinov weha dıbê : "Gava em hemû bı hev re cıviyan, konsolos rabû û got : 'Wezifeye lı ser mın ku ez fermana Sultanê mezın pêşkêşi Ebdurezaq bıkım. Ebdurezaq, dı destpêkê de got; astengek mın bı fermana Sultan re nine. Lêbelê, ez ê

(36) A.V.P.R. , bıngeh, konsolosxana İstenbul, 1907-1913, D.3572, rûp. 166.

(37) A.n.d. , Arşiva Farısan, D.672, rûp. 51-52.

dı Rusya re herım Tırkiyê. Konsolos, dıxwest bı israri bıde xûyakırın ku qet fermaneki jı bo gırtına Ebdurezaq dı destê wi de nine, yên navên wan hatıne ew kesın ku dıji dewleta Tırkiyê dı nav Kurdan de propaganda belav dıkın. Yekser hêrsa Ebdurezaq rabû, xwinsariya xwe ya destpêki wenda kır û weha got : Ez ku bıxwazım dı ku ra jı mın re baş e ez ê dı wır re herım. Ez ê bıryarên xwe bı xwe bıdım. Ez jı bo xwe serşori dızanım ku fermana dewleta zalım a Tırkiyê bı ci binım û ez vê biryarê ji hiç bı ci naynım." (38)

Dı wê rewşê de Petersborgê,bıryara anin û veşartına Ebdurezaq da.Bı herestiya Qazaxan wi gıhandın Tebrizê û dı wır re ji gihandın Tiflisê.Lı wır, rewşeki baş û tekûz jı bo bızava siyasi ya Ebdurezaq hatıbi amade kırın.Ebdurezaq,jı wır ji,bıryar da ku bıçe Avrupa û peywendi bı multeciyên siyasi yên dın re deyne.Koxanoski dı vi wari de weha dıbêje: "Ewi jı mın re got;hewceye zûtırin wext ez bıçım Parisê,jı bo ku ez kurê Paşê bıbinım.Ewi lı wır kovara Meşrutiyet der dıxıst".(39)Ebdurezaq,zû gıhişte Paris û jı wır ji derbazi Qahirê bû.Pışti du mehên dın, dı sala 1911 an de dısa vegeriya Tıflisê.

Rewşa dar û dezgên desthılatdarên Rusya Qeyseri lı ser Ebdurezaq û serokên Kurdan, ewên ku dıxwestın Rusya alikariya wan bıke nebaş bû. M.S.Lazariyef, bı awayek rasteqini lı ser vê meselê weha gotiye : "Bı eşkera, ewan nedıxwest dan û sıtendınê bı tevgera azadixwaz a Kurdan re deynın û nedıxwestın ku ew Kurdıstaneki otonom an ji azad ava bıkın."(40)

(38) A.n.d., rûp. 64.

(39) A.n.d. , konsolosxana İstenbul, 1907-1913, D.3572, rûp. 191.

(40) M.S.Lazeriyev, A.n.d., rûp. 160.

Wextê Ebdurezaq vegeriya Tiflisê, karbıdestên Qafqas, ferman derxıstın ku nehêlın: "qet bızaveki siyasi û programeki xebatê belav bıke"(41). Ew ji netica diplomasiya Tırkiyê ya xurt û hınek sebebên dın bûn. Dı destpêka sala 1912 an de, Asım Begê Wezirê Derve yê Tırkiyê, nerızaya xwe jı konsolosê Rusya yê Ermenistanê re diyar kıriye, jı ber sebebê mafê ilticatiyê dane Ebdurezaq û lı cem xwe hewandıne. Asım Beg, jı wan xwestiye ku wi vegerinın Tırkiyê.

Dewleta Tırkiyê,dı destê vi têkoşerê Kurd de, mabû heyri. Ser û bınê cihanê lê hatıbû hev û bı hemû awayi dıxwestın wi nehêlın, jı holê rakın. Belge û malumatên tevayi ketıbûn destên konsolosê Rusya yê İstenbulê, ku komita İttihat Teraki plana kuştına wi dani bû. Jı bo pêkanina vê pilanê ji mırov hatıbûn amade kırın û şandıbûn Tiflisê. Jı ber vê yekê, karbıdestên Qafqas, wi agahdar kırıbûn û parêzgeri lı Ebdurezaq dıkırın.(42)

Tırkan, zanin ku hewlê dıdın hemû vala dıçın ew çax dest avêtın hınek dek û dolab û riyên dın. Ewan lı İstenbul deng û behs dane belav kırın ku Sultan, Ebdurezaq, Şêx Taha û hınek têkoşerên dın afu kıriye. Dı hemû rojnaman de ji wê xeberê dane belav kırın.

Her wext, diplomasiyên Rusya yên İstenbul belav dıkırın ku, ew kesên dı nêziki navçên sınor de ne yek bı yek navên wan derbaz dıbın, hewceye çavdêri lı sınorê Tırkiyê û İranê bêkırın û rê neyê dayin wan " sixorên bı pereti dı sınor de bıçın bên."

Lê, berpırsiyarê beşa Rojhılata Navin ê Wezareta Derve

(41) A.n.d., rûp . 160.
(42) A.V.P.R. , bıngeh , arşıva farısan, B, 1913, D.102, rûp. 182, gşti.

ya Rusya Kılem, jı idara konsolosxana cigır re weha nıvisibû: "Lı ser we pêwıste ku hun bı hemû awayi rë û xebatên Ebdurrezaq û Şêx Taha qedexe bıkın.Jı ber ku,hun weha ne kın, ew dê bıbın bahane jı bo Tırkan ku bıkarın dı riya qanuni de şikayet bıkın. Jı wan re carek dın bêjın : eger weha nekın, bıla hêviya xwe jı parastına me bıbrın."(43) Lêbelê, nêrina Wezareta Derve ya Rusya ew bû ku, "bı tu awayi nabe ku ewan têkoşerên Kurdan bıdın destê dewleta Tırkiyê". (44)

Dı dawiya Kanuna Yekem a sala 1912 an de, Tırkan, jı bo ku bı hemû awayi bızanın Ebdurezaq lı ku ye, serok general Xêri Beg şandın navçên rojavayê İranê. Xêri Beg, dı navçên Dilman û Çayira Qelê de sınge sıng rasti Sımko hat. Wê wextê Sımko wi bı vi awayi tehdit kır : "Pır baş bızane û jı karbıdestên xwe re ji bêje ku ez seri lı ber wan danaynım, serokên eskerên we hewceye vê rewşê bıdın ber çavên xwe. Jı ber ku, hemû caran ez nıkarım bı dılpaqıji Tırkan agahdar bıkım û jı tol û şeqama Sımko wan bıparêzım."(45) Xêri Beg nekari armanca xwe bı ci bine û vegeriya.

Ebdurezaq hatına wi serokê Tırkan bıhisti bû û vê namê jê re şandıbû : "Ez Tırkiyê dıjmınê xwina xwe dızanım. Eger ez dı riya aşitiyê de negıhıjme armanca xwe, ez mecburım dı Kurdıstanê de dest bavêjım şoreşê."(46)

Dı salên 1910-1912 an de, hemû xebata têkoşina siyasi ya Ebdurezaq, lı ser temin kırına alikariya maddi jı Rusya bû, eva han ji jı bo wê mesela bıngehin bû. Vê mesela han

(43) A.n.d., 1913, D.101, rûp. 103.
(44) A.n.d., rûp. 95.
(45) A.n.d., rûp. 95.
(46) A.V.P.R. , bıngeh, Arşiva Farısan, B, 1913, D.102, rûp. 5.

ewi wek serokê tevgerê eşkera û vekıri itiraf dıkır. Çendin car lêkolina riya pılana xwe jı bo Koxonoviski û konsolosê Rusya ya Tırkiyê û Îranê re ducar kıriye û nıvisiye.

Bir û baweri û rewşa bızava Ebdurezaq a komelayeti-siyasi, tenê dı wan rapor û namên karbıdestên diplomasiyên Rusya de hatıne parastın. Ew ji, ne jı ber hezkırına Ebdurezaq, lê, jı ber giyana burokratiyê wan belge û dokumentan dane serok karbıdestên xwe. Yek jı wan belgan ku jı bal cigırê konsolosê Rusya yê Wanê ku dı 2 yê Nisana sala 1911 an de hatiye nıvisandın û daye karbıdestên xwe, geleki dıqeta mırov dıkışine : "Dı çav pêketına xwe ya yekemin de mın jı Ebdurezaq re got : Ez pır kêfxweşım ku guhê xwe bıdım wi, lê, hewceye wê dostiti û yarmetiya navbera Tırkiyê û Rusya ji tê bıgehe. Mın got ; keseki ku wek cigırê konsolosê Rusya, nıkarım pılana te qebul bıkım an nekım. Lı gora fermana karbıdestên mın, lı ber mın asteng tune ku bızanım daxwaza te çiye û bızanım dı Kurdıstan de çı heye. Dı gel wê ji, Ebdurezaq bı dıleki vekıri eşkera û hınek ji bı şık, mın bı pilan û programa xwe gihand. Wê axaftına Ebdurezaq a eşkera, gelek dıqeta mın kêşa. Rewşa wi emirê Kurdan lı hember Tırkan roni bû û hemû axaftınên wi dı lehê wi de û mantıqi bûn."(47) Wi kesi, dı wê nıvisandına xwe de dûr û dırêj behsa wan axaftınên xwe û Ebdurezaq kıriye.

Derbarê amadekırına rewşek baş jı bo tevgera azadixwaz a Kurdan, Ebdurezaq lı ser Rusan weha dıbêje : "Em dıxwazın azad û serbıxwe bıjin. Hemû wexti lı cem mın weha bûye, serkevtına Rusya dı Asya pıçûk de, wê hêviya me bıci bine. Jı kevn de, baweriya mın bı Rusya heye û nıha ji heyetên Kurdan dıbên ku, Rusya, pêwıstiya wê bı işgal kırına

(47) A.n.d. , bıngeh, konsolosxana İstenbul, 1907-1913, rûp. 128.

zevi û axa nû nine û her dıxwaze ciranên bê deng û dost jı xwe re peyda bıke."(48)

Ebdurezaq, pır bı zireki û bı kuri rewşa navbera dewletan û ya Tırkiyê dızani. Her dı wê çarçuvê de, armanc û hêviya netewa xwe baş xıstıbû ber çavan. Baş tê gıhiştıbû ku, vê rejıma nû bı çavên berê lı Rusya dınêre. Hukumeta Tırkiyê, bı giyaneki rık û dıjmınatiyeki diroki, lı hember Rusya bû. Carnan ewên ku lı ser kırdayetiyê bûn,bı fêlbazi wan rık û kinan vedışartın û jı bo lı ser kırdayetiyê bıminın û tolê jı Rusya vekın, riya hela wan dıditın.

Tırkên Cıwan, dı idarekırına welat de zana nebûn, nû bûn, dı bın tesira bend û bayên ku hınek rojnaman behsa jarbûna Rusya dıkırın dıman. Peyamnêr û karbıdestên Rusya ji, wan deng û bensan rêdıkırın ev dıgihiştın Medısa Dewleta Dumaye. Tırkiya, bı awayek dın bı peywendi û dostiya xwe ya nû bı Rusya re tê gihiştı bû. Mesela behsa jarbûna Rusya, rewşa Tırkên Cıwan tûj kırıbû.

Ebdurrezaq dızani dê dı navbera Rusya û Tırkiyê de şer derkeve. Roj bı roj jı Olverov re weha dıgot : "Wextê şereki we bı Tırkiyê re çêbe hewceye Kurd ji fırsetê jı dest bernedın, jı bo wê dılsoziya xwe bı Rusya re bıdın xuyakırın. Rusya ji hewceye ku pıştgıri û yarmetiya xwe jı Kurdan re texsir neke."

Ebdurezaq, perda lı ser ruyê siyaseta nıjadperesti ya Tırkên Cıwan radıkır. Mesela danina proja ava kırına welat ji bı wê meselê ve gırê dıda.

Ew bı belge û dokuman hatıne ispat kırın,ku mıjuliya Tırkan û hatına wan jı bo hewara mısılmanên Rusyayê, mıjuliya hêzkırın û rêk û pêk kırına hêzên xwe yên şerê jı xwe re û çêkırına riyên strateji bûye. Lı ser van bûyerên Ebdurezaq

(48) A.n.d.

gıhiştıbû vê qenaetê : "Tırk dıjmınên Rusya ne, Kurd ji dıjmınên Tırkan ın, jı ber vê yekê, hewceye ku Rusya baweriyê bı me bine." Baş baweriya Olverov bı gotınên Ebdurezaq hebû, jı ber ku, pır bı başi û dırêjayi rewşa Tırkiyê lı ba wi ronak bû.

Hejayi gotınê ye ku, Ebdurezaq, pır bı zireki rola Rusya ya dı mesela çarenıvisa Kurdan de xıstıbû ber çavan. Bı awaki rasteqini, jı xayalan dûr, wan peywendiyan dıpiva û wıha dıgot : "Baweriya me bı Rusya heye. Ez behsa peywendiya nakım, ev derdên kesi derman nake. Em bı rasti dıxwazın dosti lı gel Rusya deynın û hini çanda Rusi bıbın." Ewi dıxwest, hişyariya netewi û geşbûna çandi ya Kurdan bı Rusyayê ve bê gırêdan. Pıştrast bû ku netewa Rus, pıştgıriyê dê bı Kurdan re bıke. "Jı ber vê baweriyê serkevtın û berewpêşveçûn ê bıserkeve."

Baweriya Ebdurezaq ew bu ku, dewletên Avrupayê qet yarmetiya Kurdan nakın. Wıha dıgot : " Dewletên Avrupayê jı Kurdıstanê dûrın û nıkarın wek pêwısti yarmetiya netewa Kurd bıkın." Siyaseta dagırkeri ya İngilizan dı Rojhılata Navin de dıxıste pêş çavan, lı ser vê baweriya xwe pır bı rıkoyi bû ku, nabe Kurd bı tu awayi xwe bıdın bın çengên Ingilizan. Ewi gotınên xwe bı vi awayi dıdomand : "Baweriya me bı Ingilizan nine, jı ber ku hemû wexti me xapandıne." Dı vi wari de baştırin belge jı bo vê rayê, axaftına Şêx Ubeydullah e ku dı sala 1880 an de kıriye.

Ebdurezaq, program û taktikên rızgarbûna Kurdıstan û a şerê jı bo wê,qonax bı qonax destnişan kırıbû. Ewi programa xwe wek programa wextê Şêx Ubeydullah danibû. Şêx Ubeydullah dızani ku, Kurd hê ew qas bı hêz û rêk û pêk ninın ku yekser bıçın dıji eskerên Tırkan. Jı bo wê, dıxwest jı İranê ve dest pê bıke, ta ku bıngeheki bı hêz jı bo xebateki dûr û dırêj lı dıji Tırkiyê bê damezırandın: "Bı hemû awayi

em amadene, wek nıha ez dıkarım bajarê Wanê bıgrım. Dı nav esker de hejmareki pır zêde serbazê Kurdan he ne, em dıkarın jı wan pıştrast bın, lêbelê, ez qet feyde û serkevtınekê dı gırtına Wanê de nabinım. Jı ber ku, em nıkarın heya dawiyê bı başi dıji Tırkan şer bıkın,menfaeta xwe bıparêzın. Beri her tışti hewceye bıngeheki bı hêz bê pêkanin. Eva han lı İran de baştır dê bımeşe.Ev dê bıbe gaveki yekem jı bo damezırandına emareteki Kurdi. Eger ev bıserbıkeve, yekser dê şoreş dı Kurdıstana Tırkiyê de dest pê bıke. Lı vır hemû tışt amadeye, Kurd her çavriya gotın û dengeki mın dıkın. Daxwaza me azadkırına axa Kurdıstanê ye, em naxwazın dı axa Tırkiyê û ya İranê de pêş ve bıçın. Dawiyê netewa Kurd, dozê jı Rusya dıke ku, bê hewara me û me bıparêze, azadiya Kurdıstan dê bıci bê."(49)

Mesela pilana Ebdurezaq û rızgarkırına Kurdıstana İranê, pır bı xeyali bû qet neticeki wê ji tunebû. Ewi weha zanıbû:bı şertê ew eskerê Tırkan jı İranê derine, Şah dê wan bıke parêzgerê Kurdıstan. Eger Şah bı wan qail nebe, ew dê bı hêzên çekdari Selmas û Urmiyê bıgrın û ciyê piyê xwe dı İranê de xurt bıkın û dê Şah mecburi ser şuriyê bıkın.

Dı rastiyê de ew pilan, zêdetır wek kareki bê netice bû, jı ber ku dı rasteqini de qet xebatek jı bo wê nehatıbû kırın, jı bo vi kari sebebek nehatıbû danin. Ebdurezaq, baweri bı dılsoziya xwe û bıhêviya çendin salin a netewa xwe hebû.Ewi dıgot; çendin salın netewa Kurd lı dıji zılma Tırkan têdıkoşe û dıxwaze azad bıbe. Jı ber vê yekê Ebdurezaq weha dıgot : "Eger ev armanca me bı ci hat eva tışteki baş e, lê, eger bı ci nehat em ê serê xwe dı wê riyê de bıdın."(50)

---

(49) A.V.P.R. , bıngeh ,konsolosxana İstenbul, 1907-1913, D.3572, rûp. 131.

(50) A.n.d. , rûp. 152.

Ebdurezaq, her weha jı bo berewpêşveçûn serkevtın û xebata vê meselê alikari lı gel partiyên dıji Tırkiyê wek; Daşnak a Ermeniyan û Ahrar a Tırkan dıkır.(51)

Qewımandınên dawiya salên 1912-1913 an, dı rojavayê İmparatoriya Osmani de bı awayek yekser rewşa siyasi dı sınorê Tırkiyê û İran de guhart û dawiya şerê Balkan gelek ci jı destên wan derketın. "Ew dewletên ku hınek caran dı bın destên dewleta Imparatoriya Osmani de bûn, pıştí van guherinan bı yek cari jı bın desthılata Imparatoriyê derketın."(52)

Jı ber sebebên wan guherinan, siyaseta Rusya beramberi Kurdan kete rewş û qonaxeki dın. Heta dawiya sala 1912 an bızaveke Rusya dı Kurdıstana İranê de hebû û bı bızavi û zireki lı hemberi Tırkan têdıkoşa,.lê, nedıxwest zede bên ser peywendiya Tırkiyê û Rusya." (53) Lı ser van guherinan fırsetek fırehtır ketıbû destên wê, jı bo ew dı navçên bakura rojavayê İranê de gıraniya xwe deyne û gavên fırehtır lı wan deran bavêje. Rusya dıxwest wan navçên Kurdan ku dı ser sınorê kırdayetiya İran de ne, bıgre bın kontrola xwe. Jı bo armanca parastına sınorên Tırkiyê û İranê, hewce bû kesên bı nav û deng ên Kurdan bı xwe ve gırêbıde. Wê wezifê sıpartıbû Sımko û Ebdurezaq ku dı wexteki de dostiya wan lı gel Rusan hebû. Bı taybeti Sımko ji kırıbûn serokê parastigeri yê navça Kotor ku qazaxên Rusan lı wır hebûn.

Lı Xoyê, rolek mezın yê konsolosê Rusya Çirkov, dı xurtkırına peywendiyên navbera Kurd û Rusan de hebû. Pır ıhtırama Sımko û Ebdurezaq dıgırt, pır caran karbıdestên İran û Tırkiyê derewan lı ser wi belav dıkırın. Lêbelê, ewan

(51) A.n.d., rûp. 152.
(52) A.F.Miller, Kurte Diroka Tırkiyê, rûp. 134.
(53) M.S.Lazeriyev, A.n.d., rûp. 271.

nedıkarin lı hember parıstigeriya wi bısekının. Lı gora wi weha bû; ku lı ser wan meselan xeletiya Rusya heye. Ewi Kurdan weha nasdıkır : "Ez dızanım Kurd şerkerên çiyan ên zıkmaki ne û her tım çekên wan dı destên wan de ne û bı vi awayi dıjin. Derveyi vê kareki wan nine. Dı ber vê re hınek Kurd ji xwedan mal mılk û zevi û hınek wan ji bajari ne." (54) Gelek caran vi mırovi pêşniyar kıriye ku rewşa aloziya dı nav Kurdan a cıvaki-abori bı awaki berfıreh bê kolan. Dı vi wari de pêşniyariyên weha dıani : "Pır pêwıste ku ez dı nav Kurdan de bıjim, qet nabe dı navça Seblax (Mahabat) û der û dorên wê de ku ew navçe dıbın destên me de ne."(55) Rojhılatnasê bı nav û deng ê Rusya Gerdelêvski ji dı wê bawer iyê de bû. Ewi lı ser Kurdan bı vi awayi nêrina xwe diyar kıriye : "Wextê em, ewên bê hişyarbûn mane, jı gunehên nezaninê paqıj bıkın, an ji wan jı hınek bend û rewşên bê baha xelasbıkın, bı taybeti ji dı hemberê ew netewên ku dıxwazın çarenıvisa xwe bı me re gırêbıdın û dı riya me de dıxwazın xwe bıgihinın çanda mırovatiyê." (56) Çirkov, dı Sıbata sala 1913 an de, bı hemû dılsozi û bı dılgermiyek giyani bı vi awayi lı ser Kurdan nıvisiye : "Heya nıha Kurdan, çiya tenê ditıne. Jı Tırkiyê tenê mal wêrani û zehmeti ditıne û lı Tırkiyê bı awaki hoviti hatıne ditın. Dı aliyê dest-

(54)V.L.Gerdelêvski Mesela Kurd,çete û rêbıri bê nıvisandın propagandeki pûç û vala ye; Kurd neteweki wesane ku, mafê wê xıstıne ber piyan û pêpez dıkın. Bınêre ; V.L.Gerdelêvski, Dı Nav Kurdên Çiyayê Sipanê de, Dınyayê Musulman, Petersborg 1917, C.I, rûp. 3

(55) A.V.P.R. bıngeh. Arşiva Farısan, B, 1912. Op, 489, D.97, rûp. 62.

(56) V.L'Gerdelêvskki, Dı Nav Kurdên Çiyayê Sipanê de. rûp.3.

hılatdarên İran de wek kaniya şer an ji a pêkanina armancên xwe yên pis û qırêj hatıne bıkaranin. Jı ber sebebên serhışkiya çiyati û jiyana wê ya azadi, paşvemayina wan a bextreşi û jı bo mırovatiyê; netewa Kurd dı navbera wan her du şarıstaniyetên zalım û perpût de, kariye hebûna xwe ya netewi bıparêze." (57)

K.Akimoviç, cigırê konsolosê Rusya yê Beyazidê, ku ew ji hevriyê Çirkov bû, lı ser vê meselê xwedi eyni ray û rewşê bû. Akimoviç ji lı ser vê meselê weha dıbêje:"Karbıdestên Tırkiyê yên zalım û zorker, ciyên nerızayiyên rıkoyi yên Kurdan bûn. Jı ber vê yekê, qet ecêb nine, meyla Kurda, bı taybeti ji ya feqirên wan bı ber Rusya ve hebe." (58)

Gerdelêvski,dı salên Şerê Yekemin yê Cihanê de lı nav Kurdan jiyabû û dı derheq orf, adet, rabûn û runıştına wan de şareza bûbû. Dıxwest Rusya rolek rewşenbiri lı ser çarenıvisa netewa Kurd bıstine. Dı gotara xwe ya 'Dı nav Kurdên Çiyayê Sipanê de weha dıbêje:"Wezifeki pır mezın ketiye ser mılên Rusya, pêwıste netewa Kurd bı aliyê xwe de bıkêşe û yarmetiya rewşa jiyan û rewşenbiri bıde, jı bo ku ew bı cengeki baş a hişyarbûnê ve bıkarın mesela xwe çareser bıkın. Kijan jı bo wan baş e? Bıla Kurd bawer bıkın ku, çanda Rusya jı bo wan jı ya Tırkiyê çêtır e. Bıla çanda Rusya dı Rojhılat de belavtır û fırehtır bıbe."(59)

---

(57) Arşiva Dewleta Gurcistan.

(58) A.V.P.R. , bıngeh, konsolosxana İstenbul, rûp. 245.

(59) V.L. Gerdelêvski, A.n.d. , rûp. 14.

## KOMELA ÇANDİ Û REWŞENBİRİ:GİHANDIN

Dı destpêka Şerê Cihanê yê Yekemin de, xebata Ebdurrezaq Bedırxan jı bızava çandi, rewşenbiri û jı belavkırına xwendewariyê pêk hatıbû. Dı wê meselê de ji Çirkov cigırê konsolosê Rusya yê lı bajarê Xoyê û Sımko pıştgıriya wi dıkırın. Çirkov dı nameke xwe de lı ser wê meselê wıha nıvisiye : "Wextek mın, axaftınek dı nav kesên bı nav û deng, bazırgan,xwediyên mılk û xani yên Kurdan û karbıdestên navçê de kır. Mın ewan han da ku jı bo zarokên xwe dıbıstan vekın. Bı taybeti ji mın pêşniyareki bır jı Ocılış re û ewi ji dı vi wari de amadebûna alikariya xwe nişani mın da. Jı bo hemû yarmetiyên teknik û yarmetiya dı hemû hêlan de bı awaki temam jı bo van karan bersiveki erêni da me."(60)

Karbıdestên İraniyan û derebegên wan gûh nedane mesela belavbûna xwendewariya nav Kurdan. Dı aliki de ji peywendiya wê meselê bı yarmetiya maddi ve ji hebû.

Dı dawiya sala 1912 an û destpêka sala 1913 an de, bı alikari û pıştgıriya Ebdurrezak û Sımko, lı bajarê Xoyê komela çandi û rewşenbiri, Gihandın hat damezırandın.(61) Armanca komelê ev bû : Dı nav Kurdên Xoyê de, xwendewari belav bıke û dıbıstan veke, rojname û kovar bı zmanê Kurdi derxe û alfabeya Kurdi baş bıke. Xortên Kurdan jı bo xwendınê bışine Rusyayê.(62) Ebdurrezaq serokê komelê

---

(60) Tısgiya Gurcıstan

(61) Bınêre; O.L.Vilçivski, Kurdên Bakurê Rojavayê İranê, Tiflis 1944, rûp, 61.

(62) Kurte Hewalek (Kurte Xeberek), rûp. 11. O.L.Vilçivski Kurdên Bakurê Rojavayê İranê, rûp. 61.

bû. Dı Sıbata sala 1913 an de, Ebdurrezaq, bı navê komelê namek jı nûnerê Rusya yê Xoyê re nıvisiye û dı vê namê de weha gotiye : "Jı ber zılm û zora Farıs û Tırkan, netewa Kurd jı şarıstaniyeta Avrupa dûr ketiye.Çavriya xêrekê ne jı Farısan û ne ji jı Tırkan nake. Ewan tevan, hewıl dan ku Kurd her dı tariti û nezaniyê de bımının. İro wısa bûye ku Kurd êdi dı jiyaneki xırab de dıjin û rewşa wan a çandi êdi berewpêş ve naçe."(63)

Ebdurrezaq û hevriyên wi yên berpırsiyarên komelê, jı bo berewpêşveçûnê pıştgıriya cigırê konsolosê Rusya dıditın. Jı ber vê yekê dozê jı Çirkov kırın, ku bı awaki resmi çavdêriya Gihandınê bıke. Ebdurrezaq dı vi wari de wıha nıvisandiye : "Baweriya me bı peywendi û dostiya bı were heye, em jı rewşa Imparatoriya we -meqsed Rusya ye- ya beramber netewa Kurd pıştrast ın, jı bo wê, em dozê dıkın çavdêri û alikariyek berfıreh jı komelê û kar û barên wê re bê kırın. Jı ber ku, çavderiya we, dıbe sebebeki baş, jı bo komel jı hemû zıraran bê parastın."(64) Lı ser van daxwazan Çirkov, jı Peterborgê re weha nıvisi bû: "Daxwazake Ebdurrezaq a mezın heye, ew dıxwaze bı yarmetiya Rusya netewa xwe têbıgehine. Hewceye ku em rûmeteke gırıng bıdın vi kari."(65) Her wıha Çirkov dı rapora xwe de daxwaz dıkır ku yarmetiya maddi û giyani ji jı komelê re bê kırın.

Gihandınê, programek têr û tıje û fıreh dani bû ber xwe. Ne tenê programek jı bo xwendınê,her wıha hemla nêzikbûna giyana gelê Kurd ber bı çanda Rusya dıda.Jı bo bıcianina vê armancê,Ebdurezaq du şertan pêşkêş dıkır: yekem; alfa-

---

(63) Tısgiya Gurcıstan, rûp. 128, Kurte Xeberek, rûp. 11.
(64) Tisgiya, A.n.d., rûp. 12.
(65) A.n.d.

beya Erebi, jı bo ku hınek dengên zmanê Kurdi tê de ninın, gelek bı kêri Kurdan nayê. Ya duyem; hewceye alfabeyek Rusi bê danin. Zarokên Kurdan bı saya alfabeya Rusi dê hini zmanê Rusi bıbın û şarezayiya wan dê dı çanda Rusi de bı pêşkeve. Ebdurrezaq wıha dıgot: "Hinbûna alfabeya Rusi, dê zmanê Rusi hêsan bıke, ew ji dê yarmetiya Kurdan bıde ku, komên cıwanên zirek bên şandın Rusya, bı şarezayi û zaninek bı ser û ber dı universitên wan de bı zûtırin hinbıbın."(66)

Naskırına Ebdurrezaq bı rojhılatnasên Rusya yên bı nav û deng; wek Y.Mar û Orbili re hebû. Bı wan re, lı ser van pêgavan dıaxıft ku ew bıbın sebebê geşkırın û fırehkırına peywendiya çanda zanısti, dı navbera Rus û Kurdan de.(67) Jı bo pêşve bırına Kurdnasi dı Rusya de doza vekırına enstituyek zman dı Peterborgê de kır.(68)

Ebdurrezaq, jı bo nıvisandına kıtêbên dıbıstanê, pêşniyar kır ku dı vi wari de, raya zana û Kurdnasên Rusan bê standın. Çı jı yên zman û çı ji jı yên warên edeb û yên babetên dın, doza yarmetiyê jı wan bê xwestın. Daxwazkır ku Orbili bışinin Kurdıstanê, jı bo rêzman û ferhenga zmanê Kurdi deyne û rojên bên ji; "jı edebiyata Rusi tıştan bıke Kurdi û afırandınên şaırên Kurdan ji -ku heta nıha bı tu zmaneki Avrupayi nehatıne weşandın- bıke Rusi."(69) Hêviyeke Ebdurrezaq a mezın jı wi beşê zmanê Kurdi hebû ku dı universita

(66) A.n.d. , rûp. 129.

(67) M.S.Lazeriyev, A.n.d. , rûp. 277.

(68) Dı sedsala 19 an de, Akademiya Zanısti a Rusya, komek destnıvisên Kurdi lêkoli û bı awaki gırami û qimet çap kır. Bınêre; Bibliyografya Kurdnasi, Moskova 1963

(69) M.S.Lazeriyev, A.n.d. , rûp. 227.

İmparatoriya Peterborgê de hatıbû vekırın. Vekırına beşê, dı Kurdıstanê de dılê xelqê gelek xweş kırıbû. Endamên komela Gihandınê baweriya wan xurtır bû lı ser berewpêşveçûna van gavên bıngehin û lı ser pêşveçûna kar û barên rewşenbiri yên Kurdan.

Gihandınê, dozê jı akademiya Rusya kır ku lı ser bıngeha alfabeya Rusi alfabeyek Kurdi bê danin. Y.Orbili, dı 1919-1920 an de, alfabeyek çêkır. Ev xebata Orbili yarmetiyeki mezın û gırıng da Kurdên Bitlisê. Kesên wek Xelil Xeyali û Mehmed Emin, lı ser vê bıngehê alfabeyek Kurdi ya latini danin.(70)

Gihandınê, wextê ihtiyaca wê bı serfkırına peran an ji bı tıştên dın hebûya, van ihtiyacên xwe jı xelkê kom dıkır. Jı ber vê hındê dı kar û barên cıvaki de xelkê alikariya bı her awayi maddi dıkırın. Jı çaran yekê perê komelê jı bo mesela zanısti û xwendewari hatıbû amade kırın. Gihandın, daxwaza damezırandına çapxane û derêxıstına rojnameke hefteyi kırıbû û armanca wê ew bû ku dıbıstanek despêki a kışt û kal (zıraat) veke. Beri hemû tışti bıryara wê ew bû ku dı Xoyê de ev dıbıstan bê vekırın. Sımko, bı xwe ji, jı bo vê armancê teberru û hebûnên maddi kom dıkır.

Vê bızavi û tevgera Gihandınê tırs xıstıbû dılê misyonerên Avrupiyan û navçe bûbû cıyên nerızayi. Jı ber xurt bûna dostiya Rus û Kurdan, Sımko bı isyankeri û rêderçûyi gunehkar dıkırın.

Karbıdestê gumruka İranê, bı serokatiya Dugım, dozê jı xelkê dıkırın ku zekata xwe nedın komelê. Dozê jı danıştıwanên gundê Êringani kırın ku bêjın me bı dıl van peran nedaye. Bı rasti ji keseki zorê lı xelkê wi gundi nekırıbû û bı

(70) Arşiva Enstituya Etnografya a Lı ser Akademiya Zanısti ya Sovyet, 17, D.12.

zorê pere jı wan nestandıbû.(71) Bı hevkariya mırovên Tırkiyê û dezga dewleta İran, Dugım, telgrafek şande Tehranê ku tê de nıvisibû, Sımko, zorê lı xêzanên Kurdan dıke da ku ew herın Tırkiyê.

Serdar Murteza Qulixan ji,karê lı hemberê wan dıhat kırın, jı wan karan paş de nema. Xwest Kurdên Somayê lı dıji Ebdurrezaq derêxe. Mırovên dini û yên dın ku jı aliyên Tırkan ve hatıbûn kırêkırın, dı nav gel de dest avêtın propagandên xwe yên pûç û vala û weha belav dıkırın : Ebdurrezaq û Sımko dıxwazın Kurdan bıbın ser dinê mesihiyan.(72)

Çirkov ji, jı bo parastına têkoşerên Kurdan telgrafek jı Tehran, Tıflis û Peterborgê re şand û têde sebebên rasteqini yên meselê û bûyeran da roni kırın· Dı telgrafa xwe de wi da xwiyakırın ku karbıdestê İranê dıji belavbûna xwendewari û zanıstiyê ne dı nav Kurdan de.(73)

Gihandınê tevli van gelş û astengan ji, kari jı bo dıbıstanê xaniyek bı baxçe peyda bıke. Lêbelê, mesela tamir kırına xani ku bê tekûz kırın jı bo dıbıstanê, bı derengi ket. Waliyê Xoyê Emir Emced ji, namek jı Tebrizê re, lı ser "netırsiya Kurdan jı dewleta Farıs" şandıbû û dı wır de daxwaz dıkır ku çavdêriya hemû ew hoste û karkerên ku dı karên avabûna dıbıstanê de kar kırın bê kırın. Çirkov, dı vi wari de wıha dınvisi : "Avakırına xani jı bo ku bı kêri dıbıstanê bê, demekê sekıni. Lewra ew kesên biryar dabûn dı karê avabûnê de bıxebıtın poşman bûbûn."(74) Ebdurrezaq, naçar ma hewara xwe gıhande Fransızan. Ewan bı mêrani bersıva wi dan

---

(71) Bınêre; A.V.P.R. , bıngeh, Arşiva Farısan, B, 1913, Op. 489, D.103, rûp. 74.

(72) Tisgiya, Gurcıstan, rûp. 859.

(74) Bıngehin, a Sovyetê, 15. D.371, rûp. 159 - gışti.

xwe gihandın hewara wi. Bı alikariya Fransızan dıbıstan dı destpêka Çirya Yekem de xelas bû. Ciyên ders û xwendınê lı gora usula Avrupiyan hatıbûn amade kırın. Oda mamostan metbax û heta nexweşxane (rewir) ji tê de hatıbû dırûst kırın.

Dı 22 yê Çırya Yekem de bı awaki resmi dıbıstan hat vekırın.Dı vebûna wê de,serokê beşê eskerên Rusya ye Xoyê General Vislovisk, waliyê Xoyê, kesên dewlemend û bazırgan amade bûbûn. Lı ser cejna vekırına dıbıstanê Çirkov weha dıbê : "Dı 21 ê Çırya Yekem de, Sımkoyê Sımail Axa, 29 zarokên Kurdan, jı Xoy, Çiyarik, Soma, Bradost, Xweydar kom kırıbû. Kıncên paqıj û nû, wek Avrupiyan lı wan kırıbûn, kasketên Qazaxiyan ên sıpi danibûn serê wan. Suwarên Sımko der û dorên wan gırtıbûn. Salên wan dı navbera heşt û dehan de bûn. Bı kubari dı nav bajêr re derbaz kırın bırın ciyên jı bo wan hatıbû amade kırın. Farıs wek ecêb mayiyan lı der û dorên zarokên gurên çiyan -lı vır jı wan re weha dıbên- rawestabûn,ku ew zarok bı lez û bı meşek kubar bı ber wê dıbıstana Rusi de dıbırın. Êvara wê rojê, telgrafek lı ser vê bûyerê jı Xoyê hat şandın Tehranê, Tebriz û İstenbulê. Sımkoyê Sımail Axa ku nedıkari gelek derengi bıkeve, lê, cardın ewê fırsetê jı dest berneda û gehişte cejna vekırına dıbıstanê, tê de beşdari kır, hemû pêwıstiyên vekırına dıbıstanê ci bı ci kır û dı merasıma resmi de beşdar bû.

Beri vekırına dıbıstanê nımêj hat kırın û mele sıpasi Xwedi kır, jı bo ku vê nimetê daye van zarokên nû yên Kurdan û ku vi tıştê han jı bo wan rewa ditiye. Daxwaz jı xwendewarên pıçûk kır ku sıpasi wi karbıdestê rutbe bılınd bıkın -jı bo Xwedê tê gotın - , jı bo vi tıştê bı qimet û baş ku bı me re û bı hevwelatiyên me re kıriye. Her weha sıpasi Rusan ji kır jı bo mıldana wani kulturi ya dı vi welatê nexwendewar de, bı taybeti yên ku roleki wan a baş dı vekırına dı-

bıstanê de hebû."(75)

Sımko lı ber mêvanan sıpasi Qeyserê Rusya kır, jı bo yarmeti û xebata vekırına wê dıbıstanê. Pışti giyana berçeve û sıpasiyê re, nameke bı germi lı ser navên Kurdan jı Qeyserê Rus re şand. Sazonovi, Wezirê Derve yê Rusya, eynê sal dı 13 ê Çırya Duyemin de namekê jı nûnerê Rusya yê Tehranê re şand ku tê de wıha dıgot : "Gelek dı ciyê xwe de ye ku, jı Çirkov re bê nıvisandın İmparatorê mezın bı germi sıpasi wê rewş û nama germin ya Sımkoyê Sımail Axa ü hemû damazırêner û beşdarên vekırına wê dıbıstana Kurdi dıke." (76)

Dı dıbıstanê de dirok, matematik, coxrafya û meşandına dar û dezga dewleta Rusya dıhat xwendın. Jı bo ku zarok hini hınek pişe bıbın, ciyên xeretxane,hesınkeri,terziti û çêkırına çekan(çakmaksazi) tê de hatıbû vekırın û hemû tedarık û aletên hewcedari ji jı bo wan hatıbû amade kırın. Çirkov, wıha dıgot : "Daxwaza mın ew e, bı zûtırin wext, bax û bostanek ji bê amade kırın. Jı bo ew xwendewar hini bı kar anin û çêkırına wan melzeme û aletên ax û zeviyan bıbın. Ew alet û melzeme ka bı çı awayi tên bıkaranin û çavdêri kırına darên fêkiyan û sebzeyan bı awê Rusi çawa tê kırın û mezın kırın. Her bı wi awayi, armanca me jı bo vekırına nexweşxane û dermanxane heye û em dıxwazın yarmetiyê dı warê derman û pızişkıyê de bıdın danıştıwanên Kurdên wan navçan. Lı Xoyê dermanxane û nexweşxane heye ku bıkare yarmetiya doktoriyê bıde jınan.Doktorên wan zmanê navçê ji dızanın û dı vi wari de gelek ji şareza ne. Jı ber hınek nexweşiyên dırmi û nebûna pızişk û dermanan

---

(75) A.n.d.,.rûp. 160 -gışti.

(76) A.V.P.R. , bıngehin, Arşiva Farısan, 1913, 489, D.104, rûp. 102.

gelek Kurd dımırın. Jıneke me ya doktor bûye mudira nexweşxanê û dı nav gundên Kurdıstanê de yek bı yek dıgere. Gelek caran ji, dı demên pêwısti de daxwaza doktorên eskeri jı me dıkın. Mesrefa van doktoran dema gelek zêde be, ew jı perê dıbıstanê têdayin."(77)

Serkevtın û cigırtına wê dıbıstana Kurdi lı wır, Çirkov handa ku bı dezga karbıdestên Qafqas û karbıdestên Wezareta Derve ya Rusya re bıkeve axaftınê lı ser vekırına dıbıstanên dın lı Çariqele, Soma , Bradost û Makoyê. Jı bo armancên rojên bên, xebıti da mamoste dı nav Kurdan de bıgihine. Çirkov, jı bo pêkanina bıngeha vê xebatê pêşniyar kır ku mamosteyên Êrivanê dı wi wari de semineran bıdın û jı ber vê yekê ji daxwaz jı Kurdên Qafqasê kır ku vê wezifa han bıgrın ser mılên xwe.

Vebûna vê dıbıstanê lı Xoyê, lı nav Kurdên Tırkiyê dengeki mezın da. Rojnamên Tırkan û yên Ermeniyan behsa vebûna wê dıbıstanê kırın û armanc û daxwazên vebûna wê dıbıstanê her yeki bı cûre cûre nıvisandın.

Tırs ketıbû dılê Tırkan ku Rusya Kurdan bı xwe ve gırêde. Jı bo wê, bıryara wan ew bû ku dı destpêkê de ew bızavi û xebata çandi-rewşenbiri ya Rusya qedexe bıkın. Tırkên Cıwan dest avêtın bang û propagandan û gelek pere amade kırın jı bo vekırına dıbıstanên Kurdi. Jı bo ku, dıbıstanek lı navça Artemêtan (nahiyeki gırêdayê bajarê Wanê ye û Tırkan navê wê nıha kırıne Edremit. n.m.) nêziki Wanê vekın 17.500 lire fon jê re hat texsis kırın. 2.500 lire ji hatiye texsis kırın jı bo dı gundên Kurdıstanê de dıbıstan bên çêkırın.(78) Tırkan, her dıxwestın dı nav gundên sınor de wan dıbıstanan vekın. Vê armanca han ji jı aliyê me ve eşkere ye.

(77) Tisgiya, Gurcıstan.

(78) A.n.d.

Dı wi wari de Almanan ji dest avêtın keft û leftê. Guldeyştanê konsolosê Alman yê Musılê, dı nav gundên Kurdıstanê de dıgeriya û jı xelkê re dıgot ku, dewleta wi dıxwaze rolek wê dı pêşketına rewşa rewşenbiri ya Kurdan de hebe.

Guldeyştan lı Musıl, jı Hesen Begê bırayê Ebdurrezaq re got ku, em amadene her salê, 10 zarokên Kurdan bê pere bışinın Almanya jı bo xwendınê. Vê yekê ji jê re got; rojên bên em ê dı Wanê de cigiriyek konsolosa xwe vekın. Lı gora wan weha bûye, ku jı bo zarokên Kurdan dıbıstan bên vekırın. Guldeyştan, tenê behsa van tıştan lı ber waliyê Wanê Tehsin Beg kırıbû.(79)

Ew peyman û belêniyên diplomasiyên Almanan û dewleta Tırkiyê, jı bo armanca pêşvebırına rewşa Kurdan nebû. Qet daxwazek wan tune bû ku çanda Kurd ber bıpêş ve bıçe, ew qerar dı warê kar de rût ma û tu xebatek jı bo wê nehat kırın.

Gelek dı ser de neçû dı navbera serokatiya Gihandınê de dıjitiyek mezın dı navbera Sımko û Ebdurrezaq de peyda bû. Daxwaza Ebdurrezaq ew bû ku; hatın û hebûnên maddi yên Gihandınê jı bo çek, hazıriya şer û pır çek kırına Kurdan ji bê bıkar anin. Eva han nedıket serê Sımko, lı ba wi weha bû ku ew daxwaza Ebdurrezaq dı ciyê xwe de nine. Sımko dıgot; eger tu bıxwazi dê Kurd gışk dıji Tırkan seri hıldın û dê bı serkevın. Bı taybeti dı wi wexti de jı ber derketına şerê Balqan, Bab-i Ali bı ber tengi û astengan de dıçû. Jı ber van sebeban ji nema kari Sımko bıde amade kırın, jı ber ku, hemû berpırsiyari û meselan dıgırte ser mılên xwe. Armanca Ebdurrezaq ji her ew bû ku, çend eşiret û serokên wan eşiretan, tenê çend êrişan bıbın ser Tırkiyê, jı bo ku hınek Tırkan nerehet bıkın û bıêşinın. Sımko, bı vê qail ne-

(79) A.n.d.

bû û ew weha dıfıkırı; ew kareki rast nine û jı bo cıvaka Kurdan ji baş nine. Em nehazırın bı wi awayi bı raya xwe mırovên xwe bıdın kuştın. Hewceye ku ev hêz jı bo wexteki parastına cıvata Kurdên İran bıgre ser xwe.(80) Dı aliyek dın de ji nêrina Sımko wıha bû: Hebûnên dıbıstanê yên maddi jı bo hınek tıştên dın bên amade kırın nebaş e, ne gıramiya komelê û ne ji ya Ebdurrezaq lı cem eşiretên Kurdan namine.

Vê rewşa meşa Sımko, dı mesela çekdar kırına Kurdan dıji Tırkan de dılgermi û sergermi ya Ebdurrezaq sar nekır. Jı ber ku, Ebdurrezaq serokê komelê bû, hınek eşiretên Kurdan ên der û dorên Sımko kom kır daxwaza çekdar kırına Kurdan kırıbû serê wan. Daxwaza wi ew bû ku çekdaran bışine ber bı bajarê Erzurum û Wanê de. Vê ferqêtiya bir û baweri, sariti û nexweşiyek xıst navbera Sımko û Ebdurrezaq. (81) Vê dıjitiya han tesir kır lı ser kırdayetiya Gihandınê, gıramiya komelê şıkand û bızaviya wê ya rewşenbiri jar bû û dı sala Şerê Cihanê yê Yekem de komele nema.

Bê goman,Gihandın, rolek mezın û gırıng dı xebata hişyar kırın û pêşvebırına netewa Kurd de ditiye. Zanayê Sovyet O.L.Vılçivski wıha dıbêje : "Vê komelê rolek mezın dı geşkırına çanda hawçerxi ya Kurdan de ditiye. Geleki jı wan bızavi û destkevtiyên mirati, jı bo tevgerên Kurdan û yên bı nav û deng û mırovên siyasi yên Kurdan re maye."(82) Her bı wi awayi, ciyek wê ya eşkera û gıramiyeke wê ya baş dı peywendiya rewşenbirên netewa Rus û Kurd de heye.

---

(80) A.V.P.R. bıngeh , konsolosxana İstenbul, 1912-1914, D.3573, rûp. 302.

(81) Bınêre; A.n.d. , bıngeh , Arşiva Farısan, B, 1913, 489, D.103, rûp. 100.

(82) Bınêre; O.L.Vilçivski, A.n.d. , rûp. 61.

Dı dawiya sala 1913 an de, rê dane Ebdurrezaq ku bıçe Peterborgê. Dı çûna xwe de lı Tıflisê, cigırê Qeyser ê Qefqas Tarunsdaşkov dit û jê re got; eger Rusya alikariya ci bı ci kırına programa wi ya siyasi neke, mecbure ku ilticayi Almanya bıke û an ji bı Tırkan re lı hev bê. Ev rewşa Ebdurrezaq tesirek gelek mezın kır lı ser cigırê Qeyser û 16 ê Kanuna Yekem 1913 an, telgrafek jı Wezirê Derve re şand ku tê de wıha gotıbû : "Eger em Ebdurrezaq razi nekın, ew dê ilticayi Almanya bıke. Bı rasti ji menfaeta Almanan dı vê meselê de heye."(83)

Ebdurrezaq daxwaz jı karbıdestên Qeyser kır ku, serokatiyê dı Kurdıstana İranê de bıdın wi û jı bo serihıldana vê meselê ji amadeye dev jı hevweteniya Tırkan berde û bıbe İrani.Veransov Daşkov ê ku pır bı germi pıştgıriya vê daxwaza Ebdurezaq kır,dı vi wari de weha gotiye: "Gelek baş bû ku me Kurdên İranê anibûya ser riya xwe,jı ber ku, ewan jı bo rojên bên dê yarmetiya me bıdana ku em lı ser Kurdên Tırkiyê ji bıxebıtina."(84) Ebdurrezaq, lı Peterborgê, karbıdestên mezın ên derve yên Rusya dit. Karbıdestên Rusya bı başi dı programa Ebdurrezaq gıhiştıbûn û bı germi jê re dıgotın ku, em ê pıştgıriya bızava te bıkın. Kilim, berpırsiyarê Rojhılata Navin, dıgot ku, pêwıste rojên bên Ebdurrezaq bıratiya Kurd, Ermen û Asuriyan xurt bıke, eva han ji jı menfeeta Kurdan e. Ebdurrezaq qimetê da vê meselê û jı bo vê armancê ji, peywendi lı gel Ermeniyên Peterborgê da-

---

(83) Peywendiya Navbera Dewletan Dı Qonaxa Emperyalizmê de, qısmê 3. C.II. rûp. 250.
"Международные отношения в эпоху импер иализма", серия III, том2,стр.250.
(84) A.n.d.

ni û dı netica wê de ji komelek jı bo nezikkırına Kurd û Ermeniyan damezırand. Her bı vi awayi, behs dıkır ku, komelek wıha dı nav bajareki Qafqas de ji bê damezırandın. Vê hewla Ebdurrezaq jı bo nezik kırına her du netewan, qimetê wi lı cem Wezirê Derve Sazonov û karbıdestên dın gelek bılınd kır.

Kilim, dı nama xwe ku jı bo karbıdestên Qefqas re nıvisi ye de, bı vi awayi behsa axaftına dı navbera xwe û Ebdurrezaq de derbaz bûye dıke : "Ew tıştên ku ewi jı bo me pêşniyar kıriye, ci anina wan nıha gelek zehmet e. Dıbê ku em kûrtır û fırehtır bıçın ser vê meselê. Ev ji hewceye wıha be: Em çend konsolosê dın dı Kurdıstanê de dabımezrinın, ew wext em dıkarın bı başi hemû aliyên vê meselê bıkolın û programek eşkera deynın. Mın ewi weha tê gihandiye: qet tıştekı dıji hukumeta Tırkiyê meke û careke hewceye qet xwe nêziki sınorê Tırkiyê neki xwe jê bıparêzi."(85) Wek tê ditın, vê carê Rusya, pıştgıriya Ebdurrezaq û ya programa wê nekıriye. Kilim, lı ser Ebdurrezaq û xebat kırına wi dı İran de, jı karbıdestên dewletê re weha nivisiye : "Ebdurrezaq bı alikariya me dıxwaze bıbe hemwelatiyê İranê û kırdayetiyek jı bo wi dı Kurdıstana İranê de bê vekırın. Lı gora nêrina mın em nıkarın evê bı ci binın. Nabe ku em jı vê netırsın; ev mesele ne tenê ku peywendiya me bı Bab-i Ali re dê xera bıke, mımkun e, hemû wan sinorên Tırkiyê û İranê ji bıkeve tırsê. An ji qet dûr nine wê kırdayetiya jı bo Ebdurrezaq bê danin, Tırk ewê yekser dıjmınatiya xwe bızanın. Jı ber vê yekê, Ebdurrezaq nıha dıçe Tebrizê, lı wır dê hewıl bıde ku generalê bajêrŞudyeidewlebıbine û lı cem wi pır gırınge ku rojên bên lı ser wê meselê ew bıryarekê bıde."(86)

(85) A.n.d. , rûp. 249-250.

(86) A.n.d.

Her çend programa Ebdurrezaq lı Peterborgê nehat qebûl kırın, lê, vê carê qezencek baş jı bo çanda Kurd bı dest xıstıbû. Jı ber ku, xwendına zman, edeb û etnografya Kurd dabû qebûl kırın ku bı awaki resmi bên xwendın. Axaftın û nêzikbûna Ebdurrezaq bı Orbili yê zana û bı nav û deng re, rolek mezın dı vi wari de listıbû. Dı sala 1914 an de, dı rapora xwe ya jı Enstituya Zmanê Rojhılat re lı ser materyalên Kurdan kom kıriye; dı wê de Orbili wıha dıbêje : "Bıhara vê salê, Ebdurrezaq û Yezdanşêr ku têkoşereki siyasi yê Kurdan e, hatın Peterborgê. Mın vê fırsetê jı dest berneda, mın bı wan re, destana şaırê mezın, xelkê Cızirê ya Ehmedê Xani Mem û Zin xwend û lı ser zmanê wê mın nêrin û ditına wan gırt."(87) İ.A.Orbili, bı dılek germi ne tenê wan materyalan, ferhengeki Kurdi-Fransızi ku cıgirê konsolosê Rusya yê Erzurumê Jaba hazır kırıbû, xwest çap bıke.

Ne tenê tesirek van pêşniyar û daxwazên wi lı ser vekırına qursa zman û etnografya Kurd çêbû, Orbili bı xwe dı Universita Peterborgê de bû mamosteyê wê qursê. Dı vê meselê de, rojhılatnas N.Marr ji pıştgıri û yarmetiya vê xebatê kır. (88)

Dema Şerê Cihani yê Yekem destpêkır, Ebdurrezaq lı İranê bû. Lı ser vê bûyerê yekser zıvıri nav Kurdan û dıji

---

(87) K.Yuzbaşiyan, Akademiya Josef Abgoroviç Orbili, Moskova 1964, rûp. 43.

К.Юзбашян, Академик Иосиф Абгарович Орбели, М., 1964, стр.43.

(88) K.Yuzbaşiyan, xebatek bı qimet kıriye, programa etnografya N.Marr çap kıriye. Hêjayê gotınêye, Marr, wan belge û dokumanan jı bo dersa etnografya Kurdi amade kıriye. Bınêre; serekaniya pêşi, rûp . 143.

Tırkan dest avêt xebat û propagandeyê. Dı wi wexti de lı der û dorên Ebdurrezaq nêziki 500 kesên çekdar hebûn. Ewan yarmetiyek pır mezın jı bo eskerên Rusya yên dı İran de kırın. Ew dı bın fermandariya general Jirnozobov de bûn. General û cigırê konsolosê Rusya, çendin car behsa wan yarmetiyên Kurdan, jı bo serok esker û diplomasiyên Rusya yên Qafqas nıvisibûn.(89) Tırkên Cıwan, jı xebata Ebdurrezaq ya dı nav Kurdan de gelek dıtırsiyan. Jı ber vê yekê, gelek caran hewıl dan ku ewi jı holê rakın, bıkujın.(90)

Dı vê qonaxê de, wezifa mezın a Ebdurrezaq ew bû; lı dıji kuştına Ermeniyan ya bı destên Tırkan raweste û yarmetiya xwe û yên çekdarên xwe jı bo wan amade bıke. Lı hember kuştına Ermeniyan, hêzên xwe bı tevayi bı kar bine û alikariya wan bıke ewan jı mıntıqên şer derine û wan bı sılameti û arami bıgihine navçên Rusya yên ku ciyên aşiti û jı warên şer dûr ın. Ewan bıgihine navçên dı bın parıstigeriya Rusya de ne.(91)

Qimet nedana siyaseta Rusya dı başûrê rojavayê İran de, serokên Kurdan û heta Ebdurrezaq ji xıstıbû bın şıkê. Her çend nedıkarin tu tuhmetek bıdın ser Ebdurrezaq, lê belê, rê lı xebata wi ya bı bızavi gırtın û jı bo demekê wi lı Tıflisê dan sekınandın.

Dı sala 1918 an de, Ebdurrezaqê têkoşer, serokê bı nav û deng ê Kurd, bı destên Tırkên Cıwan, ew ên ku demek dırêj bû bı xwina serê wi ti bûbûn,fermana mırına wi bı awayek lez dan û bı yekseri ewi lı sêdarê dan.

Vê rewşa han dı nav dewletê de alozi çêkır. Diplomasiyên Qeyser,bı wi awayi rûmetek hêviyê nedan siyaseta Eb-

(89) A.n.d., rûp. 332.
(90) M.S.Lazeriyev, A.n.d. , rûp. 294.
(91) Mişak 1915, 22(9) yê Çırya Yekem, hej. 22.

durrezaq. Ewan her tenê dıxwestın armanca xwe dı nav Kurdên İranê de xurt bıkın û jı ber şerên sınorê Tırkiyê û İranê, jı bo menfeeta xwe ewan bıkar binın. Mesela azad kırına Kurdan jı destên Tırkên Cıwan, lı ba diplomasiyên Rusya "xeyal û xewn" bû. Ebdurrezaqê têkoşer, dıxwest serokên Kurdan pıştgıriya wi bıkın û ew ji feyde jı tesira esker û diplomasiyên Rusya bıgre û Kurdıstanek serbıxwe ava bıke. Lêbelê, teeb, zehmetiyên wi vala çûn û beyhûde man. Ebdurrezaq hemû caran, bı rasti nedıkari ewan rastiyan deyne holê ku astenga bı ci anina pêşiya programa wi çiye. Ewi dıxwest, sınoreki jı bo wê rewşa xırab a cıvaka Kurdan deyne, ku dı destên dıjmınatiya eşiri û şexsi de dınale. Her bı vi awayi, pışta xwe gırêda bû Rusya ku ewê ji nedıxwest Kurd serxwebûni bı dest bıxın.

Her çend bızava têkoşeri û siyasi ya Ebdurrezaq, negıhişte armanca ku ewi dıxwest, lêbelê, dı warê rewşenbiri û xwendewari de, gavên dı ciyên xwe û yên bı gırami hatın avêtın. Bı xebata Ebdurrezaq, komela Gihandın hat damezırandın û lı Xoyê dıbıstanek hat avakırın. Ew komele her çend pır nejiya, lêbelê, tesirek wê ya pır mezın çêbû lı ser rewşa xwendewari û rewşenbiri dı nav Kurdan de. Belê! Ew dıbıstana pıçûk, bûbû sıtriya nav çavên hukumeta Tırkiyê û İranê û çavên wan peqandıbû.

# HEWLA DAMEZIRANDINA EMARETEK KURDÎ A SERBIXWE Û SERÎHILDANA 1914 YA BITLÎSÊ

Gelek dı ser de neçû, Tırkên Cıwan ketın tengiyê. Nıkarin ew zor û zehmetiyên cıvaki-netewi yên siyaseta kırdayetiya Sultan dı ci de hıştıbûn çareser bıkın. Pır bı awaki zû, netewên bın destên İmparatoriya Osmani jı xwe dûr kırın.

Zorkeriya mıl bı mıl a dewletên Avrupiyan lı ser Tırkiya; dewletên weki Almanya, Ingiltere, Rusya û.h.w.d. dıjitiya cıvaki û netewi yê netewên Imparatoriya Osmani aloztır û xurtır kırıbû. Lı derveyi van mıl bı mıl ên dewletên derve, partiyên Tırkan ji, dı nav xwe bı xwe de ketıbûn canên hev, jı bo kursi û zordariyan, têkılhevi û alozi peyda dıkırın. Bı taybeti dı navbera İttihad û Teraqi û İtilaf (Fırka Hurriyet û İtilaf.n.m.) de, wan dıjitiyan xwe dıxıstın ber çavan. Bê goman, vê rasteqiniya paytext, tesirê kır lı ser danıştıwanên welat bı taybeti ji navçên rojhılata İmparatoriyê.

Şıkestına hukumeta İttihadiyan dı şerê Trablus û Balkan de, zor û zehmeti, tengi û nexweşiyek mezın dı Tırkiyê de peyda kırbû. Jı ber sebebên van bûyer û pêşveçûnan, bızava siyasi ya hêzên berxwedan, lı gora hınek çavdêran, tevgera azadixwaz a Kurdan ji ketıbû rewş û gehinekên nû.

Peyamnêrên kovara Ermeniyan Ararat dı vi wari de wıha dıgot : "Serekên Kurdan hez dıkırın, zû an dereng, partiya Tırkên Cıwan jı mafên wan bê par bıkın ku ew tınaz bı giyana netewi ya wan dıkın. Jı ber vê, hewceye em hêzên dewletê bı kar binın û dest bavêjın xebat û bızav kırınê."(1)

Sala 1912 an, dı meha Gulanê de, hınek têkoşerên Kurdan lı İstenbul bangeki yekitiyê belav kırın. Ewan jı nûnerên hemû komele, rêxıstın û kesên Kurdan, doz dıkırın ku hevkari û yekgırtına hêzên xwe kom bıkın. Nûneran daxwaza biryara damezırandına partiyek yekgırti kıribû ku ew bıkare bıbe çaresera armanc û rêbera netewa Kurd. Armanca bıngehin û riya rasteqini ya yekitiyê danibûn. Kovara Ararat, wıha dınıvisi : "Hewceye partiyek hebe ku şoreşeke mezın rake.Minaka wê tektikên Arnavutan e.Dı destpêkê de nedana bac û xerac,pışt re acız kırın û nerehetkırına karbıdestên Tırkan e, dı dawiyê de ji damezırandına kırdayetiyeki wexti û banga serxwebûna Kurdıstan e."(2) Bızavi û têkoşina serokên Kurdan dı İstenbul û Kurdıstan de deng da û xelkeki pır zêde bı aliyê xwe de kêşa.

Tevgera aazadixwaz a Kurd, ber bı xurtbûnê ve dımeşiya, lê hêjta ne wısa bû ku bıkare bı zorê mafên xwe jı Tırkiyê bıstine. Dar û dezgên navçên Kurdıstanê, zor û zehmetiyan jı nûnerên Kurdan re yên ku jı bo parlamentoyê hatıbûn bıjartın peyda dıkırın. Geleki jı Tırkan itiraf bı nûneren Kurdan nedıkırın. Lı Sêrtê danıştıwanan HesenPaşa helbıjartın, lêbelê, bı fermana partiya İttihad û Teraqi ew helbıjartın nehat qebûl kırın.

---

(1) Ararat 1913, Londra, V.I- N.3, rûp. 78.

(2) A.n.d. , jı ber zehmetiyan, dı rasteqini de ev bıryara han nehatiye ci bı ci kırın.

Lı hember van kırınên Tırkan, bersiva Kurdan ew bû ku bıryar dan bıçın dı nav partiya İtilaf û Hurriyet de bıxebıtın. Dı 31 ê Tirmeha sala 1912 an de, konsolosê Rusya yê Bıtlisê Çirkov, lı ser giyana Tırkan a lı dıji Kurdan wıha nıvisîbû: "Nıha giyan û hişyarbûnek netewi ku dı nav Kurdan de heye, ev hêdi hêdi dı nav hemû danıştıwanên welat de geş dı be."(3) Lı gora gotına Çirkov ew tevger "lı der û dorên bajarê Bıtlisê ber belav bûye."(4) Serokên Kurdan lı Bıtlisê û navçên der û pıştên wê de bıryara damezırandına emareteke Kurdi a serbıxwe dan. Çirkov, behsa daxwaz û pilanên wan Kurdan kıriye û gotiye ku daxwaz û tamaya wan dı alikariya Rusya de heye. Çirkov dı wi wari de wıha dıgot : "Kurd dıxwazın dı Bıtlisê û bajarên dın de xwe jı bın desthılatdaran xelas bıkın. Jı bo wê ji ew dıxwazın dı navçên; bajarê Sêrtê; Xerzan, Botan , bajarê Bıtlisê; Hizan, Motki, bajarê Diyarbekrê; Mêrdin, Nıseybin, Midyat, Cızirê, Silwan, bajarê Musılê; Zaxo û pıştre ji Sılêmani û Kerkuk, dı dawiyê de ji, bajarê Wanê; Başqale, Dıcbılkın û Gurcan de seri hıldın û dest deynın ser dezge, çek û zexirên dewletê û dı van navçan de hukumetek Kurdi damezrinın. Dıxwazın kurê Emır Bedırxan yê mezın ji bıkın emirê vê dewletê...

Raya Bedırxaniyan ew e ku ew emaret berdewam bıbe û bı gışk hêzên xwe ve bê parastın. Pêwıste wek wan dewletên bı İmparatoriya Almani ve gırêdayi, emareta Kurdi ji bı İmparatoriya Rusya ve bê gırêdan."(5)

Van raporên konsolosê Rusya yên ku sala 1912 an û dı

(3) A.V.P.R. , bıngeh ., Konsolosxana İstenbul, 1907-1913, D.572, rûp. 221.

(4) A.n.d.

(5) A.V.P.R. , bıngeh , Arşiva Siyasi, 1914, Op.472, D.540 D.45-gışti.

meha Tebaxê de, jı Tırkiyê jı Wezareta Derve a Rusya re hatıne şandın, eşkera roni dıkın ku rêxıstıneke Kurdan a bı dızi, bı navê İrşad hebûye. Komita serokên rêxıstınê ji dı navçên rojhılata welat de û dı nav Kurdan û bı wan bı xwe ve jiyaye. Lı gora wan melumatên ku Xeyrettin Bêrz daye sekreterê konsolosê Rusya, endamên komita Erzurumê jı van kesan pêk hatiye : Suphi Eziz Beg, Egit Efendiyê Zırki, Şêx Osman Efendiyê Eleşkêrti, Selim Efendi, Bekır Efendi. Weşanên rêxıstınê û kasa wê hebûye û endaman her meh 10 pere mehani dane. Sekreterê Konsolosê Rusya, van melumata jı Xêyrettin gırtiye, pışt re ewan jı Wezareta Rusya a Derve, Beşê Yekem re şandiye tê de weha dıbêje : "Komitên wê dı herêma Wan, Diyarbekır, Urfa û hınek ciyên dın de hatıne damezırandın. Wezife dane Xêyrettin ku dı nav Kurdên Erzurum, Bıtlis, Beyazid û Muşê de alikariya maddi jı bo rêxıstınê kom bıke."(6) Sekreter bı vi awayi rapora xwe dıdomine: "Xêyrettin dıbê eger perên komitê hebe, dı navbera 15 rojan de serihıldan dê rabe, hêjta perên me kêm ın û em jar ın. Xêyrettin Beg doza yarmetiyê jı dewleta Rusya dıke."(7)

Jı bo çareserkırına bêperetiyê, berpırsiyarên İrşadê, dı navçên Sêrt, Bışêri û Xerzan de dest avêtın pere kom kırınê. Dı wan wextan de, wê bac û xeraca ku Tırkan jı Kurdan dıstendın êdi ewê nedan û dest pê kırın ewê dan e Hesen û Sılêman Bedırxan.(8)

Bıhara 1913 an dı sancaxa Sêrtê û dı navça Şêrwan de, serokên Kurdan kombûn û behsa damezırandına emaretek

---

(6) A.n.d., 1912-1914, Op. 482, D.1648.

(7) A.n.d.

(8) A.V.P.R., bıngeh, Konsolosxana İstenbul, 1912-1914, D.3573, rûp. 18.

Kurdi a serbıxwe kırın. Her weha, behsa peywendiyên lı gel Rusya ji kırın û bıryar dan ku ev peywendiyên han bı karbıdestên Qafqas re bên xurtkırın. Bıryarek dın ji dan ku Kemal Beg(9) bışinın Tiflisê jı bo daxwaz û armancên wan bı Rusan bıde zanin û ewan lı ser rewşa xwe roni bıkın. Dozê kırın ku, dıxwazın bızanın, ka gelo dê Rusya çek bıde Kurdan û wan çekan jı wan re derbazi Kurdıstanê bıke? (10) Dı navçên dın de ji Kurd bı dızi kom dıbûn û behsa destpêkırına şoreşê dıkırın. Slogana bı safi "Kurdıstan", gelek mırovên dini û yên bı nav û deng ên Kurdan -ewên jı kırdayetiya Tırkan nerazi bûn- lı der û dora xwe kom kırıbû.Vê tevge rê,navçên Kurdıstana başûr ji gırtıbû.Konsolosê Rusya dı nama xwe a jı bo Gêrs re nıvisi bû tê de weha dıbêje : "Dı bajarê Musılê de ji, bızava giyani a tevgera Kurdan ber bı geşbûnê ve dıçe. Bı taybeti van ciyên ciranên Diyarbekır, Sêrt û Bıtlisê. Lı Dıhok ji beg û şêx ber bı kombûnê ve ne." (11)

Her weha, diplomasiyên İngilizan ji çavdêriya wê bızavê û xwe hazır kırına Kurdan dıkırın û ewan dıxwest peywendi bı serokên Kurdan re deynın.Bı taybeti cigırê konsolosê Wanê, pır xebıti ku peywendiyek xurt bı Kemal Beg re deyne. Hêjayê gotınê ye, serokên Kurdan jı wan dıxwestın ku aliariya Kurd û Ermeniyan bı hev re bıkın.

Tırkên Cıwan, pır bı hêdi û bı deqiq çavdêriya wê tevgera

---

(9) Kemal Beg (1872-1934), xelkê Sêrtêye, lı Fransa xwendına xwe temam kıriye. Bı başi çend zman zaniye. Pıştê Şoreşa Oktobr lı Tıflisê çend sal maye û mıjûliya wi her kar û barên siyasi-cıvaki bûye. Nıviskar.

(10) A.V.P.R. , A.n.d., rûp. 108-109- gışti.

(11) A.n.d. , rûp. 110.

Kurdan dıkırın û xwe ji jı bo dıji êrişeki weha hazır kırıbûn. Her ewan ji wan pilanên ku Ebdulhemid gırtıbû ber xwe, xıstın kar û dıjmıni dı nav netewan de peyda kırın û jı bo xurtkırına wan xebıtin.

Kırdayetiya Tırk, kari çend derebegên Kurdan bıke dıji Ermeniyan. Cigırê konsolosê Rusya yê Wanê weha nıvisibû: "Dı nav Kurdan de du rê hene. Yekemin, riya wan Kurdan e ku baweriyeke wan a netewi heye, riya duyemin ji ew e ku dıji Ermeniyan e. Riya yekem mırovên rewşenbirên wek ku Ebdurrezaq serokatiya wan dıke, lêbelê, riya duyem, ew kesın ku propaganda dini û ya Panislamizmê dıkın û bı hile û pilên kırdayetiya Tırkiyê hatıne xapandın."(12)

Polisê dewletê yên dızi bı hemû awayi dıxebıti ku wan serokên tevgerê bıgre. Dı İlona 1913 an de, bı destên mırovên kırê kır ên Tırkan Huseyn û Xeyrettin Bêrzi hatın kuştın. Hêjayê gotınê ye ku, ew têkoşer bı pereki zêde jı İranê vedgeriyan Tırkiyê. Ew perên bı wan re jı bo şoreşê hatıbû amade kırın. Ew dı nav gel de dıgeriyan û dıgotın ku, guhên xwe nedın propagande û derewên Tırkan ku dı nav we de belav dıkın. Ev kes her bı van propaganda re mıjûl dıbûn. Pışti vê bûyerê, jendırmên Tırkan yên Arçakê (nahiyeki bajarê Wanê ye n.m.), Sılêman Beg û bırayê wi Ferxo û qeymeqamê Ebexê (qezaki bajarê Wanê ye, Tırkan nıha navê wê kırıne Özalp. n.m.) Nuri Beg, Mıstefa Beg, Huseyn Ebdal Axa û gelek serokên Kurdan ên dın hatın gırtın.(13)

Jı bo temam kırına vê pilanê bac û xerac hat zêdekırın. "Jı bo keri gırtın û heta jı bo yek mi sıtendınê ji ew musaa-

(12) A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1912-1914, D.3573.

(13) A.n.d., Arşiva Siyasi, 1912-1914, Op. 482, D.1648, rûp. 153.

dên berê hatın rakırın û cezayên dadgehê yên dı vi wari de ya sedê 20, du car hat zêde kırın."(14)Rojnama Qafqas Rusi wıha dınıvisi : "Pıştî temam bûna şer, ferman jı İstenbul derket, ku mıktareki pır zêde û xeyali lı ser Kurdan bê danin."(15) Wek ku peyamnêreki ji behs kıriye: "Heta serê zarokan û mırovên din ji ew bac û xerac hatiye danin. Pıştî wê fermanê, ew bac û xeracên serê zarokên deh sali kırıbûn wek yên bist sali. Ew kesên ku xıstıbûn wan rewşên xırab pır bı rıkoyi lı hember wan dıcolan."(16) Dı hemû malan de lı gor daxwazên karbıdestên navçê û lı gora kêfa xwe, talan jı bo wan bac û xeracan dani bûn.

Zêdekırına bac û xeracan, rolek mezın list lı ser rewşa aboriya jiyana Kurdan.Nerızayiyên gırsi û gelêri bı awayek xwe bı xwe dıgelek ciyan de peyda bûn. Şerên dest û pêsiri lı ser bacgır û karbıdestên Tırkan dest pê kırın. Çirkov, jı konsolosê Rusya re wıha nıvisibû : "Hewceye em vê bızanın ku mesela 'keri sıtendın' bêzariyeki mezın dı aliyê Kurdan de peyda kıriye. Ew nerızayi û pêsir weşandın jı bo van bac û xeracan ku tê dan, dıbe sebeb ku peywendiya wan lı gel Tırkan xerab dıke. Pıştî zêdekırına van bac û seraneyan ev mesele êdi bı xweşi nayê sekınandın."(17) Vê nêrina Çirkov gelek dı ser de neçû, hate ci. Lı Nehê(mıntıqek gırêdayi bajarê Bıtlisê ye. n.m.), Kurdan baca "keri gırtın"ê nedan e û gotıne ku em bı vê zêdekırınê razi ninın. Lı Motkan û Xoyê, Kurdan, wan bacgırên ku jı Bıtlisê hatıbûn jı nav xwe derê-

---

(14) A.n.d. , Konsolosxana İstenbul, 1914, D.1406, rûp. 11.
(15) Qafqas, 1914, hej. 84, 15 Nisan.
(16) A.n.d.
(17) A.V.P.R., bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D. 1406, rûp. 20-gıştî.

xıstın."(18)

Ajans û deng û behsên Avrupayê, bı vi awayi behsa wan meselan kırıne; gelê Kurd, lı Trabzon, Diyarbekır, Musıl û gelek ciyên dın razi nebûne bac û xeracê bıdın. Lı navça Beyazidê, Kurdan bı çek lı hember hêzên dewletê seri hıldane.(19) Lı niziki Bıtlisê hınek serbazên Kurdan çûne nav Kurdan û seri hıldan e.(20) Peyamnêrê rojnama Horizon a Ermeniyan wıha nıvisibû : "Kurd dıbêjın, jı bo çı karbıdestên dewletê jı me sed cari zêdetır maaş bıstinın û jı bo çı dıvê em bertilên pır zêdetır bıdın? Jı bo çı em nıkarın pıçek baştır û xweştır bıjin.? Jı bo çı, çı yên wan jı yên Kurdan zêdetır e, jı bo wan bac û xeracan em bıdın!? Jı xwe ev perên han tev jı berika Kurdan derdıkeve!? Jı ber tıştên pır pûç û bê feyde û bê qimet, ev bac û xeraca han hatiye zêdekırın. Eva han ji hewceye pıraniya wê jı Kurdan bên sıtendın. Jı ber ku, ewın xwedi ax û zevi û pıraniya wan şıvan, gundi ne, yên dı vê meselê de zêdetır bên êşandın ewın."(21

Ev bûyerên han, mal kavılkırın bû û rewşa gundiyan ya abori pır xerab kırı bû. Dı ser de ji, xelkê dıbırın eskeriyê. Eva han, hejmara kesên ku bıkarın bıxebıtın pır kêm kırıbû. Rojnama Azate Mart ser vê bûyerê weha nıvisibû : "Ew kesên dıbırın eskeriyê, hewce bû ewan serwet, xêzan, mal û mılkên xwe bı ci de bıhıştana, eva han ji şerpezeti û bê seri û beriyeki mezın dıxıst nav wan. Ew bûkên bê mêr, ciyên xwe dıhêlın û ber bı gelek nerehetiyan de dıçın û zarokên wan ji ber bı xırabiyê de dıçın. Nıha em ê wê tabloya bı

---

(18) Bınêre: A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D.1406, rûp.22.

(19) Mişak 1914, Adar, hej. 27066.

(20) Wextê Nû, 1914, 21 ê Adar-3 yê Nisan, hej. 13658.

(21) Horizon (Sınor) 1914, 27 ê Addar, hej . 66 (Bı Ermeni)

dıl şewat bıdın ber çavên we; do, jına gundiyeki zarokê wê lı ber pêsira wê çû ye daira dewletê û weha gotiye : 'Kerem bıkın eva jı we re, zarokên mın ji bı zındi çal bıkın'. Jı wan hêvi û pıştgıriyê xwestiye û gotiye ; 'jı vır pê de ez ê çawa bıkarım van heft zarokan xwedi bıkım."(22)

Jı ber peydabûna vê rewşa alozi dı bajarê Bıtlisê de, wali bıryara gırtına Mele Selim da. Ew kes, yek jı wan serokê tevgera Kurdan bû. Bı fermana wali, qeymeqamê Hizanê lı gel 50 jendırman, bı nışka ve der û dorê mala Mele Selim gırtın. Wi gırtın û bı dûvê hespeki ve gırêdan xıstın ser rê û ber bı bajêr ve şandın. Jı bo bersıva vê bûyerê, Kurdin hejmara wan gelek zêde û bı çek, lı gundê Arzvin keminek danin û pişti teqandınek kêm karıbûn jendırman belav bıkın û Mele Selim jı destên wan rızgar bıkın. Mele Selim, xwe lı gundê Xomaç veşart. Serokê dini yên Ermeniyan, lı Bıtlisê, jı bo katolikên Icmıdzinê wıha nıvisiye : "Tevgera Kurd û şoreşa wan bûye rastiyeki mutlaq."(23) Karbıdestên dewletê yên navçê ji, her lı ser raya qaymeqamê Hizanê, pışti vê bûyera sernekevti, demekê xwe lı Bıtlisê veşartın û newêribûn bıçın ciyên xwe. Jı tırsa, mudirê Tatikê û hınek kesên dın, bazdan hatın Bıtlisê.

Mele Selim, lı Xomaçê dest avêt xwe qaim kırınê. Der û dorên gundan bı senger û xendêkan dabû gırtın. Gundiyên Ermeniyan yên ciranên Kurdan, çekên sokê; wek xencer û yên dın dı malên xwe de jı bo Kurdan çêdıkırın. Lı ser daxwaza Mele Selim, hesınkerên Ermeniyan ên gundê Olekê, sed kêran jı bo Kurdan çêkırın(24)Pêşmergên Kurdan,bela-

---

(22) Azate Mart (Xebat jı bo Azadi) 1914, 29 ê Gulan, hej. 1524.

(23) Horizon, 20 ê Nisan, hej. 83.

(24) Azate Mart, 1914, 27 ê Adar, hej. 66.

vok û bangewazên lı diji zılm û zora Tırkan belav dıkırın.Lı Xomaç, wek nişana serxwebûnê, ala Kurdıstanê daçıkandıbûn.(25)

Bı awayek zû, lı navçên weki Tatikê, Hizan û ciyên dın, desthılat kete destên şoreşgeran. Kurdan, tev rê û dırban gırtıbûn, esker û jendırmên Tırkan bê çek kırıbûn. Lı Xomaç, çavên wan lı riya serokên Kurdan bûn, bı taybeti ji yekek jı Bedırxaniyan. Peywendiyek Mele Selim a xurt lı gel Kurdên Bıtlisê hebû. Jı ber hındê, agahdariya wi bı hemû tıştan hebû û dızani Tırkan çı armanc danine ber xwe. Namek şoreşgeran ku jı bo xelkê Bıtlisê hatıbû şandın dı wır de; behsa nerızaya geleri ya Kurdan dıkırın û wezife û armanca tevgera xwe dınıvisin.(26)

Saw û tırsê karbıdestên Tırkan gırtıbû. Bı taybeti bı ber guhên wan dıket ku daxwaza şoreşgeran ew e ku dê bı ser bajêr de bıgrın. Dezga dewletê ya navçê, hêzek wani eskeri bı wi awayi nebû ku bıbın ser Kurdan. Bı awaki şaşmayi û heyri, bê sebır çavriya guherinên bûyerê dıkırın.Wali xwestıbû jı bo mesela gırtına ser bajêr, rû bı rû bı Mele Selim re bıaxıve, an qet nebe, ewi bıde mıjûl kırın ku heta jı navçên dın ya der û doran komek xelk bıkare bine hewara xwe. Dawiyê komek nûner dabû anin û şandıbû ba Mele Selim bo axaftınê, lê, ev koma nûneran bê netice û dest vala paşda vegeriya. Lı ser daxwaza wali, Mele Selim bıxwe, jı bo axaftına ser wan bûyeran çû Bıtlisê. Mele Selim, lı bajêr, lı mala xızmeki xwe mabû. Mele Selim, bı mantıq û pır bı xweşi bersiva wali da. Wali, dest jı axaftınê berda lı ser wê

(25) A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D. 1406, rûp. 22-gışti.

(26) A.n.d. , rûp. 23.

ji Mele Selim cardın vegeriya Xomaçê. Beri ku vegere wıha gotıbû : "Eger Kurdan heya beri nıha lı hember eskerên Tırkan parastına xwe ya şexsi dıkırın, lê, jı vır pê de, pışti demeke nizık, dê bı tevayi dı riya heq û mafên xwe de seri hıldın. Bı taybeti ew dar û dezgên Tırkiyê ku Kurdan dıperçıqinın jı mafên wan bê par dıkın û welat dıxın bın destên biyaniyan de jı holê hılinın."(27)

Bûyerê bıryardanek zû û bı lez dıxwest. Mezher Begê waliyê Bitlısê jı ber tembeli û têkılheviyê, xebatê danibû rexek. Jı ber vê, jı bo demeke wexti, xızmê Talat Paşayê Wezirê Hundur Mıstefa Xelil Begê waliyê Sêrtê anin ciyê wi.(28) Serokê nû yê Bıtlisê, bıryar da ku êriş bıbın ser şoreşgeran. Lêbelê, pıraniya eskeran vê fermanê ci bı ci nekırın û bı vi awayi lı hember derketın : "Em ê çawa şer lı dıji bırayên xwe bıkın."(29) Çirkov dı nama xwe ya jı konosolosê İstenbulê re şandıbû, tê de wıha dıgot : "Qet dûr nine, ew eskerên dewletê ku bıxwezın ber bı Kurdan de, mıl bıdın Kurdan û bı hev re herın ser Bıtlisê."(30) Esker razi ninbûn bıçın ser Kurdan. Jı ber vê yekê, ewan bı lez jı Wanê esker dan anin.

İdara awarte lı bajêr ilan kırın. Dı dawiya meha Adarê de, lı nêziki Bıtlisê dı Dêra Xındrekatar a Ermeniyan de, jendırmên Tırkan çar kes jı mırovên Mele Selim gırtın. Peyamnêrê rojnama Horizon weha nıvisibû : "Ew çar Kurdên ku lı Dêra Xındrekatar hatın gırtın, bı dest gırêdayi anin bajarê Bıtlisê. Wextê wan bırın gırtigehê, ew bı serbılındi, rû geşi dı-

---

(27) Bınêre: A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1912-1914, D.3573, rûp. 49.

(28) A.n.d. , D.1406, rûp. 24.

(29) A.n.d.

(30) A.n.d.

meşiyan. Mırov, bı wan dıhesiya ku çendin baweriya wan bı edaleta doza wan xurt e. Bı rasti, baweriya Kurdan bı doza wan heye. Bê sınor aza û bêtırsi ber bı wê xeteri û mırınê de dıçın."(31) Mele Selim, daxwaz kır ku kesên hatıne gırtın bı lez bên berdan. Ewan tehdit kır ku eger ew kes neyên berdan, dê dı şûna wan de 25 jendırmên wan bên gırtın.

Waliyê Bıtlisê yê nû, dı vê rewşa aloz de, bı zehmeti kari tenê 400 esker û jendırme kom bıke, da wan bışine ser Kurdan. Kurd zû bı vê bûyerê hesiyan û lı geliyê Êzê û dı ser riyan de xwe bı ci kırın.(32) Dı navbera her du aliyan de şereki germ dest pê kır. Tırkan dıxwestın bı çı awayi dıbe bıra bıbe, bı topbarankırınê Kurdan jı geli derêxın û riya xwe vekın, lêbelê, ew kefte lefta wan bê feyde bû û ewan nekari daxwaza xwe bı ci bıkın.

Hejmara Kurdan nêziki 700(33)kesan bû,Mele Selim serokatiya wan dıkır.Eskerên Tırkan bı awaki wısa şıkest ku heya ser riya Sêrtê paşde çû.Lı wır ji bera pey wan dan heya nava bajarê Bıtlisê. Bajêr lı ber ketınek bê nizami bû.

Şêx Şahabeddin, serokek jı yê serihıldanê bû. Namek bı tehdit nıvisi û mırovek xwe şand ba wali. Dozê jê kır ku, herçi çek, cebırxane û zexirên dezga dewletê heye bıde destê şoreşgêran. Karbıdestên Tırkan bajêr terk bıkın, deriyê gırtigehê bê vekırın û kesên gırti bên azad kırın. Dı dawiyê gotıbû ku: eger wali van daxwazan bı ci neyine ew dê êrişê bıbın ser bajêr û bı şer dê bajêr bıstinın.(34)

---

(31) Horizon 1914, 26 ê Adar, hej. 65.

(32) A.n.d.

(33) Hınek serekani dı bên ku, du hezar Kurdan bı şuran wê şerê kıriye. Bınêre: A.V.P.R. , bıngehin, Konsolosxana İstenbul, 1914, D.1406, rûp. 56.

(34) Horizon 1914, 25 ê Nisan, hej. 87.

Wextê şev bı ser de hat, beşek jı şoreşgerên Kurdan ketın nav bajêr. Zeyneddin ku kesek jı mırovên Mele Selim bû, taxa ku ketıbûnê, ala şoreşê dı wır de çıkand. Heya êvara 20 ê Adarê, şoreşgerên Kurdan der û dora hemû dezge û ciyên gırıng ên Bıtlisê gırtın. Hejmareki gelek zêde jı xelkên bajêr ketın nav wan. Her ku dıçû şer gırantır dıbû. Tırkan, dı qışle û garnizonên xwe de xwe qayim kırıbûn. Dest avêtın kuştın û agırbarankırına Kurdan. Kurdan ji dı xaniyên der û dorên wan dezgeyan de xwe ci kırıbûn. Hejmarek gelek zêde xelk hatın kuştın û şer çend rojan domand.

Rêxıstıni û têgıhiştıniyek. bı pêwısti dı kar û barê şoreşgêran de nebû. Serihıldan xwedan serokatiyek bı tımami nebû. Wek ku çavdêrikeran ji behs kırın e; komek xelkên bırçi û bêkar ketıbûn pê şoreşgêran.Dı ser vê re ji, bı pırani çekên destên wan xencerek, tevrek an ji tewşoyek bû, lêbelê, disa mıl dıdan, ber bı berepêş ve hemlan dıkırın.(35)... Komek jın ji lı gel şoreşgêran bûn, ewan ne ku tenê av û nan jı bo wan amade dıkırın, ewan mıl û bı mıl, senger sengerlı gel wan şer dıkırın.(36)

Her çendin meş û rewşa şer baş nebû, lê, para merdaneyi û azayetiya wan hêjayi gotınê ye. Wek rojnamên Ermeniyan bı taybeti ji Horizon behs kıribû: "Kurdan, bı awayek xweşi û bırati lı Ermeniyan nêrine. Heta wan tıştên ku Ermeniyan bı dılxweşi û lı ser daxwaza xwe dıdan wan, ewan nedıgırtın. Kurdan tenê tıştên şewatê jı Ermeniyan dıgırtın, ew ji jıber wê bû ku, şev û roj lı ber berf û baranan bûn. Ev rewşa han bı yek cari Ermeniyan dılxweş kır û arami xıste navbera her du mılan."(37)

(35) A.n.d., rûp. 41-42.
(36) A.n.d., 12 ê Nisan, hej. 76.
(37) Horizon 1914, 10 ê Nisan, hej. 74.

Bûyera lı Bıtlisê hat pêş, bı awayek zû lı bajarên dın hat sehkırın. Hewce bû ku Tırkiya çaresereki bı lez peyda bıkıra. Bıryar hatıbû dan ku, hêzên eskeri yên Wanê, Muşê, Erdişê û yên ciyên dın bışinın ser Bıtlisê.
İhsan Paşayê serokê hêzên parastıni yê sınor, kırın serokeskerê hêzên Tırkiyê ê wır, jı bo êrişê bıbe ser Kurdan. Ewan pilana têkılheviyê û aloziyê xıstın navbera Kurd û Ermeniyan, jı ber ku van pilanên han ne tenê tevgera Kurdan bê hez dıkır, yarmetiya Ermeniyan ji jı serihıldanê dıda qut kırın. İhsan Paşa daxwaz jı Ermeniyên Muşê kır ku lı hember Kurdan çek hılgırın. K.Sasoni ku vê bûyerê bı çavên xwe diye bı vi awayi dıbêje : "Ermeni bı vi pilani baş gehıştıbûn. Lêbelê, jı bo ku bı dewletê re nekevın aloziyê mecbûr man wê qebûl kırın."(38) Dı ber vê re ji şoreşgerên Kurdan bı awaki veşarti, jı vê çeklıılanina bı şekli agahdar kırın.(39) İhsan Paşa her bı vi awayi esker kom kır û dest avête êrişa lı ser riya Bıtlisê. Eskerên Tırkan, bê rehım û bê wıjdani dest avêtın şewıtandına malên Kurdan û kuştına xelkên dest û piyên wan gırêdayi.(40)

Bı bûyerên bajarên rojhılata Tırkiyê re, wan kırdayetiyên ku menfeeta wan dı wan navçan de hebûn, bı taybeti Almanya pıştgirê Tırkiyê, lı ber van hedisan mabûn heyri. Konsolosê Almanyê ku mudirê kar û barên bajêr bû bı awaki pêdana erdê û rıkoyi dozê jı Tırkan kır ku zûtırin wext lı vê tevgerê bıdın û wê bıtemırinın.(41) General Von San-

(38) K.Sasoni, Tevgera Azadixwaz a Kurd û Peywendiya Ermeni û Kurdan, Beyrut, 1969, rûp. 214.

(39) Bınêre: A.n.d.

(40) Bınêre: A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D.3573, rûp. 362.

(41) Mişak 1914, 30 ê Adar, hej. 69.

derson ku jı bo teftişa eskerên Tırkiyê hatıbû Asya Bıçûk, jı ber sebebên bûyerên Bıtlisê dest jı gera xwe berda û bıryar da ku bızıvıre navçên Erzurum û Etrengê (Erzincan).(42)

Dı bûyera Bıtlisê de rewş bı awaki xırab bı ser şoreşgerên Kurdan de hatbû vegerin. Wextê şer gerımbûnê de, her daxwaz û armanca Kurdan ew bû ku, beri her tışti pêwıste xwe nizıki dar, dezge û dairên Tırkan bıkın û ewan bıdestxın. Dı wi wextê nazık û gırıng de hınek serokên Kurdên Bıtlisê xwe dane ali û çûn lı ba Tırkan ciyên xwe gırtın.(43) Ewê bûyerê fırsetek mezın û wexteki fıreh jı bo İhsan Paşa peyda kır ku eskerên Tırkan pırçek bıke û Kurdan jı Bıtlisê derine. Mele Selim û çend kesên lı der û dora wi ilticayi Rusan Kırın. Wan gavan ku Kurd mıjûlê bı bazdanê bûn, eskerên Tırkan bı dızi ve der û dorên konsolosxana Rusya gırtın.(44)

Ala şoreşgêran kete destê Tırkan. Ew al jı qumaşeki zıvır hatıbû çêkırın û bı ayetên Quranê hatıbû xemlandın. Tırkan dest avêtın gera nav Bıtlisê û dı neticê de hejmareki gelek zêde Kurd hatın gırtın. Der û dorên bajêr de Kurdan 18 rojan berxwedana xwe domandın û şerê xwe nerawestandın.(45)Jı ber tırsa tolvekırına Tırkan,ceza û eziyê,Kurd û mesihiyên der û pıştên bajêr bazdan û derketın çiyan. Rojnama Horizon wıha nıvisibû: "Eskerên Tırkan, hemû gundên Kurdan, navçên Nehê xır û xali dit. Kurdan jın, zarok, serwet, pez û malên xwe dane destên Ermeniyan û bı xwe ji riyên şax û çiyan dane ber xwe."(46) Tırkan rehım

(42) Horizon 1914, 30 ê Adar, hej. 69.
(43) Bınêre: A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D.3573, rûp. 362.
(44) Horizon 1914, 2 yê Nisan, hej. 71.
(45) K.Sasoni, A.n.d. , rûp. 214.
(46) Horizon 1914, 25 ê Nisan, hej. 87.

bı tu kesi nedıkırın. Gırtigeha Bıtlisê, heta bı dev jı gırtiyên Kurdan tıji kırıbûn. Lı Xeyda Seyid Eli bı guneh kırına beşdarbûna tevgerê hat gırtın. Dı mala wi de, mezbeteyek gırtıbûn ku Mele Selim wê jı bo konsolosê Rusya nıvisi bû û hezar Kurdan ji ımza kırıbûn.(47)Tenê dı meha Nisan û Gulanê de, hezar Kurd hatın gırtın û gundên şoreşgêran lı gel zevi û zarên wan hatın kavıl û wêran kırın.(48)Andersê konsolosê Almanya ê Erzurumê,dı 12 yê Hezirana 1914 an de, gelek bı vê kêfxweş bûbû û kêfxweşiya xwe jı axayên xwe re dabû diyar kırın ku İhsan Paşayê serokê eskerên Tırkan, ne tenê beşdarên tevgerê, lê, ew Kurdên esker û serbaz yên jı eskeriya wan baz dayi û hınek Kurdên dın ku hejmara wan nizikê 2500 kesın gırtiye û ewan ji bı beşdarbûna serihıldanê gunehkar kıriye.(49)

Wextê lêgerin û gırtına Kurdan ,hemû cûre ceza û eziyetan lı ser wan bı kar anibûn. Çirkov jı konosolê Rusya re weha nıvisibû: "Do, 10 ê Nisanê, Kurdeki sax û selim bırın jor jı bo pırsê, dawiyê ewi bı ser rûyeki bı xwin û lêxısti û ser û guhên wi pêçayi paşde anin. Serbazeki, dı şûna avê de miz bı Kurdeki daye vexarın. Kurdeki serbılınd û mêrxas ku dı şerê 20 ê Adarê de bı brindari hatiye gırtın, dı gırtigehê de, serbazeki ew qas lê xıstiye, ku ferqa piyê wi jı darê tıfıngê nehatiye kırın û ew kes jı ber eziyeta brinên xwe mıriye. Gırtigehên Bıtlisê, jı gırtiyên Kurd û Ermeniyan tıjine. Behsa wan gırtigehan nayê kırın, kesê wan gırtigehan

---

(47) A.n.d. , 26 ê Nisan, hej. 88.

(48) E.K.Serkisyan, Siyaseta Dagırkeri ya İmparatoriya Osmani lı Pışt Qafqasyê, rûp. 84.

(49) Bınêre: Deuschland and Armenien Samaling Diplomatiseher Aktenstake Potsdam, 1919, s.13.

bıbine bê hış û bê eqıl dımine."(50) Gırtigeha bajêr ew qas tıji bûbû, ci jı gırtiyên nû re nemabû. Jı bo qırkırına vi xelki, dadgeha eskeri, her mıjûli qesabiya idamdana xelkê bû. "Dı aliki de fermana idamê derdıxın jı bo ku pıçek barê gırtigeha xwe sıvık bıkın, dı aliki dın de ji Kurdên nû dıgrın û ewan davêjın zindanê."(51) Jı gundên der û pıştên bajêr, 300 jınên Kurdan, ewên ku mêrên wan dı gırtigehê de ne, lı Bıtlisê jı bo berdana gırtiyan, xwenişandaneki pêk anin. Jendırman, xwenişandanê belav kır. Çavriya xwenişandanek dıni a mezıntırin dıhat kırın, jı jınên Kurdan.(52)Jı bo genım,zexire û yarmeti kırına bı Kurdan re,jı Ermeniyan ji gelek mırov hatıbûn gırtın û ewan gırtiyan ji gırtigehê zêdetır boş kırıbûn.(53) Dewleta Tırk, rojnama Ermeniyan Azatemart dan gırtın, jı bo ku wê deng û behsên serihıldana Kurdan ya Bıtlisê belav dıkır.(54)

Bı fermana dadgehê, serokên serihıldanê Şêx Seyid Eli, Şêx Şahabeddin û çend kesên dın lı sêdare dan. Jı bo tırsandına xelkê, sêdarê lı Gokmeydanê danibûn. Der û dorên wê bı eskerên sungi hatıbûn gırtın. Dı bajêr de, behs kırına kesên ku dıhatın idam kırın qedexe bû. Kesên xwe nêziki sêdarê dıkırın dıhatın gırtın. Tenê hınek kesan dıhıştın ku lı wan kesên lı sêdarê hatıne dan bınêrın û bıçın.(55) Fermana wan bı destê Sultan hatıbû dan.(56)Kurd,pır bı çav qa

---

(50) A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D. 1406, rûp. 43.

(51) A.n.d. , rup.51.

(52) Arêv (Roj) 1914, 30 ê Nisan, hej. 22.

(53) A.V.P.R. , A.n d. , rûp. 51.

(54) Horizon 1914, 1 ê Nisan, hej. 700.

(55) Horizon 1914, 7 ê Gulan, hej. 96.

(56) A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul 1914, D. 1406, rûp. 58.

yimi, aza û netırs dıçûn ser sêdarê. Mele Resul yekek jı wan bû,ku cezayê idamê jê re hatıbû dan. Beri wi idam bıkın, ewi jı serbazên Tırkan re wıha got : "Ez pıştrastım ku netewa Kurd, gelek dı ser de naçe, dê jı destê zılm û zora Tırkan rızgar bıbe."(57)

27 ê Nisanê, lı Muşê jı bo çavtırsandına xelkê, dewletê fermanek derêxıst. Eger heta yekê Hezıranê, hemû kesên fermana gırtına wan hatiye derêxıstın neyên xwe nedın dest, dê ew lı sêdarê bên dan. Eynê çarenıvis, jı bo wan kesên ku parastına şoreşgêran dıkın ji derêxıstın.(58)Dı destpêka meha Gulanê de Kamıl Bedırxan gırtın û şandın İstenbul.(59)

Karbıdestên Tırkan, dıxwestın bı hemû awayi wê tevgerê jı holê rakın û rêçek wê ji bı yekcari nehêlın. Dı 22 Adara sala 1914 an de, komita İttihad û Teraqi, lı ser behsa mesela Kurd û bı taybeti ji lı ser bûyera Bıtlisê sekını. Bı tevayi tedbira wan ew bû ku, eger rojên bên bûyerek wıha cardın bê pêş, hewceye ku bı vi awayi bê tefandın. Serokê wê komitê Mithed Beg, bı vi awayi dıaxıvi : Pıştı danina meşrutiyeta nû, hınek rewşenbirên Kurdan pıştgıriya wê hukumetê nekırın e. Serokê komitê û endamên wê, wan bûyeran "handana derve" û van kırınan kırınên bı destên biyaniyan hesıbandın. Saffet Beg, Kamıl Bedırxan, Sımko û gelek Kurdên dın gunehkar kırın ku goya jı konosolosa Rusya yarmeti gırtıne.(60) Her wıha, Mithed Şukri, jı endamên komitê re da xwuyakırın ku, dewlet jı nıha pê de, bı xurti û bı mal û can ve û bı awaki têgıhişti lı İstenbul kar bıke.(61)

---

(57) M.S.Lazeriyev, Kurdıstan û Mesela Kurd, rûp. 216.
(58) Bınêre: Deuschland and Armenien.... s.15.
(59) Bınêre: A.V.P.R. , , A.n.d.
(60) E.K. Serkisyan, A.n.d.
(61) A.n.d.

Hêjayê gotınê ye, lı ser nehêlana vê giyana şoreşgêri û nerım kırına Kurdan dısekıni û bı vi awayi dıgot : Pêwıste hınek karbıdest û nûnerên parlamentoyê jı Kurdan bên bıjartın. Lê keseki qimet neda vê pêşniyara ku wi kır.(62) Komitê, dı wê cıvinê de, berpırsiyariya tefandına tevgera azadixwaz a Kurdan da Talat Beg û wi jı bo wi kari bıjartın.

Talat Paşa, dozê jı serokwezir kır ku ew daxwaz jı dewleta Rusya û İran bıke, jı bo bızava Ebdurrezaq, Sımko û yên kesên dın bıdın tefandın û alikariya xwe jê qut bıkın. Bersiva daxwaza wan jı konsolosê Rusya yê İstenbul re bı vi awayi hatıbû şandın : "Bersiva wan bıde ku heta beri demek nıha Sımko lı Tehranê bû, jê re hat gotın ku nebe tu qet tevgerekê lı dıji Tırkiyê bıki. Herçi Ebdurrezaq e, dı meha Çirya Dûyem de jı İranê derketiye û demek dırêj lı Peterborgê jiya û lı wır ji qet nıkare tışteki lı dıji Tırkiyê bıke."(63) Bızav û serihıldana Kurdan, netica rewşeki xırab û bê seri û beriyek kırdayetiya Tırkiyê bı xwe bû. Serekwezir , bı awaki serhışki daxwaz jı konsolosê Rusya; Gırts kır, bı zûtırin wext Mele Selim û havriyên wi -ku iltica kırıbûn konsosxana Rusya- bıdın destê Tırkiyê. Gırts, daxwaza serekwezir derengi xıst û wê pêk nani. Sebebê vê dırengi xıstınê ji ew bû ku, ewi dı wi wari de wıha dınêri : Tevgera Kurdan tevgereki siyasi ye, jı ber vê yekê, heqê wan heye doza yarmetiyê jı konsolosên biyaniyan bıkın.(64)

Hınek serokani weha dıbêjın : Mele Selim daxwaz jı Kurdan -ew ên ku pê re bûn e- kırıbû ku pasaportên Rusi bıgrın û daxwaza yarmetiyê jı Rusya bıkın.(65) Mele Selim,

---

(62) A.n.d.

(63) A.n.d. , rûp. 298.

(64) Bınêre: Horizon 1914, 1 ê Nisan, hej. 7.

(65) Arêv 1914, 30 ê Nisan, hej. 22.

ku bı nûnerê Rusya û yê Ermeniyan re axıftıbû, sebebên destpêkırına serihıldanê, rewşa abori ya xırab, jiyana tahl a netewe û zılm û zora karbıdestên Tırkan destnişan kıribû. (66)

Bêşık daxwaza Almanan ji ew bû ku serihıldana han bı awaki zû têkbıçe. Jı rewşa Rusya ya lı hember wan kesan gelek hêrs û qehıri bûn. 11 ê Hezıranê, konsolosê Almanan lı Erzurumê jı bo Çirkov bıbine hat Bıtlisê. Çirkov lı ser vê hevditınê, jı Gıris re wıha nıvisibû : "Mereqa Anders mesela Kurdan bû. Pır dıxwest bızane, çarenıvisa Mele Selim û yê havriyên wi dê çawa be? Ew dıbê dê hun wi bışinın Rusya û pıştgıriyê lê bıkın an na? Lêbelê, hewıl dana wi bê feyde bû, mın tışteki jê re roni nekır."(67)

Dewleta Tırkiyê, jı bo kar kırına lı ser Rusya, dı weşanan de komeki dıji Rusya derêxıstıbû. Lı İstenbul, rojnamên Sabah, Tanin, İqdam û geleki dın dı wi wari de nıvisar belav dıkırın. Dı van weşanan de wıha hatiye gotın: Dıbêjın, tevgera Kurdan, "tehrik kırın, pilan û destên derve tê de heye."(68) Ewan, konsolosxana Rusya ya Bıtlisê, ciyê parastına çetan, dızan û şırikê beşdariya talan kırın û ciyê mırov kuştıniyê gunehkar dıkırın. Waliyê Bıtlisê, jı bo armanca xwe, xwe bı xwe mezbeteki hazır kırıbû û şandıbû gundên Kurdıstanê, ku lı ser wan kesan imza kom bıkın. Çirkov, dı raporeke xwe de ku jı İstenbul re nıvisibû weha dıbêje : "Lı ser bêşermiya Tırkan jı gundên Kurdan gundi hatıne cem mın û dıbêjın; evan imzan bı zorê jı me sıtendıne."(69)

(66) A.V.P.R., bıngeh , Konsolosxana İstenbul.

(67) A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, D.1406, rûp. 61-62-gışti.

(68) A.n.d., rûp. 55-gışti.

(69) Bınêre: A.V.P.R., A.n.d., yê pêşi, rûp . 58- gışti.

Ew propagande û gotınên dıji Mele Selim û havriyên wi, heta destpêka Şerê Cihanê yê Yekem berdewam bû. Wextê şer destpêkır, serbazê Tırkan êrişê bırın ser konsolosxana Rusya, wê talan kırın û Mele Selim û havriyên wi gırtın,fermana jı bo wan hatıbû dayin ci bı ci kırın -idam kırın.(70)

Wê bê rehmi û zora dewletê lı dıji Kurdan dıhat kırın, kerb, kin û rıkek mezın dı nav gel de lı hember zılm û zoriya Tırkan peyda kırıbû. Dı gelek navçên Kurdıstanê de berxwedanên çekdari, berdewam bûn. Danıştıwanên bajarê Erzurumê, her wek berê, razi nebûn ku bac û xeracê bıdın. Xwenişandanên mezın lı bajarê Erzincanê peyda bûn.(71) Çirkov, dı vi wari de nıvisibû : "Dı nav Kurdan de, tevgerek mezın heye. Lı bajarên der û doran deng dıgıhijın me, tê gotın ku, Kurd çek û tıfaqan peyda dıkın jı bo serihıldanên dın ên nû.(72) Heta serokên Komita İttihad û Teraqi dı cıvina xwe ya 4 ê Nisana 1914 an de, itiraf kırın û dı ser de ji, mesela serihıldana Bıtlisê, bı awaki resmi dane xwuya kırın ku ev mesele êdi nema ye û hatiye bêdengkırın. Lêbelê, mesela Kurdan, hê wê gelek zehmeti û alozi jı bo wan derine û tefandına wê zehmet e."(73) Dı rapora xwe de bı vi awayi nêrina xwe dıdomine:"Ew eskerên Tırkiyê ku daye anin, ger ku bıgıhije Bıtlisê, bajarên dın ên der û pıştên Bıtlisê de, hêviyek dê hebe."(74)

---

(70) Elaeddin Seccadi, Şoreşa Kurd û Cumhuriyeta Iraqê, Bexdat 1959, rûp. 52.

(71) M.S.Lazeriyev, A.n.d., rûp. 216.

(72) A.V.P.R., A.n.d., rûp. 59.

(73) A.V.P.R., bıngeh , Arşiva Siyasi, 1914, 482, D.3311, rûp. 27.

(74) A.n.d.

Talat Paşa, Wezirê Hındur ê Tırkiyê, waliyê Bıtlisê agahdar kır eger Kurd serihıldanek: dın pêwıst bıkın, hewceye fermana idara awarte derine. (75) Pıştі van bûyeran, jı bo ciyên kırdayetiyê lı Bıtlis û Muşê xaniyên nû ava kırın.(76)

Ew zılm û zora Tırkan, Kurdan bêdeng nekır. Jı ber ku, Kurdan xwe jı bo xebateki nû dıdan ser hev. Çirkov, deng û behsên karbıdestên Tırkan ku dıgıhandın İstenbul, derewên wan derdıxe ber çav û lı ser wan deng û behsan wıha dıbêje: "Ew deng û behsên welat yên arami ku waliyê Bıtlisê gihandiye Bab-i Ali, qet rast nine. Zılm û zora Tırkan ew qas Kurdan hêrs û kindar kıriye, ew dıxwazın tolên lıb bı lıb jı dewletê û jı serbazên Tırkan bıgrın."(77)

Konsolosê Almanan ê Trabzonê Birgifildi, bı awaki bê sebır, deng û behsên serihıldanên nû yên Bıtlisê û Dersımê ilan kırıbû.(78)

Dı Hezirana sala 1914 an de, lı Mudık u Xerzan, şer dı navbera Kurdan û Tırkan de germ bû. Sebebê destpêkırına serihıldanê kom kırına bacê bû. Eskerên Bıtlisê çûbûn ku bıxwazın bıçın gundê Kuran, dı rê de dı navbera wan û Kurdan de şereki mezın û xurt despê kırıbû. Bı lez 100 eskerên dın jı Bıtlisê anibûn jı bo yarmetiya wan. Dı ser de ji, jı Muşê ji hazıriya anina batalyoneke (1000 esker-n.m.) esker kırıbûn jı bo bışine gundê Kuran.(79) Dı rê de eskerên

(75) A.n.d.

(76) Bınêre: Deuschland and Armenien .... s.17.

(77) Bınêre: A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, 1914, D.1406.

(78) Deuschland and Armenien..... s.17.

(79) Bınêre: A.V.P.R. , bıngeh , Konsolosxana İstenbul, rûp. 46.

Tırkan dest avêtın talankırınê û xelk kuştın. Jı gundên Kurdan pez, dewar û malên wan dıanin Bıtlisê û ewan dı mezatê de dıfrotın dı ciyên bac û seranan de. Konsolosê Rusya yê Bıtlisê wıha dınıvisi : "Nıha hin zêdetır hêrs û rıkê Kurdan jı Tırkan vebûye. Mın seh kırıye ku, Kurd ew qas bêzar bûne ku dıxwazın pasaportên Rusi bıgrın. Dıbêjın; em guhê xwe nadın tund û tujiya Tırkan, emê xebata çekdari ya dûr û dırêj bıdomının.."(80)

Lı ser van rewşan dewleta Tırkiyê hınek riyên dın gırt ber xwe. Dıxwest bira welatparêziyê bı aliki dın de bıbe. Lı ser vê wıha dıhat gotın: "Pêwıste,yekemin gav jı bo avakırın û pêşxıstına welat em bavêjın."(81) Jı bo van armancan, hınek Kurdên bı nav û deng yên ku lı İstenbul rûdınıştın, şandın navçên rojhılat dı nav gel de evan belav bıkın : "Dı qonaxa niv serxwebûniyê de şer kırın tışteki pır bı xeter û bê feyde ye."(82) Dı ser vê re ji, rûyê rewşa navçên Kurdıstanê, hê qalık negırtıbû, gelek caran xebat dıhat kırın jı bo serihıldanên çekdari.

Dı Adar û Nisana sala 1914 an de, bı tundi û tuji berxwedanek hat kırın. Tırkan vê carê, fêr û fêlên af kırınê danin aliki, metodên bê rehmi bı rıkoyi bıkaranin û banga ceza kırına hemû serokên tevgerê û yên beşdari kırıbûn dıkır. Çirkov, dı vi wari de bê sebeb nenıvisiye : "Eger Kurdan, dı wê rewşê de lı Ermeniyan bıxıstana, weki dewlet dıxwest hezaran kes jı wan bıkuştana,.qet keseki jı wan serokan lı sêdarê nedıdan."(83)

Her çendin vê têkoşina netewa Kurd, rengeki serihıldani

(80) A.n.d.

(81) (Nehat Xwendın.)

(82) Mişak 1914, 10 ê Nisan, hej. 74.

(83) A.V.P.R., bıngeh , 1914, D.1406, rûp. 150-151.

gırtıbû xwe, lêbelê, rojname û weşanên Avrupayê, bı qesti û zanin dıxwestın ewê jı rastiyê dûr û lı gora daxwaza xwe bıdın ber çav. Peyamnêrên İngiliz, Fransız û heta gelek caran ên Rusya ji, vê tevgerê, wek serihıldaneki kevneperest dınivisandın. Dıgotın ku, ew naxwazın danıştıwanên mesihi yên bajarên rojhılata Tırkiyê bı reform û bı guherinan şad bıbın. Kurdan dıjmınên Ermeniyan dıdan nişandan. Peyamnêrê Daily Telegraf, vê bı eşkera nıvisiye ku : "Kurdan bangên xezayê (cihadê) lı dıji Ermeniyan rakırıye."(84)

Rojnama Times a İngilizi, dı gotarek de behsa serihıldana netewa Kurd kırıbû û hemû sucên kuştına Ermeniyan xıstıbû sıtoyê Kurdan. Rojname, bı awaki sıtayiş behsa methên zılm û zora Tırkên Cıwan kırıbû ku wê êrişa lı ser Kurdan, bı awaki xwin germi û têgıhiştıneki kûr, lı dıji islahata welat û lı ser wê riyê astengek dıda ber çav. Dı eksê wê de, hınek rojnamên Rusan, behsa zılm û zora Tırkan dıkırın û dıgotın ku; ewan navê dı rojhılata welat de islahatê bıkın. Rojnama Novoya Viremya (Wextê Nû) ya Rusi gotarek hêja bı nav û nişana "Ermen, Tırk û Kurd" belav kırıbû.(85) Rojnamên Almanan û Tırkan, jı bo serihıldana Kurdan lı yek deholê dıxıstın. Ewan jı bo xwe tışteki bıngehin zanibûn ku dıji Rusya bıaxıvın. Dıgotın ku tıliya wan dı serihıldana Kurdan de heye. Bı taybeti ji rojnama Berliner Agbolad gelek caran bı awaki dıjmıni lı ser tevgera Kurd û bı taybeti ji lı ser serihıldana Bıtlisê dınıvisand.

Dı eksê wan rojnaman de, rojnamên Ermeniyan bı başi lı ser Kurdan dınıvisandın. Wan rojnaman, ne ku tenê deng û behsên serihıldana Kurdan dınıvisandın, gotarên gelek hêja

(84) Horizon 1914, 28 ê Adar, hej. 67.
(85) Novoya Vıremya (Wextê Nû) 1914, 24 ê Adar, 13602.

ji lı ser sebeb û bıngehiya tevgerê belav dıkırın.(86) Jı bo minaki: B.Avasardiyan, ku çend salek bû mıjûliya wi naskırına Kurdan bû, dı gotara xwe ya "Serihıldana Kurdan û Aşitiya Ermeniyan" de wıha dıgot : "Serihıldana Bıtlisê lı dıji Tırkan e. Ew weşanên Avrupayê derewan belav dıkın, tevger ne kevneperset e û ne ji dıji Ermeniyan e. Serihıldan, netica hişyarbûn û zordestiya lı ser netewa Kurd e." Wi bı vi awayi dıdomand : "Dı nav Kurdan de ramanên nû belav bûne, ew hişyar dıbın û dıxwazın bıgihijın zirva şarıstaniyet mırovatiyê."(87) Ewi dı navnişana gotara xwe de ji wıha dıgot : "Serihıldana Kurdan dıji Tırkên Cıwan bû ye, qet peywendiya wê bı islehet, kuştın û bırina Ermeniyan re nebû ye."(88)

Jı bo ku Kurdan, hınek bir û raya şerietê bı kar danin, êdi, rojnaman ewê serihıldanê, bê ku bıngehê serihıldanê tê bıgehın û jı ber ku menfeeta wan ji dı wê de hebû, ewê bı kevneperesti lı qelem dıdan. Ewan dıxwestın ku serihıldanê dıji Ermeniyan û dıji xelkê bıdın naskırın. Bı dızi dı bın leqeba Mitrak de,nıviskareki Ermeni gotarek bı navnişana "Serihıldana Kurdan dı Bıtlisê de" dı rojnama Ermeniyan a bı nav û deng Mişak de dabû belav kırın. Dı wê de wıha dıgot : "Şeriet tenê qalıkê tevgera Kurdan e, cewhera wê netewi ye ne dini ye."(89)

G.Arkilyani, sernıvisarê Mişakê nıvisibû ku gelek name û dokument gıhiştıne destên wan; "ew tıştên han hemû ro-

---

(86) Bıngeh û Sebebên Tevgera Kurd, Arêv 1914, 19-26 Nisan, 13-19. 1 ê Heziran, hej. 23. B.Gazi, Tevgera Kurd, Arêv, 1914.

(87) Mişak 1914, 19 ê Nisan, hej. 76.

(88) A.n.d.

(89) Mişak 1914, 13 ê Nisan, hej. 77.

ni dıkın ku, tevgera Kurdan ne fantaziyek dini ye, ne tenê ji serihıldaneki dıji talanê xelkê ye, ew tevgerek siyasi ye û Kurd jı bo bı destxıstına otonomi dıxebıtın."(90)

Jı ber vê yekê, dı serihıldana Bıtlisê de alikari û xebateki gel bı wi awayi berfıreh nebû.Egoizma serokên Kurdan,warê tevgerê yê meheli, hişyarbûneki kêm ya serokatiyê ku bıkare rêberiyeke bı temami jı tevgerê re bıke tune bû. Ev kıl û kêmasiyên han, rê dan ku Tırkên Cıwan hemû pilanên xwe lı dıji berxwedana tevgera Kurdan bı ci binın û jı bo wê karin xebatê lı ser çarenıvisa Kurdan bıkın û bıdın meşandın

Derveyi van, geleki rık û kina Kurdan jı Tırkan vebûbû. Lêbelê,peywendiya derebegi û eşirati ku dı nav Kurdan de hebû, bûbû kelem û asteng dı riya serkevtın û berewpêşveçûna tevgera azadixwaz a Kurdan.

Ew propagande û bangên germin, yên komek têkoşer û rewşenbirên siyasi yên Kurdan ku dı nav netewa Kurd de belav dıkırın, lı hemberê hêz û desthılatên derebeg û mırovên dini yên Tırkan de, pıçûk û bê tesir dıman.

Lı derveyi van, gelek sebebên sernekevtına serihıldanê yên dın ji hebûn. Nebûna rêxıstınek xurt û despêkırına şer lı ser wareki teng û belav nebûna wê dı seranseri welat de ji,sebebên bıngehin bûn. Dewlet lı hemû der û doran hêzên xwe rıjandıbû navça Bıtlisê û ewan bera giyana şoreşgêran dabû. Jı bıli van ji, serihıldan lı ser bir û rıkoya mezın a Kurdan bû û lı dıji zılm û zora Tırkan bû. Ew rewş û sebebên cıvaki-netewi ku astengên sernekevtına serihıldana sala 1914 an bûn, dı hemû serihıldanên pışti wê de ji xwe xıstın ber çavan.

Şerê Cihanê yê Yekem destpêkır. Tırkiye çû peymana sê mıli. Tırkên Cıwan, hılbûna Şerê Cihanê yê Yekem jı bo xwe

(90) Mişak.

fırsetek mezın zanin, jı bo tefandın û têkbırına giyana netewên bındestên xwe, bı taybeti ji mesela Ermeniyan. Bı fermana Tırkên Cıwan yên nıjadperest, mılyon û niv Ermeni ketın ber lehiya kuştınê û bı hezaran xêzanên wan bı ber cihanê de tarûmar û belav bûn.

Derveyi vê, Tırkên Cıwan, dı siyaseta xwe de ciyeki taybeti dabûn mesela Kurdan. Hınek jı eşiretên Kurdan bı çek kırın û dı mesela kuştına Ermeniyan de bıkar anin. Lêbelê, hejmareki gelek zêde jı gelê Kurd, wan daxwazên Tırkan bı ci nanin û xwe nekırın şırikê wan gunehan. Wextê eskerên Rusya dest bı êrişê kırın, dewleta Tırkiye, 700 hezar kes jı navçên Kurdıstanê derêxıst û ewan şand ber bı Anadolê û navçên rojava de ber bı rê kır.(91) Eskerên Tırkan, bı zılm û xwinxariyeke nediti ve van sırgunan dıanin ci. Gelek kesên derbeder kırıbûn, dı riyan de mırın. Gelek jı cıwan û rewşenbirên Kurdan ên lı İstenbulê ji bırıbûn eskeriyê. Kêm kes jı wan karibûn bazdın derve.

Şıkestın û sernekevtına siyaseta Tırkên Cıwan, dı dawiya Şerê Yekem ê Cihanê de,bû sebebê jiyana tevgera azadixwaz a Kurdan. Ew bû sebeb ku gelek rêxıstın, komel û partiyên siyasi yên nû derketın holê. Ewan dı programên xwe de armanca serxwebûna Kurdıstanê danibûn ber xwe. Dı wê qonaxê de dewletên Avrupiyan bı taybeti ji İngiltere, lı ser tevgera Kurdan dıxwest kareki bıke. Mırovên eskeri û yên dı nav welat de, vê wezifê gırtıbûn ser xwe ku dı nav welatparêzên Kurdan de xebatek bızavi bıkın. Dı netica wê xebatê de, riyeki dostên İngilizan dı nav tevgera azadixwaz a Kurd de peyda bû. Dawiyê, dewletên emperyalist, Kurdıstan per-

---

(91) B.Nikitin, Kurd, Moskova 1964, rûp. 290.
В.Никитин, Курды, М., 1964, стр.290

çe kırın û lı ser axa İmparatoriya Osmani du dewletên dın yên nû dan damezırandın. Rewşa siyasi û cıvaki dı rojhılata Navin de guheri û tevgera Kurdan ji kete qonaxek nû ya xebat kırınê.

## AKAM (NETİCE)

Tevgera azadixwaz a netewa Kurd, dı salên 90 i yên sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de, bı awaki tevgereke netewi û hemdemi ketıbû ser piyan. Berfırehbûnên dı wê qonaxê de, gelek hêz û rêbazên siyasi peyde kırıbûn. Rojnamenıvisiya Kurdi çavên xwe vekır, dı netica guherina rewşa cıvaki-siyasi a Kurdan de, entelektuelên Kurdi ji peyda bûn. Peydabûna wan bû sebeb ku xwendewari û rewşenbiri dı nav Kurdan de ji belav bıbe. Bızava siyasi ya Kurdan, dı destpêkê de lı derve dest pê kır.

Dı dawiya sedsala 19 an de, rojnama Kurdıstan bûbû minbera ideolojiya siyasi ya berxwedanan. Dı ber vê taqet û qeweta kêm de ji, disa dıgihişt nav gırsên gel. Bir û baweriya siyasi, riya bir û nêrinan dıxemıland. Sernıvisarê rojnamê Ebdurrehman Bedırxan, dı wê qonaxê de diyartırin ideolog û têkoşerê Kurd bû.

Dı gel wê hemû zılm û zordariya Sultan ji, rojnama Kurdıstan, bı eşkera, nebaşi û xırabiya jiyana cıvaki ya tırkiyê, dıxıst ber çavan û propagande jı bo yekitiya rewşenbirên burjuwazi dıkır. Rojnamê, netewe han dıda hini xwendewari bıbın û zanıstiyê hımbêz bıkın xwe tê bıgehinın, pişesazi dabımezrinın, bıkevın têkıliyên bazırganiyê, ax û zevi bı awaki nû bı karbinın û hini çanda rojava bıbın.

Kurdıstan, yekemin rojnameye ku, tesirek wê ya mezın hebû jı dayik bûna ideolojiya Kurdayeti de.Her çendin, dı wê qonaxê de, Kurdayeti wek ideolojiyek dıji Pan-Turanizmê nehatıbû meyıl kırın, lê, Kurdayeti, bir i baweriya neteweki bû, dı nav cıvaka Asya paşvemayi de, dı wê cıvakê de ku zılm û zordariya cıvaki-netewi pırbû. Ewê gav avêt dıriya azadi serxwebûni ya netewe de, dı riya berpêşveçûna şarıstaniyetê de. Ew bir û baweri jı dayik bûbû û geş dıbû, dıxwest astengên mezın jı ser riya xwe bıde aliki.

Têkoşerên Kurdan,dıxwestın programa xwe ya siyasi û yên têkoşerên derve yên netewên dın, wek Ermen û Tırkên Cıwan bıkın yek û bı hev re dıji kırdayetiya Sultan xebat bıkın. Rojnama Kurdıstan ji, dı warê ideoloji de, jı organên hêzên berxwedanên dın qet kêmtır nebû.

Edebiyata Kurdi, dı dawiya sedsala 19 an de, lı ser destên şaırên wek Haci Qadırê Koyi û hınek dın, pır ber bı pêş ve çûbû. Vêya, rolek mezın dı geşbûn û xemlandına ideolojiya Kurdayeti de dıdit. Ew şaır û rewşenbir, nûnerên belav kırına rewşenbiri û bira demokrati û cıvakeki pêşkevtixwaz bûn.

Dıvê em eva han ji bêjın; rewşenbirên Kurdan, xwe lı rexên mesela çinati nedıdan. Dı wê qonaxê de, nedıkarin sebebên abori yên berewpeşvêçûna jiyana cıvaki tê bıgehın û bıxın ber çavan. Ew bı ber idealizmê ve dıçûn. Ewan wısa zanibûn ku dê bıkarın bı wi awayi bı hêsani hemû netewe hini xwendewari û zanıstiyê bıkın.

Lı dawiya şoreşa 1908 ya Tırkên Cıwan, qonaxek nû ya geşbûna bira Kurdayeti hate holê.

Dawiya wê şoreşê, kêm azadiya dı welat de peyda bû, bûbû sebeb ku gelek organ û rojnamên Kurdi û yên dın peyda bıbın. Bı xebat û têkoşina siyasi ya rewşenbirên xwen-

dewarên Kurdan, lı İstenbul, rêxıstınên siyasi-cıvaki wek Komela Hevkari û Pêşketın a Kurd û Hêvi û.h.d hatın damezırandın.

Dı sala yekemin a şoreşa Tırkên Cıwan de, rewşenbir û mırovên siyasi yên Kurdan, dıxwestın pıştgıriya sloganên "yekiti, pêşketın" bıkın. Lêbelê, dı netica siyaseta nıjadperest a Tırkên Cıwan de û rabûna wan lı dıji têkoşerên Kurdan, rewşek nû ani holê. Rêxıstınên Kurdan, ketın bızava xebateke asê.

Derveyi van, Partiya İttihad û Teraqi, siyaseta Pan-Turkizmê gırtıbû ber xwe, lê, tevgera azadixwaz a Kurd berewpêşve dıçû. Dı wan salan de, dı rojnama Kurdıstan, Kurd û dı kovara Roji Kurd de, bir û baweriya Kurdayeti geştır û xemlanditır ketıbû pêş çavan. Dı hemû weşanên Kurdan de, mesela nêzikbûna rasteqini û riya berewpêşveçûnê, bı awaki roni û eşkera mırov dıkare dı tevgera azadixwaz a Kurd de bıbine.

Jı ber sansora tund û tuj a wan salan, têkoşerên siyasî yên Kurdan, nedıkarin bı eşkera programên xwe yên siyasî lı ser rûpelên rojnaman belav bıkın.

Dı salên 1911-1914 an de, jı ber sebebê geşbûna tevgera Kurdan, gelek rê û birên siyasî dı nav tevgera Kurd de peyda bûbûn. Jı bo minakî; Seyid Ebdulqadır serokatiya riya lîberalî dıkır. Ewên lı ser vê riyên bûn, daxwaza kırdayetiyek otonomî dıkırın. Her çend, nûnerên wê riyê gelekî jı wan jı çin û tebeqa serdest a cıvaka Kurdan bûn, lêbelê, daxwaza belav kırına pîşesaziyan dıkırın. Riyek dın jî hebû, her çendîn programa wan bı temamî ronî nebû, lêbelê, daxwaza serxwebûnekî bı temamî dıkırın. Ew jî dı mıjûlîya xebatên warên dın de bûn.

Pıştgıriyên damezırandına emaretek Kurdî, xurtırînên

tevgera azadixwaz a Kurdan bû. Xwediyên wê armancê du gurub bûn. Gurubek dıxwest emaretek dı bın siya Tırkiyê de bê danîn, guruba dın jî dıxwestın dı bın siya Rusya an jî İran de bın. Ebdurrezaq Bedırxan, serokatiya riya lı ser Rusya dıkır. Pıştgirên damezırandına wê emaretê, bıngeha wan jı çîna derebeg û jı tebeqên eşayîri bûn.

Sebebên berewpêşveçûn û geşbûna tevgera Kurdî, bı tesîra siyasî-aborî a Qeyserê Rusya ku bı gıştî lı Rojhılata Navîn û navçên Iranê û bı taybetî jî lı Rojhılata İmparatoriya Osmanî hebû. Dı nav Kurdan de, riya lı ser Rusya ku Ebdurrezaq rêber û nûnerê wan bû, hewlê damezırandına peywendiya çandi-siyasi lı gel Rusya dıda. Dı netica wê hewıl û xebatê de, lı bajarê Xoyê komela Gihandın hat damezırandın.

Dı destpêka sedsala 20 an de, weşan bûbû çekek bı tesir dı destên têkoşerên Kurdan de. Ew çek ne tenê lı hember êrişa zılm û zora Tırkan de hatiye bıkaranin, jı bo yekitiya Kurdan û bılınd kırına sewiya wê û jı bo hışyar kırına Kurdan ji hatiye bıkaranin.

Dı gel vê ji, ew organ û weşan kêm bûn û jiyana wan kurt bû, lêbelê, kareki pır mezın kırın lı sır berewpêşveçûna bira cıvaki-siyasi dı Kurdıstan de.

Jı ber sebebên wan hemû guherin û berewpêşveçûnan de, cıvaka kurdewari dı hemû mılên jiyanê de gavên mezın avêt. Dı dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de, dı organek yekgırti, dı mılên siyasi-cıvaki de bı têgihiştınek hemdemi ciyê xwe gırtıbû.

Dı wextek de, gelek netewên bındestên cihanê, jı ber sebebên geşbûna tevgera azadixwaz a netewi, bı bızavi serihıldan û bı azadi û serxwebûnê şa bûn. Her dı vi wexti de, Kurdıstana welatê netewa Kurd, dı netica şer û perçe kırına

emperyalizmê mirata İmparatoriya Osmani, kevte rewşek gelek xırab. Kurdıstan vê carê bû çar perçe û her perçe ket bın destê dewleteki; kevte bın destê Tırkiyê, Iraq, İran û Suriyê.

## BİBLİYOGRAFYA


A.V.P.R. Arşiva Siyaseta Derve a Rusya. Bıngehin : Konsoloşxana İstenbul, 1879, 1565.

A.n.d. ,1900, 1224.

" 1905, 1400.

" 1908, 1401.

" 1909, 1401.

" 1907-1913, 3572.

" 1912-1914, 3573.

" 1914, 1406.

" 1898, 270.

" Arşiva Siyasi, 1912-1914, 482, 1648.

" " " 1914, 482, 546.

" " " 1914, 3311.

" Arşiva Farısan, 1911, 549.

" " " 1911, 672.

" " " 1911, 1238.

" " " 1911-1912, 99.

" " " 1911-12-13, 102.

" " " 1913, 103.

" " " 1913, 104.

Avriyanov P.Y. Kurd, Dı Şerê Navbera Rusya, İran û Tırkiyê de, Tiflis 1900.
Аверьянов П.И. Курды в войнах России с Персией и Турцией в течение XIX столетия, Тифлис, 1900.

Akopof.G.B. Kurd û Mesela Kurdan dı Histografya Tırki de, belavkırox; Welat û Netewên Rojhılata Nêzik û Navin, C.5, Tırkiye, Êrivan 1970.
Акопов Г.Б. Курды и курдский вопрос в турецкой историографии. Сб. "Страны и народы Ближнего и Среднего Востока", т.5, "Турция", Ереван, 1970.

A.G.Z. Tırkiye dı Qonaxa Karbıdestên Tırkên Cıwan de, Moskova, 1972.
Алиев Г.З. Турция в период правления младотурок, М., 1972.

Alimov.A.A. Şoreşa 1908 lı Tırkiyê, belavkırox; Hişyarbûna Asya Sala 1905 û Dı Rojhılat de Şoreş, Moskova 1935.
Алимов А.А. Революция 1908 г. в Турции. Сб. "Пробуждение Азии. 1905 год и революции на Востоке", М., 1935.

Arşiva Muze û Edeb, Hunermendên Ermenistana Sovyet, F.A.Kazaryan.

Arşiva Zanıstigeha Etnografya lı Ser Akademiya Zanıstі a Sovyet, Leningrad. 17, 1, 12.

Bibliyografya Kurdnasi,danina J.S.Musaelyan,Moskova 1963
Библиография по курдоведению. Сост.

Ж.С.Мусаэлян, М., 1963.

**Celilê Celil, Diroka Dayikbûna Weşanên Siyasi a Kurdi, Komita Afirandınên Tırknasi 1973, Moskova 1975.**

Джалиле Джалил Из истории возникновения курдской политической пе печати, "Тюркологический сборник" -1973, Москва, 1975.

**Celilê Celil, Kovara Roji Kurd, serekaniya lêkolina bira cıvaki-siyasi a Kurdan dı sedsala 20 an de, belavkırox; Welat û Netewên Rojhılata Nêzik û Navin, C.7, Kurdnasi, Êrivan 1975.**

Джалиле Джалил Журнал "Рожа курд" как источник изучения курдско Общественно-политической мысли начала XX в., Сб. "Страны и народы Ближнего и Среднего Востока", т.7, "Курдоведение", Ереван, 1975.

**Celilê Celil, Serihıldana Kurdan dı Sala 1880 an de. Moskova 1966.**

Джалиле Джалил Восстание курдов 1880 года, М., 1966.

**Celilê Celil, Kurdên İmparatoriya Osmani, Dı Niva Yekemin Sedsala 19 an de. Moskova 1973.**

Джалиле Джалил Курды Османской империи в первой половине XIX в., М., 1973.

**Ehmedê Xani, Mem û Zin, lêkolin, werger û pêşgotına M. B.Rodiga, Moskova 1962.**

Ахмед Хани Мам и Зин. Критический текст,

перевод, предисловие и указатель М.Б. Руденко, М., 1962.

Enderjikyan O.G. Burjuvaziya Împaratoriya Osmani, Êrivan 1977.
Инджикян О.Г. Буржуазия Османской империи, Ереван, 1977.

Ew belge û dokumentên ku Komita Etnografya Qafqas kom kırıne, C.7.
Акты, собранные Кавказской археографической комиссией, т.УII.

Fuat E. Afırandınên Haci Qadırê Koyi û Ciyên Wan Dı Edeba Kurdi de. Efter Fırati, Nama Doktorê, Moskova 1965.
Фуад И. Творчество Хаджи Койи и его место в курдской литературе. Автореферат канд. дисс., М., 1965.

Gerdelêvski V.A. Dı Dirokê de Kurd, Afırandınên Helbıjarti, Cıld. 3. Moskova 1962.
Гордлевский В.А. Из истории курдов, Избранные сочинения, т.3, М., 1962.

Gerdelêvski V.A. Dı Nav Kurdên Çiyaye Sipanê de Cihana Îslamê, Petrograd 1917, Çapa Yekem.
Гордлевский В.А. У Сипандагских курдов, "Мусульманский мир", Петроград,1917, вып. I.

Gıryastov F.F. Kurd û Suwarê Kurd. Hevalên Dıbıstana Şerê a Idara Qafqas, hej. 20, Tiflis 1907.
Грязнов Ф.Ф. Курды и курдская конница,

"Известия штаба Кавказског военного округа", №20, /Тифлис/, 1907.

Gisarov M.A. Mesela Kurdan h Tırkiyê,dı Destpêka Tevgera Kemalizm û Heta Kongra Lozanê, belavkırox; Welat û Netewên Rojhılata Nêzik û Navin, C.7, Kurdnasi, 1975.
Гисаров М.А. Курдский вопрос в Турции /От начала кемалистского движения до Лозаннской конференции/. Сб. "Страны и Народы Ближнего и Среднего Востока", т.7, "Курдоведение", Ереван,

Hal û Ehwalên Welatên Ciran, hej. 40, 1913.
"Сводка сведений о сопредельных стран". № 40. 1913.

Jeltyakov A.D., Petrosyan Y.A. Diroka Rewşenbiri Lı Tırkiyê, Moskova 1965.
Желтяков А.Д., Петросян Ю.А. История просвещения в Турции, М.,1965.

Jeltyakov A.D. Weşani Dı Jiyana Cıvaki-Siyasi û Çandi de Lı Tırkiyê, Moskova 1972.
Желтяков А.Д. Печать в общественно-политической и культурной жизни Турции, М., 1972.

Kartsov, Hınek Gotarok Lı Ser Kurdan, Tiflis 1896.
Карцов Заметки о курдах, Тифлис, 1896.

Kemal M.A. Lı Ser Derketına Diroka Yekemin Rojnama Kurdi, Netewên Asya û Afrika, hej. 4, 1968.
Камаль М.А. К истории издания первой

курдской газеты, "Народы Азии и Африки", № 4, 1968.

Kuştına Ermeniyan dı İmparatoriya Osmani de, belav kırına dokument û melzeman, bı serokatiya Prof. M.G.Nersısyan, Erivan 1966.
Геноцид армян в Османской империи. Сб.документов и материалов, по ред. проф. М.Г.Нерсисяна, Ереван, 1966.

Lahuti, Kurdıstan û Kurd, Rojhılata Nû, Moskova 1923, hej. 4.
Лахути Курдистан и курды, Пер. с перс. "Новый Восток", /М./, 1923, №4.

Lazeriyev M.S. Kurdıstan û Mesela Kurd, Moskova 1964.
Лазарев М.С. Курдистан и курдская проблема, М., 1964.

Lazeriyev M.S. Mesela Kurd, 1891-1917, Moskova 1972.
Лазарев М.С. Курдский вопрос /1891-1917/, М., 1972.

Lazeriyev M.S. Mesela Kurd, belavkırox; Mesela Netewi Dı Welatên Rojhılata Nêzik û Navin de, Moskova 1970.
Лазарев М.С. Курдская проблема. В сб. "Национальные процессы в странах Ближнего и Среднего Востока", М., 1970.

Linç X.F.B. Sefername û Nigara(Resim) Ermeniyan, C.I-II, Tiflis 1910.
Линч Х.Ф.Б. Армения. Путевые очерки и этюды, т. I-II, Тифлис, 1910.

Lixotin M. Rusya Dı Asya Tırkiyê Dı Salên 1854-1855 an de, Peterborg 1863.
Лихутин М. Русские в Азиатской Турции в 1854 и 1855 годах,СПб., 1863.

Miller A.F. Kurte Dirokeki Tırkiyê, Moskova 1948.
Миллер А.Ф. Краткая история Турции, М., 1948.

Miller A.F. 1908 an Lı Tırkiyê Şoreşa Burjuvazi, Rojhılatnasên Sovyet, hej. 60. 1955.
Миллер А.Ф. Буржуазная революция 1908 г. в Турции, Советское востоковедение", № 6, 1955.

Miller A.F. 50 Saliya Şoreşa Tırkên Cıwan, Moskova 1958.
Миллер А.Ф. 50-летие младотурецкой революции, М., 1958.

Mınorsky V.F. Lı Nav Kurdan Raman û Têgıhıştıni, Petrograd 1915.
Минорский В.Ф. Курды. Заметки и впечатления, Петроград, 1915.

Sun E.B. Lı Ser Kurdan û Welatên Wan.
Nikitin B.P. Jı Ingılizi wergerandiye; pêşgotın û paşgotınek jê re nıvisiye, Urmiye 1917.
Сон Э.Б. О курдах и их стране. С английского перевёл и снабдил примечаниями и приложениями В.П.Никитин, Урмия, 1917.

Nikitin B.P. Kurd, Moskova 1964.

Никитин В.П. Курды, М., 1964.

Petrosyan Y.A. Tevgera Tırkên Cıwan, Niva Dûyema Sedsala 19 an û Destpêka Sedsala 20 an de, Efter Fırati, Nama Doktorê, Moskova 1970.
Петросян Ю.А. Младотурецкое движение /вторая половина XIX- нач XX вв./. Автореферат докт. дисс., М., 1970.

Petrosyan Y.A. Tevgera Tırkên Cıwan, Moskova 1971.
Петросян Ю.А. Младотурецкое движение, М., 1971.

Sarkisyan E.K. Siyaseta Dewleta Osmani Lı Rojavayê Ermenistanê de, Erivan 1972.
Саркисян Е.К. Политика Османского правительства в Западной Армении, Ереван, 1972.

Sarkisyan E.K. Siyaseta Mêtıngehkari a İmparatoriya Osmani lı Pışt Qafqasyê, Êrivan 1962.
Саркисян Е.К. Экспансионистская политика Османской империи в Закавказье, Ереван, 1962.

Siminota P. Tırkiye û İran, Fakt û Mizac, Peterborg, 1908.
Семенюта П.П. Турция сегодня, факты и настроения, СПб., 1908

Tsovikyan X.M. Tesira Şoreşa Rusya a 1905 Lı Tırkiyê. Rojhılatnasên Sovyet, Cıld III. 1945.
Цовикян Х.М. Влияние русской революции 1905 г. в Турции. "Советское востоковедение", т.III, 1945.

Xalfin N.A. Zordestiya Lı Ser Kurdıstan, Moskova 1963.
Халфин Н.А. Борьба за Курдистан, М.1963.

Xeznedar M. Diroka Edebiyata Kurdi a Havçerx, Moskova 1967.
Хазнадар М. Очерк истории современной курдской литературы, М.,1967.

Vilçivski O.L. Dı Sedsala 20 an de,Bibliyografya Weşanên Kurdên Derve, Dı Kıtêba Zmanê İraniyan de. Cıld I. Moskova-Leningrad 1945.
Вильчевский О.Л. Библиографический обзор зарубежных курдских печатных изданий в XX столетии. В кн. Иранские языки", т. I, М.-Л., 1945.

Vilçivski O.L. Kurdên Bakura Rojava İran, Tiflis 1944.
Вильчевский О.Л.Курды северо-западного Ирана, Тифлис, 1944.

Vilçivski O.L. Peywendiya Abori a Miri û Maldariya Lı Pışt Qafqas û Navçên Dewr û Pışti de, Lı Niva Duyema Sedsala 19 an de. Etnografya Sovyet, Hejmar 4-5, 1936.
Вильчевский О.Л. Экономика курдской кочевой сельскохозяйственной общины Закавказья и прилегающих районов во второй половине XIX в., "Советская этнография", №4-5, 1936.

Yust K. Weşanên Anadol, Tiflis 1922.
Юст К. Анатолийская печать. Тифлис. 1922.

Yuzbaşiyan K.N. Akademiya Josef Abgaroviç Orbili, Moskova 1964.
Юзбашян К.Н. Академик Иосиф Абгарович Орбели, М., 1964.

Peywendiya Navbera Dewletan Dı Qonaxa Emperyalizmê de, Bıra Siyasi, C.II.

## SEROKANİYÊN BI ZMANE EREBİ,TIRKİ, KURDİ

Dr. Ehmed Osman Ebubekir, Kurdên Mılli û İbrahim Paşa Bexdat, 1973.

Enwer El-Mayi, Kurdên Behdinan, Musıl, 1960.

Dr. Bıleç Şêrko, Mesela Kurd, Qahire, 1930.

Ebdulcebbar Muhemmed Cebbari, Diroka Rojnamegeri a Kurdi, Bexdat.

Ebdullah Muhemmed Heddad, El Hediyye Hemidiyye Fi El-Luxe El-Kurdiyye, El-Teaxi, 1972,9 ê Kanuna Yekem, Hej: 1207.

Ebduleziz Yamulki, Kurdıstan û Serihıldanên Kurdan, Tehran, 1946.

Dr. Izzeddin Mıstefa Resul, Kurdıstan El-Ulematıl Ula Fi Tarix Sehhafe El Kurdiyye, 1898-1902, 1903 El-Teaxi.

Elaeddin Seccadi, Şoreşa Kurd û Cumhuriyeta Iraqê, Bexdat, 1959.

Elaeddin Seccadi, Diroka Edebiyata Kurdi, 1952.

Kerim Şereza, Şaırên Koyê, Bexdat, 1961.

Dr.Kemal Mezher Ehmed, Kurdıstan Dı Salên Şerê Cihanê de, Bexdat, 1977.

Lutfi Emır Bedırxan,Hasılati Kurdıstanın Ezim Qawi Cemiyetine aittir.

M.Zeki Beg, Diroka Kurd û Kurdıstan, 1936.

M.Cewad İbni Şêx Nafi, Diroka Rêxıstına Wezareta Gıştî a Rewşenbiri, 1338.

Mehmud El-Durre, Mesela Kurd, Beyrut, 1963.

Mele Mehemed Kerim, Haci Qadırê Koyi, Bexdat, 1960.

Mukriyani Huseyn Huzni, Pêşketın, Hewlêr, 1962.

El-Teaxi, 1968-1973.

Kurdıstan, Bexdat, 1972.

Roji Kurd, 1331 (1913), hejmar: 1, 2, 3, 4.

Roja Nû.

## SEROKANÎ BI ZMANE ERMENÎ

A.D.Wani, Bajarê Bıtlis û Erzurum, Êrivan 1919.

V.A.Baybuniyan, Dı İran de Tırkiya Osmani, 1905-1911, kovara Dirok û Zmanwani, 1973, hej: 4.

V.A.Baybuniyan, Peywendiya Tırkiyê û İran, 1905-1914, Êrivan, 1976.

## KOVAR Û ROJNAMÊN BI ZMANÊ ERMENÎ

Arêv (Roj), 1914.
Azate Mart (Xebat Jı Bo Azadiyê), 1910-1914.
Bakuya Zayim (Dengê Baku), 1913.
Biyuzandiyum, 1913.
Dıruşak (Al), 1900-1901.
Gorts (Kar), 1908-1909.
Hayzik (Welat), 1904.
Horizon, 1910-1913, 1914, 1903.
Jamanak (Wext) 1908-1910-1913.
Mişak, 1894, 1906, 1914.
Nurdar (Denge Nû) 1900.
Xarix, 1907.
Vıtak, 1908.
Ararat, London, 1913, r.1, N. 3.
Pro Armenia, 1900.

## SEROKANİ BI ZMANÊ TIRKİ

Ewliya Çelebi, Pêşgotın û Nêrin, A.X. Savnastiyan, Êrivan, 1967.
Ergin.O. Diroka Rewşenbiri a Tırkiye (Türkiye Maarif Tarihi), C.3.

G.Tronsi, Serihıldana Sasonê, Rûpelek Jı Bûyera Nû a Sasonê, Cenevre.

K.Sasoni, Diroka Taron, Beyrut, 1957.

K.Sasoni, Tevgera Azadixwaz a Kurdan û Peywendiya Ermeniyan û Kurdan, Beyrut, 1949.

Kirzioğlu M.Fahrettin, Bı Her Awayi de Kurdên ku Tırk ın, (Her Bakımdan Türk Olan Kürtler)Ankara, 1964.

Tevgera Geli a Koçgiriyê , 1919-1921,(Koçgiri Halk Hareketi, 1919-1921), Ankara, 1976.

M.Varandiyan, H.İ. Diroka Destanan Cıld I. Paris, 1932.

Rubin, Biraninên Şoreşgereki Ermeni, Los Angeles, 1951.

Şahbaziyan, Diroka Kurd û Ermeniyan, İstenbul, 1911.

Zınnar Sılopi, Doza Kurdıstan, Jı 60 Sal Heta Nıha Biraninê Şerê Rızgariye a Jı Bın Dest Yê Netewa Kurd ( Doza Kurdıstan, Kürt Milletinin 60 Seneden beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı), 1969.

Ziya Kökalp, Lêkolinên Cıvaki Lı Ser Eşiretên Kurdan (Kürt Aşiretleri Hakkında İçtimai Tetkikler), Ankara,1975.

The Encydopaedia Of İslam, New edition, vol. 1, Fasc. 14, London, 1958.

Revue Du Monde Musulman, 1909, t-7, N 1-2; 1910, t. 10, N.4.

Turkiye Ansiklopedisi, Ankara, 1965, C.IV.

Die Melt Des İslams, Berlin, 1913, Band 1, Heft 317.

David Adamson, The Kurdısh War, London, 1964.

Hacan Arfa, The Kurdısh Historical And Political Study, London, 1966.

The Azisan Or The Princes Of Boktan, RCAJ, V. XXXVI, 1949, part III-IV.

Joyce Blau. Le Probleme Kurde, Bruxelles, 1963.

Chukuru Mehmed Sekban. La Ouestıon Kurde, Paris, 1933.

Correspondence Respecting The Asiatic Provinus Of Turkey, 35, 1904.

Deutschland und Armenien Sammlung Diplomatischer Akmenstuke, Potsdam, 1919.

Edmons C.J. Kurds, Turks and Arabs, London, 1957.

Elphiston W.G. The Kurdish Ouestion, Journal of the Brittish Inst. of International Affairs, 1946, 22.

Gavan S.S. Kurdistan Divided Nation of the Middle East, London, 1958.

Chassemlou A.R. Kurdıstan and the Kurds, Prague, 1965.

Hartman M. Zur Kurdıshen Literatur, Wienen Zeitschifs Far Die Kurde Des Morgenlandes, B.XII, Wien, 1898.

Derk Kihhane. The Kurds and Kurdıstan, London, 1964.

Hugo Makas, Kurdische Studien, Heidelberg, 1900.

Hugo Makas, Kurdısche Texte ın Kurmanji- Dielecte aus Dengegens von Mardin, Leningrad, 1926.

Rene Maaries, Le Kurdıstan ou La Mart, Paris, 1967.

Jean Pradler, Les Kurdes Revoution Silenciense, Bordeaux, 1968.

Safrastian H. Kurds and Kurdıstan, London, 1948.

La Rerite Sur La Ouestion Syrienne, Publ. Par Le Commandement De ja IV-me Armee, Stamboul, 1916.



## Dr. CELİLÊ CELİL

Dr. Celilê Celil, dı sala 1936 an de lı Êrivanê jı dayika xwe bû. Xwendına xwe ya pêşin, lı Êrivanê, bı zmanê Ermeni xelaskır. Sala 1954 an dest bı Fakulta Tarixê ya Universita Êrivanê kır. Hin dı wan salan de, dı komela universitê ya Hevalbendiya Xwendekarên Ilmi de, lı ser tarixa Kurdi semineran dıda.

Dı sınıfa çaran de, nasbûna wi bı Prof. Yosıf Orbeli; serokê Instutiya Rojhılatnasiyê qısmê Kurdzani re çêbû. Sala 1959 an, universitê xelas kır.

Pışti vê, dı wê universitê de dest bı asistaniyê kır. Dı 1963 an de heqê doktoriyê lı ser xebata xwe ya hêja, Rabûna Kurdan Lı Tırkiyê Ya 1850-1880 i gırt. Dı sala 1964 an de vegeriya Êrivanê û dı Instutiya Rojhılatnasiyê ya Akademiya Ilmi ya Ermenistanê dı qısmê Kurdnasiyê de dest bı xebatê kır.

Qısmek têza (disertasyon) wi dı sala 1966 an de lı Moskovayê bı zmanê Rusi hat çapkırın. Dı sala 1973 an de, pırtûka wi ya, Kurdên İmparatoriya Osmani -Lı Niveka Pêşina Sedsala 19'an- bı zmanê Rûsi hat çapkırın.

Ev pênc pırtûkên jêrin ji, bı birayê xwe Ordixan re amade kiriye :

1) Mesele û Metelokên Kurdi (bı Kurdi-Rûsi)

2) Çirokê Cım'eta Kurda, Êrivan, 1974

3) Zargotına Kurdi (bı tipên latini) Moskova, 1978, 2 C.

4) Cardın bı vi navi, dı sala 1978 an de, lı Êrivanê bı tipên krili kıtêbek wi ya jı sê bıran pêkhati çap bû;

a) Landekok û Didarok (bona zarok û lori)

b) Stranên Şinê (nêziki 1200 stran-bend)

c) Qewl û Beytên Êzidiyan (38 poêm)

5) Gulçin (bona şagırdê dıbıstanan bıjarteyên folklori) Dı sala 1982 an de cılda duyemin a vê pırtûkê hat çapkırın. Jı bılî van, 19 poêmên weki Zembilfıroş, Kerr û Kulık, Leyla û Mecnun, Bınefşa Narin, Mencıla Yaz Begê, Şêxê Sıd'aniyan û hwd. weşan çapkır.

Jê pêştır, destnıvisarek bı navê; Politika Jon Turkan Lı Hemberi Kurda (1908-1918) ji amade kiriye.

İSBN : 91970747-21